CON BÎVÊR

# TELA ŞEYTAN

Ji tela
xeyîdêye mirinê
aza bijîn

CON BÎVÊR

# TELA ŞEYTAN

The Bait of Satan by John Bevere, Kurdish Latin
© 2020 Messenger International
www.MessengerInternational.org
Originally published in English as The Bait of Satan by
Additional resources in Kurdish Latin by John Bevere
Are available for free download at www.CloudLibrary.org
To contact the author: JohnBevere@ymail.com

“Tela Şeytan” Con Bîvêr, bi kurdîya latînî
© 2020 Messenger International
www.Messengerinternational.org
Pêşda bi zimanê înglîzî, bi sernavê “The Bait of Satan” hatiye weşandinê
Matêryalên Con Bîvêre mayîn ên bi kurdîya latînî hûn dikarin belaş li
malpera www.CloudLibrary.org–ê barkin
Bo îzbatkirina pêwendiyên tevî xudanê kitêbê: JohnBevere@ymail.com

## Ez razîbûnê elamî navên li jêrê kifşkirî dikim...

Jina xwe Lîzayê, ya ku dû Xwedê ra hevala min a gelekî hizkirî ye. “Tu bi rastî jineke dilrehmî. Ez minetdarê Xwedê me, ku em çawa mêr û jin gîhandine hev. Bona wê yekê ku te nava xebatên li ser vê kitêbê alî min kir, ez razîbûnê elamî te dikim”. Bona serhevdaanîna vê projeyê ez razalixîyê usa jî elamî her çar kurên –xwe Эdîson, Ostîn, Alêksandr û Ardên dikim, ên ku wedê xwe qurbana vê xebatê kirin. “Hûn, zarokno, şabûna dilê min in”.

Spasiya mexsûs bo Con Mêyson, yê ku bawarîya xwe vê yekê anî û piştgirîya moralî da min, da ku ez çapkirina kitêbê mîyaser bikim, bo Dêbora Pûlêylîonê û usa jî teşkîla xebatkarên “Charisma House”–ê, yên ku tevî min nava vê bernamêda xebitîn.

Ya here sereke, ez razîbûna xwe ya bêqelp elamî Bavê Ezmîn dikim, bona pêşkêşa Wî ya vî cûreyî, razîbûnê elamî Xudan Îsa dikim bona kerema Wî, rastîyê û hizkirinê û Ruhê Pîroz, ku nava vê projeyê da rêberî li min kiriye.

# SERECEM


*PÊŞGOTIN.* . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . *5*

*SERECEM* . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . *9*

1. GELO EZ DAME XEYDANDİNÊ? . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .13
2. XEYÎDA Bİ MASSAYÎ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .21
3. ÇFWA TİŞTEKÎ USA DİKARİBÛ BİHATA SERÊ MİN? . . . . . . . .33
4. BAVÊ MIN, BAVÊ MIN! . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .45
5. GEROKÊN RUHANÎ ÇAWA TÊN DİNÎYAYÊ . . . . . . . . . . . . . . .59
6. BI XWEVEŞVRTİNV Jİ RASTÎYÊ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .73
7. HÎMÊ QEWÎN. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .83
8. HEMÛ TİŞT, Çİ KU DİKARE Jİ CÎHEKÎ BİLEQE, WÊ BİLEQE . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .97
9. ZİNARÊ XEYÎDÊ. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .113
10. NİŞKÊVA NEDİNE XEYÎDANDİNÊ. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 129
11. HEGER TU NEBAXŞÎNÎ, TÊ NEYÊYÎ BAXŞANDİNÊ . . . . . . 141
12. HEYFHİLDAN TELE YE . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 155
13. AZABÛNA Jİ TELÊ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 167
14. LİHEVHATİN ÇAWA ARMANC . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 177

*PAŞGOTİN: DERBASÎ KİRİNÊ BİBİN.* . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . *189*

# PÊŞGOTIN

Kitêba ku niha destê we da ye, diqewime bona we bibe rû bi rû sekinandina tevî wê rastiyê, ya ku nava jîyana weda rastî we hatiye. Ez dikarim bi guman bêjim, wekî ne ku bi wê menîyê ku ev kitêb min nivîsîye, lê rûyê wê têmayêda, derheqa kîjanêda emê biaxivin. Têma xeyîdê, ya ku beşa kitêba "Tela Şeytan" ya hîmlî ye, gelek cara dijwariya here mezin e, çimkî meriv ese rastî wê yekê tê û wê yekê gerekê alt bike.

Şagirtên Îsa bûne şedê gelek ecêbên mezin: çavên kora vebûn, û mirî rabûn, Îsa emir kir ku bagera bi qezîya bisekine. Şagirta dît ku çawa bi hezara meriv bi du nana û hevt masîya têr bûn. Ecêbên ku Îsa kirin û karên wîye mayîn cimet zendegirtî dihiştin û ew yek ser hevda nedihat, kîjan anegorî Încîlê, temamîya kitêbên dinîyayêda wê cîh nebûna.

Berê meriv ecêbên Xwedêye wî cûreyî nedîtibûn. Şagirt zendegirtî mabûn. Menîya şikberîyê ecêb nîbû. Na xêr, ew yek wê diha dereng bihata, piştî xilasbûna qulixa Îsaye li ser dinîyayê. Îsa şagirtên Xwe hîn kiribûn: "Heger birayê te himberî te guneha bike... eger hevt cara rojê li himberî te guneha bike û hevt cara jî paşda vegere û bêje tobe dikim, wî bibaxşîne". Şagirta carekêra bersiva Îsa da: "Bawarîya me zêde bike" (Lûqa 17:3–5). Ew ecêb bona wê yekê nîbû, wekî meriv diha gelekî berbi bawarîyê bicedandana, bo ku jîyanê bidine mirîya, yan jî bagerê bidine sekinandinê, lê bona wê yekê bû, da ku meriv bibaxşandana wana, kî ku ew xeyîdandibûn.

Îsa got: "Ew yek tiştê bûyînê nîne, wekî sebebîya ji rêderketinê tunebe" (Lûqa 17:1). Li vir gilî derheqa mecala xeyîdandinê, yan jî xeyîdê da nîne, lê derheqa wê yekêda ye, ku tê çawa bersiva wan xeyîda bidî. Feqet ew yek ber çava ye, ku gelek xeyîdî û dîlketî ne. Eva êdî serê deh sala ye ku ev kitêb hatîye nivîsarê. Nava wî wedeyîda me gelek name û şedetîyên merivên cuda–cuda, malbeta û qulixçîya stendine, yên ku ji rastîya Gotina Xwedê ya li vê kitêbêda qenc bûne. Bona piştgirîya we me hinek mesele kitêbêda çap kirine. Bona wan hemûya em şa dibin û şikirîyê didine Xwedê.

Rêberek şedetî dida: "Civîna me li ser şêmîka dutîretîyê bû. Guman êdî tune bû. Min kitêba "Tela Şeytan" da hemû mezinên li wir. Dutîretî hate sekinandinê û em îro yekbûyî ne". Gelek zewac wî cûreyî hatine xilaskirinê. Van axirîya, wextê ku min li Nêbraskayê qulixa xwe dikir, piştî xeberdana min, mêr û jinek nêzîkî min bûn. Ew jin xwe mikur hat: "Deh sal pêşda ez ji mezinên vê civînê xeyîdî bûm. Min her dem xwe diparast û ez gelekî şikber dibûm. Ji wê yekê usa jî zewaca me zyanê diket û mêrê min hazir dibû ji min cihê bibûya. Ew xilasbûyî nîbû û nedixwest ku tevgirêdanên wî civînê ra hebûna. Endamekî civînê kitêba "Tela Şeytan" da min, min xwend û piştî wedekî kurt ez ji xeydê û talayê azad bûm. Wextê ku mêrê min guhartinên nava minda dîtin, ewî, bi rezedilîya xwe, xwe teslîmî Îsa Mesîh kir û ji cihêbûnê paşda sekinî". Mêr li rex jinê sekinîbû û ken li ber devê wê bû. Şedetîkê ez zendegirtî hiştim. Li bajarê Florîdayêyî Nêpilzê, piştî qulixê, merivekî bi fîzîkî gelekî giran, yaşê xweva

nêzîkî 4O salî, li ber cimetê sekinî bû, digiriya û serpêhatîya xweye tragîk gilî dikir: “Nava temamîya jîyana xweda min texmîn dikir, wekî dîwarek di navbera min û Xwedê da heye. Wextê qulixkirina, meriva haziriya Xwedê texmîn dikir, lê ez tê bêjî cudabûyî bûm, min tu tişt texmîn nedikir. Wextê duakirinê jî min sivikayî texmîn nedikir. Çend hevtê pêşda kitêba “Tela Şeytan” kete destê min. Min heya dawîyê xwend. Min fem kir, wekî çend sal pêşda min tiştê li ser tela şeytan daqurtandibû. Min dayka xwe hiz nedikir, çimkî ewê wextê ku ez şeşmehî bûme, hiştîye û çûye. Min fem kir, wekî gerekê herim li cem wê û bibaxşînime wê. Min jêra têlefon kir û nava 36–salada cara duem ez wê ra axivîm. Ez digiryam û min digotê: “Dayê, min nikaribû bibaxşanda te bo wê yekê, wekî te ez hiştibûm û çûbûyî”. Dayîka min girya û got: “Kurê min, min 36 sala ser hev bona hiştina te xwe hiz nekiriye”. Min baxşande dayîka xwe, lê ewê jî baxşande min. Niha nava meda lihevnehatin tune. Ewî gotina xwe berdewam kir û pişt ra tiştê herî grîng got: “Niha ew dîwarê ku îzin nedida ku ez hazirîya Xwedê texmîn bikim ji navberê hatîye hildanê”.

Bi serhevdaanîna serpêhatîya xwe, ew girîya. Ewî dicedand ku van xeberên dawîyê bêje: “Niha ez nava hazirya Xwedê da mînanî zarokekê digrîm”.

Rastî û qewata wê yekê min ra nas in. Bi sala ser hev, ez bûme dîlê zêrandina wê telê. Ev kitêb têorîya nîne, lê Gotina bi rastîêva tijî ye, ya bi bedena Xwedê ye, rastî ye, nava kîjanê ra ez bi xwe derbas bûme. Ez bawar im, wekî ewê qewatê bide te. Wextê ku tu bixwînî, hîvî ji Xudan bike, ku Ew bawarîya te zêde bike. Wextê ku tu nava bawarîyê da pêş bikevî, Ewê şa bibe, lê tê bi şabûnê tijî bibî”. Bila Xwedê bi merdanî te pîroz bike.

– Con Bîvêr

# SERECEM

Eger yekî bi alîkarîya telê heywan girtine, wî çaxî ew zane wekî bona nêçîra baş du tişt lazim in. Wextê ku telê diatînin, gerekê telê usa veşêrin û guman bin, wekî heywanê bişimite (bilukume). Xêncî wê yekê, gerekê usa bedew bê kifşê, wekî ew heywana bikeve nava hembêza mirinê.

Şeytan (cin), dijminê ruhên me vê stratêjiyê, van herdu tişta dide xebatê, wextê ku telên xweye xapînok diatîne. Ew herdu tişt jî gelekî baş veşartîne.

Cin tevî hevalkarên xwe eşkere kar nake, bi çiqasîva jî usa bê texmînkirinê. Ew veşartî kar dike û dixapîne. Ew gelekî zîrek û fêlbaz e. Bîr neke, wekî cin dikare xwe çawa milyaketê ronahiyê veşêre. Eger em ji Gotina Xwedê hîn nebûne, başîyê û xirabîyê ji hev cuda nekin, wî çaxî emê telên wî nas nekin. Eger em bi Gotina

Xwedê hîn nebûne, nava pirsa cudakirina xirabîyê û qencîyê da, wî çaxî emê nizanibin, ku telên wî kîjan in.

Teleke xapînoke gelekî bi qezîya, kîjan rastî her mesîhîkî hatîye, xeyîd e. Bi rastî xeyîd tiştê mirinê nîne, heger ew telê da bimîne. Lê heger em wê yekê diqetînin, dadiqurtînin û dilên xweda xweyî dikin, peyî wê yekê ra em dibine merivê xeyîdî. Dilên merivên xeyîdî dişkên û nava wana da rezên hêrsê, harbûnê, komreşîyê, şerkirinê, talayê û hevsûdîyê hene. Ji feydaên xeyîdê nin bêhrmetkirin, êşandina merivên mayîn, êrîşkirin, cihêbûn, dutîretî, heleqetîyên terbandî, xayîntî, bêşêkirî û tiştên mayîn.

Gelek cara, ewên ku xeyîdîne, qet texmîn jî nakin ku ketine telê. Ew fem nakin ku halê wan çi ye, çimkî ew li ser wê şaşîyê disekinin, kîjan hindava wanda hatîye kirinê. Ew nava înkarbûnê da nin. Bona korkirina me rêya dijmine here kardar ew e, ku guhdarîya me bide li ser şexsê me.

Ev kitêb tela mirinê eşkere dike û dide kifşê ku çawa ji wê yekê paşda bisekinin û aza bimînin. Bona ku mesîhî ji xeyîdê aza bimîne, ew yek grîng e, çimkî Îsa got, wekî nava vî emirîda tiştê bûyînê nîne ku mecala xeyîdandinê tune be (Lûqa 17:1).

Li kîderê jî min ev berbirîbûn xwendiye, dixwezî li Amêrîkayê be, yan jî li civînên welatên mayîn, piranîya meriva banga azabûnê kirine. Nenihêrî wê yekê, wekî eva bersiveke mezin e, lê ev yek hela hê ji alîyê hemûya da nîne. Kubarî hinek meriva ji vê bangê paşda dihêle. Min dîtîye ku çawa meriv qenc bûne, aza bûne, bi Ruhê Pîroz va tijî bûne û bersivên duakirinên xwe stendine, wextê ku ew ji telê aza bûne. Carna ew şedetiyê didin, wekî ew bi sala çi gerîyane, piştî azabûnê stendine.

Dawîya sedsala 21–ê ulmê Xwedê li civînê kifş e. Nenihêrî vê yekê, zelal dibe wekî em nava bawarmenda û mezinên civîna da diha gelekî dibine şedê cihêbûna.

Menî tenê yek e: xeyîd, kîjan lez rûyê kêmasîya hizkirina bêqelp da zêde dibe. “Ulm kubar dike, lê hizkirin çê dike” (1 Korintî 8:1). Gelek meriv ketine evê tela xapînok û em hatine ser wê fikirê, wekî ew yek jîyana normal e.

Çawa jî hebe, hetanî vegera Mesîh, nenihêrî paşeroja wan, bawarmendên rast wê yekbûyî bin. Ez bawar im, wekî îro gelek meriv ji evê tela xeyîdê aza dibin. Ev azabûn jî wê bibe xeleqeke hişyarbûnêye sereke. Bêbawar wê bi saya hizkirina meye himberî hev Îsa bibînin, rûyê tunebûna kîjanêda jî wana hetanî niha Îsa nedîtîye. Berê, çavên wana bona Îsa girtî bûn.

Ez nafikirim, wekî kitêbê tenê bona nivîsarê dinivîsin. Xwedê dilê min da ev berbirîbûn da şuxulandinê û min rezên wê dîtin. Piştî qulixekê, wextê kîjanê min ev gotin dixwendin, serwêrekî civînê gote min: "Min tu cara nedîtîye, wekî awqas meriv carekêra aza bibin".

Xwedê gotibû dilê min, wekî eva tenê destpêk e, gelek meriv, wextê ku vê kitêbê bixwînin, wê aza bibin, qenc bin û bêne dasekinandinê. Ez bawar im, wekî wextê tu gotinên vê kitêbê bixwînî, wî çaxî Dersdar û Şêwirdar wê wan ticta bona we bidine xebitandinê. Wextê ku Ew kar bike, ew gotina eşkerekirî wê azayê bîne nava jîyana te û qulixa te.

Hetanî xwendina kitêbê were em tevayî dua bikin:

> "Bavo, bi navê Îsa ez teweqeyî Te dikim, wekî wextê xwendina vê kitêbê Gotina Xwe bi Ruhê Xweva bidî eşkerekirinê. Cîhên dilê min, yên veşartî, nîşan bide, kîjan bona min bûne dijwarî û rûyê wan da ez ji naskirina Te û qulixê paşda sekinîme. Ez bi şabûn hilmeyîkirina Ruhê Pîroz qebûl dikim û kerema Te tewaqe dikim, ku xwestina Te mîyaser bikim. Îzinê bide min, ku ez diha ji nêzîkva Te nas bikim û wextê xwendina vê kitêbê dengê Te bibhêm".

## BERSİVA ME YA HİNDAVA XEYÎDÊ DA PÊŞEROJA ME QİRAR DİKE.

“Kitêba “Tela Şeytan” emir û qulixkirina min daye guhartinê. Me nêzîkî 2O cara vîdêo nihêrîye û em hertim kitêbê dixwînin. Qulixdarîya me ev kitêb û hînkirinên bi vîdêoyê çawa bona xwe, usa jî bona guhartina emirên gelek merivên mayîn dane xebatê. Temîya kitêbê gelekî qewat e û anegorî wede ye”.

– S. K., KONNÊKTÎKÛT

# 1

# GELO EZ DAME XEYDANDİNÊ?

***"Tiştê bûyînê nîne ku xeyîd neyên".***
**– LÛQA 17:1**

Bi bûyîna nava qulixê da, wextê gera li Amêrîkayê, min karibûye teleke dijmine mirinê û xapandinê lêkolîn bikim. Ew yek gelek mesîhîya bi hevra dide girêdanê, heleqetîyên wana dide teribandinê û terşên di navbera wan da ji hev dide dûrxistinê. Gilî derheqa tela xeyîdê da ye.

Gelek meriv rûyê xeyîdê da, rûyê birînên ku nava emirê xweda stendine, nikarin tam nava qulixa xweda kar bikin. Ew seqet dibin û dijwarîî nahêlin ku ew potênsyala (qewata) xwe bidine xebatê. Gelek cara ew ji alîyê merivên bawermend da tên xeyîdandinê. Di Zebûr 55:12–14–da Dawid lawijeke wiha distirê: "Heger neyarekî ku min

biçûk dibîne hebûya, min dikaribû sebir bikira, heger yê ku min hiz nake himberî min pesinê xwe bida, min dikaribû xwe ji wî veşarta. Lê belê, yê beramberî min tuyî–xêrxwezê min, hevalê min ê nêzîk. Me bi hev ra şêwirdarîke şîrin dikir û tevî civakê diçûne mala Xwedê. ”

Ewana ew meriv in, li rex kîjana em rûdinên, tevayî pesina didin, yan jî bi texmîn ew e, yê ku propagandayê dike. Em bi wan ra hêsabûnên xwe derbas dikin, tevî teşkîldarîyên civakî dibin, hevalbendîyê dikin. Belkî ew merivên gelekî nêzîkî me ne, yên bi hevra mezinbûyî, bi hevra meremên xwe parevekirî, yan merivên ku bi hevra bin qatekîda dimînin û derbas dikin. Bi çiqasîva ew pevgirêdan nêzîkî hev in, bi awqasîva tajana wê xeyîdandinê zêde ye. Hiznekirina here mezin tu nava heleqetîyên wan meriva da dibînî, yên ku tevî te nêzîk bûne.

Parêzer wê we ra serpêhatîyên gelekî bi êş û tajan gilî bikin, kîjan wextê ji hev cihêbûna mêr û jin diqewimin. Prêsa amêrîkî her dem înformasyayên derheqa kuştinên nava malbeta da belav dike, kîjan bi destê endamên malbatêye gumanbir hatine kirinê. Malbat gerekê bibe cîhê parastinê, çareserîyê û gihîştinê, li kîderê em hînî hizkirinê dibin, lê ew gelek cara dibe koka êşa meye kûr. Dîrok dide kifşê, wekî şerê here bi xwînrêtin yê bajarvanîyê ne, wextê ku bira radibe miqabilî birê, kur miqabilî bav, bav miqabilî kur.

Mecalên xeyîdê, awqas zef in, çiqas pevgirêdanin, nenihêrî wê yekê ku ew xeyîd mezin e yan biçûk e. Rastî ew e, wekî ew meriv dikarin te bidine xeyîdandinê, kîjan bona te grîng in. Hûn dikarin gelek tiştî ji wan meriva bibînin, himberî kîjana te xwepêşkêşkirin daye kifşê. Lê belê, ji tiştên qewimî şûnva hûn dinihêrin ku ji xwe gelek tişt êdî çûne. Bendewarî çiqas mezin be, ketin jî awqas mezin dibe.

Xwehizî nava civaka meda serwêrîyê dike. Roja îroyîn meriv gelekî fesal bûne, çimkî ditirsin ku ji alîyê dor û berên xweda neyêne êşandinê. Ev yek gerekê me zendegirtî nehêle. Încîl gelekî zelal dibêje, ku rojên dawî da merivê bibine “êgoîst” (xwehiz) (2 Tîmotêyo. 3:2). Vê yekê em derheqa merivên bêbawar da dibêjin, lê belê Pawlos berbirî wan meriva nabe, yên ku ji civînê der in. Ew derheqa wan merivada dibêje, yên ku hundurê

civînê da bûn. Gelek merivêncivînê da bêhurmetbûyî û êşandîne, xeyîdîne. Ew xeyîdîne, lê fem nakin ku ketine tela şeytan.

Gelo eva şaşîya me ye? Îsa gelekî zelal got, wekî wextê ku tu li vê dinyayê dijîyî, ew yek tiştê bûyînê nîne, heger meriv neyê xeyîdandinê û xapandinê. Bi wê yekêva tevayî, gelek bawermend zendegirtî dimînin, şaş û ecêbmayî dimînin, wextê ku ev yek diqewime. Em difikirin ku tenê li me neheqî hatîye kirinê. Tevî vê yekê li hundurê meda koka talayê şîn dibe û me bêyî parastin dihêle. Ji boyî vê yekê em gerekê hazir bin ku neyêne xeyîdandinê, çimkî bersiva (caba) me pêşeroja me dide qirarkirinê.

## Tela xapînok

Lûqa 17:1–da peyva (xebera) bi navê "xeyîd" ji peyva yûnanîye "skandalon" tê. Pêşda bi vê peyvê ew parçê telê nav dikirin, kîjanêva ew xapînok dihate qemitandinê. Bo wê yekê jî fikira vê xeberê ev e: "Li ser rêya yekî telê daynin". Peymana Nû da gelek cara derheqa wê yekê da tê nîşandayînê ku ji alîyê dijmin da tele tê çêkirinê. Xeyîdandin hacetekî şeytên e (cin), bi kîjanê ew meriva bindest dike. Pawlos wiha Tîmotêyosê ciwan (cahil) hîn dike:

> "Divê xulamê Xudan ji pevçûyînê dûr be, li hemberî hemûyan nerm be, ji bo hînkirinê jêhatî û bînfireh be. Divê ew bi nermî şîreta li yên miqabil bike, belkî Xwedê mecalê bide wan ku rastîyê bizanibin û bêne ser hişê xwe, ku ji bo daxwaza xwe ew hatine girtinê, xilaz bibin".
>
> – 2 TÎMOTÊYO 2:24–26

Merivên ku bi hev ra şer dikin, yan jî li dijî (miqabilî) hev disekinin dikevine telê û anegorî xwestina şeytên dibine dîl. Tiştê herî tirsandinê jî ew e, ku ew meriv ha ji xwe tunene, wekî ew dîl ketine. Mînanî kurê ji rêya xwe derketî, wexta ku ev tişt bêne serê wan, ewê wî çaxî halê xwe fem bikin. Ew texmîn nakin ku ji wana diha gelek ava tal derdikeve, ne ku ava paqij. Wextê ku merivek hatîye xapandinê, ew difikire ku ew rast e, nenihêrî wê yekê ku ew şaş e.

Firqî tune ku ssênar çi cûreyî ye, hemû merivên xapîyayî meriv dikare pareveyî li ser du komên hîmlî bike: (1) hindava kîjana da neheqî hatîye kirinê û (2) merivên ku difikirin, ku hindava wan da neheqî hatîye kirinê. Merivên koma duem bi dil bawar dikin ku neheqî li wan hatîye kirinê. Ewana carna ji înformasîyayên nerast usa difikirin, yan jî înformasîya rast in, lê hatine navhevxistinê. Çawa jî hebe merivên wî cûreyî hatine êşandinê, lê femdarîya wan jî nava tarîyê da ye. Ew tenê bi texmîn difikirin, bi hesabhildana xeberdanên ji der.

## Rewşa dile rast

Rêke dijmine usa heye, bi kîjanê dijmin mêriv nava halê xeyîdî da xweyî dike. Ew xeyîdê vedişêre û wê yekê bi kubarîyê vedişêre. Kubarî wê nehêle ku tu li halê xweyî rast xwe mikur bêyî.

Carekê ez ji jin û mêrekî ku civînê da qulix dikirin êşîyam. Meriva digotine min: “Em bawer nakin ku wana himberî te usa kirîye. Tu ne êşyayî?”. Min bersiva wan dida: “Na, hemû tişt baş e. Ez nexeyîdîme”. Min zanibû ku xeyîd şaşî ye, ji bo vê yekê jî min ew yek înkar dikir, lê bi rastî ez xeyîdî bûm. Kubarîyê, rewşa dilê min, ya rast, pêçabû, veşartibû.

Kubarî te ji rastîyê dûr xweyî dike, dîtinokên we tevlîhev dike. Dema ku tu difikirî ku her tişt baş e, tê tu cara neyêyî guhartinê. Kubarî dilê te hişk dike û femdarîya te reş dike. Êw te ji guhartina dil paşda xweyî dike (binihere 2 Tîmotêyo 2:24–26. )

Wekî din ew te mecbûr dike ku tu xwe çawa qurban bibînî. Tu wa difikirî: “Hindava min da xirabî hatîye kirinê, derheqa min da şaş difikirin, nava vê yekê da heqê min heye ku ez usa bikim. ” Tu difikirî ku tu heqî û tu wî nabaxşînî. Nenihêrî wê yekê ku rewşa dilê te ya rast ji te hatîye veşartinê, lê ji Xwedê ew veşartî nîne. Heger himberî te şaşî jî hatîye kirinê, ew yek îzinê nade te ku tu bibî dîlê xeyîdê. Wextê ku li ser şaşîyê şaşî zêde dibe ew êdî weke rastîyê nîne.

# Çare

Îsa Peymana Nû da berbirî Civîna Lavodîkîyê dibe, di destpêkê da dibêje, ku ew çawa xwe awqas zengîn, dewlemend dibînin û hewceyî tu tiştî nînin, lê paşê rewşa dilê wan eşkere dike: “feqîr, kesîb, kor, tezî” (Eyantîya Yûhenna 3:14–20). Ew bi şaşîtî difikirîn ku heger ew bi fînansî qewat in, usa ye ew bi ruhanî jî qewat in. Kubarîyê îzin nedida wan ku wana halê xweyî rast bidîtana.

Roja îroyîn gelek kes vê rewşê da nin, wek ev mêr û jinê ku ez jê xeyîdî bûm. Min xwe qanî kiribû ku ez nexeyîdîme. Îsa şêwir da Lavodîkyan ku ew çawa dikarin ji nava xwexapandinê derbikevin: Zêrê Xudan bikir’in û rewşa dilê xwe bibînin.

***Zêrê Xudan bikire.***

Bona xilasbûna ji xwexapandinê şîreta Îsa ev bû: “Ji min zêrê ku nava agir da hatîye cêribandinê bikire” (Eyantîya Yûhenna 3:18).

Zêrê hatiye safîkirinê nerm e û hêsa tê tewandinê, nava wî da zeng û tiştên mayîn tunene. Bo wê yekê jî, wextê ku zêr tevî hesinên mayîn (sifir, nîkêl û yên mayîn) dibe ew giran dibe, natewe û zû zeng digire. Vê tevlîhevbûnê ra amêjen tê gotin. Nava zêr da çiqas gelek hesin zêde dibe, ew bi awqasîva giran e û wekî mayîn.

Em dikarin himberîhevkirinê derbas bikin: “Dilê paqij mînanî zêrê paqij e. Ew nerm û nazik e û hêsa ditewe”. Îbranî 3:13 îzbat dike, wekî rûyê xapandina gunehê da dil berk dibe. Heger em pirsên xeyîdê safî nakin, dilkeserî, hêrs û xeyîd wê hê zêde fêkîyên guneh zêde bikin. Ew hemû tişt dilê me berk dikin, çawa hesinên mayîn zêr hişk dikin. Ew hişkbûn nermaya dilê me kêm dike û nazikayî unda dibe. Bi vî cûreyî, em karebûna guhdarkirina dengê Xudan unda dikin. Karebûna meye rastdîtinê tarî dibe. Ev yek jî halekî kardar bona xapandinê pêşda tîne.

Gava ewlin, ya bona paqijkirina zêr ew e, wextê ku zêr werguhêzî tozê dikin û flyûsê nava wî dixin. Paşê jî wî bin dereca germêye bilind da dihelînin. Qinyatê flyûs tiştên qirêj dikişîne nava xwe û

wana bilind dike, başqe dike. Zêr (kîjan diha giran e) binda dimîne. Tiştên qirêj yan jî tiştên nelazim dûr dikevin û nava encamê wê yekê da tenê hesinê paqij dimîne.

Niha em bibînin ku Xudan çi dibêje:

> "Awa, Min tu paqijkirî û ne ku bi cûrê zîv, lê Min tu nava helandina tengavya da cêribandî".
>
> – ÎŞAYA 48:10

Careke mayîn:

> "Hûn bi vê yekê gelek şa ne, her çiqas niha divê ku hûn ji bo demeke kurt bi cêribandinên cûre–cûre xemgîn bibin jî. Ew tên, da ku hêjabûna baweriya we kifş bibe û çaxê ku Îsa Mesîh xuya bibe, ewê ji we ra bibe pesin, rûmet û serbilindî. Bi ser ku zêr tune dibe û diçe, dîsa di êgir da tê helandinê û bawerîya we ji zêr hêjatir e".
>
> – 1 PETRÛS 1:6,7

Xwedê mêriv bi tengasiya cêribandin û derda safî dike, agirê kîjana tiştên nepaqij cuda dike, mînak: nebaxşandinê, pevçûyîna, hêrsê, talayê, çavnebarîyê û tiþtên mayîn, û jîyanên meda xeysetê Xudan çê dibe.

Cîhê ku agirê cêribandin û tengaviya tune guneh hêsa xwe vedişêre. Di dema açix û gulvedayî da yekî xirab jî dikare çawa merivekî nazik û destfireh bê kifşê.

Demekê di jîyana min da, ez nava cêribandinên usa ra derbas dibûm, kîjan min pêşda nedîtibûn. Ez himberî merivên nêzîkî xwe gelekî sert bibûm. Heval–hogir û malbata min ji min dûr diketin. Bi dengekî awaz min gazî Xudan kir: "Ev hêrsa min ji kîderê tê? Berê tiştekî usa dilê min da tunebû!"

Xwedê bersiv (cab) da min: "Lawê min, wextê ku zêr nava agir-da dihelînin, tiştên nepaqij derdikevne holê".

Paşê Xudan pirsek da min, kîjanê emirê min da guhartinê: "Berî ku zêr biavêjin nava êgir tu dikarî nava zêr da wan tiştên nepaqij

bibînî?”. “Na xêr”, – min bersiv da.

Xudan min ra got: “Lê ew yek nade kifşê, wekî ew tiştên qirêj li wir tunene. Wextê ku agirê cêribandinê derbê digihîne te, ew qirêj derdikevine holê. Rast e ew xwe nîşanî te nakin, lê belê, Ez her dem wana dibînim. Bona wê yekê jî li pêşîya te bijartin heye, kîjanê pêşeroja te qirar bike. Niha tu dikarî hêrsketî bimînî– dikarî jina xwe, hevalên xwe, pêşengên civîna xwe û hevalê xweye ku tu pêra dixebitî gunehkar bikî, yan jî tu dikarî ewê para gunehê nelazim bibînî çawa ku ew heye û baxşandinê bistînî. Wî çaxî Ez ê heska xwe hildim û wan tiştên nepaqij ji jîyana te dûr bixim”.

***Rewşa xweye rast bibine.***

Îsa got ku kilîteke azabûna ji xapandinê rastdîtina hal e. Gelek cara, wextê ku em dixeyîdin, em xwe çawa qurbanî dibînin û ewên ku em êşandine em wana sûcdar dikin. Wextê ku talayî, nebaxşandin, hêrs, û hevsûdî pêşda tên ew xwe heq derdixin. Carna em li ser wana jî hêrs dikevin, kîjan derheqa wan merivada bîr tînin, yên ku em xeyîdandine. Ji bo vê yekê jî Îsa di Eyantîya Yûhenna 3:18–da şîret dida: “Derman dayne li ser çavê xwe ku tu bibînî”. Lê tê çi bibînî? Rewşa te ya rast. Ev e rêya tek–tenê, bi kîjanê em dikarin “bicedînin”, çawa ku Îsa got. Tê wî çaxî tobe bikî, wextê ku tu terka gnehkarkirina yên mayîn bidî.

Em kor in, heger em merivên mayîn gunehkar dikin û tabîya xwe diparêzin. Em dicedînin ji çavê birayê xwe zilikê biçûk derxin, lê em nanhêrin ku çavê meda qirşikekî mezin heye.

Tenê eşkerekirina rastîyê azayê dide me. Wextê ku Ruhê Pîroz gunêhê me wî cûreyî nîşanî me dide, wekî em xwe ji guneha cudabûyî dibînin, ew gunehkarîyê nayne.

Duayê min ew e, wekî bi xwendina vê kitêbê, Gotina Xwedê femdarîya te ronahî bike, bona ku tu halê xweyî rast bibînî û ji her xeyîdekê xilas bibî, bona kîjanê te cîh daye. Îzinê nede ku kubarî te ji dîtina halê rast û tobekirinê paşda bigire.

## MESÎHÎYÊ XEYÎDÎ EW E YÊ KU EMİR QEBÛL DİKE, LÊ RÛYÊ TİRSÊ DA NİKARE EMİR BİDE.

“Piştî bîst salên emirê tevayî, deh sal pêşda, mêrê min ez tenê hiştim û çû, çimkî ew “êdî tevî min bextewar nîbû”. Gelek wede min dicêriband wê xeyîdê, tenêbûnê û înkarîyê alt bikim, kîjan min piştî çûyîna mêrê xwe ra texmîn dikir. Min tewaqe ji Xwedê dikir ku alî min bike, ji bo ku ez mêrê xwe bibaxşînim û ez guman bûm ku karebûna min ya baxşandinê heye, lê dilê xweda xeyîdî bûm û min nikaribû ew yek alt bikira. Her car, wextê ku min mêrê xwe didît, ez diêşîyam. Piştî wê yekê, wextê ku min kitêba “Tela şeytan” xwend Ruhê Pîroz ez anîme li ser wê fikirê ku ez mêrê xwera xeber bidim û ji wî tewaqe bikim, ku ew bona xweyîkirina xeyîdê min bibaxşîne. Nava deh salada me cara ewlin bi hev ra qise kir. Bi rastî ez bawar im, wekî ez qenc bûm û aza bûm. Ez ji Xwedê razî me, wekî Ewî ez ji wê dîlketinê aza kirim”.

– D.B., NYÛ YORK

# 2

# XEYÎDA Bİ MASSAYÎ

***"Û wî çaxî gelek meriv wê bixeyîdin, wê hev hiznekin. Û gelek pêxemberên derewîn wê derbikevin û geleka bixapînin. Rûyê zêdebûna nerastîyêda hizkirina geleka wê sar bibe. Lê yê ku heta dawiyê sebir bike, ewê xilas bibe".***

**– METTA 24:10–13**

Îsa evê beşa (para) Mattêosda, nîşanên dinîyaêye dawîyê dide. Şagirtên wî jê pirsîn: «Ji me ra bêje *ku nîşana hatina Te wê çi be?"*.

Gelek meriv wê fikirê ra qayîlin, wekî em nava wedê pêşîya hatina Îsa da dijîn. Ew yek bêfeyda ye ku konkrêt roja hatina Îsa bidne kifşê: tenê Bav wê yekê zane. Feqet Îsa got ku em gerekê wî wedeyî bizanibin û ew wede niha ye. Pêşda tu cara li civînê, li Îsrayêlê û nava tebyetê da me mîyaserbûna pêxembertyên wî cûreyî nedîtine.

Bo wê yekê jî em bi guman dikarin bêjin, wekî em nava wî wedeyî da dijîn, derheqa kîjanîda Îsa beşa Metta 24–ada got. Guhdarîyê bidine li ser nîşanekê, kîjanê pêşîya hatina Îsa pêşda bê: *"Gelek meriv wê ji rê derbikevin... "* ne hinek, lê belê, *gelek meriv.*

Pirsa ewlin, kîjanê em gerekê bidin, ev e: "Lê kîn e ew merivên ku xeyîdîne?". Ew mesîhîne, yan temamîya civakê ye? Em bersiva vê pirsê wî çaxî dibînin, wextê ku em xwendinê berdewam (dûmayî) dikin: "Rûyê zêdebûna neheqiyêda *hizkirina* geleka wê sar bibe". Nava vê gotinêda xebera "hizkirin" zimanê yûnanîda "*agape" ye*. Peymanêda ji bo xebera "hizkirin" gelek peyv tên bikaranîn, lê yên here qebûlkirî du peyv in, *agape* û *phileo*–ne.

*Phileo* ew hizkirin e, kîjanê em nava hevalada dibînin. Ew hizkirina dilovanîye û ya bi peymanê ye. *Phileo* dibêje: "Tu min ra baş be, ezê jî himberî te wî cûreyî bim".

*Agape* ew hizkirin e, kîjan Xwedê kiriye dilê zarokên Xwe. Ewa hema ew hizkirin e, kîjanê Îsa gelekî dide me. Ew hizkirin ya bi peymanî nîne. Ew li ser tu kirinekê yan jî dayîna tu tiştî nîne. Hizkirina wî cûreyî Ew usa jî wî çaxî dide, wextê ku ew tê înkarkirinê.

Bêyî Xwedê em tenê dikarin bi hizkirina êgoîstîyê (xwehizîyê) hiz bikin, nava kîjanêda heger berjewandî (kar) tunebe, nikare bide. Feqet *agape* bêyî tu tiştî hiz dike. *Agape* ew hizkirin e, kuîjan Îsa da, wextê ku li ser xaç baxşand. Bi gotina "gelek kes, " Îsa derheqa wan mesîhîya da dibêje, *agape*–ya kîjana êdî sar bûye.

Demekê min jîyana xweda her tişt dikir bona ku hizkirina xweye himberî merivekî bida kivşê. Wextê ku min gaveke hizkirinê diavît, ew meriv bi nerazîbûna xwe û nêzîkbûna hişk tê bêjî derb digîhande min. Evî halî çar meha kişand û rojekê jî ez êdî ji wê yekê aciz bûm.

Ez bi şikyat berbirî Xwedê bûm: "Ez êdî aciz bûme. Niha Tu gerekê derheqa vê yekêda minra xeber bidî. Her dem ez hizkirina Te nîşanî wî merivî didim, lê dewsa wê yekê ew hêrsa xwe dide kifşê".

Xwedê minra axivî (xeberda): "Con tu hewcê wê yekêyî ku bawarîya xweye nava hizkirina Xwedê da bidî pêşxistinê!"

Min jê pirsî: "Xudan, Tu çi dixwazî bêjî?"

Xudan min ra şirove kir: “Kî ku bona binyata xwe diçîne, ewê ji wê binyatê mirinê biçine, lê kî ku bona Ruh biçîne, wê ji Ruh jîyana heta–hetayê biçine. Ji qencîkirinê jî aciz nebin, çimkî emê wextêda biçinin, heger em nedine der” (Galatî 6:8, 9).

Tu gerekê fem bikî, wekî bi çandina hizkirina Xwedê, tê hizkirina Xwedê jî bidirûyî. Tu hewceyî ku nava zagona ruhanî da bawarîya xwe pêş bixî, nenihêrî wê yekê ku diqewime wê hizkirinê ji wê zevîyê nedirûyî, li kîderê te çandiye û diqewime ew tişt diha gelekî lez biqewime, çawa ku tu dixwezî.

Xudan axaftina (xeberdana) xwe domand: “Dema ku Ez nava hewceyetîya mezin da bûm, dostên nêzîkî min ez tenê hiştim. Yahûda bêbextî li min kir, Petrûs ez înkar kirim û yên din jî, ji bo ku xwe xilas bikin, revîn. Tenê Yûhena ji dûrva da pey min. Ji sê sala zêdetir min li wan nihêrî, min ew xweyî kirin û ew hîn kirin. Lê wextê ku ez bona gunehê dinyayê dimirim min ev hemû baxşandin. Min ew serbest berdan, ji hevalên min destpêkirî, kîjana Ez tenê hiştim, hetanî leşkerên romayî jî, kîjana Ez xaç kirim. Wana ji Min baxşandin nexwestin, lê belê, min ew baxşandin. Nava hizkirina Bav da bawarîya min hebû.

> “Ez we ra dibêjim, dijminên xwe hiz bikin û ji bo yên ku tengavîyê didine we dua bikin, da ku hûn bibin zarokên Bavê xwe, Yê li ezmana, çimkî ew tava xwe him li ser xiraba û him jî li ser qenca dertîne û barana xwe li ser rast û nerastada dibarîne. Eger hûn wana hiz bikin, yên ku we hiz dikin, lê wê xelata we çi be? Gelo bacgir jî usa nakin? Û heger hûn tenê silavê bidin birayên xwe, wî çaxî hûn ji yên din zêdetir çi dikin? Lê pûtperest jî usa nakin?”.
>
> – METTA 5:44–47

## Hêvîyên mazin

Min fem kir, wekî wextê ku min hizkirin diçand, bi wê yekê min ew nava Ruh da diçand û paşê minê rezê wê hizkirinê biçinîya. Min nizanibû, wekî minê li kîderê biçînîya, lê min zanibû wekî dirûtinê hebe. Ez êdî xwe çawa merivê bêaçix hesab nakim, wextê ku kesê ez hizkirinê didimê, ji wî hizkirinê nastînim. Ewê yekê alî min kirîye ku wî merivî diha gelekî hiz bikim.

Eger gelek mesîhî ev yek fem bikirana, wê paşda venekişyana û wê nexeyîdîyana. Bi tomerî hildayî, em ne ku bi hizkirina agapê, lê bi ya xwehizkirinê dijîn, ya ku gelekî hêsa bêguman dike, wextê ku hêvîyên mêriv mîyaser nabin.

Heger hêvîyên min ji merivên kifş hene, ew meriv dikarin min bêguman bikin. Ew yek wê awqasî berdewam bike, hetanî ku hêvîdarîya min nesekine. Feqet, heger hêvîyên min ji tu yekî tune bin, çi jî bona min hebe ewê bona min bibe dua, lê ne paşdadayîna wê yekê. Em nava xweda bona xeyîdê cîh çê dikin, wextê ku em dewa nêzîkbûneke cuda ji wana dikin. Bi çiqasîva hêvîyên me gelek in, bi awqasîva mecala xeyîdê mezin e.

## Sûrên parastinê?

> "Birayê xeyîdî ji bajarê qewîn qewîntir e û hevfemnekirin mînanî sûra ye".
>
> – METELOK 18:19

Diha gelekî dijwar e xwîşk yan jî birayê xeyîdî alt kin, ne ku bajarê qewîn. Li dora bajarên qewîn sûrên qewîn hebûn, kîjan bajar ji dagirkira diparastin. Hemû dergehên bajêr dihatine parastinê. Deynê kê hebûn îzin nedidan ku ew bikevine bajêr, hetanî ku deyînê xwe nedana. Ewên ku bona gulvedan û pêşdaçûyîna bajêr qezîya bûn, ew li derva diman.

Dema ku em têne êşandin, ji bo ku em dilê xwe biparêzin û bona ku em paşê neyêne êşandinê, em sûra ava dikin. Em dergehê dilê xwe bona wan hemûya digrin, kîjan dikarin me biêşînin. Em wan

meriva ji xwe dûr dixin, kîjan bi fikira me bi tiştekî deyîndarê mene. Em dergehê dilê xwe awqasî digrin, hetanî ku ew meriv "deynê xwe nadin". Em jîyana xwe li ber wan meriva vedikin, kîjana em çawa piştgirên xwe hesab dikin.

Gelek cara, hema ew "piştgir" me dêşînin. Dewsa alîkirina wan meriva, em dîsa li ser sûrên ku me çêkirine kevira zêde dikin. Em fem nakin, wekî wî cûreyî sûrên parastinê werguhêzî hebsê (zindanê) dibin. Wî çaxî em ne tenê himberî wan meriva gelekî fesal dibin, lê em bi xwe jî newêrin ji kela xwe derbikevin.

Mesîhîyên xeyîdî, li ser fikirdarîya xwe disekinin. Em fesal dest pê dikin maf û heleqetîyên xwe biparêzin. Bere–bere ênêrcîya me xilas dibe, wextê ku em dicêribînin pêşerojêda xwe ji êşandina xweyî bikin. Eger em ji êşandinê bitirsin, emê nikaribin rast hiz bikin. Ew hizkirin îzinê dide yên mayîn ku ew me biêşînin.

Hizkirin ya xwe nagere, lê belê, merivên ku hatine êşandinê xwe dûr digrin û ya xwe digerin. Nava qewilên vî cûreyî da hizkirina Xwedê sar dibe. Bona vê gotinê du behrên li welatê Pîroz dikarin bibine mînak. Behra Celîlê avê distîne û dide. Li wir jîyan aktîv e, li kîderê masîyên cûre–cûre û şînayî hene. Ava behra Celîlê bi çemê Erdenê diçe dikeve behra Mirî. Behra Mirî avê tenê hiltîne, lê nade. Li vê behrê jîyan tune. Wextê ava behra Celîlê tevî ava behra Mirî dibe, ew dimire. Emir nikare dirêj bikişîne, heger wî hema usa li cîhekî xweyî bikî, ew gerekê bikişe der.

Lema jî mesîhîyê dilmayî ew e, yê ku emir nava xweda qebûl dike, lê rûyê tirsêda nikare emir bide. Nava feydayê wê yekê da, emirê ku ketîye wî berî dîwarê xeyîdê, yan jî hebsê, gol digire. Peymana Nû van dîwara himberî kela dike.

> "Çimkî çekên şerkarîya me nayêne kifşê, lê belê ji bo hilweşandina kela ew hêza Xwedayî ne. Em raman û her tiştê bilind, yên ku li himberî zanîna Xwedê radibin, hildiweşînin û her fikirekê dikine hêsîr, bona ku serî li ber Mesîh daynin".
>
> – 2 KORÎNTÎ 10:4,5

Ev kela qalibên fikirdarîyê çê dikin, nava kîjana ra temamîya înformasya ku dikeve hundur hazir dibe. Nenihêrî wê yekê, wekî kela pêşda bona parastinê hatibûne çêkirinê, lê paşê ew dibine kanîya zêrandinê û tevlîhevbûnê, çimkî ew dijî naskirina Xwedê û ulmê Xwedê şer dikin.

Wextê ku em hemû tiştî ji alîyê xeyîda, înkarkirina, cêribandina da qîmet dikin, bona me bawarîya himberî Xwedê dijwar dibe. Em nikarin bawar bikin, wekî Ew çi ku dibêje hema wê yekê jî hesab hiltîne. Em destpê dikin himberî nêzîkbûna Xwedêye wî cûreyî şikber bin, wextê ku em destpê dikin Wî bi normên ji alîyê merivada qebûlkirî qîmet bikin. Lê Xwedê meriv nîne. Ew nikare derewa bike (Jimar 23:19). Rêyên Wî mînanî rêyên me nînin û fikirên Wî jî ne mînanî fikirên me ne (Îşaya 55:8,9).

Merivên xeyîdî ji bo ku xwe biparêzin dikarin nava nivîsarên Pîroz da gotina bibînin, lê belê, eva para gotina Xudan ya rast nîne. Bêyî hizkirin ulmê Gotina Xwedê qewata hedimandinê ye, çimkî firnaxbûn me kubar dike (1 Korintî 8:1–3). Eva jî dibe menî, bo ku em xwe diha gelekî sofî bikin, lê ne ku bona nebaxşandinê gava biavêjin. Eva rewşa atmosfêreke usa pêşda tîne, kîjanê da em dikarin xapîayî bin, çimkî bêyî hizkirinê ulm mêriv berbi undabûnê dibe.

Pey wê yekê ra, wextê ku Îsa elam kir ku gelekê bixeyîdin, Ewî bona fesalbûna ji pêxemberên derew eşaretî da û got: “Û gelek pêxemberên derew wê derbikevin û gelekê bêne xapandinê” (Metta 24:11). Kîjanin ew “gelek”, yên ku wê ji alîyê pêxemberên derew da bêne xapandinê? Bersiv ev e: yên ku xeyîdîne, hizkirina kîjana sar bûye (Metta 24:12).

## PÊXEMBERÊN DEREW

Îsa pêxemberên derew çawa “gurên bi postê berxa” nav kirin (Metta 7:15). Ev meriv ji derva çawa mesîhî xuya dibin (postê berxa xwe kirine), lê hundur da ew gur in. Gur hiz dikin li dora berxa bigerin. Wana dikarî nava olka civînê û li ser dikê jî bibînî. Ew ji alîyê dijmin da hatine şandinê, bona ku bi cûrê xewle zyanê bidin û bixapînin. Wana dikarin bi fêkîyên wan, lê ne bi hînkirin û

pêxembertîya wan nas bikin. Carna hînkirina wana dikare bê kifşê, lê fêkîyên emir û qulixên wana nayêne kifşê. Tiştê rast ew e, wekî qulixçî yan jî mesîhî çawa dijî, lê ne ku ew çi dibêje.

Gur her dem ne ku pey pezê saxlem yan qewat, lê yên brîndar yan jî biçûk diçe. Ev gur meriva ra tiştên usa gilî dikin, çi ku ew dixwezin guhdar bikin, lê ne wê yekê çi ku ew hewcene. Ew naxwezin tiştên saxlem guhdar bikin, lê dixwezin tiştên usa guhdar bikin çi ku li wana xweş tê. Werin binihêrin ku Pawlos derheqa rojên dawîyêda çi dibêje:

> "Vê yekê bizanibe, wekî nava rojên paşin da wedê dijwar wê bê. Çimkî meriv wê bibin xwehiz, parehiz, pesindar, pozbilind, gura dê û bava da nîbin, nepak, nedilovan, bê-rehm, buxdankir, har, neyarên qenciyê, xayîn, qure û wê ji Xwedê zêdetir kêfê hiz bikin. Wê şikilê jiyana xwedayî nîşan bidin, lê wê hêza wê înkar bikin. Tu xwe ji yên usa dûr bixe. Çimkî wext wê bê ku wê nexwazin guhê xwe bidin ser hînkirina saxlem, lê ewê dewsa vê yekê anegorî xwestinên xwe, xwe ra gelek dersdara bicivînin, yên ku tiştên li guhên wan xweş bên hîn bikin. Îcar ewê guhên xwe ji rastîyê bizivirînin û bikevine pey çîroka".
>
> – 2 TÎMOTÊYO 3:1–5; 4:3,4

Guhdarîyê bide li ser wê yekê, wekî ewê xwe çawa xwedêparêz yan jî "mesîhî" bidine kifşê, lê ewê wê qewatê înkar bikin. Lê ewê çawa wê qewatê înkar bikin? Ew wê yekê înkar dikin, wekî mesîhîtî dikare emir bide guhartinê: merivê ku nabaxşîne werguhêzî merivê usa bike ku ew bibaxşîne. Ew pesinê xwe didin ku ew peyhatîyên Îsa ne û "ji nûva çêbûne", lê bi wê pesindayînêva tevayî îzinê nadin, wekî emirê nû bikeve dilê wan û heyîna Mesîh çê bibe.

## Nisileta ku ha ji pê heye

Pawlos bi cûrê pexembertîyê karibû bibîne, wekî ev mervên xa-pîyayî bi hevsûdî nêzîkî ulmê Xwedê dibin, lê nayêne guhar'tinê, çimkî tu cara wî ulmî nadine xebatê. Pawlos da kifşê, wekî "ew her

dem hîn dibin û tu cara nikarin berbi ulmê rastîyê bên".

Heger Pawlos sax bûya, ewê gelekî xemgîn bûya ku gotinên wî çawa mîyaser dibin. Ewê gelek meriv bidîtana, yên ku tevayî sêmînara derbas dikin, berevbûna teşkîl dikin û bi wê yekê tenê ulmê kitêbên Pîroz berev dikin. Pawlosê bidîta ku çawa ew "tiştên nû" digerin, ku diha xwehiz û gulvedayî bijîn. Ewê bidîta ku çawa mesîhîyên bi Ruh va tijî, bi hesabhildana "menîyên heq", hev diavêjine nava şuxulên mehkemê, çawa rojname û radîyoyên mesîhîya rexne dikin, êrîşê dibine ser merivên Xwedê. Wê bidîta ku çawa "mesîhîyên xarîzmatîk" ji xeyîdê dêr bi dêr digerin. Nenihêrî wê yekê, wekî ew hemû jî Îsa çawa Xudan qebûl dikin, lê nikarin bibaxşînin: Heger Pawlos îro bijîta, ewê bi dengekî bilind bigota: "Tobe bikin û xwe ji xapandinê azad bikin, hey mirovên durû û sûdparêz!"

Ew yek awqasî grîng nîne ku tu tevî gelek dibistanên Xwedêzanîyê û sêmînara bûyî, çiqas kitêb te xwendine, te bi siheta wedê xwe nava duakirin û odên xwendinê da derbas kirîye. Heger tu xeyîdîyî, nabaxşînî û van gunehên xwe tobe nakî û li dijî van disekinî, usa ye tu hela hê negihîştî ulmê rastîyê. Tu nava xapandinê da yî û bi jîyana xweye durû tu merivên mayîn dikî nava şaşîyê. Ew yek nayê hesabhildanê ku heyîna te çî ye, fêkîyên te tiştekî mayîn didine kifşê. Wî cûreyî tê bibî kanîke bi ava tal, ya ku xapandinê tîne, lê ne ku rastîyê.

## Xayîntî

> "Wî çaxî gelek merivê bixeyîdin û xayîntîyê himberî hev bikin û wê hev hiz nekin"
>
> – METTA 24:10

Werin em vê gotinê lêkolîn bikin. Heger em vî cîhî diha bi kûrayî lêkolîn bikin, emê pêşketina bere–bere bibînin. Xeyîd mêriv berbi xayîntîyê dibe, lê xayîntî jî berbi hiznekirinê dibe. Wek berê me anîbû zimên, kesên xeyîdî ji bo parastina xwe sûra ava dikin. Xweparastin dibe meremê me. Em bi her cûreyî xwe diparêzin û bêqezyabûna xwe çareser dikin, yan jî kîsî yekî mayîn berjewandîyên (kara) xwe pêşda di-

kişînin. Hîmlî ew kes ew meriv e, tevî kîjanî em nava heleqetîya da nin.

Bi vî cûreyî, nava padişatîya Xwedê da xayîntî wî çaxî pêşda tê, wextê ku bawarmendek kîsî bawarmendekî mayîn berjewandîyên xwe, yan jî parastina xwe digere. Bi çiqasîva ew heleqetî nêzîk bin, bi awqasîva ew xayîntî dikare keder be. Xayîntîa himberî yekî mayîn halê gelekî xirab e. Wextê ku xayîntî eşkere dibe, heleqetî hetanî wî çaxî nayêne dasekinandinê, hetanî ku tobekirina rast neqewimîye.

Pêşdaçûyîna xayîntîyê berbi hiznekirinê dibe û encamên bi qezîya pêşda tîne. Kitêba Pîroz zelal îzbat dike, wekî kî ku birayê xwe hiz nake ew merivkuj e û emirê tu merivkujî wê nebe yê heta–hetayê (1 Yûhenna 3:15).

Mixabin, roja îroyîn nava bawermenda da em dikarin gelek mînakên xeyîdê, xayîntîyê û hiznekirinê bibînin. Ev yek awqas nava malbet û civînên meda belavbûyî ye, wekî ew çawa tiştekî normal tê qebûlkirinê. Em awqasî texmîn nakin, ku çawa qulixçîk qulixçîkî mayîn dibe mehkemê (dadgehê). Bo me êdî ew yek tiştekî metelmayînê nîne, ku jin û mêrên mesîhî bona ji hev cihêbûnê hev didine mehkemê. Dutîretîyên civînê êdî bûne tiştên hercare. Lîstikên sîyasî êdî sînora nas nakin û bêyî şik çawa fikirên bona berjewandîyên padişatîyê û civînê tên raberkirinê.

"Mesîhî" mafê xwe diparêzin, bona ku mesîhîyekî mayîn xirab nêzîkî wan nebe û wana bona kara xwe nede xebatê.

Gelo me peyvên di Kitêba Pîroz da bîr kirine?

> "Boy çi hûn diha gelekî miqûf dimînin û boy çi hûn diha gelekî nerastîyê dikişînin?"
>
> – KORÎNTÎ 6:7

Gelo me gotinên Îsa bîr kirine?

> "Lê ez ji wera dibêjim: "Dijminên xwe hiz bikin û ji bo yên ku nifira li we dikin, dizêrînin, dua bikin".
>
> – METTA 5:44

Gelo me temîya Xwedê bîr kir?

> "Tu tiştî bi pesindayîna pûç nekin, lê bila bi temenebûnê yek yê mayîn ji şexsê xwe bilindtir bigre".
>
> – FÎLÎPÎ 2:3

Çima em bi van zagonê hizkirinê najîn? Bo çi lez dikevin xayîntîyê himberî hev bikin? Menî ew e, wekî hizkirina me sar bûye, rûyê çida em dicedînin xwe biparêzin. Bi wî cûreyî em nikarin problêmên xwe teslîmî Xwedê bikin, çimkî em dicêribînin pirsên xwe bi xwe bidine helkirinê.

Wextê ku himberî Îsa xirabî kirin, Ewî bi xirabîyê bersiv neda, lê Ewî bi Xwe Xwe teslîmî Xwedê kir, Yê ku bi heqîtî dadê dike. Bona ku em pey gavên Wî herin, şîretekî wa heye:

> "Çimkî nava vê yekêda hûn hatine gazîkirinê, wekî Mesîh jî ji bo we cefa kişand û çawa mesele bo we hişt, da ku hûn dîna xwe bidne rêça Wî. Ewî qet guneh nekirin û peyveke bi hîle ji devê wî derneket. Çaxê ku dihate nimizkirinê, Wî bi nizimkirinê bersiv neda. Çaxê ku êş dikişand Wî li kesî gef nexwarin, lê Wî xwe sparte Wî, yê ku bi heqîtî dîwanê dike".
>
> – 1 PETRÛS 2:21–23

## Mecala serkeftinê

Em gerekê bighîjine dereceke usa, bona ku em gumana xwe dayînine ne ku li ser bedena xwe, lê li ser Xwedê. Gelek tenê bi lêvên xwe qulixî Xwedê dikin û Wî çawa kanîya emir nav dikin, lê bi xwe mînanî sêwîya dijîn. Wana rênîşa emirê xwe hildaye destê xwe, lê bi lêvên xwe jî dibêjin ku Ew Xudan û Xwedayê wan e.

Niha tu dibînî ku gunehê xeyîdê bi çiqasîva qezîya ye. Heger pirsa wî gunehî neyê helkirinê, ewê berbi mirinê bibe, lê wextê tu miqabilî cêribandina xeyîdê derdikevî, wî çaxî Xwedê serkeftineke mezin tîne.

# HEGER ŞEYTAN BİKARİBÛYA KENGÊ BİXWESTA ME BİDA REDKİRİNÊ, NİHA EWÎ ZÛVA EW YEK KİRİBÛ.

**“**Berî xwendina vê kitêbê tevgirêdanên min yên tevî Xwedê tunebûn. Ez xilas bibûm, lê di navbera min û Xwedê da hinek tişt hebûn, kîjan nerast bûn. Min zanibû ku ev kêmasî ji Xwedê nîne, lê min nizanibû ku pirsgirêk çî ye. Rojekê ez li mala hevalê xwe bûm, li kîderê çavê min kitêba Con Bîvêre bi sernavê *“Tela Şeytan”* ket. Min kitêb anî malê û dest bi xwendinê kir. Min kitêb ji destê xwe nikaribû daniya. Wextê xwendina nîvê kitêbê, min nişkêva fem kir, wekî dîwarê di navbera min û Xudan da ruhê xeyîdê bû”.

– K. K., CORCÎA

# 3

# ÇFWA TİŞTEKÎ USA DİKARİBÛ BİHATA SERÊ MİN?

***–"Wextê Ûsiv wan ra got: "... Rast e hûn dijî (miqabilî) min xirab fikirîn, lê Xwedê fikirî ku wê yekê werguhêzî qencîyê bike. Lê belê... Xwedê îro jî usa ye, bona jîyana gelek mileta biparêze, Ewî xirabî wergerand û kire qencî"".***

**– DESTPÊBÛN 50:19,20**

Beşa ewlinda, me hemû merivên xeyîdî pareveyî li ser du beşênên hîmlî kirin: (1) ewên ku bi rastî xirabî lê hatine kirinê û (2) ewên ku difikirin ku xirabî himberî wan hatîye kirinê. Vê beşêda ez dixwazim derheqa wê beşa merivaye ewlinda xeber bidim.

Were em ji vê pirsê destpê bikin:

Heger bi rastî himberî te xirab bûne, îzina te heye ku tu bixeyîdî?

Bona dîtina bersiva vê pirsê, were em jîyana kurê Aqûbî hizkirî, Ûsiv, binihêrin. (Destpêbûn 37–48 binihêrin).

## Xewn dibe tarîstan

Ûsiv kurê Aqûbî 11–a bû. Lê belê, ew ji alîyê birayên xweye mezinda nedihate hekirinnê, çimkî bavê wan hê zêde Ûsiv hiz dikir û potekî dirêj û rengîn pêşkêşî wî kiribû û ji wan cuda kiribû. Xwedê du xewn dane Ûsiv. Xewna ewlinda ewî li zevîyê gurzên simila dîtin. Gurza wî rabû rast sekinî, lê gurzên birayên wî li ber ya wî tewîyan. Xewna mayînda Ûsiv dît ku ro, hîv û yanzdeh steyrk li ber wî xar bûn (kîjan bav, dê û birayên wî nîşan didan). Wextê ku ewî xewnên xwe birayên xwera gilî kir, femdarî ye ku birayên wî şabûna Ûsiv tevî wî nîvî nekirin. Hiznekirina wane himberî Ûsiv hê zêde bû. Piştî wedekî kurt 1O birayên Ûsiv, bona ku keriyê bavê xwe biçêrînin, çûne deştê. Aqûb Ûsiv dişîne ku ew here bibîne ku brayên wî çawanin. Wextê ku birayên mezin ji dûrva dîtin ku Ûsiv tê, qirar dikin miqabilî wî xirabîyê teşkîl bikin û dibêjin: “Awa, ewê ku xewn didîtin tê. Werin em wî bikujin, paşê emê bibînin ku xewnên wî wê çawa bin. Ew dibêje, wekî ew hazir dibe bibe rêberê me. Emê bibînin ku ewê çawa bicêribîne serwêrîyê li me bike, wextê ku ew bimire”. Bi vî awayî, wana Ûsiv avîtine bîrekê ku ew li wir bimire. Birayên Ûsiv kincên wî hildidin, diqelêşin û xwîna heywanekî kincên wî dixin, bona ku li ber bavê xwe bidne kifşê ku heywanekî beyanî ew çawa parçe–parçyî kiriye.

Piştî avîtina Ûsive li bîrê, ew karwanekî dibînin, yên ku diçûne Misirê. Cihûda birayên xwera got: “Heger em birayê xwe bikujin û xwîna wî veşêrin emê çi qazanc bikin? Werin em wî bifiroşine îsmaîlîyan û bi vî awayî para qazanc bikin. Bona Ûsiv ew yek wê ji mirinê baştir be û wê tu cara nerehetîyê nede me, lê para jî emê nîvekarî bikin”. Û birayên wî qebûl kirin, Ûsiv bi bîst parên zîv firotin. Hemû ji Ûsiv xeyîdî bûn, ji bo vê jî Ûsiv dane destê îsmaîlîyan û ew bona koletîyê firotin. Birayên Ûsiv ev xirabkarî usa jî bona wê yekê kirin ku hebûna wî jî wan ra bimîne. Hûn bîr nekin, wekî yên ku ew tişt kirin ji dê û bavekî û ji xwîna hev bûn.

Çanda amêrîkî awqasî pircûre ye, wekî bona me gelekî dijwar e em vê kirinê fem bikin. Bona me tiştê herî xirab tenê kuştin e. Di dema Kitêba Pîroz da bûyîna kura bona bavê pir girîng bû. Çimkî wana navê bavê xwe hildidan û dibûne xweyê hebûna bavê xwe. Û ji bo vê yekê jî birayên Ûsiv ew kuştin, bo ku ew ne navê bavê xwe, ne jî hebûna wî bistîne, nav û heyîna wî ji ortê rakin. Ûsiv ji hemûya miqûf ma, yên ku nêzîkî wî bûn.

Wî çaxî, wextê ku yek bona koletîyê difrotin, ew hetanî dawîya jîyana xwe kole jî dima. Heger bizewicîya jî, jin û zarokên wî jî wê koletî bikirana.

Bi koletî ji dayîk bûyîn dibê tiştekî dijwar bû, lê tiştekî diha dijwar bû, wextê ku meriv çawa peyhatîyê xweyê hebûna mezin dihate dinîyayê û dikaribû ji wî hemû tiştî bêpar bima. Heger Ûsiv tu cara nizanibûya ku çi dikaribû biqewimîya, ew yek wê bona wî diha hêsa bûya. Bi gilîkî ew cinyazê sax bû. Ez bawar im ku ewê bixwesta ku birayên wî ew bikuştana. Feqet, fikir nava wê yekêda ye, wekî kirina birayên Ûsiv diha xirab û xedar bû.

## Femkirina mijareke bêyî kêmasî, bûyîn û qedandina paşî wê

Wextê ku te serhatîya Ûsiv dixwend, tê bêjî tu êdî ha ji dawîya wê hebûyî. Gelek tiştekî balkêş e, wextê ku êdî ha ji dawîya serhatîyê heyî. Lê belê, Ûsiv usa bi vî cûreyî nejîya. Dihate texmînkirinê, wekî ewê êdî bavê xwe nedîta û xewnên ku Xwedê dabûne wî wê mîyaser nebûna. Li welatekî bîyanî (xerîb) ew xulam (dîl) bû û nikaribû ji Misirê derbiketa. Îdî bi jîyana xwe ew xulamê kesekî bû.

Ûsiv firotine merivekî bi navê Potîfar, yê ku li cem Fîrawun fermandarê parêzgeran bû. Kêm–zêde, 10 sala ji wî ra qulix kir. Ewî ji malbeta xwe tu behs nedistandin û zanibû ku bavê wî bawer kiribû ku ew mirî ye. Malbeta wî bêyî wî jîyana xwe berdewam dikir. Qet gumana wî nemabû ku rojekê bavê wî wê wî azad bike.

Dem weke avê diherikî, Ûsiv li ber efendîyê xwe merîfet dît û

wî jî qencî dikir. Potîfar Ûsiv kire berpirsyarê mal, zarok, xulam û hebûna xwe.

Her tiştên Ûsiv baş pêşda diçûn, lê belê, tiştekî nerast li cem jina efendîyê wî pêşda dihat, agirê evînê dişuxulî. Ewê zûva çavv berdabû Ûsiv û dixwest pêra zina bikira. Her roj ewê Ûsiv dicêriband ji bo ku wî bixapîne, lê belê, Ûsiv ew înkar dikir. Rojekê Ûsiv li malê tevî jina axayê xwe tenê bû, û ewê emir kir ku Ûsiv tevî wê pal bide. Ûsiv ew yek înkar kir. Ewê hişk kincê Ûsiv girtibû û wextê ku Ûsiv revî, kincê Ûsiv destê wêda mabû. Wextê ku Ûsiv usa kir, jinikê bi şerm kire qîrîn û got: “Ewî xwest destê xwe biavêje min”. Potîfar Ûsiv avîte girtîgeha Fîrawun.

Girtîgeha Fîrawun mînanî girtîgehên Amêrîka îroyîn nîbû. Min çend girtîgehanda qulix derbas kiriye û bi çiqasîva jî ew berk bin, yek e himberî girtîgehên Fîrawûn ew wek klûbên gunda ne. Li wê hebsê ne ronahiya rojê, ne cîhekî zîha hebû. Ew mînanî bîrê bû, li kîderê ne germahî û ne jî ronahî hebû. Girtî diavîtine li wir ku ew hêdî–hêdî bimirin, çimkî ew li wir bi nan û ava bi tengaviyê dizêrîyan, ancaxkî xwe xweyî dikirin. Li gora Zebûr 10:5:18–a, lingê wî rûyê zincîra da zîyanê ketibû û ew nava hesinada pal dabû. Ji bo ku bimire Ûsiv kiribûne wê zindanê.

Eger Ûsiv misirî bûya, mecala wî ya azadbûnê dikaribû hebûya, lê ew merivekî bîyanî bû û bona çi jî hatibû sûcdarkirin, lema gumaneke biçûk jî bona azadbûna wî tune bû. Ji vê yekê xirabtir tu tişt tunebû. Ûsiv ketibû halekî dijwar, çawa merivekî li ser şêmîka mirinê.

Tu dikarî fikirên Ûsive li nava ewê tarîstana zindanêda bibhêyî? Ev e fikira wî: “Deh sala min efendîyê xwe ra durust û rast xulamtî kir. Ez hindava wî da diha helal bûm, ne ku jina wî. Ez her roj ji heramtîyê revîm û hindava Xwedê û efendîyê da xwe rast bûm. Bona vê yekê xelata min çi bû? Zindana binerd? Bi gilîkî, min dixwest hemû tişt rast bikira, lê tiştê herî xirab qewimî. Xwedê çawa karibû îzina vê yekê bida? Gelo birayên min karibûn sozê ku Xwedê dabû min bidizin? Çima Xwedê bi hêz û bi peymana Xwe bo min nekete navbera vê pirsê? Gelo Xwedê vî cûreyî nêzîkî xulamên Xweye rast

dibe? Çima ez? Min çi kirîye ku layîqî vî hemû tiştî bûm? Min tenê bawarîya xwe li wî hemû tiştî anî çi ku min ji Xwedê bihîstibû".

Ez bawer im ku Ûsiv dijî fikirên vî cûreyî, yan jî yên mînanî wan, şerkarî dikir.

Azaya Ûsiv gelekî sînorkirî bû, lê mafê wî hela hê hebû ku bersiva wî hemû tiştî bide, çi ku qewimîbû. Gelo Ûsivê ji birayên xwe bixeyîdiya, yan jî ewê birayên xwe û paşê jî Xwedê nasnekirina? Gelo ewê gumana mîyaserbûna soz unda bikira û xwe ji gumana jîyanê miqûf bihîşta?

***Gelo Xwedê kontrol nake?***

Bi fikira min ew hemû tişt qet fikira Ûsiv ra jî derbas nedibû, wekî çi ku diqewimî, ew şuxulkarîya Xwedê bû, bi kîjanê Xwedê bona serkarîkirinê ew hazir dikir. Gelo pêşerojê da ewê çawa serkarîya xwe li ser birayên xwe bida xebatê, kîjana xayîntî himberî wî kirin. Ûsiv ji wî hemû tiştî hînî gurêkirinê dibû, ji çi ew dizêrîya. Birayên wî destê Xwedê da çawa hacet bûn. Gelo Ûsivê bona soz rojî bigirta, yan jî wê bona mîyaserkirina wî sozî Xwedê bigerîya? Diqewime wextê ku Ûsiv xewnên xwe dîtin, ewî ew xewn çawa îzbatiya merîfetêye li ser emirê xwe qebûl kirin. Ew hela hê hîn nebibû, wekî serkarîkirin bona qulixkirinê, lê ne ku bona cudabûnê tê dayînê. Gelek cara, wextê ku tiştên vî cûreyî dibin, em dewsa wê yekê ku li ser mezinaya Xwedê bifikirin, em derheqa nebûyîna pirsên xweda difikirn. Lema jî em rûyê vê yekêda bêguman dibin û kesekî gunehkar dikin. Bo wê yekê jî em kesekî digerin, kîjanî em bona bêgumaniya xwe cabdar hesab dikin, lê wextê em rastî wê yekê tên ku Xwedê dikaribû ew tevlîhevbûn bida sekinandinê û nekir, wî çaxî gelek cara em Wî gunehkar dikin.

Ev fikir her dem serê Ûsiv da bû: "Ez anegorî naskirina Xwedê dijyam û miqabilî tabî û heyîna Xwedê tu cara derneketime. Min tenê xewnek diwekiland, kîjan Xwedê bi Xwe dabû min. Û encam jî ev bû? Birayên min xayîntî kirin û ez firotime koletîyê. Bavê min difikire, wekî ez mirîme û wê tu cara bona dîtina min neyê Misirê".

Bona Ûsiv merivên here gunehkar birayên wî bûn. Bi destî wan

bû ku ew paşê kete zindana binerd. Diqewime Ûsiv ketibû nava wan fikira, wekî her tişt dikaribû cûrekî mayîn pêşda biçûya heger serkarîkirina wî hebûya, Xwedê ew danîya li ser tabîya serkarîkirinê, çawa ku ewî xewnên xweda dîtibû. Hemû tişt wê cûrekî mayîn bûya, heger birayên wî pêşeroja wî xirab nekirana.

Çiqas cara em dibhên ku çawa bira û xwîşkên me dikevine evê tela gunehkarkirinê? Em çend mesela bînin ber çava: *"Heger jina min nîbûya, ezê niha qulixêda bûma. Ewê ew karê min xirab kir, bona kîjanî ez nava xiyalada bûm".*

*"Heger dê û bavê min nîbûna, emirê min wê normal bûya. Ew rûyê wanda ye ku ez ketime nava vî halî, ew in gunehkar. Bona çi dê û bavên merivên mayîn normal in, lê yên min... Heger bavê min û dayîka min ji hev cihê nebûna, nava pirsa zewacêda ezê diha azad bûma".*

*"Heger serwêrê civîna min bona rewa hundurê minda astengî çênekira, ezê azad bûma û wê dijwarî li pêşîya min tunebûna. Ewî ez ji mîyaserkirina qulixê dûrxistim. Ewî merivên civînê rakirine miqabilî min".*

*"Heger mêrê minî berê nîbûya, wî çaxî problêmên zarokên min û yên mine fînansîyê wê tune bûna".*

*"Heger ew jina nîbûya, merîfeta min wê niha li ber mezina hebûya. Ewê jinê bi buxdanên xwe ez pûç kirim û gumana mine himberî wê yekê, ku qedirê min wê bihata girtnê, unda bû".*

Xilasbûna lîsta mînaka tune. Gelekî hêsa ye ku bona pirsgirêkên xwe merivên mayîn gunehkar bikî û texmîn bikî, ku heger ew dora te nîbûna tê diha azad bûyayî. Tu difikirî, wekî bi gunehê wan tu ketî wî halî û xeyîdîyî.

Ez dixwezim vê yekê bidime dîyarkirinê: "Tu mêrek, tu jinek, tu zarokek yan jî şeytan nikarin te ji daxwaza Xwedê derbixin. Yazîya te tenê destê Xwedê da ye". Birayên Ûsiv cêribandin tiştê ku Xwedê dabû wî ji holê rakin. Ew difikirîn ku wana ew yek kir. Hema ji birayên wî yekî bi devê xwe got: "Em wî bikujin û biavêjin bîrekî... em binihêrin xiyalên wî wê çawa bibin" (Destpêbûn 37:20).

Qewimandina ku rastî Ûsiv hat, badîhewa nîbû. Ew yek pêşda hatibû amedekirinê. Birayên wî nedixwestin mecala Ûsiv hebe ku ew bigihîje açixîya. Diqewime tu difikirî ku wextê ew firotin, Xwedê li ezmana Kur û Ruhê Pîroz nihêrî û got: “Niha emê çawa bikin? Binihêrin ku birayên wî çi wî kirin. Planê Me yên ji bo Ûsiv tune kirin. Diha baş e ku Em lez tiştekî bifikirin. Planeke meye din heye?”. Eva rast nîne, lê em hela hê bersiva wê yekê didin û hesab dikin ku fikira Xwedê ev e.

Em binihêrin heger Ûsiv îro li civînên me bûya wê çawa li dijî rewşa xirab bisekiniya. Heger ew mînanî me geleka bûya, zanî ewê çi bikira? Ewê heyfhildan teşkîl bikira. Ewê bi van xebera li ber dilê xweda bihata: “Heger bikevine destê min, ezê wana bikujim. Ji bo tiştên li min kirine ezê wana bikujim. Ew gerekê berdêlê van bidin”.

Lê heger bi rastî Ûsiv li ser tabîa vî cûreyî bûya, Xwedê wê ji bo pûçbûnê di zindanêda ew biterikanda. Heger ew bi vê menîyê ji zindanê derketa, ewê ji 12 serokeşîrên Îsrayêlê 1O bikuştana. Ev jî ew eşîr bûn, nava kîjanada bû eşîra ku Îsa tê da bû.

Erê, merivên ku hindava Ûsiv da usa xirab bûn serwerê eşîrên Îsrayêlê bûn, lê Xwedê soz dabû Birahîm ku wê ji wana netewekê derxe holê. Di dawîyê da Îsa wê nava wan ra bihata. Ûsiv ji xeyîdê azad ma û jîyana wî û birayên wî da plana Xwedê îzbat bû.

## Dikaribû tiştê hê xirab biqewimiya?

Girtîgeh bona Ûsiv dema derbasbûna hilbijartinê bû, lê belê, demeke mecalê bû jî. Tevî Ûsiv du girtîyên din jî hebûn û herdua jî xewnê zindî û nerehet dîtin. Ûsiv xewnê herdua jî rast şirove kir. Yek wê vegerîya li ser qulixa xweye berê, lê yê din wê bihata daliqandinê (dardakirinê). Ûsiv, yê ku wê biçûya li ser qulixa xwe, wî ra got ku wextê ew here li ser qulixa xwe û layîqî qîmetkirina Fîrawûn bibe bila wî bîr bîne. Û ew vegerîya sera Fîrawûn li ser qulixa xwe, lê belê, du sala ji wî tu tişt jî nebîhîst. Ew yek bona Ûsiv dîsa menî bû ku xiyalên wî undabûna û pêra jî menîya xeyîdê bû.

***Her dem planeke Xwedê heye.***

Rojekê Fîrawûn xewneke bi xof dît. Ne serbazên wî, ne jî xozanên wî, nikarbûn şirove bikirana. Di wê demê da Ûsiv hate bîra wî xulamî. Û ewî Fîrawûnra got ku yekî xewnên te şirove bikê heye. Ûsiv anîne cem Fîrawûn û ewî xewn şirove kir. Li gorî xewnê, xelayî nêzîk dibû. Ewî şirove kir û paşê Fîrawûn ra got ku ji bo vê xelayê çawa bikin bo ku xwe hazir bikin. Û Fîrawûn dem unda nekir û serkarîkirin da destê Ûsiv, ew kire pey xwe ra merivê dudayî li Misirê. Ûsiv bi xozanîya ku Xwedê dabû wî, xwe amede kir ji bo xelaya ku dihat. Pey wê yekê ra, wextê ku xelayî hate ser netewan, birayên Ûsiv ji bo xwestina alîkarîyê hatine Misriê. Heger di dilê Ûsiv da nêteke xirab hebûya, wî çaxî ewî dikaribû meremê dilê xwe bikira. Ewî dikaribû ew hemû biavîtana zindanê, dikaribû ew bikuştana, yan jî heta dawîya emirê wan ew zindanê da bizêranda. Û tu kesî jî nikaribû ew sûcdar derxista, çimkî ew li Misirê pey Fîrawûnra ew dihat. Kemala birayên wî bona Fîrawûn tu tişt nîbû. Lê Ûsiv genim belaş da wan. Paşê jî ji bo malbatên wan erdê herî qenc hate dayînê û wana jî ji adanê erdê xwarin. Ûsiv hemû tişt gîhande dawîyê, bona wan dua kir, yên ku nifir li wî kiribûn û qencî bo wan kir, kîjana ew hiznekiribûn (Metta 5:44 a binihêrin).

Xwedê pêşda ha ji nêta birayên Ûsiv hebû. Heger em rastîyê binihêrin, pêşiya bûyîna wana jî Xwedê zanibû ku birayên Ûsiv wê usa bikin.

Em gavekê pêşda herin, bibînin Ûsiv çi got, wextê ku piştî çend sala ew rastî birayên xwe hat: “Û niha bona wê yekê ku we ez firotime li vir, ber xwe nekevin, xwe sûcdar nekin, çimkî bona ku jîyanê bona we biparêze, Xwedê ez şandim. Çimkî li ser topa dinîyayê eva sala duda ye û hela hê pênc sal jî hene, ku wê çandin tunebe. Bo wê yekê jî Xwedê ez şandim, wekî li ser dinîyayê bona we nisiletê xweyke û we bi azadiya mezin bide jîyandinê.

Û Ewî, lê ne we, ez şandime li vir ku ez li Misirê ji alîyê Fîrawûnda çawa rêberê welatê Misirê bême kivşkirinê (Destpêbûn 45:5–8).

Em binhêrin, ku Zebûr çi dibêje: “Û Ewî (Xwedê) xelayî anî li

ser dinîyayê, hemû xwarinên wan tune kirin: Ûsiv nava qulixêda hate firotanê” (Zebûr 105:16, 17).

Kî Ûsiv şand? Birayên wî, yan Xwedê? Ji van her du şedetîya em dibînin, wekî Xwedê ew şandiye. Ûsiv zelal gote birayên xwe: “We ez neşandime Misirê”. Bi guhdarî guhdar bike, ku Ruh çi dibêje...

Çawa ku me êdî îzbat kir, tu merivek, yan jî cin nikare nava emirê te da dewsa bernama Xwedê bigre. Heger tu li ser vê rastîyê qewîn îzbat bibî, ewê te xilaz bike, lê tenê yek heye ku dikare te ji xwestina Xwedê der bihêle, ew jî tu yî.

Were em dîna xwe bidine zarokên Cuhîya. Xwedê azadarek, Mûsa şand ku Misirê ji koletîyê xilazke û rêberîyê berbi welatê ku soz dabû bike. Piştî derbazkirina saleke nava qûmistanêda, rêber bona cesûsîyê şandine li welatê sozdayî. Cesûs bi nerazîbûn paşda vegerîyan. Ew ji netewên (miletên) li ser dinîyayê tirsya bûn, yên ku gelek û sîlihkirî bûn.

Xêncî Yeşû û Kalep, hemû kes wan rêberara qayîl bûn. Wan meriva texmîn dikir, wekî Xwedê wana ji Misirê bona mirinê derdixe. Ew ji Mûsa û Xwedê xeyîdî bûn. Ev hal ji salekê zêdetir kişand. Nisileta ku xeyîdî bû, tu cara welatê ji alîyê Xwedê da sozdayî nedît, kîjan gerekê welatê wan bûya. Gelek meriv bi kel û ced Xudan ra qulix kirine, lê ketine nava halê dijwar, çimkî merivên nebaş, yan jî mesîhîyên wî cûreyî xirab nêzîkî wan bûne. Rastî ew e, wekî ew bi nerastî nêzîkî wan bûne, feqet, bi xeyîda xwe ew meremê dijmin mîyaser dikin, lê ew merem jî ew e ku ji xwestina Xwedê bêne derxistinê. Heger tu ji xeyîdê azad bimînî, wî çaxî tu nava xwestina Xwedê da dimînî. Heger tu bixeyîdî, ew yek dide kifşê, wekî dijminê te çawa dîl (hêsîr) hilde bo ku meremê xwe bide mîyaserkirinê. Usa ye tu bi xwe gerekê bijartina xwe bikî. Tê bêyî li ser wê fikirê, wekî diha kardar e ku tu ji xeyîdê azad bimînî. Em gerekê bîr bînin, wekî tu tişt bêyî Xudan nikare biqewime. Heger cin (şeytan) bikaribûya bi xwestina xwe em ji ortê bidana hildanê, wî çaxî ewê zûva ew yek bikira, çimkî ew merivên ku bi qewatê dijîn, ew wana hiz nake. Bila ev Gotina Xwedê her dem li ber çavê te be:

> “Xêncî cêribandina merivatîyê, hûn rastî cêrbandineke başqe nehatine, lê Xwedê li ser wê yekê ye, wekî wê nehêle ku ji karebûnên xwe jortir hûn bêne cêribandinê, lê Ewê tevî cêribandinê jî dergeh we ra çê bike, ku hûn bikarbin sebir bikin”.
>
> – KORİNTÎ 10:13

Guhdarîyê bide li ser wê yekê, wekî Gotin dibêje “dergeh jî”, lê ne “dergehekî”. Xwedê êdî hemû tiştên xirab dîtine, kîjan gerekê rastî me bên û ew yek girîng nîne ku wê tiştekî mezin be, yan jî biçûk. Bona xilasbûna ji wê yekê êdî rêya Xwedê ya plankirî heye. Heger em ji xeyîdê azad bimînin, wî çaxî tiştê ku em jê ditirsin, kîjan carna bona me tê texmînkirinê ku bernama Xwedê tê teribandinê, dawîyê usa dertê, wekî ew yek dibe mecala mîyaserkirina wê progiramê.

Bîr bîne, wekî wextê ku tu naxeyîdî, wî çaxî tu gura Xwedê da yî. Miqabilî (dijî) cin derkeve û ewê ji te bireve (Aqûb 4:7). Wextê ku em naxeyîdin, wî çaxî em miqabilî cin derdikevin. Diqewime xewin bi rastî mîyaser bibe, lê ne usa, çawa ku hûn difikirin, lê çawa jî hebe, Gotina Xudan û sozên Wî tu cara wê neyêne teribandinê. Bi gurênekirinê em tenê berbi rîska teribandina wê yekê diçin.

## Cûrê xayîntiyêyî başqe

Her kes nîne ku mînanî Ûsiv hate zêrandinê, çawa ku ew ji alîyê birayên xwe da hate zêrandinê. Ew yek awqas xedar wê nîbûya, heger dijminên wî himberî wî wî cûreyî bikirana. Feqet, xirabkar biryaên wî bûn, ji goşt û xwîna wî. Birayên wî ew meriv bûn, kîjana gerekê piştgirîya wî bikirana, ew biparastana. Gelo diqewime, wekî ssênareke diha xirab pêşda bihata, lê ne ku ew hal, nava kîjanî da Ûsiv sebir kir.

## ÎNKARBÛN Û XİRABKARÎYA Jİ ALİYÊ BİRA, YAN JÎ XWÎŞKÊ DA TİŞTK E, LÊ LAP TİŞTEKÎ BAŞQE YE, WEXTÊ KU TU WÊ YEKÊ Jİ ALÎYÊ BAVÊ DA DİBÎNÎNÎ.

“Ez mamosteyê (dersdar) dersxanên navîn û bilind im. Van axirîya, min kitêba “Tela Şeytan” xwend. Tevî şagirtên xwe, me vîdêyo temaşe kir û li dersxana me hazirîya Ruhê Pîroz usa qewat bû, wekî her şagirtek destpê kir derheqa xeyîdên xweda xwe mikur bê û baxşandinê bixweze. Çend şagirta şedetî dida, wekî nava temamîya salê da ew roj bona wan roja here baş e. Şagirtek bavê xwe ra li hev hat, yê ku ji bavê xwe xeyîdî bû. Li cem yekî mayîn şuxulkarîya qencbûna xeyîda ji alîyê pîrikê da destpê bû. Xudan bi rastî bi cûrê qewat qulixî van zaroka dikir. Ez razîbûnê elamî We dikim bona vî şîretî”.

– R. F., ÎNDÎANA

# 4

# BAVÊ MIN, BAVÊ MIN!

***“Bavê min... fem bike û binihêre, wekî destê min da bêqanûnî tune û min miqabilî te tu xirabkarî nekiriye, lê tu dixwezî şexsê min bikujî”.***

**– 1 PADİŞATÎ 24:12**

Para (beşa) pêşinda me dît, ku çawa birayên Ûsiv dicêribandin wî tune bikirana. Me dît ku ewî êşeke çawa ji vê xayîntîyê dît. Diqewime tu jî nava halekî wî cûreyî da yî, diqewime himberî te jî merivên here nêzîk xayîntî kirine, ew meriv, ji kîjana tu hîvîya hizkirinê û piştgirîyê bûyî.

Vê beşê da ez dixwezim derheqa halekîda xeber bidim, kîjan diha gelekî dijwar e, ne ku xayîntîya ji alîyê bira da. Înkarbûn û xirabkarîya ji alîyê bira, yan jî xwîşkêda tiştek e, lê lap tiştekî başqe

ye, wextê ku wê yekê ji alîyê bavê da dibînî. Wextê ku ez derheqa bava da xeber didim, ez konkrêt derheqa bavê bîologî da nabêjim, gilî derheqa her mezinekîda ne, yê ku Xwedê danîye li ser me. Ewana ew meriv in, bona kîjana em difikirin, ew gerekê me hiz bikin, hîn kin û piştgirîyê bidine me.

## Heleqetîya hizkirinê û hiznekirinê

Bona lênihêrandina mînakaa bavê ku xayîntîyê dike, were em dîna xwe bidine heleqetîyên di navbera Şaûlê padişa û Dawid da (binhêrin 1 Padişatî: beşên 16–31). Emirên wana pêşîya rasthatina wan hev ketin, wî çaxî, wextê ku pêxemberê Xwedê Samûêl Dawid çawa padişê Îsrayêlê danî. Dawid gerekê şa bûya û bifikirîya, wekî eva hema xût ew meriv bû, yê ku Şaûl qebûl kir: usa ye gerekê ew bi rastî bibe padişa.

Bi paşdahatina li serayê, Şaûl ji alîyê ruhekî nebaş da dihate zêrandinê, çimkî ewî gura Xwedê nekiribû. Şaûl wî çaxî tenê edil dibû, wextê ku yekî saz dixist. Xulamên wî destpê kirin cahilekî bibînin, yê ku wê bikaribûya li rex wî rûnişta û qulixî wî bikira. Xulamekî padişê pêşnîyar kir, ku gazî Dawid– kurê Îşaya bikin. Şaûlê padişa meriv şandine peyî Dawid û tewaqe kir, ku ew bê sera wî û qulixî wî bike.

Diqewime Dawid vî cûreyî difikirî: *“Xwedê êdî hazir dibe bi destî pêxember sozê Xwe mîyaser bike. Ezê bêşik layîqî begemîya padişê bibim. Bi wî cûreyî jî ezê bikevime nava tabîya xwe”.*

Wede derbas bû û bavê Dawid tewaqe kir ku ew xwerinê bibe birayên xwe yên mezin ra, yên ku tevî felestînîya nava şêr da bûn. Bi gihîştina xeta şêr, Dawid mêrxasê felestînî Golîat dît, yê ku qerfê xwe li eskerê Xwedê dikir û pê hesîya, wekî ew yek êdî 4O roja berdewam dike. Dawid ra eyan bû, wekî padişa dixweze qîza xwe bide wî merivî, yê ku wê Golîat alt bike. Dawid çû cem padişa û bona şerkirinê îzin xwest. Ewî Golîat kuşt û keça Şaûl stend. Peyî wê yekê ra ew layîqî qebûlkirina Şaûl bû û ew anîne serayê, bo ku ew tevî padişê bijî. Kurê Şaûlî mezin, Yonatan, tevî Dawid peyman danî, ku heta–hetayê bi hev

ra hevaltîyê bikin. Şaûl çi teslîmî Dawid dikir Dawid diqedand û ew yek wî ra li hev dihat, çimkî destê Xwedê li ser wî bû. Padişê pêşniyar kir ku Dawid tevî kurên wî dora sivirê rûnî.

Dilê Dawid lêdixist, ew li serayê dima, ji sivira wî xwerin dixwar, keça padişê stendibû, hevaltî Yonatan ra dikir û heleqetîyên wî yên tevî hevalên wî jî yên açix bûn. Ew layîqî begemîya temamîya cimetê bibû. Ewî dikaribû bidîta ku çawa li ber çavê wî pêxemberî destpê dibe mîyaser bibe.

Li ber xulamên mayîn Şaûl hizkirina xweye himberî Dawid dida kifşê. Ew bona Dawid bibû bav. Dawid guman bû, wekî Şaûlê rêberîyê li wî bike û wî hîn bike û wê rojekê jî bi qedir wî dayîne li ser text. Dawid bona hizkirina Xwedê şa dibû. Feqet, rojekê ew hemû tişt hate guhartinê.

Wextê ku Şaûl û Dawid tevayî ji şêr vegerîyan, ji hemû bajarên Îsrayêlê jin bi ryeqasa xwe çûne pêşîya wan. Wana digot: “Şaûl bi hezara kuştine, lê Dawid bi deh hezara”. Ev yek hêrsa Şaûl rakir û ji wê rojêda destpêkirî ewî Dawid hiznekir. Du cara, wextê ku Dawid bona Şaûl saz dixist, ewî cêriband Dawid bikuje.

Kitêba Pîroz dibêje, wekî Şaûl Dawid hiznedikir, çimkî ewî zanibû, wekî Xwedê Dawid ra bû, lê ne ku wî ra. Bona xilaskirina emirê xwe Dawid mecbûr bû ji wir bireve. Cîhê çûyîna wî tune bû, lema jî ew revî qûmistanê.

“Çi diqewime?, – Dawid digot, – sozê dayî mîyaser dibû, lê niha jî ew hûrxweşî bû. Ew merivê ku rêberê min e, niha dicêribîne min bikuje. Ez çi dikarim bikim? Şaûl xulamê Xwedêyî qebûlkirî ye. Ew miqabilî min derketîye, ez çi bikim?. Ew e padişa, ew e merivê Xwedê, yê ku li ser milet e. Gelo Xwedê bona çi îzina vê yekê dide?”.

Şaûl tevî sê hezar leşkerên Îsrayêlêye bijare peyî Dawid ketibû, nava qûmistan û şikevtada wî digerîyan. Meremê wanî tek– tenê kuştina Dawid bû.

Nava vî wedeyî da soz mînanî sîhekê bû. Dawid êdî serayêda nedima, ne jî ji sivira padişê xwerin dixwer. Ew li şikevtada dima û bermayên terewilên qûmistanê dixwer. Ew meriv peyî Dawid ket-

ibûn, kîjan wextê şêr tevî wî bûn. Êdî cî– nivînên germ tune bûn, xulamên ku ber wî diçûn– dihatin tune bûn. Dergîstîya wî jî dabûne yekî mayîn. Dawid tenêbûna merivê xerîb kişand.

Guhdar be, wekî Xwedê, lê ne ku cin, Dawid danîbû bin destê Şaûl, gelo bona çi Xwedê ne tenê îzina vî hemû tiştî daye, lê pêra jî daye progiramkirinê? Bona çi li ber çavê Dawid merîfeta ku teze dihate kifşê, nişkêva hate hildanê. Ev hemû tişt bona Dawid menî pêşda dianî, ku ew ne tenê ji Şaûl, lê usa jî ji Xwedê bixeyîde. Ev hemû pirs nava Dawid da şikberîya himberî zanebûna Xwedê û bernama Wî pêşda anîn.

Şaûl li ser gilîyê xwe sekinîbû ku evî cahil çawa jî hebe bikuje û pêra jî dînanîya wî çiqas diçû zêde kûr dibû. Ew bibû merivekî gumanbir. Kahînên bajarê Nobê cîh, xurek û şûrê Golîat dane Dawid. Wana nizanibû ku ew ji Şaûl revîye û ew difikirîn, wekî ew ji alîyê padişêda hatibû şandinê. Haya wan ji Xwedê bona Dawid hebû û bona wê yekê jî wana çawa lazim bû Dawid verê kirin.

Wextê ku Şaûl derheqa vê yekê da pê hesîya, hêrsa wî diha zêde rabû. Ewî 85 kahînên Xudan, jin, zarok, mêr, heywanên wî bajarî kuştin. Ewî ew yek usa mîyaser kir, çawa ku ewê himberî amrlîkya bikira. Ew merivkuj bû. Xwedê çawa dikaribû Ruhê Xwe danîya nava merivekî wî cûreyî?

Em qewimandineke mayîn bîr bînin:wextê ku Şaûl pê hesîya, wekî Dawid li qûmistana Eyn–Gedyê ye, sê hezar leşkerên xweva da peyî wî. Li ser rêya xwe ew li ber derê şikevtekî sekinîn ku hêsa bibin. Wana nizanibû, wekî Dawid li wêderê xwe veşartiye. Şaûl potê xwe êxist û pal da. Dawid rihet ji cîhê xwe derket, ji potê wî parçek jê kir û dizîva dûrket.

Wextê ku Şaûl ji şikevtê derket, Dawid li ber wî temene bû û peyî wî kire gazî: “Awa binhêre, bavê min, binhêre, wekî perçê potê te destê min da ye... Fem bike û binihêre, wekî destê min da xirabkarî tune û min miqabilî te tiştê xirab nekiriye, lê tu dixwezî min bikujî” (1 Padişatî: 24:12).

Gotinên Dawid ev bûn: “Bavê min, bavê min”. Bi gilîkî mayîn,

Dawid dikire gazî û digot: “Dilê min binihêre. Bibe bavê min. Ez hewcê rêber im, yê ku gerekê min hîn bike, lê ne ku bikuje”. Hema wî çaxî jî, wextê ku Şaûl dicêriband Dawid bikuje, dilê Dawid da dîsa guman hebû.

## Bav li kîderêne?

Ev gazîya bedena Mesîh da, min li cem gelek meriva dîtiye. Ji wana gelek nava emirê xweda cahilên usanin, li cem kîjana gazîya Xwedêye qewat heye. Ew bona bav dikine gazî, bona merivekî usa, yê ku wê wana hîn bike, hiz bike û piştgirîya wan bike. Awa bona vê yekê jî Xwedê dibêje, wekî Ew “gerekê dilê bava (mezina, rêbera) vegerîne berbi lawa (cimet) û dilê lawa (ewled) berbi bavên wan, wekî diqewime Ez bêm û bi nifirê dinîyayê xim” (Maleyakî 4:6).

Miletê me (amêrîkî) salên 194O–195O–î bavên xwe unda kirin (rêber, qulixçî... ). Û roja îroyîn halê me çiqas diçe xirab dibe. Himberî Şaûl, gelek rêberên malbetên me, hevaltîya û civîna diha gelekî bona meremên xwe xemgîn in, ne ku bona nisiletên xwe.

Rûyê tabîya vî cûreyî da ev rêber miletê Xwedê çawa ji bo xebitandina mecalên xwe dinhêrin. Ew nabînin, wekî ew dîtinok tenê mecal e, bona ku cimetê bona xwe bidine qulixkirinê. Bona açixîya dîtinok çawa emirên merivaye undabûyî nayêne hesabhildanê. Bona açixîya xwe ew dora rastîyê, heqîtîyê û hizkirinê ra derbas dibin. Qirarên wan li ser reqema pera û encamên wan hatine hîmdanînê.

Eva yeka dergeh bona nêzîkbûna usa vedike, çawa ku Dawid stend. Piştî vî hemûşkî Şaûl dîsa padişatîya xwe xweyî dikir. Nêzîkbûna vî cûreyî nava fikirdarîya mezinada tê qebûlkirinê, çimkî ew digerin ku bibine xweyê Mizgînîya açix.

Çiqas mezina rûyê şikberîyêda merivên bin cabdarîya xweda dûr xistine. Gelo bona çi ev mezin şikber in? Bersiva wê yekê tenê ev e, ew qulixî Xwedê nakin, lê qulixî dîtinokê dikin. Mînanî Şaûl ew nava qulixa xweda li ser xwe guman nînin û ew yek jî çavnebarîyê û kubarîyê pêşda tîne. Ew mezin nava merivada wan tişta qebûl dikin,

kîjan bi fikira wan yên Xwedê ne û wan meriva awqas wext didine xebatê, çiqas wext ew karê ji wana distînin. Şaûl ji açixîya Dawid razî bû, lê hetanî wî çaxî, wextê ku ewî dît ku Dawid bona wî qeziya ye. Paşê Şaûl Dawid nimiz kir û bona kuştina wî menî digerîya.

Min tevî gelek cahila qise kiriye, yên ku dewê dikin, wekî gerekê merivek bona wan cabdar be. Ew dixwezin ku li ser serê wan mezin hebe û ew peyî wî herin. Ew xwe tenê texmîn dikin û bo wê yekê jî merivê usa digerin, kîjan wê bona wan bibe bav. Feqet Xwedê îzin daye, ku ew nava înkarbûnê ra derbas bibin, çimkî Xwedê dixweze ku nava wanda ew tişt çê bibe, çi ku ewî nava Dawid da kiribû. Guhdar bike, ku Ruh çi dibêje.

Şaûl bawar dikir, wekî Dawid miqabilî wî bû û xirabkar bû, lê Dawid jî bona wê yekê xemgîn bû. Dawid dilê xwe vedikola û digot: “Ez li kîderê şaş bûme? Çawa bû, wekî dilê Şaûl awqas lez zivirî miqabilî min?”. Ev bû menî, ku ewî digot: “Kesekî min ra digot, ku ezê te bikujim, lê min ew yek nekir. Min tenê pêşa potê te jê kir, bona ku te bizanibûya û bidîta ku destê minda ne xirabî, ne jî miqabilderketin heye” (binhêre 1 Padişatî 24:12). Dawid difikirî, wekî heger ewî bikaribûya hizkirina xweye himberî Şaûl bida kifşê, wî çaxî li cem Şaûl keremê bihata dîtinê û pêxemberî wê mîyaser bûya.

Merivên ku ji alîyê bav, yan jî mezina da hatine înkarkirinê, destpê dikin nava hemû tiştîda xwe gunehkar bikin. Ew dikevine nava mitalên giran: *“Min çi kir?*”, yan jî *“Diqewime dilê min ne temiz e?”*. Ew carna jî difikirin, wekî hineka nêzîkbûna mezinaye himberî wan guhartîye. Paşê hertim dicêribînin heqîtîya xweye himberî mezina bidine kifşê. Ew difikirin, wekî heger bikaribin wê yekê bidine kifşê, ewê bêne qebûlkirinê. Telebext ra, bi çiqasîva ew dicêribînin wê yekê bikin, bi awqasîva jî ew tên înkarkirinê.

## Kî wê bona min heyfê hilde?

Şaûl rehmbûna Dawid nas kir, wextê ku ewî dît, wekî Dawid dikaribû ew bikuşta, lê nekuşt. Şaûl û merivên wî dûrketin. Dawid gerekê wa bifikirîya: *“Ezê niha li ber padişê merîfetê bibînim. Niha*

*pêxemberî wê mîyaser bibe. Ewî bi rastî dilê min dît û wê niha baş nêzîkî li min bibe”.*

Piştî wedekî kurt, meriva Şaûl ra got, wekî Dawid li gelîyê Hakîla xwe vedişêre. aûl dîsa bi sê h’ezar leşkerava da peyî Dawid. Ez zanim, wekî ewê yekê Dawid zendegirtî hişt. Ewî fem kir, wekî tiştê qewimî şaşî nîbû, lê bi rastî Şaûl bêyî provokasîya, bi zanebûn wî digere. Gelo bi çiqasîva Dawid xwe înkarbûyî gerekê texmîn bikira. Şaûl haj dilê Dawid hebû û hela hê dîsa derdiket dijî (miqabilî) wî.

Tevî Awîşa, Dawid kete artêşgeha Şaûl. Tu leşkerekî ew nedît, çimkî Xwedê ew kiribûne xeweke kûr. Herdu, dizîva, nava artêşgehê ra geriyan û gihîştine li wir, li kîderê Şaûl razayî bû.

Abîşay Dawid ra xeberda: “Xwedê îro dijminê te da destê te û niha îzinê bide ku ez wî bikujim” (1 Padişatî 26:8).

Gelek sedemên (menîîyên) Abîşay hebûn, ku Dawid destûr (îzinê) bida wî û ewî Şaûl bikuşta. Ya ewlin ew bû, wekî Şaûl 85 kahînên bêsûc kuştibûn û endamên malbetên wan nava xwînêda hiştibûn.

Ya duda ew bû, wekî Şaûl bi eskerê sêhezarêva derketibû ku Dawid û merivên wî bikuje. Abîşay vî cûreyî difikirî: “Heger tu pêşda dijminê xwe nekujî, wî çaxî ewê ese te bikuje”. Eva xweparastin e. Anegorî qanûnên mehkemê îzina wê yekê hebû.

Menîya sisîya ew bû, wekî Xwedê bi destî Samûêl, peyî Şaûl ra, Dawid çawa padişê Îsrayêlê danîbû. Dawid gerekê li ser mîrata xwe bisekinîya, heger ew nedixwest bimira û heger pêxemberî jî mîyaser nebûya.

Ya çara ew bû, wekî Xwedê temamîya esker kiribû nava xewa kûr, ku Dawid û Abîşay herine cem Şaûl. Gelo Xwedê ew yek bona çi kiribû?. Abîşay difikirî, wekî mecala Dawide vî cûreyîye mayîn êdî wê tune bûya.

Ev hemû menî gelekî baş dihatine guhdarkirinê. Tê bêjî Dawid piştgirî ji alîyê birayekî xweyî mayînda distend. Dêmek, eger Dawid hinekî jî xeyîdî bûya, wî çaxî ewê xwe afûkirî texmîn bikira û wê îzin bida Abîşay ku ewî Şaûl bikuşta.

Niha guh bidine xeberên Dawid: "Wî nekuje, çimkî ewê ku ji alîyê Xudanda hatîye qebûlkirinê, tu dest nikare dirêjî wî bibe û serketî be...

Xudan sax e, wekî Xudan wî bixe, wî çaxî yan wê roja wî bê û bimire, yan jî wê bikeve nava şêr û bimire" (1 Padişatî 26:9–11).

Dawid Saûl nekuşt, nenihêrî wê yekê, wekî ewî gelek merivên bêsûc kuştibûn û dixwest Dawid jî bikuje. Dawid bi xwe heyf hilneda, lê heyfhildan teslîmî destên Xwedê kir.

Bêguman, wê diha hêsa bûya, ku hema li vir ev hemû tişt bigîhanda dawîyê. Ew yek him wê bona Dawid û him jî bona cimeta Îsrayêlê hêsa bûya. Dawid zanibû, wekî miletê wî mînanî kerîyê bêşivan e. Ewî zanibû, wekî gurek bona xwestinên xweye xwehizîyê, ew zeft dikirin. Bona Dawid çetin bû, ku xwe neparêze, lê tê bêjî ew yek jî diha çetin bû, ku cimeta xwe ji padişê harbûyî xilas neke. Bi qebûlkirina qirara heyfhilnedanê, ewî zanibû, wekî meremê Şaûl tenê kuştina wî bû.

Dawid paqijaya dilê xwe wî çaxî da kifşê, wextê ku ewî Şaûl nekuşt. Wextê ku mecala duda hebû Şaûl bikuşta, ewî dîsa dest nedayê. Şaûl ji alîyê Xudan da qebûlkirî bû û bona mehkemê ewî Şaûl teslîmî destên Xwedê kir.

Gelo roja îroyîn merivên usa hene, dilê kîjana mînanî dilê Dawid be? Roja îroyîn êdî bi şûra hev nakujin, lê yek yekî mayîn bi şûrê cûrekî mayîn dikuje û ew cûre jî bi ziman e: "Mirin û emir destê zimanda nin" (Metelok 18:21).

Ji êrîşa bi xeyîdê û gumanbirîyê destpêkirî civîn parçe– parçeyî dibin, malbet cihê dibin û hizkirin dimire. Wextê ku em ji hevala, ji malbetê û mezina dixeyîdin, em bi gotinên tal û hêrsva tijî dibin. Diqewime înformasîayên me yên rast bin, lê menî diqewime yên paqij nîbin.

Di metelokên Silêman 6:16–19–da tê gotinê, wekî belavkirina hevraqayîlnebûnê û cihêbûnêye nava bira da li ber Xudan tiştekî xirab e. Heger em bi zanebûn hertim tiştekî dikin, ku heleqetî navhev bikevin û meriv ji hev cihê bibin, wî çaxî nenihêrî wê yekê, ku ew yek rast e, yan na, yek e ew yek jî qedirnegirtina hindava Xwedê da ye.

## Gelo Xwedê gunehên min mazînî bona eşkerekirinê dide xebatê?

Berî wê yekê, wextê ku Xwedê min û jina min wê bianîya nava vê qulixê, hevt sala ser hev min nava qulixa alîkarîyê da qulix dikir û ez li civînê serwêrê cahila bûm. Wî çaxî merivek hebû, kîjanî gelekî ez hiz dikirim û ew şîret, kîjan min belav dikirin, li wî xweş nedihatin. Ewê yekê ez xemgîn nedikirim, lê tabîya serwêrtiyêye wî merivî li ser min hebû.

Ez bawar bûm, wekî Xwedê min ra gotibû, ku xeberên qewat bidime cahila. Kurê wî merivî nava koma minda bû.

Rojekê kurê wî hate cem me û girîya. Ew ber xwe diket, çimkî texmîn kiribû, wekî cûrê jîyana wane li malbetê berbi wî meremî nedibir, derheqa çida min bangî wan cahila dikir.

Peyî vê yekê ra, dihate kifşê, wekî bavê wî qirar kiribû, ku ji min azad be. Ew çûbû li cem serwêrê mezin, bona ku bi gunehkarkirinên derew hêrsa wî miqabilî min rake. Paşê ew nêzîkî min bû û got ku çawa ewî serwêrî ez parastime, wextê ku serwêrê pêşîyê miqabilî min bûye. Nivîsarên rexnekirinê derketibûne meydanê û giva xudanê wan nivîsara ez bûme. Lê ew ne yên min bûn. Ew meriv min ra dikenîya, lê meremê wî hebû ku min tune bikira.

Çend endamên koma cahila gotin, wekî wana bihîstîye ku wê min azad bikin. Hema kurê wî merivî ew behs belav kiribû û ewî ne ku bi sidqê xirab ew yek kiribû, lê ew tişt wekilandibû, çi ku ewî li malê bihîstibû. Ez hêrsketî û navhevketî bûm. Ez çûme li cem wî merivî û ew xwe mikur hat, got ku ewî usa gotîye, lê serda zêde kir, wekî ewî fikira serwêrê mezin wekilandiye.

Meh derbas bûn. Dihate texmînkirinê, wekî guman tune bû ku hal wê bihata milahîmkirinê. Ewî pêra gîhandibû, heleqetîyên di navbera serwêrê mezin û min da navhev bixe. Nêzîkbûna wî merivî tenê himberî min nîbû, lê himberî yên mayîn jî usa bû.

Malbeta min her dem bin hukumda bû. Me nizanibû, emê civînêda bimînin, yan na. Me xwera mal kirîbû, jina min jî hemle bû û me-

cala me tunebû em cîhekîda biçûna. Min nedixwest xebateke başqe bigeryama. Ez bawar bûm, wekî Xwedê ez anîbûme wê civînê û rêke başqe bona min tunebû.

Jina min hêrsketî û şikestî bû: “Delalê min, ez zanim, wekî ew hazir dibin te ji wê derê aza bikin. Her kes jî derheqa wê yekê da min ra dibêje”.

“Bêyî begemîya Xwedê ewê min aza nekin û wê nikaribin wê yekê bikin”, – min gote jina xwe. Jina min difikirî, wekî ez halê pêşdahatî hesab hilnadim û tewaqe kir ku ez xwe bêdeng bikim.

Bi kutasî em pê hesyan, wekî qirara derheqa azakirina minda êdî hatîye qebûlkirinê. Serwêrê mezin elamî civînê kir, wekî nava serkarîkirina koma cahilada wê guhartin hebe. Min hela hê serwêrê mezin ra derheqa pirsgirêka tevî serwêrê xwe xeber nedabû. Rojtira mayîn min qirar kir rastî wî merivî bêm. Xwedê bi cûrekî başqe ez pêşda birim ku ez xwe neparêzim.

Rojtira mayîn ez rastî wî hatim, ew li ofîsê tenê bû. Ewî min li nihêrî û got: “Con Xwedê te şandîye vê dêrê, ez îzinê nadim, ku tu herî”.

Ez rih’et bûm. Deqa xilazîyê Xwedê ez parastibûm.

Serwêrê mezin ji min pirsî: “Bona çi ew meriv peyî te ketîye?. Ez tewaqe dikim, here cem wî û heleqetîyên xwe bide dasekinandinê”. Piştî wê rasthatinê min nivîsara derheqa qirara serwêrê mezinda stend, kîjan derheqa goveka borcdarîyên minda bû. Ewê yekê menîyên rast didane eşkerekirinê. Ez hazir bûm, ku wê nivîsarê raberî serwêr bikim.

Ewê rojê ez gelekî dirêj geryam û nêzîkî 45 deqa min dua dikir, dicêriband ewî halê xirab alt bikim. Min ser hev digot: “Xwedêyê min, ew meriv ne paqij û xirab bûye, sifetê wîyî rast gerekê bê eşkerekirinê. Nava qulixêda ew dijwariya bi qezya ye. Ez gerekê derheqa wê yekê da serwêr ra gilî bikim, ku bi rastî ew kî ye”.

Paşê min meremên xweye bona eşkerekirina wî afû dikirin. “Ev hemû tişt, çi ku ezê bêjim, rastî ye, li ber xwe derxistî nîne. Heger ew nesekine, xirabîya wî wê nava temamîya civînêda belav be”.

Bi kutasî, nava gumanbirîya minda, bêyî fikirmîşbûn, min kire gazî: “Xwedêyê min, Tu naxwezî, wekî ez wî eşkere bikim, usa nîne?”.

Wextê ku min ev xeber gotin, edilaya Xwedê dilê min hilda. Ez zendegirtî mam û min serê xwe girt. Ez pê hesiyam, wekî Xwedê nedixwest ku min tu tişt bikira û min jî ew hemû tişt danî alîkî. Paşwextiyêda min fem kir, wekî wî çaxî min diha gelekî xwestîye heyfê hildim, lê ne ky nava qylixêda yekî biparêzim. Wî çaxî ez difikirîm, wekî menîyên min yên xwehizîyê nînin. Înformasîya ky min dixwest bigota serwêrê mezin ya rast bû, lê menîyên wê paqij nîbûn.

Wede derbas bû û rojekê, wextê ky min bi seheta dua dikir, min li ber ofîsa civînê dît, ku çawa ew meriv bi avtomaşînê hate civînê. Xwedê usa kir ku ez herim li cem wî û li ber wî ta bim. Wî çaxî xwehizî li cem min pêşda hat: “Na, Xudan, ew bi xwe gerekê bê cem min. Hema ew e menîya hemû pirsgirêka.

Min duakirin berdewam kir, lê Xudan careke mayîn got, wekî ez herime cem wî û li ber wî ta bim. Min zanibû, wekî ew Xwedê bû min ra xeber dida. Min wî merivî ra têlefon kir û ez çûme cem wî. Çi min gote wî ji wê yekê cuda dibû, çi ku minê pêşda bigotayê, heger Xwedê usa nekira.

Min baxşandin ji wî xwest. Ez xwe mikur hatim: “Ez himberî te rexnekir û gunehkarkir bûme”.

Ew carekê ra nerm bû û me nêzîkî sehetekê qise kir. Ji wê rojêda destpêkirî êrîşên wî yên dijî min sekinîn, nenihêrî wê yekê, wekî problêmên di navbera wî û merivên civînêye mayînda hebûn.

Piştî şeş meha, wextê ku min ji welêt der qulix dikir, hemû şaşîyên wî merivî li ber serwêrên mezin eşkere bibûn, kîjan govekên qulixêye mayînva girêdayî bûn. Çi ku ewî kiribû hê xirab bibûn, ne ku çi min zanibû. Ew carekê ra hate azadkirinê.

Mehkema wî hate kirinê, lê ne bi destî min. Çi ku ewî dicêriband miqabilî min bikira hate pêşya wî. Çawa jî hebe, wextê ku ew tişt qewimî, ez şa nebûm. Ez bona wî û malbata wî ber xwe ketim. Min êşa wî fem dikir, çimkî rûyê wî da ez ketibûme nava halê usa.

Nenihêrî wê yekê, wekî şeş meh pêşda min baxşandibû wî, niha min ew hiz dikir û min nedixwest, wekî ew rastî wê yekê bihata. Heger ew salekê pêşda ji wê civînê azad bûya, wextê ku ez li ser wî hêrsketî bûm, ezê şabûma. Min fem kir, wekî ez êdî ji wê xeyîdê aza me, bona kîjanê min cîh dabû. Hin tabûna li ber wî û hin jî ew yek, wekî min nexwest heyfê hildim, bûne kilîta azadbûna ji dîlketina xeyîdê.

Piştî salekê min ew li firegehekê dît. Ez bi hizkirina Xwedê tijî bibûm. Ez revîm û min ew hembêz kir. Bi rastî ez şa bûm, wextê ku ewî min ra got ku nava emirê wîda hemû tişt baş e. Heger çend meh pêşda ez neçûma ofîsê, li ber wî ta nebûma, minê nikaribûya ewê rojê li çavê wî binhêrîya. Ji wê rojê hetanî niha, wextê ku min ew cara dawî dît, êdî sal derbas bûne, lê ez tenê hizkirinê himberî wî texmîn dikim û bi xwestina Xwedê ez dixwezim wî bibînim.

Dawid aqil bû, wextê ku îzin da ku Xwedê bibe dadkirê Şaûl. Tê bipirsî: “Wî çaxî Xwedê bi destê kê dada Şaûl kir, xulamê Xwe?”. Na xêr, bi destî felestînîya. Şaûl tevî kurên xwe mir, wextê ku dijî felestînîya şer dikir. Wextê ku behsa derheqa mirina Şaûl da gihîşte Dawid, ew şa nebû, lê girîya.

Merivekî li cem Dawid pesinê xwe da ku ewî Şaûl kuştiye. Gumana wî hebû, wekî ew yek wê li Dawid xweş bê, lê usa nebû. “Tu çawa netirsiyayî, wextê te destê xwe li ser wî merivî bilind kir, yê ku ji alîyê Xudan da hatibû qebûlkirinê?”, – Dawid jê pirsî. Ewî emir kir ku wî merivî ceza bikin, bikujin (2 Padişatî 1:14, 15 binhêre).

Paşê Dawid bona cimeta cuhîya, bona qedirê Şaûl û kurên wî stiran got. Ewî teslîmî cimetê kir ku li soqaqên (kûçên) bajarên Felestînêda derheqa mirina Şaûl da elam nekin, bo ku bi wê yekê îzinê nedin ku dijmin şa be. Ewî elam dikir, wekî li wan cîha bila ne baran, ne jî şînahî hebe, li kîderê Şaûl ket. Ewî bangî temamîya Îsrayêlê kir ku bona Saûl şînê bikin. Eva dilê merivê xeyîdî nîbû. Merivê xeyîdî wê bigota: “Ew layîqî çi bû, ew jî stend”.

Dawid hela hê diha dûr çû. Ewî rehmbûna xwe hindava malbeta Şaûl da kifşê, erd û xurek da wan û îzina peyîhatîkî Şaûl jî da ku li

dora sivira padişê rûnê. Gelo eva gava merivê xeyîdî ye? Nenihêrî wê yekê, wekî Dawid înkarbûyî bû ji alîyê Şaûl da, yê ku gerekê bona wî bavtî bikira, piştî mirina wî jî ew usa paqij ma. Gelekî hêsa ye, ku tu himberî wî mezinî yan jî wî bavî paqij bimînî, yê ku te hiz dike, lê gelo tê çi derheqa wî da bêjî, yê ku dixweze te tune bike? Tê bibî merivê himberî dilê Xwedê, yan tê bi xwe heyfê hildî?

## HEQ E, WEXTE KU XWEDÊ HEYFÊ Jİ XULAMÊN XWE HİLDİDE, LÊ HEQ NÎNE, WEXTÊ KU XULAMÊN XWEDÊ Bİ XWE HEYFÊ HİLDİDİN.

"Birêz Pîvêr, min hema îro xwendina kitêba weye bi sernavê "Tela Şeytan" xilas kir û min nikaribû ew ji destê xwe dianîya. Bêguman, eva kitêbeke ji wan kitêbên here baş e, kîjan min nava emirê xweda xwendiye".

– P. A., MÎSSÛRÎ

# 5

# GEROKÊN RUHANÎ ÇAWA TÊN DİNÎYAYÊ

***“Xwedê neke, wekî ez destê xwe hildim li ser mesîhîyê Xudan– axayê xwe, çimkî ew mesîhîyê Xudan e. Û Dawid bi van xeberava merivên xwe da zeftkirinê û îzin neda wana ku ew êrîşê bibine ser Şaûl”.***

**– 1 PADİŞATÎ 24:7,8**

Nava beşa dawî da me dît ku çawa ew meriv, bona kîjanî gumana Dawid hebû, ku wê bibûya bavê wî, gelek tiştên xirab hindava Dawid kirin. Dawid dicêriband fem bikira ku li kîderê ew şaş bibû. Ewî çi kiribû, wekî Şaûl miqabilî wî derketibû û difikirî, ku çawa ew dikaribû dilê Şaûl qazanc bikira. Bi wê yekê Dawid paqijaya xweye himberî Saûl da kifşê, nenihêrî wê yekê, wekî Şaûl dixwest ew bikuşta.

Serê xwe berjêkirî, Dawid dikire gazî û digote Şaûl: “Binhêre, wekî destê minda tu xirabî tune û min himberî te guneh nekirine”.

Wijdanê Dawid rihet bû, ewî zanibû, wekî ewî paqijaya xweye himberî rêber daye kifşê. Paşê ewî behseke ecêb bihîst, ew pê hesîya, wekî Şaûl hela hê dixwest ew bikuşta. Feqet Dawid nexwest destê xwe li ser merivekî bilind bike, yê ku li wî digerîya, nenihêrî wê yekê, wekî Xwedê xew peyayî li ser esker kiribû û merivek jî dabû wî, yê ku teweqe dikir ku qayîlîya xwe bida bona kuştina Şaûl. Dawid texmîn dikir, wekî razana esker bona meremekî başqe qulix dikir û ew merem nihêrandina kûraya dilê wî bû.

Xwedê dixwest bidîta ku gelo Dawidê Şaûl bikuşta, wekî peyî wê yekê ra ewî padişatîya xwe îzbat bikira, yan wê îzin bida ku Xwedê textê padişatîyê nava heqîtîyêda îzbat bikira.

> “Heyfê hilnedin, delalno, lê cîh bidine hêrsa Xwedê, çimkî nivîsar e: “Heyfhildan destê min e, Ezê heyfê hilînim, Xudan dibêje”.
>
> – ROMAYÎ 12:19

Heq e, wextê ku Xwedê heyfê ji xulamên Xwe hildide, lê ne heq e, wextê ku xulam bi xwe heyfê hildidin. Şaûl merivek bû, yê ku bi xwe heyf hildida. Ew 14 sala peyî Dawid ketibû, yê ku merivekî bi qedir bû. Şaûl usa jî kahîn û malbetên wan kuştin.

Wextê ku Dawid li ber Şaûlê razayî sekinî, ewa ew dem bû, wextê ku ew li ber cêribandineke grîng rû bi rû sekinîbû. Evê bida eşkerekirinê ku gelo Dawid hela hê xweyê dilê paqij bû, yan ew dikaribû bibûya Şaûlekî mayîn? Gelo ewê çawa merivekî himberî dilê Xwedê bima?

Pêşda ew hemû tişt gelekî hêsa dihate texmînkirinê, wextê ku me hemû tişt bi cûrê xwe hel dikir, ne ku em hîvîya dîwana Xwedê ya heq disekinîn.

Xwedê xulamên xwe bi rêya gurêkirinê dinihêrî. Ew me diatîne nava halê usa, li kîderê bona afûkirina kirinên me normên ruhanî û civakî pêşda tên. Xwedê îzinê dide merivên mayîn, bi taybetî qewimên me,

ku ew nava pirsa xweparastinêda piştgirîya me bikin. Carna em dikarin bifikirin, wekî wextê ku em heyfê hildidin, bi wê yekê em yên mayîn diparêzin. Lê eva rêya Xwedê nîne. Ewa rêya serwaxtîya dinîyayê ye.

Wextê ku ez evê mecalê dinhêrim, yên bona eşkerekirina kirinên mezinê min, ez bîr tînim, wekî min miqabilî wan fikira şerkarî dikir, anegorî kîjana mecal hebû zyan bidana yên mayîn, heger ew eşkere nekirana.

Ez hertim difikirîm: "Ez tenê rastîyê gilî dikim. Heger ez nekim ev hemû tişt wê hela hê berdewam bibe". Yên mayîn piştgirîya min dikirin, wekî min kirinên wî bida eşkerekirinê.

Çawa jî hebe, îro ez zanim, wekî Xwedê derheqa vî mezinîda înformasîya dabû min, bi wî meremî ku min kontrol bikira. Gelo ezê mînanî wî merivî bûma, yê ku dixwest min tune bikira. Yan jî, heger ewî merivî tobe bikira, minê ew teslîmî dîwana Xwedê bikira?.

## Gelo Xwedê çawa dikare mezinên mixenet bide xebatê?

Gelek meriv dipirsin: "Bona çi Xwedê meriva datîne bin destê mezinên usa, yên ku şaşîya dikin û şaşîyên usa, kîjan gelekî xirab in?".

Dîna xwe bide zarotîya Samûêl (beşên 1 Padişatî 2–5 da binihêre). Xwedê bi Xwe, lê ne ku şeytan, Yê tek tenê bû, Yê ku ev xortê biçûk danîbû bin serkarîya kahînekî bi navê Hêxî û herdu kurên wî yên ji rêya xwe derketî. Ew jî kahîn bû. Ev meriv gelekî xirab bû. Wana meriv dixapandin, qurban ji wana hildidan û tiştên xirabva mijûl dibûn.

Tu dikarî texmîn bikî, wekî tu li cem mezinekî usa qulix bikî, yê ku bi emirê vî cûreyîva dijî? Li cem qulixçîkî usa, yê ku Ruh texmîn nedikir, jina nava duayêda fem nedikir û nava îçikevexarinêda gunehkar dikir. Hêxî gelekî bi beden bû, wekî êdî tu tişt hesab hilnedida. Ewî awqas ber dadixust, wekî bona kurên xwe tu tişt nedikir, yên ku civînêda tiştên xirabva mijûl dibûn.

Gelek mesîhî roja îroyîn dûr dikevin û civînên mayîn digerin û dibêjin ku ew rûyê jîyana mezinên xirab da dûr dikevin. Yên ku nava

wî emirîda dijîn, ez dixwezim gilî bikim ku Samûêlê cahil çi kir: “Û Samûêlê zarok li ber Hêxî qulixa Xudan dikir” (1 Padişatî 3:1).

Xêncî wê yekê, ew kirin encamên xwe dan: “Û wan roja gotina Xudan hertim nîbû, dîtinoka eyan tune bû (1 Padişatî 3:1). Dihate texmînkirinê, wekî Xwedê ji civaka cuhîya dûr bû. Li paristgeha Xudan îşiqa Xwedê nêzîkî temirandinê bû. Gelo Samûêl çû cîhekî mayîn? Gelo ew çû bo ku bida eşkerekirinê, wekî Hêxî û kurên wî xirab bûn?

Gelo Samûêl civînek saz kir bo ku Hêxî û kurên wî ji serwêrtîyê miqûf bihişta? Na, Samûêl qulixî Xudan dikir.

Xwedê Samûêl danîbû li wir û ew bona kirinên Hêxî û kurên wî cabdar nîbû. Samûêl ne ku bona gunehkarkirinê bin serkarîya wanda bû, lê bona qulixkirinê li wir bû. Ewî zanibû, wekî Hêxî xulamê Xwedê bû, lê ne yê wî. Ewî zanibû, wekî Xwedê dikaribû xulamên Xwe gunehkar bikira.

Zarok bava nadine rastkirinê. Borcdarîya bava hînkirin û rastkirina zaroka ye. Em tevî wan meriva kar dikin û rastî wana tên, kîjan Xwedê danîne bona hînkirinê. Cabdarîya me ew e, ku em piştgirîyê bikin û li ber dilê wan da bên, xwîşk û birayên ku li ser dereca me ne. Feqet vê beşêda, çawa ya pêşîyêda, emê derheqa wê yekêda xeber bidin, ku çawa gerekê bersiva wan bidin, serkarîya kîjana li ser me heye.

Samûêl çiqas dikaribû bi gurêkirin qulixî merivê kö Xwedê kifş kiribû kir, bêyî cedandina gunehkarkirinê û rastkirinê. Tenê wî çaxî Samûêl gotina rastkirinê pêşda kişand, wextê ku Hêxî hate cem wî û pirsî ku şeva derbasbûyî Xwedê bona wî çi pêxemberî dabû Samûêl. Feqet hema wî çaxî jî gotina rastkirinê ji Xwedê bû, lê ne ku ji Samûêl. Heger gelek meriva ev rastî qewîn destê xweda bigirtana, wî çaxî civînên me wê cûrekî mayîn bûna.

## Civîn ne qawexane ne

Roja îroyîn meriv ji civîna dûr dikevin, wextê ku nava serwêrtîyêda şaşîkê dibînin. Diqewime menîya dûrketinê ew e, wekî serwêr pera berev dike, yan jî diqewime li wana xweş nayê ku li civînê ew

pere çawa xerc dibin. Heger li wana xweş nayê ku serwêr çi dibêje, wî çaxî ew dûr dikevin. Serwêr yan usa ye, wextê ku nêzîkî wî nikarî bibî, yan jî gelekî nêzîkî meriva ye. Navnîşa van yeka bêdawî ye. Wextê rasthatina çetinaya, dewsa xweyîkirina gumanê ew direvine li wir, li kîderê tê texmînkirinê ku tevî kesekî jî pevçûyîn tune.

Werin em li ber çavên xwe bibînin, wekî tenê Îsa Serwêr e. Usa ye bo çi hûn ji wan dijwaryên li Amêrîkayê direvin, dewsa karkirina nava wan da? Wextê ku em sêrîda van tişta naxin, hîmlî bi xeyîd dûr dikevin. Carna em dibêjin, wekî qulixa pêxemberîyê nebû rastî. Piştî wê yekê em ji civînekê diçine civîneke mayîn û li wan dera serwêrên bêyî kêmasiya digerin.

Bi hesabhildana wê yekê, wekî ez vê kitêbê dinivîsim, bêjim, wekî nava 14 salên derbasbûyîda ez bûme endamê du civîna, kîjan li du ştatên ji hev cuda bûn. Gelek cara menî hebûne ku ez ji serwêra bixeyîdiyama (dikarim zêde bikim, wekî nava wan gelekada kêmasîya min hebûye). Ez dikaribûm bibûma rexnekir û gunehkarkirê hindava serwêra, lê dûrketin helkirina pirsê nîbû.

Rojekê, nava halekî giranda Xudan bi rêya beşeke Kitêba Pîroz min ra xeberda û got, wekî dixweze ku ez ji civînê vî cûreyî dûrkevim:

> “Çimkî hûn gerekê bi şabûn derbikevin û bi edlayêva bêne rêberkirinê”.
>
> – ÎŞAYA 55:12

Gelek meriv bi vî cûreyî ji civînê dûrnakevin. Ew difikirin, wekî civîn mîna qawexana ne, li kîderê dikarin hildin û bibijêrin çi ku li wana xweş tê. Ewana li wir hetanî wî çaxî azayê li ser xwe texmîn dikin, hetanî ku pirsgirêk pêşda nayê. Feqet ev tişt anegorî hînkirina Kitêba Pîroz nîne. Tu nînî, ku gerekê bibijêrî, ku herî kîjan civînê, çimkî Xwedê wê yekê dibijêre. Kitêba Pîroz nabêje, wekî “Xwedê çawa ku wana xwestîye, wî cûreyî jî endamên bedena her yekî danîne”. Kitêba Pîroz dibêje: “Lê niha Xwedê her endamek danî nava bedenê çawa ku Ewî xwest” (1 Korintî 12:18).

Bila bîra te da be, wekî heger tu li wî cîhî yî, li kîderê Xwedê dixweze ku tu li wir bî, cinê bicêribîne bi xeydandinê te ji wê derê der bixe. Cin dixweze, meriva ji wan cîha der bixe, li kîderê Xwedê ew nikandine. Heger cin bikaribe te der bixe, ewê bighîje açixîyê. Heger tu nava halê dijwar da ji cîhê xwe neleqî, wî çaxî tu progirama cin didî xirabkirinê.

## Xapandina krîzîsî

Bi sala ser hev ez li civînekê bûm. Serwêrê wê civînê xeberdankirekî Amêrîkayêyî baş bû. Dema ku ez cara ewlin çûme wê civînê, min bi hewask'arî, devê xwe vekirî, rûniştî guhdarîya hînkirina wî dikir.

Wede derbas bû. Rûyê tabîya qulixê da ez gelekî nêzîkî serwêr bûm û min dikaribû dîna xwe bida kêmasîyên wî. Min destpê kir çend qirarên wî yên qulixê bikime bin şikberîyê. Ez bûme rexnekir û gunehkarkir û nava min da xeyîdê cîhê xwe girt. Ewî digot, lê min tu tiştekî ji Xwedê texmîn nedikir. Xeberdana wî êdî qulixî min nedikir.

Jin û mêrek li wir bûn, yên ku ji admînîstrasîya civînê bûn û me jî tevî wan hevaltî dikir. Dihate texmînkirinê, wekî ew jî mînanî min texmîn dikirin. Xwedê ew ji wê civînê şandin û wana qulixa başqe destpê kir. Van herdua teweqeyî min kirin, ku ez jî tevî wan herim. Wana zanibû ku em nava şerkarîya çi cûreyîda nin û piştgirîya me dikirin.

Wana gilî dikir, wekî serwêrê wê civînê, jina wî û mezinên wî çi dikirin şaşî bû. Me tevayî gumanbirî texmîn dikir. Me texmîn dikir, wekî em ketine telê.

Tê bêjî ew jin û mêr bona pêşdaçûyîna me ber xwe diketin. Feqet ew xeberdan agirê nerazîbûn û xeyda me diha didane gurkirinê. Metelokên Silêman 26:20–da tê zelalkirinê: "Wextê dar tune bin, agirê bitemire... ". Çi ku wana digote me, diqewime înformasîyayên rast bûn, lê li ber çavê Xwedê ew yek şaş bû, çimkî ewana dar li ser agirê xeyîdê zêde dikirin.

Wana digot: "Em zanin, wekî tu merivê Xwedê yî, bona wê yekê

jî li vê derê pirsgirêkên te hene". Ev gotin gelekî baş dihatine guhdarkirinê.

Min û jina xwe bi hev ra got: "Ew yek usa ye, em halekî xirabda nin, em hewcê derketina ji vir in. Jin û mêrên mayîn me hiz dikin. Ewê me hîn bikin û merivê civîna nû wê me qebûl bikin".

Em ji wê civînê çûne civîna ku ewî mêrî û ewê jinê me ra salix dan, lê çend meha... Em difikirîn, wekî em ji problêmê revîne, lê me texmîn kir, wekî ew problêm hela hê bona me heye. Ruhên me bêyî şabûnê bûn. Em ditirsyan ku emê bikevine dîsa nava wî halî, ji çi em dûrketibûn. Dihate texmînkirinê, wekî ew hemû tişt, çi ku me kir, bi mecbûrî bû. Me nikaribû bi cûrê anegor biketana nava gotina Ruh. Niha jî dîsa heleqetiyên me tevî wî mêrî û wê jinê sert bûn.

Bi kutasî min fem kir, wekî gerekê em vegerine civîna xwe. Wextê ku me ew yek kir, me carekê ra fem kir, ku em paşda vedigerine nava xwestina Xwedê.

Paşê Xwedê ez zendegirtî hiştim: "Con, Min tu cara tera negotibû, wekî tu ji vê civînê dûrkevî. Tu ji xeyîdê ji civînê dûrketî". Menîya çûyîna meye ji dêrê ne ku bi gunhkarîya serwêrê me û jina wî bû, lê bi gunehkarîya me bû. Wana ew yek fem dikir û dicêribandin hema wê pirsgirêkê dilê xweda bidine safîkirinê. Wextê ku tu ji xwestina Xwedê der î, tu nikarî bona dêreke mayîn bibî piştgir. Wextê ku tu ji xwestina Xwedê der î, heleqetîyên baş jî xirab dibin. Em ji xwestina Xwedê derketibûn.

Merivên xeyîdî ji hal paşda vedikişin û hemû tiştî dikin, kîjan anegorî wan rast tên texmînkirinê. Em bona wê yekê hatine gazîkirinê ku kar bikin, lê ne ku paşda vekişin.

Heger em gura Xwedê da bin û Wî digerin, lê Ew xeber nade, wî çaxî zanî ku cab kîjan e? Ew tê bêjî dibêje: "Hema li vir bimîne, li kîderê tu yî, tu tiştî neguhêre". Gelek cara, wextê ku em hukum texmîn dikin, bona hêsabûna xwe em hîvîya gotina Xwedê ne. Feqet Xwedê me datîne nava halekî usa, ku em bighîjin, paqij bin û qewat bin, lê ne ku ew usa dike, ku me tune bike. Nava mehekê da min ra li hev hat, ku ez rastî serwêrê dêra ewlin bêm. Min tobe kir, wekî

ez rexne kirim. Ewî baxşande min, heleqetîyên me dîsa hatine dasekinandinê û dilê min bi şabûnêva tijî bû. Min carekê ra qulixa wî qebûl kir û gelek sala ez li wê ciînê mam.

## Tiştên nikandî wê şîn bin

Di Kitêba Pîroz, Zebûr 92:13–da tê gotinê: "Tiştên ku mala Xudan da hatine nikandinê, wê li hewşên Xwedê da şîn bin".

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî ew şîn dibin, kîjan li mala Xudan hatine "nikandinê". Ew şînahî çawa dibe, wextê ku sê şemîya carekê ewê ji cîhekî cîguhastî cîhekî mayîn bikin. Ji we gelek meriv zanin, wekî sîstêma koka şînahê wî çaxî zehîf dibe û ew nagihîje. Heger tu hertim usa berdewam bikî, ewê ji cîguhastinê bimire.

Gelek meriv ji civînekê cîguhastî civîneke mayîn dibin û dicêribînin qulixa xwe bidine pêşxistinê. Heger Xwedê ew danîne li cîhekî, li kîderê wana fem nakin, wî çaxî ew rihet dixeyîdin û dixapin. Heger ew nava tiştekî da civînê ra qayîl nînin, wî çaxî ew tên xapandinê, dûr dikevin û mezina gunehkar dikin. Merivên usa himberî her kêmasîke xeyset kor in û fem nakin, wekî Xwedê dixweze ku ew bi saya hukum paqij bin û bighîjin.

Were em bi meselên şînahiyê û dara hîn bibin. Wextê ku tu dara fêkîya erdê da dinikînî, ew eseyî rastî baranên bi bagerê, germa royê û ba tên. Heger dara cahil bikaribûya xeberda, diqewime ewê bigota: "Tewaqe dikim, min li vir nenikînin, lê cîhekî usa binikînîn, li kîderê germahiya usa û bagerên usa tunene".

Heger tu ewê darê guhdar bikî, bi rastî tê zyanê bidî wê darê. Dar li ber germahiya royê û bagera, barana, ber xwe didin û koka xwe erdê da hê dirêj dikin. Bi kutasî ew yek dibe hîmê qewînbûnê. Qedexekirinên dora dara dibine menî, ku ew kanîyên emire başqe bibînin û rojekê jî bagerên here mezin wê nikaribin hukumî li ser dayîna fêkîyên wê darê bikin.

Çend sal pêşda ez li bajarekî Florîdayê dimam, kîjan merkeza fêkîyên sîtrûs e. Gelek florîdî zanin, wekî bi çiqasîva zivistan sar e,

wî çaxî portûqal diha şîrin dibin. Heger em awqas zû ji berxudana ruhanî nerevin, emê koka xwe diha kûr bikin û emê diha qewat bin, fêkîyên me li ber çavê Xwedê wê diha şîrin bin, lê bona cimeta Wî wê diha xweş bin. Em gerekê bibine darên wî cûreyî, bo ku gelek fêkîya bidin, kîjanê li Xudan xweş bên, lê ne ku bibine mînanî wan dara, kîjan ji kokêva radikin û cîguhastî cîhekî mayîn dikin. Lûqa 13:6–9. Em gerekê miqabilî wê yekê dernekevin, çi ku Xwedê me ra dişîne, bona ku em bighîjin.

Nivîsara Zebûr Dawidê ku bi Ruhê Pîroz va tijî bûye, tevgirêdana orta xeyîdê, qanûna Xwedê û zêdebûna ruhanîya me dide kifşê. Zebûr yekêda wa dinivîse:

> "Xwezî li wî merivî... xwestina kîjanî nava qanûna Xudan da ye û şev û roj li ser qanûna Wî difikire".
>
> – ZEBÛR 1:1,2

Paşê jî Zebûr 119:165–da, ew diha zelal derheqa wan meriva da dibêje, yên qanûna Xwedê hiz dikin.

> "Bona hizkirên qanûna te gelek edilayî heye û bona wan xeyîd tune".

Di Zebûr 1:3–da gotin derheqa yazîya merivê vî cûreyî da ye:

> "Û ew mînanî darên ku nava avada nikandî ye, yê ku wede da fêkîyên xwe dide, belçên wî naweşin û çi ku dike, wî ra li hev tê".

Bi gilîkî mayîn gotî, heger bawarmend bi rêya Gotina Xwedê diçe, ewê nava halê dijwar da ji xeyîdê dûrkeve. Ew meriv wê bibe mînanî wê darê, koka kîjanê diha kûr dirêj dibe, li kîderê Ruh qewînbûnê dide. Ewê ruhê xwe da berbi bîra (bîra avê) Xwedê dirêj be. Ev yek jî wê halekî usa pêşda bîne, wextê ku lihevnehatin wê alî bike, bo ku şuxulkarîya çêbûna fêkîyê lez bikeve. Alêlûya.

Niha were em derbasî şirovekirina meteloka derheqa çandina Îsa bin:

> "Wî cûreyîne jî ewên ku li cîhên kevir– kuçik hatine çandinê, yên ku wextê gotinê guhdar dikin, bi şabûn qebûl dikin û nava wanda kok tune, lê dem–demîne, paşê, wextê ku bona wê gotinê dikevine nava tengavîyê, zû dixeyîdin".
>
> – MARQOS 4:16,17

Hema tu ji cîhê xwe dûr dikevî, li kîderê Xwedê bona te cîh bijartiye, gihîştina koka te disekine. Nava halên wî cûreyî da bona te diha hêsa dibe ji levnehatinê birevî, çimkî bona dirêjkirina koka xwe qewata te tune. Bi kutasî tê bighîjî halekî usa, wextê sebirkirina dijwariya, yan qewata te wê hindik be, yan jî wê qet tunebe.

Peyî wê yekê ra tê bibî merivekî ruhanîyî gerok, dero– der bibî, ji cîhekî herî cîhekî mayîn, bibî şikber û tê bitirsî, wekî merivên mayîn wê xirab nêzîkî te bin. Karebûna te ya dayîna fêkîyên ruhanîye rast wê qels bibe û bi veşartin tê destpê bikî dijî emirê xwehiz şer bikî û tê bermayên fêkîyên xelqê buxî.

Were em dîna xwe bidine kurên Adem yên ewlin Kayên û Abêl. Kayên fêkîyên baxê tirîyên xwe, yên bi xebata destê xwe qurbana Xudan kir. Ew fêkî feydayên xebata bi kel û ced bûn. Kayên bi dijwarî erd ji kevira û şînahiyên nelazim temiz kiribû. Ewî bi dijwarî erd bêcer kiribû, bi dijwarî nikandibû, av dabû û bax parastibûn. Ewî li ber Xwedê cedandin dabûne xebatê. Feqet ev yek diha gelekî qurbanîya şexsî ye, lê ne ku ew yek e, çi ku Xwedê xwestiye. Kirina Kayên sembola wê yekê ye, wextê ku meriv diha gelekî bi qewata xwe Xwedê dihebîne, lê ne ku bi kerema Xwedê.

Abêl wekî mayîn kir. Ewî nava kerîyê xwe da yên tezebûyî û kok bijartin. Abêl mîna Kayên nexebitîbû, ku vê qurbanîyê bike, lê ew yek bona wî biha bû. Her du bira jî zanibûn ku çawa dê û bavên wan cêribandine bedenên xweye tazî bi belçên dara hêjîra binixêmin, ya ku ew xwestin bû, ku bi wî cûreyî gunehên dê û bavaye rûyê karên wanda kirî veşêrin. Feqet, Xwedê qurbana qebûl da kifşê, Adem û Hewa bi postê heywanê bêsûc da nixamtinê. Adem û Hewa derheqa wê yekê da haj pê tunebûn, çimkî rêya Xwedê nîşanî wan dabûn û ne jî zarokên wan haj pê hebûn.

Kayên dicêriband bêyî şêwira Xwedê layîqî qebûlkirina Xwedê bibûya. Xwedê jî da kifşê, wekî Ewê wana qebûl bike, yên ku anegorî normên (qurbana Abêl) kerema Wî tên li cem Wî û Ewê wê yekê înkar bike, wextê ku dicêribînin bi karê “zanebûna xirabîyê û qencîyê” wê yekê bikin (karên Kayêne ruhanî).

Paşê Xwedê Kayên hînkir ku heger ew qencîyê bike, wê bê qebûlkirinê. Lê heger qencîkirinê nebijêre, gunehê bê li ser wî. Kayên ji Xudan xeyîdî bû. Dewsa rastkirinê û ji vî halî derketinê, Kayên hêrsa xwe li ser Abêl rêt û ji Xwedê xeyîdî. Ewî Abêl kuşt.

Xwedê gote Kayên:

> “Û niha tu ji wê axê nifirkirî bî, kîjanê devê xwe vekir, ku xwîna birayê te ji destê te qebûl bike. Wextê ku tu li ser axê karê bikî, bira ew êdî feydayê xwe nede te, tu li ser erdê dero–der bî”.
>
> – DESTPÊBÛN 4:11,12

Tiştê tek– tenê, ji çi Kayên ditirsîya, ew înkarkirina Xwedê bû, bona çi jî ewî dîwana Xwedê anî li ser xwe. Mecala tek– tenê, bi kîjanê Kayên cêriband layîqî begemîya Xwedê bibe, niha jî ew bi destê xwe hatibû nifirkirinê. Xwînrêtina qewimî nifir anî, ax jî wê feydayê xwe neda Kayên, tenê bi cedandinên mezin ewê fêkî bidana.

Mesîhîyên xeyîdî wî cûreyî karebûna dayîna fêkîya unda dikin. Nava meteloka çandina Îsa da dil himberî axê tê kirinê. Çawa ku deştên Kayên bêfeyda bûn, usa jî dilê xeyîdî bêyî fêkî ye, bi talayêva tijî. Merivên xeyîdî dikarin nava emirê xwe da ecêba bibînin, gilîya bêjin, xeberdanên mezin derbas bikin, lê eva ne ku fêkî, lê pêşkêşên Ruh in. Emê anegorî fêkîyên xwe lê ne ku li gorî pêşkêşa bêne mehkemekirinê. Pêşkêş tê dayînê, lê fêkî bi xebatê tên bêcerkirinê.

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî Xwedê got ku Kayênê rûyê kirinên xweda dero–der be. Roja îroyîn li civînên me da gelek mihacirên ruhanî yên wî cûreyî hene. Pêşkêşên wane kerema stiranê, xeberdanê û yên mayîn ji alîyê serwêrên civînên wane berê nehatine qebûlkirinê, bona wê yekê jî ew ji wana dûr dikevin. Ew bêyî merem

direvin û xeyîdê hildidine ser xwe, civîneke mayîn digerin, kîjanê wana qebûl bike û wê birînên wan qenc bike. Ew meriv xeydeke kûr li ser xwe texmîn dikin. Ew dibêjin, wekî ew û Xwedê tenê mane, lê yên mayîn hemû miqabilî wan in. Ew ber dilê xwe da tên û difikirin, wekî ew pîroz in, yan jî pêxemberên Xwedê ne, lê ji alîyê yên mayîn da nayêne qebûlkirinê. Merivên wî cûreyî hindava hemûya şikber in. Hema ev yek rastî Kayên hat. Binhêre ku Kayên çi dibêje:

> "Û li ser axê ez gerekê dero–der bim û wê usa bibe ku her yek, kî ku rastî min bê, wê min bikuje"
>
> – DESTPÊBÛN 4:14

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî Kayên difikirî ku her kes miqabilî wî derketibû. Eva rastîya usa jî ya îroyîn e, merivên xeyîdî bawar in, wekî hemû kes dijî wan derketine. Bi vî cûreyî ew wan govekên emirê xwe nabînin, kîjan hewcê guhartinê ne. Ew başqe dibin û xwe usa didine kifşê, wekî kirina wan berbi xeîydê def dide.

> "Merivê ku xwe başqe dike, xwestina xwe digere, miqabilî her açixîkê hêrsa xwe dide der".
>
> – METELOK 18:1

Xwedê em bona wê yekê çênekirine ku em ji hevdu başqe bijîn. Ew yek li Xwedê xweş tê, wextê ku ewledên Wî guhdarîya hev dikin û hev bilind dikin. Xwedê ber xwe dikeve, wextê ku moralê me yê xirab e û êşê texmîn dike, wextê ku em dicêribînin bona xweşbextîya xwe yên mayîn bikine cabdar. Xwedê dixweze ku em bibine endamên malbeta Wî yên şuxulkir. Ew dixweze ku em aktîvîya xwe ji Wî dest bînin. Merivê başqebûyî tenê xwestina xwe digere, lê ne ku ya Xwedê. Ew meriv tu şîretekî qebûl nake û berbi xapandinê diçe.

Ez derheqa wan wedada xeber nadim, wextê ku Xwedê meriva bona başqebûnê gazî dike, ku ew berbi başîyê bêne guhartinê. Ez derheqa wan meriva da dibêjim, kîjana xwe başqe kirine, tê bêjî ketibûne hebsê. Ew ji civînekê diçine civîneke mayîn, ji heleqetîkê berbi ya mayîn diçin û li dinîya xweda başqe dibin û difikirin, wekî ewên

ku wan ra qayîl nînin, şaş in û miqabilî wan in. Ew merivên başqebûyî bi xwe xwe diparêzin, li wan cîha, li kîderê ew xwe bêqezîya dibînin. Ew meriv êdî bona rastkirina kêmasîyên xwe şerkarîyê nakin. Wextê ku dijwarî rastî wan tên, ew dicêribînin ji kontrolkirinê birevin. Pêşdaçûyîna xeyset, kîjan wî çaxî diqewime, wextê ku ew tevî merivên mayîn kar dikin, ji wan pevçûyîna unda dibe, çimkî êtapa xeyîdê careke mayîn destpê dibe.

# Bİ XEYÎDÊ TU XWE Jİ DÎTİNA ŞAŞÎYÊN XEYSETÊ XWE XWE DÛR DİXÎ, ÇİMKÎ WÎ ÇAXÎ YEKÎ DİN HATÎYE GUNEHKARKİRİNÊ.

“Çawa mêr û jin, me salên dirêj hev nebaxşandîye û bi wî cûreyî em birîndar dibûn. Em gihîştibûne halekî usa, wekî hevalên me hindik bûn û min xwe başqebûyî û hiznekirî texmîn dikir, nenihêrî wê yekê, wekî ez diçûme civîneke gelekî baş. Paşê min kitêba We, ya bi sernavê “Tela Şeytan” xwend û hemû tişt hate guhartinê. Ez miqabilî xeyîdê û nebaxşandinê derketim û bi alîkarîya Xwedê ez azad bûm.

– K. G. BÊLFAST, ÎRLANDÎYA

# 6

# BI XWEVEŞVRTİNV Jİ RASTÎYÊ

***"Ew her dem hîn dibin û tu cara nikarin berbi ulmê rastîyê bên"***

**– 2 TÎMOTÊYO 3:7**

Gelek cara ji min dipirsin: "Ezê kengê yan ji vê dêrê, yan jî ji koma qulixkirinê dûrkevim? Ez çawa bizanibim, wekî ew yek êdî bona min nîne?". Ez bersivê didim: "Lê kê tu şandî wê dêrê û tu niha diçî wira?". Gelek bersivê didin ku Xwedê ew şandine. Ez dibêjim: "Heger Xwedê şandîye, awqas wext dûr nekevin hetanî ku Xwedê we ji wê civînê aza bernede. Heger Xudan xwe ker dike, gelek cara Ew dibêje: "Tu tiştî neguhêre, dûr nekeve. Li wir bimîne, li kîderê Min tu danîyî"". Wextê ku Xwedê te ra bêje dûrkeve, tê bi edilayê derkevî, nenihêrî wê yekê ku qulixa te çi halîdane.

> "Çimkî hûn gerekê bi şabûn derkevin û gerekê bi edilayê bêne rêberkirinê".
>
> – ÎŞAYA 55:12

Dûrketina te wê li ser kirinên merivên mayîn neyê hîmdanînê, lê wê li ser rêberîya Ruh be. Dixwezim bêjim, wekî dûrketina ji qulixekê wê li ser wê yekê neyê hîmdanînê, bi çiqasîva hemû tişt xirab e.

Ew yek programa Xwedê nîne, wextê ji civînê bi ruhê xeyîdî, yan jî rexnekir dûr dikevin. Ew yek diha nêzîkî paşdavekişandinê ye, ne ku karkirina bi rêberîya Wî. Romayî 8:14–a da tê gotinê: "Çimkî ewên ku bi Ruhê Xwedê va hemû tiştî dikin, ew ewledên Xwedê ne". Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî nayê gotinê: "Çimkî ewên ku ji halê dijwar paşdavedikişin ew lawên Xwedê ne".

Hercar xebera "ewled" (law) nava Peymana Nû da tê xebitandinê. Ew ji du xeberên yûnanî pêşda tên– "teknon" (têknon) û "huios" (hyûos). Nava xebernama şirovekirinê da *"teknon*" çawa "zarok" tê tercimekirinê. Şirovekirina vê xeberê ev e: "ew meriv, yê ku tenê bi hatina li rûbarê dinîyayê çawa zarok tê hesabê".

Wextê ku lawê minî ewlin Êdîson hate dinîyayê, ew kurê Con Bîvêr bû, tenê bi wê yekê, wekî ew ji jina min û min hatibû dinîyayê. Wextê ku ew tevî zarokên mayîne tezebûyî li oda zaroka bû, min nikaribû ew ji zarokên mayîn bi cudabûn nasbikira çawa kurê xwe. Wextê ku heval û hogirên min hatine li wir, wana nikaribû ew nas bikirana. Nivîsara li rex cîhê wî alî wan kir ku nas bikin. Li ser Êdîson tiştekî usa tunebû ku ew cuda bûya. Ew çawa *"teknon"*–ê Con û Lîza Bîvêra dihate hesabê. Em xebera *"teknon*" nava Romayan 8:15–16–da dibînin. Ew dibêje, wekî me ruhê navê bavtîyê stendiye û "hema Ew Ruh şedetîya ruhê me dide, wekî em ewledên *("teknon"–ê)* Xwedê ne. Wextê ku însan Îsa Mesîh çawa Xudan qebûl dike, usa ye ew zaroka Xwedê ye (Yûhenna 1:12 binihêrin).

Xebera yûnanîye mayîn, kîjan Peymana Nû da çawa "ewled" tê tercimekirinê, xebera "huios" e. Xebernamê da ew çawa "ewled" tê tercimekirinê. Peymana Nû da bona nîşandayîna wî merivî tê xebitandinê, "yê ku dikare çawa ewled bê naskirinê, çimkî ew xeysetê dê

û bava nîşan dide”. Wextê ku kurê min Êdîson mezin bû, ew mînanî bavê xwe bû û destpêkir mînanî wî jî kar bike. Wextê ku ew şeş salî bû, ez û Lîza çûn gerê û me ew li cem dê û bavên min hişt. Wextê ku em paşda vegeryan, dayîka min gote jina min, wekî Êdîson kopîya bavê xwe ye. Şeşsalîya xweda ew gelekî mînanî min bû. Wextê ku ew hê mezin bû, ew diha zêde mînanî bavê xwe bû. Niha wî dikaribûn çawa kurê Con Bîvêr nas bikirana, ne tenê bi bûyîna wî, lê bi xeysetva jî, kîjan mînanî xeysetê bavê wî bû. Bi vî cûreyî em bidine zelalkirinê, wekî xebera yûnanîye “teknon” tê hesabê çawa “zarokên negihîştî”, lê xebera yûnanîye “huios” gelek cara bona zelalkirina “ewledên gihîştî” didine xebatê. Nava xebernama Peymana Nû da xudanê xebernamê van tişta bona wê yekê dide xebatê, da ku cudabûna wan hebe. Firqî ev e: “Firqîya di navbera bawarmenda da çawa “zarokên Xwedê” – “teknon”, û “ewledên Xwedê”– “huios” ji Romayî 8:14–21–ê hatîye hildanê. Ruh şedetîya ruhê wan dide, wekî ew “zarokên Xwedê”–ne û ew peyîhatîyên Wî û Mesîh ne” (gotinên 16, 17–a). Ji alîkî mayînva “ew bi Ruhê Xwedê tên rêberkirinê, ew in ewledên Xwedê”. Rêberbûna bi Ruh şedetîya wê yekê ye, wekî ew tevî Xwedê nava heleqetiya da nin û bi xeysetva mînanî xeysetê Xwedê ne. Meshîyê Xudan xebera “huios” nava gotina “navê ewledên Xwedê” da girîng hesab dikir û dibêje: “Dijminên xwe hiz bikin... û bona wana, kê ku we dizêrîne, dua bikin... wekî hûn bibine ewledên Bavê xwe, Yê ku li ezmana ye” (Metta. 5:44, 45). Şagirt gerekê ev hemû tişt ne ku bona wê yekê bikirana, wekî bibûna zarokên Xwedê, lê çawa zarok wana gerekê xeysetê xwe bidana kifşê, çimkî ew êdî ewled bûn (2 Korintî. 6:17, 18 binihêre).

Careke mayîn bi nihêrandina Romaya 8:14, em dixwînin: “Çimkî ewên ku bi Ruhê Xwedê dişuxulin, ew ewledên Xwedê ne” (huios)”. Em bi cûrê femdarî dikarin bibînin, wekî ewledên gihîştî bi Ruhê Xwedê dişuxulin. Mesîhîyên “negihîştî” çetin bi Ruhê Xwedê pêşda herin. Ew hela hê hîn nebûne bi Ruhê Xwedê bêne rêberkirinê.

Wextê ku Êdîson mezin bibe, ewê nava pêşkeftina xeyset da pêşda here. Bi çiqasîva ew mezin bibe, bi awqasîva ezê cabdarîyê bidime ser wî. Bona wî ew yek şaşî ye ku negihîştî bimîne. Ew ne xwestina Xwedê ye ku em çawa zarok bimînin. Rêya tek– tenê, kîjanê ra xey-

setê kurê min gihîşt, rasthatina dijwariya bû. Wextê ku ew çû mektebê, ew rastî hinek “xûlîgana” hat. Min dibihîst, ku çawa ew zarok nêzîkî kurê min dibûn û çi digotine wî. Min dixwest ez biçûma û pirsên wan bi destî xwe hel bikira, lê min dizanibû, wekî ew yek wê rast nîbûya, tevbûna min wê bona gihîştina Êdîson bibûya dijwarî.

Ez û jina min li malê şêwira didine wî. Em wî bona rasthatina tevî dijwariya amede dikin. Nava xeysetê xweda ew gihîşt, wextê ku nava zêrandinên xweda ewî gura şêwirên me kir. Ev yek jî mînanî wê yekê ye, çi ku Xwedê bo me çê dike. Kitêba Pîroz dibêje: “Nenihêrî wê yekê, wekî Ew (Îsa) Ewled bû (huios), ji wan zêrandina hînî gurêkirinê bû” (Îbranî 5:8).

Mezinbûna fîzîkî wedeva girêdayî ye. Tu zarokeke dusalî bi bejina xwe negihîştîye mêtrek 8O sm. î. Mezinbûna bi mejû hînbûnêva girêdayî ye, lê mezinbûna ruhanî karekî usa ye, ya ku ne wede, ne jî hînbûnêva girêdayî ye. Ew yek girêdayî ye gurêkirinêva. Niha binihêre Petrûs çi dibêje:

> “Mesîh bi bedena xweva bona me zêrîya, hûn jî bi wê fikirê pêş ketin, wekî ewê ku bi bedena xwe dizêre, ji guneha xilas bû”.
>
> – 1 PÊTRÛS 4:1

Merivê ku ji guneh xilas bûye, bi temamî zaroka Xwedê ye. Merivê vî cûreyî rêya Xwedê dibijêre, lê ne ku rêya xwe. Çawa ku Îsa ji wan tişta hîn bû, hînî gurêkirinê bû, bi kîjana zêrîya, em jî usa ji dijwariya hîn dibin. Wextê ku em gura Ruhê Pîroz, Xwedê pêşda diçin, bi wê yekê em nava pevçûyîn û zêrandina da dighîjin. Zanebûnên Kitêba Pîroz kilît nînin, gurêdamayîn kilît e. Niha bona me femdarî ye, ku bona çi li civînê meriv hene, kîjan 2O salî mesîhîne, yên ku dikarin bi ezberî hejmarên Kitêba Pîroz û beşên wan bêjin, xeberdana biwekilînin û bêjin, wekî gelek kitêb xwendine, lê hetanî niha ew bi ruhên xweva zarok in.

Her car, wextê ku ew rastî halên dijwar tên, dewsa rêberbûna bi Ruhê Xwedê, ew bi rêya xwe xwe diparêzin. Ew “Her car hîn dibin û tu cara nikarin berbi ulmê rastîyê bên” (2 Tîmotêyo 3:7). Ew nêzîkî ulmê rastîyê nabin, çimkî nadine xebatê.

Heger em dixwezin mezin bibin û bighîjin, wî çaxî em gerekê îzinê bidin, wekî rêya rastîyê nava emirê me da hebe. Bêyî wê yekê tenê qayîlîya bi mejû bes nîne. heger em hîn dibin jî, bêyî gurêkirinê em naghîjin.

## Xweparastin

Xeyîd menîke belavbûyî ye, bo ku bi saya gurênekirinê şexsê xwe biparêzin. Nava cîhê xeyîdê da texmînkirina xweparastina qelp heye. Ew yek te ji dîtina kêmasiyên xeysetê te dûr xweyî dike, çimkî wî çaxî tu merivên başqe gunehkar dikî. Tê tu cara rastî sifetê xweyî rast, halê xweyî negihîştî, yan jî gunehê xwe neyêyî, çimkî tu tenê kêmasîyên wî merivî dibînî, kîjanî tu xeyîdandî. Cêribandina Xwedê, bona pêşxistina xeyset, yê ku bi saya tiştên wî cûreyî pêşda tê, tê teribandinê. Merivê xeyîdî ji koka xeyîdê, destpêka wê direve û bi kutasî dûr dikeve, bi ruhanî dero–der dibe.

Van axirîya jinekê derheqa hevala xweda gilî kir, ya ku ji civînê dûr ketibû û destpê kiribû here civîneke mayîn. Ewê serwêrê nû teglîfî nanxwerinê kiribû. Wextê qisê, serwêr jê pirsî bû, ku bona çi ew ji civîna ewlin dûrketiye. Ewê jinê gilî kiribû, wekî pirsgirêkên wê tevî mezinên civîna berê hebûne. Serwêr guhdar kiribû û paşê cêribandibû ber dilê wê da bê. Bi hesabhildana cêribandina xwe, ez guman im, wekî serwêr gaveke aqil wê avîtî bûya, heger ew bi Gotina Xwedê piştgirîya wê jinê bikira, bona ku ew pirs hel bûna. Heger pêwîst bûya, serwêr gerekê pêşniyar bikira ku ew vegeriye civîna xweye berê û li wir bima, hetanî wî çaxî, hetanî ku Xwedê bi Xwe ew bi aşîtî ji wir aza bikira. Wextê ku Xwedê te bi edilayê aza dike, tu xwe binketî texmîn nakî û li ber merivên mayîn dûrketina xwe afû nakî. Bi dûrketina ji civînê tê mecbûr nîbî, pirsên civîna berê gunehkar bikî, yan jî bi rexnekirin eşkere bikî. Min zanibû, wekî piştî hinek wede ew jina tevî wî serwêrî û mezinên wê wê wî cûreyî bikirana, çawa ku tevî yên pêşda qewimî bû. Wextê ku em xeyîdê dilê xwe da xweyî dikin, em hemû tiştî nava wê ra derbas dikin.

Metelokeke kevinar heye, kîjan anegorî vî halê pêşdahatî ye. Êpêce wext pêşda, wextê ku Rojava teze destpê kiribû bi binelîyên

tezeva bê cîwarkirinê, merivekî aqil li ber bajarekî Rojavayêyî nû, li ser girekî disekine. Wextê ku binelîyên teze tên, wî merivê aqil dibînin. Ew jê dipirsin ku merivên wî bajarî çi cûreyî ne. Merivê serwaxt jî bersivaa wan bi pirsê dide: “Lê merivên wî bajarî çi cûreyî bûn, ji kîderê hûn hatine?”. Çend meriv dibêjin: “Ew bajar, ji kîderê em hatine, bi merivên ji rêya xwe derketî va tijî bû. Li wir buxdan dikirin û heyf ji merivên bêsûc hildidan. Bajar bi diza û merivên qelp va tijî bû”. Paşê ew merivê pêşin ra dibêje: “Ev bajar jî wî cûreyî ye”. Ewana razalixîyê elamî wî dikin, ku ewî ji wê yekê ew xilas kirin, ji nava çi ew teze derketibûn. Ew alîyê çûyîna xwe diguhêrin. Paşê komeke başqe tê û dîsa wê pirsê dide: “Ev bajar çi cûreyî ye?”. Ew meriv jî dîsa wî cûreyî dibêje wan. Ew jî bersivaa wî didin: “Bajarê meyî pêşda baş bû, li wir hevalên meye baş hebûn. Kêmasîya tu tiştî tune bû, çimkî hemû kesî alîk’arîya hevalê xwe dikir. Heger yekî dixwest tiştek bikira, yê mayîn berev dibûn bo ku piştgirîya wî bikin. Dûrketina ji wira gelekî dijwar bû, lê em hatine rojavayê, bi wî meremî bo ku em rê bona nisiletên pêşerojê çê bikin”. Ev meriv jî dibêje wana, wekî ev bajar jî mînanî yê wana ye, û wî çaxî koma meriva bi şabûn dike gazî: “Werin em li vir bijîn”.

Fikir vî cûreyî ye, wekî li cîhê wanî berê heleqetîyên wane tevî cimeta li wir çi cûreyî bûne, li cîhê teze jî wê usa be. Tu çi cûreyî civînekî dihêlî, yan jî ji heleqetîya dûr dikevî, hema bi wê rê jî tu dikevî civîneke mayîn, yan jî nava heleqetîyên nû. Îsa di Yûhenna 20:23 da wa gotîye: “Hûn gunehên kîjana bibaxşînin, ewê buhurtî bin, lê gunehê kê hûn xweyî bikin, ewê veşartî bimînin”.

Wextê ku em xeyîdê hildidin û cîh didine hêrsê, bi wî cûreyî gunehên merivên başqe em xweyî dikin. Heger em ji civînekê bi hêrs dûr dikevin, hema bi wî cûreyî jî em dikevine civîneke mayîn. Heger li vir jî pirsgirêk pêşda tên, em ji bo van heleqetîya jî dûr dikevin. Wî çaxî karê me ne tenê wan xeyîda ra girêdayî ye, yên ku nava heleqetîyên teze da pêşda hatine, lê wan xeyîda ra girêdayî ne, yên ku ji heleqetîyên pêşin tên. Hesabên sosyolocî didine kifşê, wekî 6O–65 selefê jin û mêrên ji hev cihêbûyî piştî zewaca duda careke mayîn cihê dibin. Menî ew e, wekî ew meriv, yên ku cara ewlin ji hev cihê dibin hema ew menî jî wana dibe berbi zewaca cara duem.

Barê nebaxşandinê, kîjanî ew tev xwe cara ewlin dibin, pêşerojê da, wextê zewaca duem, dibe dijwarî. Wextê ku merivên mayîn gunehkar dikin, ew himberî kêmasiyên xwe kor dibin. Çiqas diçe hemû tişt xirab dibe û paşê bona xeyîdê ew dîsa tirs in. Ev prînsîb ne tenê wextê zewacê û ji hev cihêbûnê kar dike. Ew derheqa hemû heleqetiya da ne. Merivekî ku wextêda tevî yekî mayîn qulix kiribû, hat ku nava koma me ya qulixê da bixebite. Ew ji mezinê berê xeyîdî bû, Wede derbas bû û min texmîn kir, wekî Xudan rêberîya min dike ku ez teweqe bikim ku ew bê û tevî me bixebite. Ez bawar bûm, wekî ew nava prosêsa altkirina xeyîdê da bû.

Min gazî mezinê wî yê berê kir û wî ra got, ku bernama min a vî cûreyî heye, ku ez wî bînim nava koma me. Ewî piştgirîya min kir û fikirî, wekî ew fikireke baş e, çimkî zanibû, wekî ezê piştgirîya wan herdua jî bikim. Min herdua ra jî got, wekî ez bona dasekinandina heleqetîya û dermankirinê dua dikim. Wextê ku ew meriv gihîşte koma meye qulixê, carekê ra pirsgirêk pêşda hat. Ez gerekê derbasî ser koka wê pirsgirêkê bûma, bona ku min helkirina wedelû bidîta. Dihate texmînkirinê, wekî ewî merivî nikaribû pirsgirêkên xweye nava heleqetîyên pêşda danîya alîkî mayîn. Ewî hela serbara serda ez gunehkar dikirim ku ez jî wê yekê dikim, çi ku mezinê wî yê berê dikir.

Ez xemgîn bûm, çimkî bona min zêdetir girîng bû, wekî heger ew meriv nava halekî baş da bûya, lê ne çawa qulixçî, ewê bona min çi bikira. Piştî du meha ewî merivî derheqa dûrketina xwe da got. Ewî texmîn dikir, wekî mînanî berê dîsa ketibû telê. Wextê dûrketinê ewî min ra got: “Con, ezê tu cara bona qulixeke mayîn nexebitim”. Min bona wî dua kir û ew çû. Em wî û jina wî hiz dikin. Tiştekî dijwar e, lê ew yek ber çava ye, wekî bona wî navekî qewat hebû, hema nava wê yekê da jî ew dûrket. Wê yekê nedida kifşê, wekî nava govekên mayîn da wê açixîyên wî tune bûna. Piştî dûrketina wî ez xemgîn bûm, bona wê yekê ez sifetê Xudan digeriyam. Min ji Wî pirsî: “Ew çima awqas zû çû?”. Piştî çend hevtiya Xudan hevalekî min da xebatê, bo ku min bersiva vê pirsê bida. Ewî got: “Gelek cara Xwedê îzinê dide, wekî meriv ji wan halên pêşdahatî birevin, kîjana Xwedê dixweze ku rast pê bên, heger ew dilê xwe da qirar dikin ji wê yekê birevin”. Paşê ewî serpêhatîya Îlyas gilî kir, yê ku ji Îzabêlê direviya

(3 Padişatî 18, 19). Îlyas pêxemberên xirab Baal û Aşera kuştibûn. Ewana ew meriv bûn, kîjana rêberîya milet nava kereparêziyê da dikirin û ji sivira Îzabêlê jî dixwerin. Wextê ku Îzabêlê derheqa wê yekê da bihîst, ewê gef xwer ku wê nava 24 seheta da Îlyas bikuje.

Xwedê dixwest ku Îlyas ber xwe bida, lê dewsa wê yekê ew revî. Ewî gumana xwe unda kiribû û dua dikir ku bimire. Îlyas nikaribû ew yek mîyaser bikira, bo çi ew hatibû gazîkirinê. Xwedê milyaketek şande cem wî ku bi du nana wî têr bike û îzin da ku Îlyas 4O rojî û 4O şevî berbi çîyayê Horewê bireve. Wextê ku ew gihîşte li wir, pirsa ewlin, çi ku Xwedê ji wî pirsî, ev bû: “Îlyas, tu li vir çi dikî?”. Dihate texmînkirinê, wekî eva pirseke nefemdarî bû. Xudan bona rêwîtîya wî xwerin dayê, îzin da wî ku ew bigihîje li wir û paşê jî pirsa wî cûreyî bidê. Xwedê zanibû, wekî Îlyas ji halê çetin direvî. Ewî îzina vî hemû tiştî dabû, nenihêrî wê yekê, wekî ji pirsa Xwedê zelal bû ku ew yek bernama (progirama) Wî ya pêşîyê nîbû.

Paşê Xwedê gote Îlyas: “Paşda vegere, bi rêya xwe here Damişqê û wextê bêyî.. kurê Nîmşî Yehû çawa padişê Îsrayêlê dayne û kurê Awêl Meholalî Elîşa dewsa xwe çawa pêxember dayne” (3 Padişatî 19:15, 16). Wextê qulixê Elîşa û Yehû sîstêma padişa ji rêya xwe derketî hate tunekirinê (4 Padişatî 9, 10). Ev kirin borcdarîya Îlyas nîbû, lê ya merivên peyî wî ra bû, bona kîjana Xwedê gotibû Îlyas ku dewsa xwe dayne.

Serwêr min ra got: “Heger me dilê xwe da zirar kiriye ji halên çetin birevin, bi rastî Xwedê me aza berdide, hetanî wî çaxî, hetanî ku wedê xwestina wî bighîje”.

Paşê qewimandinek hate bîra min, ji beşa Jimar 22–a, kîjanêda ev tişt tê şirovekirinê. Balam dixwest nifir li Îsraêlê bikira, çimkî hema xût bona wî heqê mezin hebû. Cara ewlin ewî ji Xudan pirsî, ku ew dikare here, yan na û Xwedê nîşanî wî da, wekî bona Balam xwestina Wî neçûyîn e. Wextê ku serokeşîrên Moav bi gelek pera û qedir papş-da vegeryan, Balam dîsa çû cem Xwedê. Vê carê fikira xwedê piştîî wê yekê hatibû guhartinê, wekî niha jî bona Balam diha gelek pare û qedir hebû. Feqet, vê carê Xwedê got, wekî Balam tevî wan here.

Bona çi Xwedê fikira xwe guhart? Balam awqasî li ser qirara xwe bû, wekî Xwedê îzina wî da ku ew here. Ev bû menî, wekî hêrsa Wî

dijî Balam zêde bû, wextê ku ew çû.

Em dikarin Xudan bi gelek pirsên dora tiştekî aciz bikin, bona kîjanê Ewî êdî xwestina Xwe daye kifşê. Piştî wê yekê, Ew îzina me dide ku em çi dixwezin wê jî bikin, nenihêrî wê yekê, wekî ew yek dijî, miqabilî, progirama wî ye û serbara serda bona kara me nîne.

Gelek cara progirama Xwedê dibe menî, wekî em rû bi rû li ber wan xeyîda û kirina bisekinin, kîjana em naxwezin bibînin. Bi wê yekê em direvin, wextê ku em helkirina pirsên xeyîdê înkar dikin, em bi wê yekê ji pirsgirêkê aza nabin. Ew tenê rihetîya wedelû ye, lê wî çaxî koka pirsgirêkê bê zyan dimîne.

Min derheqa xeyîda û heleqetiyada dersek xwend. Ew yek tiştê bûyînê nîne ku heleqetîyên saxlem tevî wî merivî îzbat bikî, yê ku ji heleqetîkî dûr ketîye û xeydîye. Wî çaxî gerekê wê yekê qenc bikî. Nenihêrî wê yekê, wekî ewî cahilî digote min ku ewî baxşandiye mezinê xweyî berê, lê ewî tu tişt bîr nekiribû.

Hizkirin şaşîya bîr dike û bona pêşerojê guman dimîne. Heger me bi rastî xeyîd alt kiriye, wî çaxî bicêribînin edilayê bigerin. Diqewime wedê rast nîbe, lê dilê xwe da em dikarin bona dasekinandinê xebatê bikin.

Paşê hevalekî min gote min: “Nava metelokeke kevinar da tê gotinê, wekî heger kûçikek carekê nava ava kelda hatîye kelandinê, ewê ji ava sar bitirse”. Çiqas meriv roja îroyîn ji ava sar ditirsin, kîjan paqijîyê pêşda tîne?”. Ew jî bi wê menîyê, wekî wedekî ew nava ava kel da şewitîne û wê yekê bîr nakin.

Îsa dixweze birînên me bide qenckirinê, lê em gelek cara îzinê nadine Wî, ku Ew me qenc bike, çimkî qebûlkirina qencbûnê rêya here hêsa nîne. Rêya xwepêşkêşkirinê û gurêdamayînê berbi qencbûnê û gihîştina ruhanî rêberîyê dike. Ew qirar qencbûnê tîne, wextê ku bona te başbûna yekî mayîn diha grîng e, ne ku ya te, nenihêrî wê yekê, wekî ewî merivî xirabî li te kirîye.

Merivê kubar nikare bi vê rêyê rêwîtîyê bike. Ev rê tenê bona wan meriva ye, yên ku berbi rîska înkarbûnê diçin, edilayê dixwezin. Eva rêyeke usa ye, kîjan berbi gurêkirinê rêberîyê dike. Eva ew rê ye, ya ku rêberîya berbi jîyanê dike.

## Çİ KU EM NAVA HAZİRÎYA XWEDÊ DA FÊR DİBİN, EM NİKARİN NAVA HAZİÎYA MÊRİV DA FÊR BİBİN.

“Min kitêba “Tela Şeytan” xwendiye. Fikira min ya derheqa Gotina Xwedê da bi temamî hate guhartinê. Ez nava halekî gelekî dijwar da bûm û heger berbirîbûna vê kitêbê nîbûya, ez dikaribûm nava tela heta–hetayê da bimama”.

– F. N. MALAZÎYA

# 7

# HÎMÊ QEWÎN

***"Bi vî cûreyî Xudan dibêje: "Awa Ez im, Yê ku li Sîyonê kevirê hîm danîye, hîmê qewîn: kî ku bawarîya xwe li Wî bîne, ewê nereve".***

**– ÎŞAYA 28:16**

Kî ku bawar bike wê nereve, kî ku direve, merivê îzbatbûyî nîne, çimkî kirinên wî nehatine hîmdanînê. Merivên wî cûreyî rih'et, ji bagera cêribandina û halê dijwar dişimite û ji yên mayîn cuda dibe. Were em binhêrin ku çi li Petrûs qewimî.

Îsa çûbû alîyê qeysirîya Fîlîposê û Ewî ji şagirtên Xwe pirsî: "Li gor gotina xelqê Kurê mêriv kî ye?" (Metta 16:13).

Çend şagirta bi beşera xweş ew fikira cimetê gotin ku Îsa kî bû. Îsa hîvîyê sekinî, hetanî ku wana xeberdana xwe xilas kir, paşê ewî li wana

nihêrî û pirsî: “Lê hûn çi dibêjin? Bi ya we ez kî me?” (Metta 16:15).

Ez li ser wê fikirê me, wekî wextê ku şagirt derheqa wê yekê da difikirîn, û li ser sifetê geleka tevlîhevbûn û tirs hebû. Devên wan nîvvekirî mabûn. Ewên ku bi aktîvî fikirên merivên mayîn elam dikirin, nişkêva xwe ker kirin, çimkî diqewime wana ew pirs tu cara nedabûne xwe. Çi jî hebe, wana wî çaxî fem kir, wekî bersiva wan tune. Îsa nava kirina Xwe da hertim rast bû. Ewî tenê bi pirsekê halê dilê şagirta da kifşê, bi wê yekê da eşkerekirinê, ku ew bêyî zanebûn çi dikirin. Ew diha gelekî bi fikirên merivên başqe bûn, lê ne bi fikira xwe zanibûn ku Îsa kî ye. Ew bi şexsê xwe ra hesab rûnedinîştin.

Şimhûn, navê kîjanî Îsa danî Petrûs, ji nava şagirta yê tek– tenê bû, ku karibû bersivaa xwe bide. Ewî nişkêva bi dengê bilind got: “Tu yî Mesîh–Kurê Xwedêyî sax” (Metta 16:16).

Paşê Îsa bersiva wî da: “Xwezîya min te, Şimhûn–kurê Ûnis, çimkî bedenê û xwînê elamî te nekirin, lê Bavê Min li ezmana ye (Metta 16:17).

Îsa derheqa koka vê yekê da Petrûs ra şirove kir. Şimhûn, Petrûs ev ulm ji guhdarkirina fikirên xelqê nestend, yan jî hînbûna xwe, lê Xwedê ew yek elamî wî kir.

Şimhûn, Pêtrûs gelekî dixwest tiştên Xwedê hîn bibe, pirsên here gelek ewî didan. Ew Petrûs bû, yê ku li ser avê ra gerîya, lê 11 şagirtên mayîn wî çaxî temaşe dikirin. Ew merivekî usa bû, yê ku li ser fikira yekî mayîn nedihate hîmdanînê. Petrûs dixwest wan xebera hema ji devê Xwedê bibhê. Ew yek pêşkêşek bû, kîjanê dilê wî da ronahî da. Geleka ew yek dîtibû û şedetî dabû, çi ku Şimhûn–Petrûs dît û şedetî da, lê bona naskirina Xwedê dilê wan usa nîbû, çiqas dilê Petrûs. Li ser kaxeza Yûhenna ya ewlin 2. 27–a da tê gotinê: “Çi ku we ji Wî qebûl kir, dilê we da dijî û we ra nelazim e, ku yekî mayîn we hîn bike, çawa ku ew yek we bona hemû tiştî hîn dike, rast e, û derew jî nîne û ewî çawa ku hûn kirin, nava wê yekê da bimînin”.

Hema wê yekê Şimhûn–Petrûs hîn kiribû. Ewî hemû kes hîn kirin û paşê di nava xwe da gotina Xwedê nihêrî. Heger tu wî cûreyî ji Xwedê ulm bistînî, tu kes nikare te ji ser rêya te der bixe. He-

ger Xwedê tiştekî diêbje te, êdî kemala wê yekê tune, ku temamîya dinîyayê wê te ra çi bêje. Ew nikarin dilê te biguhêrin.

Paşê Îsa gote Şimhûn–Petrûs û şagirtên mayîn: “Hema li ser wî hîmî (ulmê ku Xwedê eşkere kirîye) ezê civîna Xwe çê bikim û dergehên cehnemê wê wî alt nekin (Metta 16:18). Em zelal dibînin, wekî nava Gotina Xwedê da hîmekî qewîn heye. Hema rûyê wî hîmî da bû, ku Petrûs fem kiribû, wekî Îsa Kurê Xwedê bû.

## Gotina ku ronahî dike

Ez gelek cara dibêjime civîna û şexsa, wekî wextê ku ez xeber didim, bi saya dengê min, dengê Xwedê guhdar bikin. Gelek cara bona dîyarkirina tişta em awqasî mijûl in, wekî tenê gotina dinivîsin. Ev yek jî berbi nivîsarên Pîroz dibe, wextê kîjanê zanebûn cîhê sereke digre. Wextê ku ulmê me heye, kîjan yê sereke ye, du tişt dikarin biqewimin.

1. Em bi hêsanî himberî teribandinê û texmînkirinên nazik dibin.
2. Em bi femdarîya xwe tên sînorkirinê, feqet hîmê qewîn eva nîne, li ser kîjanî Îsa civîna Xwe çê dike. Ewî got, wekî civînê li ser Xebera pêşdahatî bê hîmdanînê, lê ne ku li ser hejmarên ezberîkirî.

Wextê ku em gotina qulixçîyê duakirî dibhên, yan jî wextê ku kitêbekê dixwînin, gerekê himberî wan gotina guhdar bin, yên ku ruhên meda “diteqin”. Eva hema Gotina Xwedê ye. Ew derbasî femdarîya ruhanî û ronahî dibe. Çawa ku gotibêjê zebûran dibêje: “Heyîna gotinên te ronahê û serwaxtiyê dide dilsaxa” (Zebûr 119:13O). Wextê ku Gotin dikeve dilê me, lê ne ku fikira me, hemû tişt ronahî û femdarî dibe.

Gelek cara qulixçî dikare ji têmakê xeber bide, lê wî çaxî Xwedê dikare tiştekî mayîn dilê min da ronahî bike. Ji alîkî mayînva jî Xwedê dikare gotinên wî qulixçîyî mesh bike û ew dikarin dilê minda biteqin. Bi gilîkî mayîn, ew yek bona min Gotina Xwedê ya eşkerekirî ye. Hema ev e, ku me diguhêre, ji dilsaxîyê dike aqilmend. Dilê

me da ev Gotina ku ronahiyê dide ew hîm e, bona kîjanî Îsa xeberda û li ser kîjanî Ewê civînaa Xwe çê bike. Îsa xebera ji Xwedê hatî himberî hîm kir. Hîm sembola qewînbûnê ye. Em meteloka herdu mala bîr bînin, ji kîjana yek li ser zinar hate çêkirinê, lê ya mayîn li ser qûmê. Wextê ku lihevnehatin– cêribandin, zêrandin û bager pêşda hatin, ew mala ku li ser qûmê hatibû çêkirinê xirab bû, lê ya li ser zinar çêkirî sekinî ma. Tiştên usa hene ku em hewce ne ji Xwedê guhdar bikin, lê em nikarin wana Kitêba Pîroz da bibînin. Mînak: "Em gerekê kê bistînin? (zewac)", "Em gerekê li kîderê bixebitin?", "Em gerekê li kîjan civînê da bin?". Ev navnîş dikare dirêj bê berdewamkirinê. Nava qirarên wî cûreyî da em gerekê guhdarîya Gotina Xwedê bikin. Bêyî vê yekê qirarên me wê li ser qûmê bêne hîmdanînê.

Ew tişt, çi ku Xwedê bi Ruhê Xweva eşkere dike, ji me nayê hildanê. Ev gerekê bibe hîmê wan hemû tişta, çi ku em dikin. Bêyî hîmê wî cûreyî emê rihet ji cêribandina bixeyîdin, yên ku nişkêva êrîşê tînin li ser me.

Em carekê jî bîr bînin, ku Îsa bona wê Gotinê çi got, ya ku bi şabûn tê qebûlkirinê, lê koka xwe nake dilê me, ew bi şabûn ji alîyê fikir û texmînkirinên me da tê qebûlkirinê.

> "Ewên ku gotinê guhdar dikin, carekêra bi şabûn qebûl dikin, koka wê yekê dilê wan da tune û ew yek wedelû ye. Paşê, wextê ku tengavî bona wê gotinê pêşda tê, ew zû dixeyîdin".
>
> – MARQOS 4:16,17

Em bi hêsanî dikarin dewsa xebera "kok" xebera "hîm" daynin, çimkî ev her du xeber jî qewînbûna darekê, yan avayhîkî didine kifşê. Heger meriv li ser Gotina ji Xwedê hatî îzbat nebûye, yan jî nehatîye hîmdanînê, wî çaxî ew dibe kandîdatekî baş bona cîhleqandina ji bagera xeyîdê. Gelo çiqas meriv mînanî wan şagirta nin, rastî kîjana Îsa hat. Ew meriv li ser gotinên merivên mayîn tên hîmdanînê, fikirên merivên başqe qebûl dikin çawa rastî, bêyî gera şêwira Ruh û şedetîyê. Em tenê dikarin bi wê yekêva bijîn çi ku

Xwedê daye. Hema li ser vê jî Îsa civîna Xwe çê dike.

Çend sal pêşda xebatkareke min ya nemêrkirî hebû, ya ku rastî xebatkarekî civînêyî cahil dihat. Roj bi roj ew diha gelekî nêzîkî hev dibûn. Zelal dihate kifşê, wekî heleqetîyên wan wê bi kutasî bi zewacêva ser hevda bihatana. Wana ew pirs êdî gotûbêj kiribû.

Êvareke yekşemê serwêrê mezin gazî wan kir û gote wan: “Xudan wa dibêje–hûn gerekê bizewicin”.

Rojtira mayîn keçik medekirî kete ofîsê. Ew gelekî xemgîn bû û ji min pirsî ku ezê bixwezim heytehola zewaca wan bidime derbaskirinê. Min gotê, wekî ew yek wê bona min qedir be. Bona şêwirdayînê min rasthatin kifş kir.

Feqet ez nerihet bûm. Wextê ku ew ketine ofîsê, ruhê min nava nerhetîyê da bû. Min li xebatkara xwe nihêrî û jê pirsî ku gelo ew li ser wê fikirê ye, ku ew dixweze wî xortê cahil bistîne, kîjan Xwedê bona wê bijartibû. Ewê bi şabûn qayîlîya xwe da.

Paşê min li xortê cahil nihêrî û jê pirsî: “Tu bawarî, wekî zewaca teye tevî wê keçikê bona te hema xwestina Xwedê ye?”.

Xort bi devê nîvvekibrî li min nihêrî, paşê serê xwe berjêr kir û bi dengê lerizî got: “Na, ez li ser xwe guman nînim”. Min li her du cahila nihêrî û paşê xort ra xeberda: “Ezê we nezewicînim, bona min hewaskar nîne ku kê çi gotîye, yan çi kirîye. Ez dixwezim bizanibim, ku çend meriva gotîye, wekî hûn gerekê bizewicin. Heger Xwedê dilê we da xwestina Xwe negotîye, karê we wê zewacê neketîye”.

Min gotina xwe berdewam kir û gote xort: “Heger tu bêyî gotina Xwedê dizewicî, wextê ku bager bên, lê ewê ese bên, li cem te pirsê pêşda bê: “Wê çawa bûya, heger min qîzeke başqe bistenda?”, “Ev problêm wê hebûna?”, “Ez gerekê li ser xwe guman bûma, ku gelo zewaca min a tevî wê keçikê xwestina Xwedê bû?”, “Ez telê da bûm”... Paşê dilê te wê usa be û tê nikaribî dijî wan pirsgirêka şer bikî, kîjanê zewaca te bixin. Tê bibî merivekî ne îzbatbûyî”.

Min ew aza berdan û gote wan ku rasthatina tevî min a careke mayîn bêfikir e. Xortê cahil sivik bû, keçik jî zendegirtî mabû. Hevtîya mayîn li ofîsa me atmosifêreke gelekî xirab pêşda hatibû,

lê min zanibû, wekî ez rastiyê dibêjim. Bona wê keçikê wedê cêrbandinê bû. Heger bi rastî Xwedê gotibû wê, wekî ew meriv gerekê bibe mêrê wê, ewê aminaya xwe li Xudan bianîya, wekî Ew xwestina elamî wî cahilî bike û ewê ji min jî aza bûya, usa jî ji xeyîda ji Xwedê. Min gote wê keçikê, wekî ew ji wî xortî dûr bimîne û îzinê bidê, ku ew oda xwe da başqe be û xwestina Xwedê guhdar bike. Keçikê usa jî kir.

Sê sal derbas bûn. Rojekê jî ew hatin û bona rasthatineke mayîn tewaqe kirin. Ez carekê ra şa bûm. Vê carê, wextê ku hatine ofîsê çavên xort dibriqîn û ewî min ra got: "Ez bêyî şikberî zanim, wekî eva ew keçik e, kîjanê Xwedê dixeweze ku ez bistînim". Hevt meha şûnda ew zewicîn.

Wextê ku tu zanî, wekî Xwedê te daniye nava heleqetîkî, yan jî nava civînekê, wî çaxî dijmin ra wê dijwar be, ku te ji wê derê der bixe. Heger tu li ser gotina Xwedê têyî hîmdanînê, tê nava her dijwarya da bixebitî.

## Rêyeke başqe tune

Pênc salên zewaca me bona jina min û min gelekî dijwar bûn. Me gelek cara hev dida xeyîdandinê û dihate texmînkirinê ku rêke başqe tune, ku em heleqetîyên xwe bînine ser dereca berê.

Tenê tiştek em xweyî dikirin: me herdua jî zanibû, wekî Xwedê zewaca me îzbat kiribû, bo wê yekê jî cihêbûna ji hev bijartina me nîbû. Bijartina me ya tek– tenê bawarkirin bû, wekî Ewê qenc bike û me biguhêre. Em herdu jî ketibûne nava vê şuxulkariyê û bona me firqî tune bû, ku ew yek wê çiqasîva dijwar bûya.

Wextê ku ez diketime nava fikirên paşdavekişandinê, ew sozdayîn dihatine bîra min, kîjan Xwedê derheqa zewaca meda dabûn. Ez hazir nedibûm çi ku Xwedê progiram kiribû bidime teribandinê.

Sozdayîneke Xwedê ku dabû me ew bû, wekî min û jina min, me gerekê tevayî qulix bikira. Wî çaxî, wextê ku Xwedê ev yek da, ez difikirîm: "Zelal tê kifşê. Destê Wî bona qulixê li ser me herdua ye".

Nava bagerên zewaca me da min êdî ew sozdayîn nedidît, lê min îzin nedida, wekî ew ji ber çavê min dûr bikeve. Rûyê kubarîyê û şerkarîya nava zewacê da gumana rast dûr ketibû. Feqet nava dilê min da hela hê tiştekî mezin mabû. Ew sozdayîn hîmek bû û ez wî çaxî hewcê Wî bûm.

Hemû tişt hate guhartinê û Xwedê ne tenê heleqetîyên me dane qenckirinê, lê ew hê qewîn kirin. Ji pevçûyîna em mezin bûn, me baxşande hev û me ji wê yekê ders hilda. Niha em tevayî qulix dikin. Ez jina xwe ne tenê çawa hevala xweye here hizkirî hesab dikim, lê usa jî çawa qulixçîya here hizkirî û ez diha gelekî cabdarîyê diatînim li ser wê. Ez bawarîya xwe diha gelekî li wê tînim, lê ne ku merivên mayîn.

Piştî dijwaryên pênc sala, min fem kir, wekî Xwedê kêmasîyên nava jîyana me û heleqetîyên me da dîtibûn û Ewî ew anîbûne nava ronahiyê.

Bona zewaca min ez aqilmendîyê digeryam. Pêşîya rasthatina tevî Lîzaê, min bona wê jinê dua dikir, ya ku gerekê min bistenda. Piştî qebûlkirina Mizgînîyê, nava emirê min da ew bijartin ya duem bû. Min bona hevala xwe dua kiribû û min bijartina Xwedê stendibû. Bona wê yekê jî ez difikirîm, wekî ezê mînanî merivên başqe rastî diwariya neyêm, lê ez şaş bûm.

Xwedê bona min jinek hilbijart, ya ku bi xwestina dilê min bû, lê jina min jî ew xwehizî da eşkerekirinê, ya ku dilê min da veşartî bû. Heger min cihêbûn bilbijarta, yan jî jina xwe gunehkar bikira, ku ji wê pevçûyînê birevyama, bi wê yekê minê tenê negihîştina xwe bin perda parastinêye feş da veşarta, navê kîjanê xeyîd e. Gotina Xwedê ya bona zewacê ez ji paşdavekişandinê dûr xistim. Li vir ez gerekê bighîjime para vê beşêye sereke. Ji we kî ku vê yekê dixwîne, diqewime bifikire, ku ew wextê ku zewicîne xilasbûyî nîbûne.

Bona me jî Xwedê dibêje: *"Ez nabêjime merivên zewicî, lê Xudan dibêje ku jin ji mêrê xwe neqetin. Heger cihê bibe jî, gerekê yan mêr neke, yan jî mêrê xwe ra li hev bê û mêr jî jinê nehêle... Bila her kes li ber Xwedê nava wê yekê da bimîne" (1 Korintî. 7:1O,11,24).*

Bila ev gotina Xwedê dilê te da cîhê koka xwe bigire, bona ku tu rûyê îzbatîya xwe da ji tela xeyîdê dudilî nebî.

Ji we gelek, usa jî çawa bawermend, usa nîbûye ku bêyî xwestina Xwedê bizewicin. Bona ku bikevine nava duakirina Xwedê, ya bona zewacê, gerekê bona wê yekê tobe bikî, ku hetanî zewacê tu şêwira Wî negeryayî û Ewê te bibaxşîne. Vê yekê dilê xwe da îzbat bike, wekî ji du şaşîya rastîk pêşda nayê. Ji hev cihêbûna mêr û jinaye rûyê xeyîdê da helkirina pirsê nîne. Bona helkirina pirsên nava heleqetîyên zewacê da tu gerekê Xudan nava Gotina Wî da bigerî.

## Zinarê zexm

Gotina Xwedê zinarekî zexm e, bi kîjanî em emir û qulixa xwe çê dikin. Gelek meriva derheqa gelek civîna û komên qulixê da min ra gilî kirine, endamên kîjana bi wedê kurtva li wir mane. Ew dibêjin ku çiqas tiştên şaş hene, yan jî bi çiqasîva xirab nêzîkî wan bûne. Ew nava qirarên xwe da xwe heq derdixin. Feqet nava hîmê vî hemû tiştî da perdeke şaşîyêye mayîn heye, ya ku wana xweyî dike ku ew kêmasîyên xeysetê xwe û xeyîdê negerin û nebînin.

Ew dibêjin, wekî heleqetîyên wane tevî qulixçîya û civîna niha "wedelû ne", yan jî "Eva ew cîh ye, kîjan Xwedê bona min daye dîyarkirinê". Min usa jî bihîst, ku çawa merivek dibêje: "Ez niha li vê civînê wedelû me". Ewana van elametîya bona wê yekê dikin, wekî wextê ku dijwarî hebin, rêya wane revê hebe. Bona sekinandina li cîhê teze hîmê wan tune. Bager dikarin wana bi hêsanî bibine berbi îskeleke behrêye mayîn.

## Em dikarin herine kîderê?

Bi paşdahatina li ser wê meselê, li kîderê Îsa ji şagirtên xwe dipirsî, ku meriv derheqa Wî da çi dibêjin, em wê qewînbûnê dibînin, ya ku wî çaxî pêşda tê, wextê ku tu xwestina Xwedê ya eşkerekirî dibînî. Niha Şimhûn–Petrûs binihêre.

Piştî wê yekê, wextê ku Petrûs got ku Bavê çi elamî dilê wî kiribû, Îsa got: “Ez jî dibêjime te, ku tu yî Petrûs û li ser wî hîmî ezê civîna Xwe çê bikim û dergehên cehnemê wê wî alt nekin” (Metta 16:18).

Îsa navê Şimhûn guharte Petrûs. Eva tiştekî grîng e, çimkî navê “Şimhûn” bi fikira “guhdarkirin” e. Navê “Petrûs” nava zimanê yûnanî da “petros” bi fikira “kevir” e. Dilê xwe da ewî Gotina Xwedê ya eşkerekirî bihîst û Şimhûn bû mînanî “kevirekî”. Mala ku bi kevir li ser hîmê zinarê zexm tê çêkirinê li ber bagera ber xwe dide.

Vê hejmarê da xebera “zinar” ji xebera yûnanî ye “petra” pêşda tê, fikira kîjanê “zinarê mezin e”. Îsa digote Şimhûn– Petrûs, wekî ew hîmekî qewîn e, li ser kîjanî jî gerekê mal bê hîmdanînê.

Diha dereng ew li ser kaxeza Petrûs a ewlin ya 2:5 da dinivîse: “Hûn jî mînanî kevirên sax çawa civînên ruhanî werine çêkirinê”. Kevir parçekî zinar e. Qewînbûn û qewat bi gotina Xwedê nava zinarda nin û ew meriv, yê ku qebûl dike, wê nava emirê xwe da rez bistîne. Ew meriv bi qewata Îsa Mesîh qewat dibe.

Çawa ku Pawlos kaxeza 1 Korintî 3:11 da dinivîse: “Çimkî tu kes hîmekî diha qewîn nikare dayne, çimkî ew êdî danî ye û ew Îsa Mesîh e”. Wextê ku em Wî digerin, yê ku Gotina Xwedê ya sax e, Ewê li ber me be û emê jî îzbat bin.

Di Yûhena 5:16 da, em dibînin, wekî rojên dawîyê, yên emirê Îsa yê li ser topa dinîyayê, bona koma Wî ya qulixê diha gelekî dijwar bû. Pêşîkêşên ruhanî û cihû Îsa dizêrandin û dixwestin Wî bikujin. Wextê ku meriva kirinên Îsa dîtin, wana dixwest Ew bi mecbûrî bibira û bikira padişa. Feqet Îsa careke mayîn “tenê çû li çîyê” (Yûhenna 6:15–a binhêrin).

Bona şagirta ew gava Wî femdarî nîbû: “Bona çi Ewî usa kir? Eva mecala çawa bona Îsa, usa jî bona me bû”. Ew xemgîn dibûn, bager zêde dibûn.

> “Te mala xwe, xebata xwe hiştîye û em peyî vî merivî diçin. Gumana me bona gelek tiştî heye. Em bawar in, wekî Ew e ew Yek, Yê ku gerekê bê. Xêncî vê yekê Yûhenayê Îmadvan jî ev yek elam kir û me guhdar kir ku

> Şimhûn Petrûs li Qeyserîyê çi got. Ew herdu şede bûn. Feqet bona çi Ew hêrsa pêşîkêşa ra dike? Bona çi Ew mexberê Xwe dikole? Bona çi Ewî elametiya wî cûreyîye berk bona me kir, ku got: "Bêbawarno, hetanî kengê ez gerekê tevî we bim?".

Xeyîd nava van meriva da destpê dikir bilind bibe. Wana hemû tişt hiştibûn, bo ku peyî Îsa herin.

Paşê tiştê sereke qewimî. Îsa tiştek got, kîjan bona wan çawa tiştekî sar hate texmînkirinê: "Ez rast dibêjime we, heger hûn bedena Kurê mêriv nexun û xwîna Wî venexun, emirê we wê tune be" (Yûhenna 6:54).

"Niha Ew çi dibêje, ewana ji hev dipirsîn, eva êdî gelek bû". Îsa ev tişt usa jî li cîhê civînaye li Kefernahûmê, li ber rêbera got. Bona şagirta eva "barekî giran bû".

> "Û ji şagirtên Wî geleka guhdar kirin, gotin: "Ew tişt gelekî berk e, kî dikare wê yekê guhdar bike?""
>
> – YÛHENNA 6:61

Guhdarîyê bide ser bersiva Îsa:

> "Wextê ku Îsa pê hesîya, ku şexsê Wî da, ku şagirtên Wî bona wê yekê çi dibêjin, gote wan: "Ew yek we dide xeydandinê?"
>
> – YÛHENNA 6:62

Evana şagirtên Îsa bûn. Îsa rastîyê danayne alîkî, lê li ber van meriva ber xwe dide. Ewî zanibû, wekî hinek li ser hîmê şaş dijîn. Îsa ew hîm eşkere kir û mecal da wan, ku ew dilên xwe bibînin. Feqet ew mînanî Şimhûn Petrûs, yan jî şagirtên mayîn nîbûn, yên ku dixwestin rastî bizanibûna. Dîna xwe bide bersiva wan.

> "Peyî vê yekê ra ji şagirtên Wî gelek paşda çûn û Wî ra nedigeriyan".
>
> – YÛHENNA 6:67

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî ew çend meriv nîbûn, lê "gelek" bûn. Ji wana gelek hema ew meriv bûn, yên ku pêşda li Qeyserîya Fîlîpos gotibûn: "Hinek dibêjin Yehyayê Îmadkar e, hinekên din dibêjin Elyas e, lê hinekên din jî dibêjin Yêremya ye, yan jî yek ji pêxemberên berê ye" (Metta 16:14). Ew li ser hîmê Gotina Xwedêye eşkerekirî nehatibûne hîmdanînê.

Xeyîd gîhande wê xalê, li kîderê gelek merivên ku peyî Îsa diçûn ew yek kirin, çi ku roja îroyîn gelek mesîhî wê yekê dikin. Ew ji Wî dûr ketin. Ew difikirîn ku ew xapandine û xirab nêzîkî wan bûne, lê ew yek usa nîbû. Ew şagirt rastî nedidîtin, çimkî çavên wan li ser xwestinên wane xwehizîyê bûn.

Niha binhêre ku çi li Şimhûn Petrûs qewimî, wextê ku Îsa gote şagirtên xwe:

> "Îsa jî gote wan 12 şagirta: "Gelo hûn jî dixwezin herin?", Şimhûn Petrûs jî bersiva Wî da: "Xudan, em herine cem kê, xeberên Te yên emirê heta–hetayê ne. Û me bawar kir û nas kir, ku Tu yî Mesîh–Kurê Xwedê yî sax"".
>
> – YÛHENNA 6:68–70

Îsa tewaqeyî li wan meriva nekir ku bêje wan: "Tewaqe dikim, dûr nekevin. Min hema hêja gelek şagirtên Xwe unda kirin. Ezê bêyî we çi bikim? Na xêr, ewî gote wan: "Hûn jî dixwezin dûrkevin?".

Ghdar be, ku Şimhûn–Petrûs çi bersiv da, nenihêrî wê yekê, wekî ew jî di dilê xweda tevî xeyîdê şer dikir. Ewî got: "Xudan ez herime cem kê?".

Çi ku ewî bihîst gerekê Petrûs bikira nava şaşîyê, lê dilê wî da tiştek hebû, ku li cem yên mayîn tune bû. Li Qeyserîya Fîlîpos li cem Petrûs zelalîk pêşda hat ku bi rastî kî bû Îsa (Metta 16:16).

Û nava vê cêribandinê da Petrûs ew yek got, çi ku dilê wî da bû: "Me bawar kir û nas kir, ku Tu yî Mesîh– Kurê Xwedê yî sax". Evana gotinên rast bûn, k'îjan ji wî derketin. Petrûs kevirek bû, yê ku li ser zinarê îzbatbûyî, yê bi gotina Xwedêye sax hatibû danînê. Ewê bi xeyîd dûrneketa.

## Bersiva bin hukum da

Ez gelek cara dibêjim, wekî kontrolkirin cîhê mêriv didine qirarkirinê. Bi gilîkî mayîn gotî, ew qirar dikin, ku alîyê ruhanî da tu kuda diçî. Ew halê dilê te didine eşkerekirinê. Bersiva bin hukum da wê bide kifşê ku bi çiqasîva cabdayîna te bi rastî ye.

Tu dikarî bibî xweyê malekê, ya ku li ser qûmê hatiye çêkirinê, lê ew pêncqatî ye, bedew e û bi hostatî hatiye çêkirinê. Hetanî ku ro derketî be û wextê ku ro dibriqe, mala te mînanî kela qewatê û bedewetiyê ye.

Li rex da tu dikarî maleke yekqatî ya zelal bibînî. Ew mal li rex mala te ya bedew nayê kifşê. Lê ew li ser zinarekî usa hatiye çêkirinê ku tu nikarî bibînî.

Wextê ku hela hê bager tune, mala pêncqatê gelekî bedew e. Lê wextê ku nişkêva bager ra dibe, ew hildiweşe û wêran dibe. Ew mala dikare ji bayê nerm xwe xweyî bike, lê ne ku ji bagerê. Feqet mala yekqatî tê xweyîkirinê. Bi çiqasîva mal fireh e, bi aqasîva giran e û wêranbûna wê kifşe.

Li civînê hinek meriv mînanî wan şagirta ne, yên ku nava xeberdana xwe da lez bûn, lê paşê hatine eşkerekirinê. Ew dikaribûn bibûna mînanî mesîhîyên “pêncqatî”: qewat, qewîn û bedew bihatana kifşê. Ew dikarin tenê wextê bayên nerm xwe xweyî bikin.

Li ser xwe guman be, wekî tu gerekê emirê xwe li ser Gotina Xwedê ya eşkerekirî çê bikî, lê ne ku li ser wê yekê, çi ku merivên başqe dibêjin. Guhdarîya dilê xwe bike û Xudan bigere. Tiştên usa neke, yan jî nebêje, kîjan hemû dibêjin. Wî bigere û li ser gotina ku dilê te ronahî dike, bisekine.

# WEXTÊ KU DİJMİN Jİ CİHÊ XWE DİLEQE, EW YEK BONA TUNEKİRİNÊ YE, LÊ WÎ ÇAXÎ MEREMÊ XWEDÊ TİŞTEKÎ MAYÎN E.

“Ez ji Xwedê razî me, bona berbirîbûna bi navê “Tela Şeytan”. Bona ku nava emirê min da terş hebe, min rojî girtiye û dua kiriye. Xudan bi Xwe rêberîya min berbi vê berbirîbûnê kir û bi temamî emirê min guhart. Vê kitêbê mezin gerekê ese bixwînin”.

– K. P. ZÊLANDÎYA

# 8

# HEMÛ TİŞT, Çİ KU DİKARE Jİ CÎHEKÎ BİLEQE, WÊ BİLEQE

***"... Û niha soz daye û dibêje, ku careke mayîn ezê ji cîh bileqim, ne tenê dinîya, lê ezman jî. Lê careke mayîn dide kifşê, wekî tiştê ku dihejin, çawa tiştên bûyî, gerekê bêne guhartinê, wekî yên ji cîh dileqin, îzbat bibin".***

**– ÎBRANÎ 12:26,27**

Beşa pêşîyê da me dît, wekî Gotina ji Xwedê hatî ew hîm e, li ser kîjanî Îsa civîna xwe çê dike. Me dît, wekî Şimhûn–Petrûs wî çaxî jî sekinî ma, wextê ku şagirtên xeyîdî dûrketin. Hema wî çaxî jî, wextê ku Îsa mecal da wî, ku ew jî dûrbikeve, Şimhûn Petrûs ew got, çi ku dilê wî da îzbatbûyî bû.

Niha were em derbasî li ser cêribandineke mayîn bibin, ya ku nava emirê Şimhûn–Petrûs da qewimîye. Ewa ew şev bû, wextê ku himberî Îsa xayîntî hate kirinê.

Wextê ku Îsa tevî 12 şagirtên Xwe şikirî elam dikir, sivira Xudan amede dikir, tiştekî ecêbmayînê elam kir: “Destê, ku xayîntîyê himberî Min dike, niha tevî Min li ser vê sivirê ye. Û Kurê mêriv diçe, çawa ku hatîye gotinê, lê ne xwezî li wî merivî, bi destê kîjanî wê himberî wî xayîntî bê kirinê” (Lûqa 22:21, 22). Gelo elametîke çawa ewî kir! Bi xeberên îroyîn em dikarin bêjin, wekî Îsa bi van gotina “bomb avît”.

Nenihêrî wê yekê, wekî Îsa pêşda jî zanibû, wekî wê himberî Wî xayîntîyê bikin, lê şagirtên Wî yên ewlin bûn, kîjana ev yek bihîstin. Tu dikarî wê yekê bînî ber çavê xwe, ku odê da atmosifêreke çawa pêşda hat, wextê ku Îsa got, wekî ji wana yek, yê ku ji destpêkê da tevî Wî bû û hevalê nêzîk bû, amede dibû xayîntîyê himberî Wî bike.

Bersiva vî cûreyî hate dayînê: “Û wana destpêkir nav hev da ji hev bipirsin, ku ji wana kî ye ew meriv, yê ku wê ewê yekê bike” (Lûqa 22:23). Ew zendegirtî man, wextê ku bihîstin, ku ji wana yek dikare wê yekê bike. Wextê lêpirsîna şagirta menîya wan paqij nîbû. Em vê yekê piştî qisê pê dihesin. Hîmê lêpirsîna wan, ya xwehizîyê bû û bi kubarîyêva tijî bû. Guhdarîyê bide ser gotina Kitêba Pîroz a bi sirê:

> “Di navbera wan da tevhevbûnek jî çê bû, ku ji wana kî gerekê çawa mezin bê hesabê”.
>
> – LÛQA 22:24

Bicêribîne wî halî bîne ber çavê xwe. Îsa gote wan, wekî zûtirekê himberî Wî xayîntî wê bê kirinê û wê Wî teslîmî remilwana bike, ku cezayê mirinê bidine Wî û teslîmî romanîyan bikin, ku qerfa wî bikin, bizêrînin û bikujin. Ewê ku gerekê ew yek bikira, tevî Wî dora vê sivirê rûniştî bû.

Şagirta ji hev dipirsî, ku kî ye ew meriv û ew prosês bi tevhevbûnekê ser hev da hat, wextê kuîjanê gotûbêj dikirin, ku ji wana kî gerekê yê herîî mezin bihata hesabê. Eva nêzîkbûneke ne baş bû, ya ku mînanî wê yekê ye, wextê ku zarok bona mîrasê bi hev ra şer dikin. Îsa êdî bona wan hewaskar nîbû, lê bona wan serkarîkirin û

tabî hewaskar bû. Gelo eva xwehizîke çi cûreyî ye?

Nava halê vî cûreyî da minê bipirsîya ku wana gotina min guhdar kir, yan jî gelo ew xemgîn in, ji vî halî em ji Xudan mesela hizkirinê û sebrê hildidin. Ji me gelek meriv, heger dewsa Îsa bûna, wê bigotana: "Bicemin, ji vir derkevin. Ez nava hewcetîya çi da me, lê hûn derheqa çi da difikirin". Eva bona Îsa mecala xeyîdê bû.

Em dikarin fem bikin ku nava şagirta da kîjan ew yek destpê kir. Ew Şimhûn –Petrûs bû, çimkî ew nava komê da yê herî bilind bû û hîmlî ew bû, yê ku destpêkê da xeber dida.

Diqewime Petrûs lez ket bîne bîra yên mayîn, ku çawa ew li ser avê ra gerîya, yan jî xwest bêje ku çawa cara ewlin ew yek got, ku bi rastî Îsa Kî bû. Diqewime paşê Petrûs careke mayîn derheqa wê cêribandinê da bîr anî, ya ku li ser çîyê rastî Îsa, Mûsa û Elyas hat.

Petrûs li ser xwe guman bû, wekî nava 12 a da ew yê herî mezin bû. Feqet ev guman nava hizkirinêda nîbû. Ewê hîmê xwe nava kubarîyê da danîbû.

Îsa li hemûya nihêrî û got, wekî ew mînanî merivên negihîştî xwe didine kifşê, lê ne ku mînanî lawên padişatîyê. "Padişên mileta serkarîyê li wan dikin û ewên ku serkarîyê li wan dikin, çawa "xêrkir" tên navkirinê. Feqet, nava we da gerekê usa nîbe, lê mezinê nava we da bila mînanî yê biçûk be, lê rêber jî mînanî qulixçî. Çimkî kî ye mezin: yê ku dora sivirê rûdinî, yan qulixçî, lê Ez jî himberî qulixçîkî me" (Lûqa 22:25–27).

## Armanca bêjingê xistinê

Nenihêrî wê yekê, wekî Şimhûn–Petrûs ew îzbatiya derheqa wê yekê da stendibû, ku Îsa Kî bû, lê ew hela hê nava xeysetê Mesîh da nedigerîya. Petrûs emir û qulixkirina xwe li ser serkeftinên pêşda û li ser kubarîyê çê dikir. Pawlos li ser kaxeza Korintî 3:10–da şîretê dide me, ku em guhdariyê bidine ser wê yekê, ku em çawa nava Mesîh da hîmê xwe çê bikin.

Şimhûn–Petrûs bi wan "qinyatên" nava padişatîya Xwedê da çê

nedikir, lê bi tiştên usa çê dikir, yên mînanî qewata xwestinê û gumana li ser xwe. Lê ewî nizanibû, wekî xeysetê wî hela hê gerekê bihata guhartinê. Ew xeysetê Petrûs ji "bêqanûnîya emir" dihat (1 Yûhenna 2:16).

Kubarî tu cara awqas qewat nîne, wekî bikaribûya qewat bida Petrûs, ku ew nava Mesîh da yazîya xwe mîyaser bikira. Heger ew kubarî nehata dûrxistinê, ewê bi kutasî Petrûs tune bikira.

Niha binihêre ku Îsa çi dibêje Şimhûn–Petrûs:

> "Û Xudan got: "Şimhûn, Şimhûn, awa cin xwest ku we mînanî genim bêjingê bixe"".
>
> – LÛQA 22:31

Kubarîyê bona dijmin derî vekir, wekî ew bê hundur û Şimhûn–Petrûs bêjingê bixe. Xebera "bêjingêxistin" tercima xebera bi zimanê yûnanî "siniazo" ye. Anegorî Kitêba Pîroz, ya "Logos"–ê ya hînkirinê, ew yek dide kifşê "bêjingêxin, bihejînin, ji cî bileqînin, nava bêjingê da bihejînin", dêmek bi rêya agîtasîayê bicêribînin bawarîya yekî bighînine tunekirinê.

Heger wî çaxî fikirdarîya Îsa wî cûreyî bûya, kîjan roja îroyîn li gelek civîna heye, ewê bigiota: "Werin em dua bikin û ev êrîşa cin girêdin. Em hazir nabin îzinê bidine cin, ku wê yekê Şimhûnê me ra bike". Feqet binihêre Îsa çi dibêje:

> "Min bona te reca kir, ku bawarîya te kêm nebe û wextê ku tu paşda vegerî birayên xwe îzbat bike".
>
> – LÛQA 22:32

Îsa bona wê yekê dua nekir, wekî Şimhûn– Petrûs ji wê heja wêrankir azad bûya. Ewî dua kir, wekî bawarîya Petrûs nava wê yekê da kêm nebe. Îsa zanibû, wekî ji nava vê cêribandinê wê xeysetekî nû pêşda bihata, ew xeysetê nû tiştê tek–tenê bû bona Şimhûn–Petrûs, bo ku ewî program mîyaser bikira û birayên xwe îzbat bikira.

Cin îzin stendibû ku Şimhûn–Petrûs ji cî bileqîne, wekî ewî bawarîya xwe unda bikira. Meremê dijmin ew bû, bo ku vî merivê

bi potênsiyala mezin tune bikira, yê ku ew kerema mezin stendibû. Feqet bona cîleqandinê, meremê Xwedê tiştekî mayîn bû û mînanî hertim rêya Xwedê ji ya cin bilindtir e. Ewî îzin da dijmin ku ewî yek bikira, bona ku bi wê yekê nava Şimhûn–Petrûs da ew tişt ji cîh bileqanda, çi ku hewcê cîhleqandinê bû.

Xwedê nîşanî jina min, Lîzayê kir, wekî ji cîhleqandina her tiştekî bi pênc merema tê kirinê:

1. Nêzîkî hîm bin.
2. Wî hemû tiştî dûr bixin çi ku mirî ye.
3. Wî hemû tiştî berev bikin çi ku gihîştî ye.
4. Hişyar bikin.
5. Wê yekê yan bighînine tiştekî, yan jî tevî wî tiştî bixin, bona ku ew careke mayîn nikaribe başqe be.

Wextê cîhleqandinê her şuxulkarîke bi fikirê, yan jî tabîya dil, kîjan nava xwehizî da yê, yan jî kubarîyê da ye, paqij dibe. Rûyê vê heja mezin da gumana Petrûse li ser xwe wê dûr biketa, lê çi ku bima sekinî wê bibûya hîmê Xwedêyî qewîn. Petrûsê carekê ra halê rast bidîta, fêkîyên mirî wê dûrketana, yên gihîştî wê bihatana berevkirinê û ewê niha nêzîkî hîmê rast bûya. Petrûsê êdî serbest kar nekira, lê ewê Xudanva bihata girêdanê.

Petrûs miqabilî gotinên Îsa çû: “Xudan, ez hazirim t’evî Te bême hebsê jî, mirinê jî”. Ev elametî ne ku ji Ruh pêşda hat, lê ji wê yekê, wekî ew gelekî li ser xwe guman bû. Ewî nikaribû bidîta ku meremê cîhleqandinê çi bû.

## Petrûs û Cihûda şikilên miqabilî hev in

Hinek difikirin, wekî Petrûs mezin–mezin xeber dida û tirsonek bû. Feqet, wextê ku nava baxê Gêtsêman da, wextê ku hatin Îsa bigrin, Petrûs şûrê xwe derxist û guhê xulamê serwêrê kahîna jê kir (Yûhena 18:1O). Gelek merivên tirsonek nikarin tiştên usa bikin, wextê ku eskerê dijmin ji wana zêdetir e. Lema jî Petrûs qewat bû û

qewata wî tenê nava şexsê wî da bû, lê ne ku nava gurêkirina Xwedê da, çimkî şuxulkarîya bêjingêxistinê hela hê destpê nebibû.

Usa qewimî çawa ku Îsa gotibû. Hema ew Şimhûn–Petrûsê qewat, yê ku hazir bû bona Îsa bimire, yê ku şûr hilda destê xwe, bi gotina jinekê bin ket. Petrûs ji wê jinê tirsîya û înkar kir, got ku ew Îsa nas nake.

Hinek difikirin, wekî tiştên mezin dibine menî ku meriv dişimitin. Feqet, gelek cara hema tiştên here biçûk me ji cîh dileqînin. Ev yek dide kifşê, wekî wextê ku meriv li ser xwe guman e, ew awqasî jî kardar nîne.

Paşê Petrûs sê cara Îsa înkar kir. Çaxê ku dîk bang kir, Petrûs girîya. Ewî gumana li ser xwe unda kiribû û difikirî, wekî ewê tu cara ji cîhê ketî ranebe. Ew hemû tişt, çi ku Petrûs hiştibû, ew bû çi ku Ruh elamî wî kiribû. Şimhûn–Petrûs û cihûda nava hinek pirsa da mînanî hev bûn. Mînak, hema ew yek, wekî wana herdua jî Îsa înkar kirin. Feqet nava hîmê van herdu meriva da firqî heye.

Cihûda li rex Îsa mabû û ewî Ew nas nekiribû çawa Şimhûn–Petrûs. Hîmê Cihûda nava Îsa da tunebû. Dihate texmînkirinê, wekî ewî Îsa ji wê rojê da destpêkirî hiz dikir, wextê ku ewî hemû tiştên xwe hiştin ku peyî Wî here. Ewî tevî Îsa û şagirtên mayîn rêwîtî kiribû û nava agirê qerfa da jî mabû. Cihûda cin derdixistin, nexweş qenc dikirin û Mizgînî propaganda dikir. Feqet ew kirinên Cihûda ji wê yekê nîbûn ku ew bi hizkirin nêzîkî Îsa dibû, yan jî ku Ew Kî bû.

Hema destpêkê da jî fikirên Cihûdaye şexsî yên teng bûn. Ewî tu cara xwe tobe nekir, xeysextê wî ji vê elametiyê eşkere bû: “Hûn çi dixewezin bidine min... ?” (Metta 26:15).

Ewî ji xizna qulixa Îsa bona şexsê xwe pere hildida (Yûhenna 12:4–6). Ev navnîşa vî cûreyî berdewam dike. Cihûda tu cara Xudan nas nekir, nenihêrî wê yekê, wekî ew sê sal û nîv nava koma Îsa da bû.

Ev her du jî bona kirina xwe poşman bûn. Feqet hîmê Cihûda mînanî hîmê Petrûs nîbû, çimkî ew tu cara bona naskirina Îsa birçî nîbûye, îzbatîya wî ya derheqa Îsa da tune bû. Heger îzbatîya wî

cûreyî li cem Cihûda hebûya, ewê tu cara xayîntî hindava Wî da nekira. Wextê u bagereke qewat nava emirê wîda rabû, hemû tişt ji cîh leqîya û hûrdexweşî bû. Awa çi qewimî:

> "Wî çaxî xayînê Wî, Cihûda, dît ku Ew hate gunehkarkirinê, poşman bû û ew 3O–î zêrên ku dabûne wî, paşda vegerandin. Û got: "Min bi xayîntîya hindava xwîna bêsûc guneh kir". Wana jî got: "Mera çi, tu binihêre". Û ewî zîv avîtine serayê, dûr ket û çû xwe xeniqand".
>
> – METTA 27:3–5

Wijdanê Cihûda pêşda hat, ew poşman bû û ewî zanibû, wekî ewî guneh kiriye. Feqet ewî Mesîh nas nedikir. Cihûda fem nedikir, wekî bi çiqasîva ew yek grîng bû, ku ewî xayîntî himberî Kê kirîye. Ewî tenê got: "Min xayîntî himberî xwîna bêsûc kiriye". Heger mînanî Şimhûn–Petrûs îzbatîya derheqa Mesîh da li cem wî hebûya, ewê paşda vegerîya li cem Îsa û bi zanebûna rehmbûna Xudan ewê tobe bikira. Xwekuştin ji kerema Xwedê cudabûneke başqe ye. Evê cîhleqandinê eşkere kir, wekî piştî sê sala, çûyîna li peyî Xudan hîmê Cihûda tune bû.

Gelek paşdahatîyên nû "duayê xilasbûnê" kirine, çûne civînê, aktîv bûne û Kitêba Pîroz lêkolîn kirine. Feqet, ev wana hemû tişt bêyî îzbatîya derheqa Îsa da kirîye. Ew nizanin, ku bi rastî Îsa Kî ye, nenihêrî wê yekê, wekî ew bi lêvên xwe Wî çawa Xudanê xwe dihebînin. Wextê ku ew rastî çetinayîkê tên, ew ji Xwedê dixeyîdin û paşê bi karên xweva ji Wî dûr dikevin. "Xwedê wê vir hada tu tiştî bona min neke", "Min cêriband ez bibime mesîhî, lê emirê min diha feqîr bû", "Min dua kir û tewaqe ji Xwedê kir, lê Ewî ev yek nekir": xeberên wî cûreyî min gelek cara bihîstine. Merivên wî cûreyî tu cara emirê xwe teslîmî Îsa nekirine, lê cêribandine bona kara xweye şexsî şexsê xwe dayînnine li ser tabîya weke ya Xwedê. Wana bona kara xwe qulix kirîye, û yên usa bi hêsanî tên xapandinê û xeyîdandinê.

> "Hinek meriv, wextê ku guhdarîya gotinê nakin, zû bi şabûn wê yekê qebûl dikin, lê nava wan da kok tune, ew

> tiştê wedelî ye. Wextê ku ew bona wê gotinê dikevine nava tengavîyê, zû dixeyîdin”.
>
> – MARQOS 4:16,17

Guhdarîyê bide ser wê yekê ku Îsa got, wekî ew zû dixalifin, çimkî hîmê wan tune. Lê gelo nava çi da ew gerekê koka xwe dayînin? Bersivê em Efesî 3:16–18 da dibînin. Koka me gerekê nava hizkirinê da îzbatbûyî be. Hizkirina hindava Xwedê da hîmê me ye. Îsa got: “Hizkirina tu kesî ji ya Wî zêdetir nîne, wekî yek şexsê xwe bona xêrxwezên xwe dayne” (Yûhenna 15:13).

Em nikarin emirê xwe bona wî merivî daynin, kîjanî em amin nabin. Em nikarin emirê xwe bona Xwedê daynin, hetanî ku Wî awqasî nas nekin ku aminaya xwe lê bînin. Em gerekê heyîna Xwedê û xeysetê Wî nas bikin û fem bikin. Em gerekê guman bin, wekî Xwedê tu cara tiştê usa nake ku zyanê bide me.

Xwedê hertim nava hemû pirsa da guhdar e, çi ku bona başîya me ye. Ew yek çi ku gumana me dide birînê, wê hertim bizvire û wê bona me bibe tiþtê baş, heger em bawarîya xwe unda nekin. Xwedê hizkirin e û tu xwehez î, yan jî xirabî nava Wî da tune. Tenê cin dixweze ku em tune bin.

Gelek cara em bi berçavkên “ku nêzîk didine kifşê” halên emirê xwe dinihêrin. Feqet ew yek şikilê rast tevlîhev dike. Ew tiştên ku em nav ra derbaz dibin, Xwedê bi temamî dibîne. Heger em ji “tabîya xweye dîtinê” ya sînorkirî hal dinihêrin, wî çaxî du tişt dikarin biqewimin. Berê ewlin, nava şuxulkarîya ku Xwedê dide paqijkirinê, em dikarin bi hêsanî bibine qurbana xeyîdê: yan ji Xwedê bixeyîdin, yan ji qulixçîên Wî. Ya duem ew e, wekî em bi hêsanî dikarin ji alîyê dijmin da bêne xapandinê. Cinê tiştekî bide xebatê, bo ku wî çaxî ew tişt rast bê kifşê, lê bernama wî ya hîmlî ew e ku “rastîya” wî tunekirina me ye. Wextê ku em nava aminaya himberî Xwedê da qewîn sekinîne, em nikarin ji xwedîderketina Bavê der bimînin. Bona xweyîkirina xwe em gerekê teslîmî cêribandinê nebin.

## Wextê ku tu xeysetê Xwedê va girêdayîyî

Mecala tek–tenê, bi kîjanê cin dicêribîne me ji aminaya hindava Xwedê da paşda bigire, ew e wextê ku ew fikirên meye derheqa xeysetê Xwedê da navhev dixe. Ewî ew yek usa jî li baxçê Adem himberî Hêwayê kir, wextê ku ji wê pirsî: "Bi rastî, Xwedê got, wekî ji wî baxî tu ji tu darekê nexiwî?" (Destpêbûn 3:1). Ewî temîa Xwedê tevlîhev kir, bo ku bi wê yekê êrîşê bibe li ser xeysetê Xwedê û tevlîhevbûnê çê bike.

Xwedê gotibû: "Tu dikarî ji her dareke baxçe bixwî, lê ji dara ulmê xirab nexwî, çimkî heger tu ji wê darê bixwî, tê bi mirina xwe wê rojê bimirî" (Destpêbûn 2:16,17).

Gotina mar hîmlî ev bû, wextê ku ewî gote Hêwayê: "Xwedê hemû tiştên baş ji te veşartiye". Feqet, Xwedê ev yek dixwest bigota: "Tu dikarî bixwî, xêncî... ". Xwedê baxçê wî cûreyî dabû mêriv ku ew xêncî tiştekî hemû fêkîyên mayîn bikaribe bixwe.

Mar gote jinikê: "Bi rastî Xwedê xwedîtbyê li we nake, çi tiştên baş hene Ew ji we vedişêre, Ew we hiz nake, çawa ku hûn difikirin. Ew Xwedêyê rehm nîne". Jin hate xapandinê û bawarîya xwe li derewa derheqa xeysetê Xwedê da anî. Paşê xwestina xweguneh-karkirinê pêşda hat. GotinaXwedê êdî emir nîbû, lê qanûn bû. Feqet "qewata guneh qanûn e" (1 Korintî 15:56).

Roja îroyîn jî dijmin vê mecalê dide xebatê. Ew xeysetê Xwedê nava çavvê ewledên Wî da tevlîhev dike. Li ser me hemûya jî mezin hebûne, mesele, bav, dersdar, serkar, kîjan xwehiz bûne û em hiz nekirine. Rast e, qedirê wan li cem me hebûye, lê ji wê yekê meriv dikare derheqa xeysetê Xwedê da texmîn bike, çimkî Ew e yê sereke.

Dijmin bi hostatî xeysetê Bav navhevxistîye û bi mesela bavên li ser dinîyayê ronahiya çavê me jî navhevxistiye. Xwedê dibêje, wekî hetanî vegera Îsa dilên bava wê berbi ewleda bizvire (Malaxî 4:6). Xeysetê Xwedê, yan jî heyîna Wî, wê nava mezinên Wî da bê kifşê û evê bibe dermanê bona doxtirîyê.

Wextê ku tu zanî, wekî Xwedê tu tiştê usa nake ku zyanê bide te û çi jî Ew nava emirê te da dike, yan jî nake, bona kara te ye, peyî vî hemû tiþtî ra tu emirê xwe bi temamî teslîmî Wî dikî. Tu dibî me-

rivekî usa, yê ku bi şabûn emirê xwe bona Xudan diatîne.

Heger te xwe bi temamî pêşkêşî Îsa kirîye û teslîmî xwedîkirina Wî bûyî, wî çaxî tu nikarî bixeyîdî, çimkî şexsê te ne yê te ye. Ew meriv dixeyîdin û gumana xwe unda dikin, yên ku bi menîkê hatine li cem Xwedê ku bibînin, Îsa wê bona wan çi bike. Menîya wan naskirina Wî nîne.

Wextê ku em li ser vê tabîyê ne, em bi hêsanî gumana xwe unda dikin. Ew yek dibe menî ku em dûr nebînin. Em nikarin bi çavvên bawarîyê tiştên nava emirên xwe da binihêrin. Wextê ku emirê me bi rastî nava Îsa da ye, em xeysetê Wî nas dikin û em tevî şabûna Wî dibin û dudilî nabin.

Wextê ku em anegorî dor–berên xwe difikirin, wî çaxî em rihet dixeyîdin. Eva ne dîtina bi çavê ruh e, Gelek cara Xwedê cabê nade wextê ku tu lazimatîya wî texmîn dikî. Feqet, wextê ku ez paşda dinihêrim û wan bûyera gotûbêj dikim, wê kerbûnê fem dikim û aqilmendîya Wî dibînim.

Gelek cara zarokên me wan mêtoda û wê fikirdariyê fem nakin, kîjan bi meremê terbyetkirinê tên pêşdakişandinê. Wextê ku ew mezin dibin, em dicêribînin şirovekirina bidin, bona ku ew bikaribin ji aqilmendîyê karê bistînin. Feqet yaşekî usa heye, wextê ku ew dikarin fem nekin, yan jî rûyê negihîştîbûnê da me ra qayîl nebin. Ew yek tiştekî nake, ewê paşê fem bikin. Diqewime em bi wê yekê dixwezin wê yekê kontrol bikin, ku ew gura me da bimînin, yan jî hizkirin û gihîştîbûna wan binihêrin. Hema ew yek usa jî derheqa Bavê Ezmîn da ye. Merivê ku nava halên vî cûreyî da bi bawarîyê tijî ye, dibêje: “Xudan ez aminaya xwe li Te tînim, nenihêrî wê yekê, wekî fem nakim”.

Di Îbranî 11:35–39 da em şedetiyê derheqa wan meriva da dibînin, kîjana tu cara mîyaserbûna sozdayînên ji alîyê Xwedê da dayî nedîtibûn, lê dîsa dudilî nebûn: “Merivên mayîn jî gelekî zêrîyan, azayî qebûl nekirin, ku bighîjine rasta baş. Yên mayîn jî nava zêrandina û hebsa ra derbaz bûn: pê kevira hatine lêxistinê, hatine perçekirinê, ketine nava qezîyayê, bi şûr hatine kuştinê, bi postên pêz û bizina nava xerîbîyêda geryan, wekî dinîya nelayîqî wan bû. Ew

nava qûmistanada, çîyada û cîhên başqe da unda bûn. Û ev meriv bi bawarîyê şedetî stendin, lê sozdayîn qebûl nekirin".

Wana qirar kiribû, wekî çi ku wana xwestibû Xwedê grîngî nedabû wê yekê ku ewê bihakî çawa bidin. Ew hindava Xwedê da hetanî mirina xwe rast man, nenihêrî wê yekê, wekî wana mîyaserbûna sozdayîna nedîtin. Ewana nikaribûn bixeyîdîyana.

Dêmek em îzbatbûyî ne, wextê ku em bûyînê didine evê hizkirina mezin û aminaya xwe li Xwedê tînin. Wî çaxî ew yek grîng nîne ku bager bi çiqasîva qewat e, yek e ewê nikaribe me ji cîh bileqîne. Menîya vê yekê xwestina qewat, yan jî şexs nîne: eva pêşkêşa keremê ye bona wan hemûya, kîjan xwe teslîmî Xwedê dikin û gumana li ser xwe diatînine alîkî mayîn.

Bi xweteslîmkirinê tu gerekê Wî nas bikî, kî emirê te xweyî dike.

## Kerem bona wan tê dayînê, yên ku gurê da nin

Şimhûn–Petrûs bona mezinaya xwe nikaribû kubar bûya. Ewî gumana li ser xweye tebyetî unda kir. Petrûs hemû tişt zelal dît û fem kir, wekî ew yek bêfeyda ye. Petrûs şikest, ew bona kerema Xwedê kandîdatekî tam bû. Xwedê kerema Xwe dide yên şikestî. Nava ruhê Petrûs da derseke usa hebû, wextê ku ewî berbirîbûna xwe da nivîsî: "Xwedê miqabilî merivên bi serî xwe ye, lê keremê dide wana, yên ku li ber wî şikestî ne" (1 Petrûs. 5:5).

Petrûs ji kevîya paşdavekişandinê dûr ket. Em vê yekê wî çaxî pê dihesin, wextê ku milyaketê Xudan Meyrema Mecdelî da ber mexber: "Lê herin, şagirtên Wî û Petrûs ra bêjin, wekî Ewê pêşîya we here Celîlê û li wir hûnê Wî bibînin, çawa ku Ewî we ra got" (Marqos 16:7).

Milyaket Petrûs ji komê başqe kir. Petrûs nava qezîya behrê da bû, lê Xwedê hela hê li ser wî Xwe dida hîmdanînê. Ji wê heja mezin Petrûs dudilî nebû, lê diha qewîn bû.

Îsa ne tenê baxşande Petrûs, lê ew usa jî da dasekinandinê. Nenihêrî wê yekê, wekî Petrûs nava wê hejê ra derbas bibû, ew êdî

hazir bû bibe merivekî civîna merkezî. Ewî bi dengê bilind qîyameta Mesîh elam dikir. Dîrok dide kifşê, wekî piştî gelek salên qulixkirina paqij, Petrûs dew kir, ku wî li ser sêrî xaç bikin. Ewî got, wekî ew layîqî wê yekê nîne ku ew wî cûreyî bimire, çawa ku Xudan miribû, bo wê yekê jî ew li ser sêrî xaç kirin. Ew êdî netirsîya. Petrûs kevirekî li ser hîmê zinarê zexm çê kirîbû.

Nava vî emirî da dijwarî wê ewê yekê eşkere bikin, çi ku dilê te da bûye, dixwezî ew xeyîda hindava Xwedê da be, yan jî yên mayîn be. Tiştên wî cûreyî wê te himberî Xwedê û xwîşk û birayê te talayê pêşda bînin, yan jî wê te diha qewat bikin. Heger tu kontrola xwe baş teslîm bikî, koka te wê nava axê da diha kûr here, bona ku te û pêşeroja te qewîn bikin. Lê heger ew yek te ra li hev neyê, tê bixeyîdî û bi talayê tijî bibî.

## Xudan, min qulixî te kirîye, dêmek bona çi... ?

Wextê ku ez serwêr bûm, nava kuoma cahilada xortekî 14–salî hebû, qedirê kîjanî li cem hevalên wî û mezinên wî hebû. Ew xwendikarekî baş bû û sportsmênekî serxwe bû. Hindava karên Xwedê ewî qulix mîyaser dikir û nava hemû karada tevbûna xwe pêşniyar dikir. Ew tevî me hate rêwîtîke mîsîyonêrîyê, wextê kîjanê şedetîya xwe dida her yekî, kî ku rast pê dihat.

Hebû wede, wextê ku ew rojê çar seheta nava dua– dorzga da bû. Ewî xortî gelek tişt ji Xudan dibhîst û derheqa wan da yên mayîn ra gilî dikir. Ew hemû tişt dua bû. Xort navê xweyî nava qulixêda zanibû û pêşîya 2O salîya xwe dixwest bibûya serwêr. Dihate texmînkirinê, wekî ew zinarekî zexm e.

Min ew cahil hiz dikir û min gelek wede tevî wî derbas dikir. Ez tenê bona tiştekî xemgîn bûm: nava wî da min texmîn dikir ku ew li ser xwe guman bû. Min tiştek dixwest bigota wî, lê azaya kirina wê yekê li cem min tune bû. Min zanibû, wekî rojekê guhartinê bihata. Ew rastî çend dijwariya hat û ber xwe da. Carna min çi ku texmîn dikir, dikete bin şikberîyê, wextê ku min didît ku ewî çawa ew cêribandinên dijwar sebir dikir.

Sal derbaz bûn. Ew cîguhartî bû, lê min jî dest bi rêwîtîya kir, lê tevgirêdanên xweye tevî wî min xweyî dikirin. Min zanibû, wekî ew hela hê gerekê nava prosêsa şikestîbûnê ra derbaz bûya. Min nizanibû ku çi wê biqewimîya, lê min fem dikir, wekî ew yek bona wî lazim bû ku ewî navê xwe mîyaser bikira. Ev yek mînanî prosêsa bêjingêxistina Şimhûn–Petrûs bû.

Wextê ku ev cahil 19 salî bû, doxtira li cem bavê wî nexweşîya penceşêrê dît. Xortê cahil tevî dayîka xwe rojî digirtin û dua dikir wekî bavê wî qenc bibûya. Merivên başqe jî gihîştine wan. Bavê xort pêşîya wê yekê, çend meh pêşda, Îsa çawa Xudan û Xilazkirê xwe qebûl kiribû.

Halê bavê çiqas diçû awqas xirab dibû. Min li Alabamayê qulix dikir, wextê ku jina min têlêfon kir û gote min ku ez lez wî xortî ra têlefon bikim. Min wî ra xeberda û fem kir, wekî xort hewcê piştgirîyê bû.

Piştî qulixa xweye dawîyê ez rê ketim û şebeqê seheta çara gihîştme malê. Halê bavê xort awqasî giran bû, wekî bi gotina doxtira bona jîyana wî rojên hesabkirî mabûn. Ewî nikaribû xeber bida.

Xortê cahil guman bû, wekî bavê qenc bûya. Min bona wê malbetê qulix kir û piştî çend seheta ez çûm. Rojtira mayîn me ra têlêfon kirin û gotin, wekî halê nexweş çiqas diçe diha xirab dibe.

Min û Lîzayê, me destbi duakirinê kir. Wextê ku me dua dikir, Xwedê dîtinokek da jina min: Îsa li rex wî merivî sekinîbû û hazir dibû wî bibe. Piştî nîv sehetî ewî cahilî têlêfon kir û got, wekî bavê wî wefat bûye. Dihate texmînkirinê, wekî ew xort gelekî li ser xwe guman e, lê ew yek hela hê destpêk bû.

Wê şevê ewî hevalên xweye nêzîk ra têlêfon kir ku derheqa mirina bavê xweda elam bikira. Hevalên wî digiryan, wextê ku ewî têlêfon kir. Xort pirsî ku ew çawa bû, wekî ew awqasî zû derheqa mirina bavê wî da pê hesîyan. Bi rastî tu kesî hevalên wî ra negotibû. Hevalên wî bona qewimandineke başqe digiriyan, çimkî ji wê qewimandinê hevalekî wanî mayîn wefat bibû. Nava rojekê da xort him bavê xwe unda kir û him jî hevalê xweyî baş.

Hej destpê bibû. Xort tevlîhev bibû û bêguman mabû. Hate

texmînkirinê ku hazirîya Xwedê ji wî dûr ketibû.

Piştî mehekê, wextê ku ew bi avtomaşînê dihate malê, ew bû şedê qezîyake avtomaşîna, kîjan hema teze qewimîbû. Zanebûnên wîye bona dayîna alîkarîya ewlin hebûn û ewî destpêkir alî bike. Du avtomaşîna da hevalên wî yên nêzîk bûn. Wextê ku ewî dicêriband alî wan bikira, dudu hema li ser destê wî wefat bûn.

Hevalê minî cahil gihîşte sînorê xwe. Ewî sê sehet nava mêşada derbaz kir, berbirî Xwedê dibû û dikire gazî: “Tu li kîderê yî? Te gote min ku Tê ber dilê min da bêyî, lê ew yek niha tune”.

Dihate texmînkirinê, wekî Xwedê berê xwe ji wî vegerandibû. Qewat û gumana xort alî wî nedikirin.

Xort li ser Xwedê hêrs ket. “Bona çi Xwedê îzina vê yekê da?”. Ew ne li ser serwêr, ne li ser malbetê, yan jî li ser min hêrs ket. Ew ji Xwedê xeyîdî bû. Ji bêgumanîyê xort kuta bû. Xwedê gumana wî birî bû, wî çaxî wextê ku ew hewcê wê yekê bû”.

Xortê cahil dua dikir: “Xudan, min qulixî te kiriye û min gelek tişt hiştine ku peyî Te bêm, lê niha te berê xwe ji min vegerandiye”. Ew difikirî, wekî Xwedê bona wî hemû tiştî deyîndarê wî ye, çimkî ewî hemû tişt hiştibû ku bona Xwedê qulix bikira.

Gelek meriv birîn stendine û gumana xwe unda kirine, ji kîjana çend meriv gelekî gira nin, lê çend meriv jî hindik. Gelek ji Xudan dixeyîdin. Ew bawar in, wekî Xudanê dewsa wî hemû tiştî bide, çi ku wana bo Xwedê kirîye.

Em bi hîmên şaş qulixî Xwedê dikin. Em gerekê bona wê yekê qulixî Xudan nekin ku Ew çi dikare bike, lê bona wê yekê ku Ew Kî ye û Ewî bona me çi kirîye. Ewên ku xeyîdîne, fem nakin, wekî Xudan êdî bona azakirina wan daye. Wana bîr kirîye ku çawa ji mirinê xilas bûne. Ew diha gelekî bi çavên fîzîkî dibînin, lê ne ku yên heta–hetayê.

Evî cahilî destpê kir neçe civînê û tevî dor û berên şaş dibû, diçû bara, klûba û cîhên kêyfaye başqe. Nava wî halî da ewî nedixwest ku karê wî tevî Xudan hebûya.

Ev kirin nêzîkaya du hevtîya kişandin. Dilê xwe da ewî gunehkarî texmîn dikir, lê hela dîsa nêzîkbûna berbi Xudan înkar dikir. Evî

halî şeş meha kişand. Peyî awqas tiştî ra jî dihate texmînkirinê, wekî ezman bibû kevir, hazirîya Xudan tune bû.

Nêzîkî salekê derbaz bû. Bi ketina nava çend halên cûre–cûre, ewî dît, wekî Xudan hela hê nava emirê wî da kar dikir. Xort nêzîkî Xwedê bû, lê eva nêzîkbûneke başqe bû. Ew şikestî hat. Peyî van cêribandina ra, Xudan da kifşê, wekî Ew tu cara ji wî dûrneketiye. Wextê ku şuxulkarîya wîye ruhanî hate dasekinandinê, ewî destpêkir gumana xwe nava kerema Xwedê da dayne, lê ne ku nava qewata xwe da.

Min tevgirêdanên xweye tevî wî xweyî dikirin. Piştî sal û nîvekî ewî min ra gilî kir û got, wekî ewî dilê xweda tişt dîtine, cîhê kîjana ewî pêşda nizanibûye. “Ez merivekî bêyî xeyset bûm, lê tevgirêdanên min jî yên ser ra bûn.

Bavê min ji derva ez çawa merivekî qewat terbet kiribûm, lê ez jî tu cara bi xwestina Xwedê mezin nebûme. Ez ji Xudan razîm e, ku Ew nava wî halî da ji min dûr neket.

Feqet, çi jî ez xemgîn dikirim, ne ew bû ku ez wedê xwe nava kêfa da derbaz dikim, lê ew yek bû, wekî min berê xwe ji Ruhê Pîroz vegerandibû. Ez gelek–gelekî Wî hiz dikim. Hevaltîya min ya tevî Ruhê Pîroz tu cara awqas şîrin nîbûye, çawa ku niha ye”.

Nava emirê wî da gelek cîhleqandinên wî cûreyî hebûne. Gumana li ser xwe bi temamî hate hildanê. Feqet ev cahil bû xweyê hîmekî usa, çawa ku Şimhûn–Petrûs bû û wê yekê ji wî nikarin hildin. Dewsa bi rêya kubarîyê çêkirina emir û qulixa xwe, ewî ew yek bi kerema Xwedê dikir.

Xeyîd zeyîfbûnê didine eşkerekirinê û “cîhên” emirê meyî qewîn didine nermkirinê. Gelek cara ew “cîh”, li kîderê em difikirin ku em qewat in, bi rastî dibe cîhê zeyîfiya me. Ewê awqasî veşartî bimîne, hetanî ku bayekî qewat neyê û wê yekê nede kifşê. Pawlos wa nivîsîye: “Çimkî yên bi sineta rast em in, wekî em Ruhê Xwedê diparêzin, em bi Mesîh Îsa va firnax dibin û gumana me ya li ser bedenê tune” (Fîlîpî 3:3).

Bi qewata xwe em nikarin tu tiştî bona qîmetîyên heta–hetayê bikin. Kirina vî cûreyî hêsa ye, lê hîmdanîna vê rastîya nava me da lap tiştekî başqe ye.

## ÎSA Jİ RASTÎYÊ DÛR NEDİKET, BO KU MERİVAYÊ Jİ QEZÎYA XEYÎDÊ DÛR BİGİRE.

“Kitêba We, ya bi sernavê “Tela Şeytan” bi kutasî çavê min dane vekirinê. Ez û malxwê xwe nava qulixê da bûn û min texmîn dikir, wekî nava emirê min da hemû tiştên tevî Xudan baş bûn. Kitêbê nîşanî min da, wekî 15 sala li cem min xeyîda himberî meta min hebûye. Em hertim hînkirine ku mesîhî gerekê bibaxşîne, lê min tu cara ew yek nekiribû dilê xwe. Berbirîbûna We ez mecbûr kirim, ku ez rastî wê birîna pêşda bêm.

– R. M. TÊNNÊSÎ

9

# ZİNARÊ XEYÎDÊ

***"Awa li Sîyonê–serê kevîyê, ez kevirekî qîmtlû datînim û kê Wî bawar dike, wê şerm neke. Ew yek qîmetîya we bawermenda ye, lê bona bêbawera ew kevir wekî çêkirçî bêhurmet kirin. Ew bû serê kevîya Wî. Û kevirê gilorkirinê û zinarê xeyîdê, wekî usa dikin, bi bawarnekirina gotinê, kîjan bona wê yekê jî danî ye".***

***– 1 PETRÛS 2:6–8***

Roja îroyîn fikira xebera "bawarkirin" zeyîf bûye. Bona geleka ew bûye bi fikira naskirina tiştekî. Bona geleka jî ew gurêkirinê ra girêdayî nîne. Feqet nava gotina li jor kifşkirî da xeberên "bawarkirin" û "gurênekirin" çawa yên miqabilî hev hatine raberkirinê. Kitêba Pîroz dibêje: "Bila ew kesê ku Wî (Îsa Mesîh) bawar dike unda

nebe, wê emirê wî yê heta –hetayê be" (Yûhenna 3:16). Çawa ku em xebera "bawarkirin" lêkolîn dikin, em bêjin, wekî gelek difikirin, ku ew çi ku ji wana dew tê kirinê, tenê bawarkirin e, wekî Îsa heye û li ser xaç mir, lê ew jî tevî Xwedê, li ser cîhekî baş sekinîne. Heger ev dewa tenê hebûya, wî çaxî cin jî wê tevî Wî li ser tabîke baş bûna. Kitêba Pîroz dibêje: "Tu bawarî, wekî Xwedê yek e, wê yekê baş dikî, lê cin jî wê yekê bawar dikin û ditirsin" (Aqûb 2:19). Feqet bona cina xilasbûn tune.

Kitêba Pîroz da xebera "bawarkirin" bi çend fikira tê raberkirinê. Bi hesabhildana tenê xeberên li jor kifşkirî li vir em tenê dikarin bêjin, ku fikira wê xeberêye sereke gurêkirin e. Em dikarin vî cûreyî bixwînin: "Bona wê yekê jî bo we, wekî hûn gurê dikin, Ew qîmetlû ye, lê bona ewên ku gurê nakin, "ew kevirê, ku çêkirçîya înkar kir, bû kevîya wî ya sereke" û "kevirê glorbûnê û zinarê xeyîdê"". Tiştekî dijwar nîne, wextê ku tu yekî bi xeyset û hizkirinê nas dikî, gura Wî da bî. Hizkirina tevî Xudan "heyîna" tevgirêdana me ye, lê ne ku himberî prînsîb û hînkirina, lê hizkirina himberî Şexsê Îsa Mesşh. Heger ew hizkirin cîhê xwe da qewîn nîne, wî çaxî em xeyîdê texmîn dikin.

Îsrayêlî, kîjana Xudan çawa "çêkirçî" gazî kiribû, Kevirê Xwedê yê Kevîyê– Îsa înkar kirin. Wana hînkirinên xwe yên kitêba Kevinar hiz kirin. Ew bi şirovekirinên xwe va razî bibûn, çimkî ewana anegorî kara xwe xwe ji wê civînêva girtibûn û bona kontrolkirinê yên mayîn didane xebatê. Îsa miqabilî wê yekê derket. Ewî gote wan: "Kitêba lê binihêrin, bi kîjana hûn difikirin ku emirê we yê heta–hetayê be û ew in, yên ku şedetîya Min didin" (Yûhenna 5:39).

Wana nikaribû ew fikir fem bikira, wekî pêşda Xwedê dixwest law û keç hebûna, tevî kîjana Ew dikaribû nava heleqetiyada bûya. Yên ku dîna xwe didane qanûna, dixwestin serkarîyê û padişatîyê bikirana. Çavê wan da qanûn ji heleqetîyê bilindtir bû. Wana ew yek înkar kir, çi ku wana belaş stendibû. Bi wî cûreyî Pêşkêşa Xwedê– Îsa Mesîh bû, gumana xilasbûn û emirê wan".

Sîmêon, wextê ku Îsayê zarok girte destê xwe, li serayê ew bû pêxember: "Awa Ew Zaroka, ku li Îsrayêlê heye û ew bona geleka

çawa nîşana ketin û sekinandinê û dijîderketinê ye" (Lûqa 2:34). Guhdarîyê bide ser gotina "ketin û sekinandin" ê. Ewê ku bona edilayê hatibû dinîyayê. Bi kutasî şûrê başqekirinê anî, bo wana, li cem kîjana Ew hatibû şandinê (Metta 10:34), û emir da wana, yên ku bibûne qurbanîyên qulixçîyên ewê rojê.

## Îsa û Xeyîd

Li mekteba roja yekşemê, gelek cara Îsa çawa Serwêr dihate raberkirinê, Yê ku li ser milê Xwe berxa undabûyî dibir, yan jî çawa Îsayê ku zarokên hembêza Xwe da dua dike, dihate raberkirinê, Yê ku bi ken dibêje: "Ez we hiz dikim". Ev hemû tişt rastî ye, lê ew temamîya şikil naynine ber çava.

Hema ew Îsa jî fêrisî bona xweheqîtîya wan dane şermê: "Marno, cisinên mara, hûnê çawa ji dadgeha dojê birevin" (Metta 23:33). Ewî li wir textên ku li ser pare diguhartin wergerandin û ew ji wir dane derxistinê (Yûhenna 2:13–22). Wî merivî ra, yê ku dixwest bavê xwe defin bike û paşê peyî Îsa here, ewî got: "Bira mirî mirîyên xwe defin bikin, lê tu here pesinê padişatîya Xwedê bide" (Lûqa 9:59, 60). Vê navnîşê merîv dikare berdewam bike.

Wextê ku em diha ji nêzîk va dîna xwe didine qulixa Îsa, Merivek eşkere dibe, Yê ku gelek didane xeyîdandinê, wextê ku Ewî qulix dikir. Were em çend mesela binihêrin.

### *Ferîsî ji Îsa dixeyîdîn.*

Gelek cara Îsa miqabilî wan rêbera derdiket û ew dida xeyîdandinê. Rûyê wê yekê da, wekî ferîsî xeyîdî bûn, wana Îsa şande berbi xaç. Wana Îsa hiznedikir. Feqet Îsa awqas ferîsî hiz dikirin, wekî rastî digot: "Dûrûno, Îşaya li ser we rast pêxembertî kirîye û gotîye "Ev milet bi devê xwe nêzîkî Min dibe û bi lêvên xwe qedirê Min digre" (Metta 15:7–9). Ev elametî ew dane xeyîdandinê.

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî hema piştî wê yekê şagirta çi tewaqeyî Îsa kir:

> "Wî çaxî şagirtên Wî nêzîkî Wî bûn û gotin: "*Tu zanî, wekî ew gotin ferîsiyan bihîst û xeyîdîn?*".
>
> – METTA 15:12

Bersiva Wî gotûbêj bike:

> "Her dareke ku Bavê Minî li ezmana ne nikandiye, wê bê jêkirinê. Berdin wana: ewana rêberên kora nin û wextê ku kor rêberîyê li kor dike, her du jî dikevine çelê".
>
> – METTA 15:13, 14

Îsa da kifşê, wekî bi rastî xeyîd wana bi kokêva dide rakirinê, kîjan rast ji alîyê Bavê Wî da nehatine nikandinê. Hinek meriv dikarin bighîjine komên civîna yên qulixkirinê, lê ew usa jî dikarin ji alîyê Xwedê da şandî nîbûna. Xeyîd, ya ku wextê xeberdana rast pêşda tê, menîyên wê yên rast eşkere dike û dibe menî, wekî ew bi xwe xwe ji kokêva rakin.

Bi çûyîna li civînên mayîn, min dîtîye kö çawa gelek cara serwêr bona wê olê ber xwe ketiye, ji kîjanê meriv dûrketine. Gelek cara li cem wan meriva ewê yekê nerazîbûn pêşda anîye, wekî rastî hatîye raberkirinê û ew yek anegorî cûrê jîyana wan nîne. Merivên usa fikirên civînê rexne dikin û dûr dikevin.

Ew serwêrên ku xwe wan bawarmenda va digrin, yên ku dergehên wan ra dikevine hundur, bi kutasî mecbûr dibin wan ra qayîl bin. Ez wan ra dibêjim: "Heger hûn derheqa rastîyê da xeber didin û wê yekê didine raberkirinê, bi wê yekê hûn diqewime meriva bidine xeyîdandinê û ewê bi koka xweva rabin û wê dûr bikevin. Terka piştgirîya wan nekin, kîjana Xwedê şandîye cem we".

Gelek serwêr ditirsin, ku wê meriva unda bikin û wî çaxî ew ji pevçûyînê dûr dikevin. Bi tomerî hildayî ew dudilî dibin, çimkî miqabilî kîjana gerekê der bikevin, ew merivên usa nin, yên ku alîkarîya fînansî didine civînê, yan jî nava olê da hukumê wan heye. Yê mayîn jî ditirsin bibine menîya xeyîdê. Çawa encam, serwêr serkarîya ji alîyê Xwedê da dayî unda dikin, ya ku bona parastin û piştgirîya wana ye.

Wextê ku ez cara ewlin ketime tabîya serwêrîyê, merivekî aqilbend eşaretî da min: “Tu nava serkarîkirina xwe da bimîne, heger usa nebe, yekê ji te hilde û wê miqabilî te bide xebatê”.

Samûêl merivê Xwedê bû, yê ku îzin nedida ku rastîyê daynine alîkî. Ew padişê ra jî usa bû. Wextê ku Şaûl gura Xwedê nekir, Xudan Samûêl ra got ku miqabilî wî derkeve. Ewî usa jî kir. Mixabin, Şaûl çawa bersiva Xudan bi tobekirina rast va pêşda nehat. Ew diha xemgîn bû, ku fikira meriva derheqa wî da çi ye. Wextê ku Samûêl xwest ji wî dûr bikeve, Şaûl kinca wî girt, pêşya wî qelişî. Samûêl gote Şaûl: “Xudan îro padişatîya Îsrayêlê ji ser te qelaşt” (1 Padişatî. 15:28).

Eva ew tişt bû, çi ku Samûêl bona Şaûl dixwest. Ew bona Şaûl ber xwe ketibû. Ewî Şaûl çawa padişa danîbû, hînî serkarîkirinê kiribû û li ser text rêberîya wî dikir. Samûêl hevalê Şaûl bû. Feqet guhdar bike ku çawa Xwedê bersiva berxweketina Samûêl ya bona Şaûl da: “Tê hetanî kengê bona Şaûl şînê bikî, çimkî Min ew înkar kir ku ew padişatîya li Îsrayêlê neke: *strûyê xwe bi* rûnva tijî ke, û were ez te bişînim... ” (1 Padişatî. 16:1).

Xwedê digot, wekî pêşîya bi rûnê teze pêşdaçûyînê, Samûêl gerekê fem bikira, wekî hizkirina Xwedê û dada wî tiştên bûyînê bûn. Heger Samûêl paşda biçûya cem Şaûl peyî wê yekê ra, wextê ku Xwedê ew înkar kiribû, rûnê wî yê teze wê tune bûya. Heger Samûêl şîna wî berdewam bikira, ewê tu cîha da neçûya.

Ew serwêrên ku ber xwe dikevin û bona wan meriva şînê dikin, yên ku ji civînê dûrketine û ew serwêrên ku naxwezin dijî wan endama derkevin, çimkî ew heval in, nava emirê wan da ew rûn wê ziîha be. Hinek qulixdarî dimirin, lê hene hinek qulixdarî jî, kîjan xwe didine kifşê ku ew sax in. Bi nezanebûn, wana heleqetîyên tevî meriva ji yên tevî Xwedê bilindtir hesab kirine.

Kitêba Pîroz nabêje, wekî Îsa bersiva her kesê ku ji Wî dûr diket dida.

Xwestina Wî ya tek– tenê mîyaserkirina xwestina Bavê bû. Heger Îsa peyî her yekî biçûya, wî çaxî gelekê peyî wî biçûna.

Ezê tu cara wê demê bîr nekim, wextê ku min li cvîneke bi Ruh va tijîbûyî qulix dikir. Nêzîkî salekê em bona wê yekê hazir dibûn. Wextê qulixa roja yekşema ewlin, min berbirîbûneke zelal, ya tobekirinê û paşdahatina berbi hizkirina ewlin raber kir. Min berxdan texmîn dikir, lê min zanibû, wekî ewa ew berbirîbûn bû, kîjan gerekê min bida.

Piştî qulixê serwêr got: "Xwedê nîşanî min dida ku tê vê şebeqê çi xeber bidî, lê ez nafikirim, wekî cimeta min bona wê yekê hazir e".

Jina min jê pirsî: "Serwêrê civînê kî ye, tu yan Îsa?".

Serwêr serê xwe kire ber xwe: "Ew hema ew tişt e, derheqa çi da Xudan mehekê pêşda gote min. Ewî gote min, wekî Ew zane çawa nêzîkî vê cimetê bibe". Serwêr gote me, wekî yek sêanîya cimeta civîna wî merivên bi pisîxolojîya "gemîyên kevinar"in, kîjana nedixwexstin ku nava qulixê da, ne jî nava xeberdanêda guhartin hebûna. Me piştgirîya wî kir û gote wî, ku ew gura Xudan da be.

Li wê civînê me çar cara qulixa xwe derbas kir û ew hemû cara jî dijwar pêşda diçû. Wextê ku em ji wî bajarî dûr diketin, dihate texmînkirinê, wekî di dilê min da torbê qûmê hebû. Çiqas diçû texmînkirina giranîyê diha mezin dibû û ez aciz dibûm. Hertim, wextê ku ez ji civînkê dûr dikevim, dilê min bi şabûnê va tijî dibe. Min nizanibû ku li vir şaşî çi bû.

Bi kutasî ez tevî Xudan tenê mam, min ji Wî pirsî: "Bavo, min çi şaşî kirîye?". Bona çi ruhê min aqas giran bûye, diqewime serkarîkirina ku bo min hatîye dayînê, min rast nekirîye?".

Xudan zelal gote min: "Toza li ser lingên xwe daweşîne" (Lûqa 9:5).

Ez lerizîm. Wextê ku min duakirina xwe berdewam kir û dîsa ji Wî pirsî, min dîsa ew xeber bihîstin: "Toza li ser lingên xwe daweşîne".

Axiriyê min gura Wî kir. Wextê ku min destê xwe ji ser sola xwe dûrxist, giranî dûrket û şabûn kete dilê min. Ez zendegirtî mam û dîsa berbir'î Wî bûm: "Xudan, wana êrîşî li min nekir û ez ji bajêr dernexistim. Bo çi tozê daweşînim?".

Xudan nîşanî min da, wekî serwêr û gelek merivên din sozê xweyî ku dane Xwedê înkar kirine.

“Xudan, diha gelekî wede bide wan”, – min tewaqe jê kir.

“Heger Ez 5O–î sala jî bidime wan, ewê neyêne guhartinê. Dilên wan bûne kevir”, – Xwedê bersiva min da.

Ez pê hesîyam, wekî serwêrê wê civînê dewsa wê yekê ku gura Xwedê da bimîne, rêyeke başqe bijartibû, ku bona xweyîkirina edilayê ber wan daxwe. Strûyê wî bi rûnê tezeva tijîbûyî nîbû.

Ji derva ew mînanî merivekî usa bû, ku tê bêjî ew ruhva tijîbûyî ye, lê di hundurê wî da qewata Xwedê û hazirîya Wî kêm bû. Paşê min bihîst, wekî ewî terka serwêrîya civînê daye û dutîretî mînanî berê ketibû civînê.

Yên başqe Îsa kontrol nedikirin. Ewî rastî dianî ber çava, heger rûyê wê yekê da jî pevçûyîn biqewimîya, yan jî xeyîd pêşda bihata. Heger tu dixwezî layîqî begemîya meriva bibî, begemîya Xwedê nikare li ser te da birije. Tu gerekê dilê xweda Gotina Xwedê daynî û xwestina Wî biqedînî, heger tu berbi rîska xeyîdandina yê mayîn jî herî.

***Ew meriv ji Îsa xeyîdîn, yên ku ji bajarê Wî bûn.***

Îsa hate bajarê Xwe bo ku qulix bike. Feqet Ewî nikaribû azayê û qenckirinê bona wan bîne, çi ku Ewî gelek cara li bajarên mayîn kiribû. Binhêre ku çi gotine Wî:

> “Ne ev kurê necar e, ne navê dayîka wî Meyrem e û birayên wî Aqûb, Ûsiv, Şimhûn û Cihûda ne? Û gelo hemû xwîşkên wî li cem nînin, wî çaxî ev hemû tişt bona vî ji kîderê ne? Û ji Wî dixeyîdîn. Îsa jî wan ra got:”Pêxemberek bêqedir nîne, lê tenê nava bajar û mala xwe da bêqedir e””.
>
> – METTA 13:55–57

Tu dikarî guhdar bikî, ku çawa ev jin û mêrên Nisretîyê çi gotin: “Gelo fikira Wî derheqa Wî da çi ye, wekî Ew bi serwêrîyê me hîn dike? Em zanin ku Ew Kî ye. Ew li vir mezin bûye, em mezinên Wî ne. Ew kurê necar e. Xwendina Wî ya fermî tune bûye”.

Îsa careke mayîn ji rastîyê paşda nesekinî, ku wana ji xeyîdandinê

dûr bigire. Ew meriv awqasî hêrsketî bûn, wekî wana dicêriband Wî ji zinar biavêjin û bikujin (Lûqa 4:28–30).

Hema wî çaxî jî, wextê ku emirê Îsa nava qezîyaê da bû, ewî xeberdana rast berdewam dikir. Roja îroyîn hewcetîyên merivên wî cûreyî gelekin.

***Endamên malbeta Îsa ji Wî xeyîdîn.***

Hema ew meriv jî, kîjan ji mala Wî bûn, ji Wî xeyîdî bûn. Ew hukum li wan xweş nedihat, wekî rûyê Îsa da dihate ser wan. Were binhêrin:

> "Û malbata Wî bi guhdarkirin derketin derva, ku Wî bigrin, çimkî digotin ku Ew dîn bûye... Paşê birayên Wî û dayîka Wî hatin û li derva sekinîn, şandine cem Wî, gazî Wî kirin. Û cimet çaralî rûniştî bû û gotine Wî: "Awa dayîk û biryaên Te derva gazî Te dikin". Û Ewî bersiv da û got: "Dayîka Min, yan jî birayên Min kî ne?". Û dîna xwe da li her çar alîyên Xwe û got: "Awa dayîka Min û birayên Min". Çimkî kî ku xwestina Xwedê biqedîne, ew in birayên Min, xwîşk û dayîka Min"".
>
> – MARQOS 3:21, 31–35

Malbata Îsa difikirî, wekî Ew dîn bûye. Guhdarîyê bide ser wê yekê, wextê ku kitêba Pîroz dibêje, wekî malbata Îsa derketibû derva, wekî Wî paşda vegerînine malê. Marqos îzbat dike, wekî ew meriv dayîka Îsa û birayên wî bûn, yên ku paşê Wî li mala yekî da, wextê axaftinê dibînin. Hema xût Yûhena jî dibêje: çimkî birayên Wî jî bawarîya xwe li Wî nedianîn" (Yûhenna 7:5).

Geleka fem kiriye, wekî Îsa hema ji aliyê wan meriva da jî hate înkarkirinê, kîjan nêzîkî Wî bûn. Lê Ewî qebûlkirina endamên malbata Xwe nedigeriya. Xwestinên wana li ser Îsa hukum nedikirin. Ewê bernama (progirama) Bavê mîyaser bikira, nenihêrî wê yekê ku wana wê begem bikira, yan na.

Min gelek meriv dîtine, bi taybetî jin û mêr, kîjan rûyê wê tirsê

da ku wê ji alîyê endamên malbata xwe da bihatana xeyîdandinê, peyî Îsa neçûne. Û çawa encamê wê yekê, ew paşda diçin, yan jî nagihîjine potênsiyala xwe ya bi temamî.

Mala me da ez yê ewlin bûm ku vî cûreyî hatime dinîyayê. Endamên malbata me yên mayîn katolîk bûn û min derheqa bawarîya xwe ya nûdîtî da wan ra nedigot. Ew qirar bi taybet li dayîka min xweş nedihat, bi kîjanê ez ji civîna katolîk dûrketim, çimkî ewê ez biribûme wê civînê. Bêguman, hene katolîk, yên ku Xwedê hiz dikin, lê min zanibû, wekî Xwedê ez ji wir derxistibûme der.

Bona dê û bavê min derba duda ew bû, wextê ku min gote wan, ku ezê bikevime qulixê. Min teze ûnîvêrsîtêya Pûrdûyê xilas kiribû û min navê înjênêrê mêxanîkayê stendibû. Gumana dê û bavê min ya mezin li ser min hebû. Min zanibû, ku Xudan bona çi dixwest û min zanibû, wekî ew yek wê malbata min bida xeyîdandinê. Bi sala ser hev, li malbata me hal sertbûyî bû. Nava gelek pirsa da me ji hev fem nedikir. Feqet, min qirar kiribû, wekî minê grîngî neda wê yekê, ku ewê bi çiqasîva hêrs biketana, yek e ez gerekê peyî Îsa biçûma.

Destpêkê da min dicêriband bi Încîlê serbiketama. Min wan ra digot, wekî tenê bi çûyîna li civînê ew xilas nabin. Bi wî cûreyî min ew li ber hesarê didane sekinandinê, kîjan ji alîyê min da gaveke aqilmendîyê nîbû. Paşê Xwedê ez hîn kirim, ku ez li ber wan bi emirê mesîhîtiyê bijîm û îzinê bidim, ku ew karên min bibînin. Peyî wê yekê ra, min berdewam kir ku li ber wan danexum.

Roja îroyîn dê û bavê min gelekî piştgirîya min dikin, lê kalikê min, yê ku hemûya zeyîftir miqabilî min şer dikir, 89–salîya xwe da bi qedir, du sala pêşîya mirinê, xilas bû.

Dayîka Îsa û birayên wî difikirîn ku Ew dîn bûye. Feqet rûyê wê yekê da, wekî Îsa gura Bav da bû, ew hemû jî xilas bûn û roja Pêntîkosê li mala jorin bûn. Birayê wî Aqûb bû rêberê civîna Orşelîmê.

Hger em li ber yên mayîn bona gotinên Xwedê ber daxun, ku ew yek li endamên malbeta me xweş bê, emê ji emirên xwe rûnê teze unda bikin û emê dijwariya bona azabûna wan pêşda bînin.

Şagirtên Îsa ji Wî xeyîdîn.

Nava beşeke kitêbêye derbasbûyî da me bi hûr–gilî fikira şagirta gotûbêj kir, wextê ku ew ji Îsa xeyîdîn. Werin em careke mayîn derbasî wê yekê bibin û wê yekê ji alîyê fikira Îsa da binhêrin.

> "Û gelek şagirtên Wî wextê uö bihîstin, gotin: "Ew tişt gelekî berk e, kî dikare guhdarîyê bike?". Feqet, wextê Îsa şexsê Xwe da pê hesîya ku şagirtên Wî bona wê yekê li ber xw eda xeber didan, ewî gote wan: "Ew yek we dide xeyîdandinê?". Peyî vê yekê ra ji şagirtên Wî gelek paşda çûn û êdî tevî Wî nedigeryan"
>
> – YÛHENNA 6:60–61, 66

Hemû tişt êdî gelekî çetin pêşda diçû. Rêberên ruhanî mirina Wî didane progiramkirinê. Bajarê Îsa Ew înkar kir. Endamên malbata Wî difikirîn ku Ew dîn bûye. Gelekên ji koma Wî bi xeyîd dûr ketin. Feqet Îsa dîsa ber wan danedixist. Yên ku mabûn jî, Îsa wan ra got, wekî ew jî aza ne û heger dixwezin, dikarin herin.

Tiştê tek– tenê, çi ku bona Îsa grîng bû, mîyaserkirina bernama Bavê bû. Heger ewê rojê hemû kes jî Îsa bihiştana û biçûna û Ew tenê bima, wî çaxî jî ew yek wê dilê Îsa neguharta. Ewî qirar kiribû gotinên Bavê Xwe bike.

Çend hevalên Îsa yên here nêzîk ji Wî xeyîdî bûn

> "Û nexweşek hebû, navê kîjanî Lazarê ji Beytanyayê, ji gundê Meyremê û xwîşka wê Martayê. Meyrem ew bû, ya ku bi rûnê bînxweş li Xudan dabû û bi porê xwe lingên Wî paqij kiribûn, birayê kîjanê, Lazar, nexweş bû. Û xwîşkên wî şandine li cem Wî û gotinê: "Xudan, awa ewê ku Tu hiz dikî, nexweş e".
>
> – YÛHENNA 11:1–3

Îsa Marta, Meyrem û Lazar hiz dikirin. Ew hevalên nêzîk bûn. Îsa wede tevî wan derbas kiribû. Guhdarîyê bide ser bersiva Îsa, wextê ku behsa derheqa nexweşîya Lazar da gihîşte wî:

> “Wextê ku bihîst ku nexweş e, wî çaxî ew du rojên din jî li wî cîhê ku lê bû, ma”.
>
> – YÛHENNA 11:6

Îsa zanibû, wekî nexweşîya Lazar wê bighîne mirinê. Eva pirseke girîng bû. Feqet, Îsa du roja jî hema li wî cîhî ma. Wextê ku ew hate Beytanyayê Lazar êdî miribû.

Martayê û Meyremê gotine Wî: “Xudan, heger tu li vir bûyayî, birayê me wê nemira” (Yûhenna 11:21, 32). Bi gilîkî mayîn gotî: “Tu çima carekê ra nehatî, te dikaribû ew xilas bikira”.

Herdu xwîşk jî hinekî xeyîdî bûn. Wana meriv şandibûn li cem Îsa, lê Ew du roja jî dereng hat. Îsa wî cûreyî bersiva wan neda, çawa ku ew hîvîyê bûn. Ewî hemû tişt nehişt û dewsa wê yekê li peyî rêberîya Ruhê Pîroz çû. Eva bona hemûya tiştê herî baş bû. Wî çaxî ew yek dihate texmînkirinê, ku tê bêjî Îsa guh nedidayê.

Gelek cara qulixçî endamên civînê kontrol dikin. Ew difikirin, wekî ew gerekê wî hemû tiştî bikin, çi ku cimet ji wana tewaqe dike.

Endamekî şêwira civînê, bi ruhva tijîbûyî, yê ku serwêrê xwe unda kiribû, carekê gote min: “Em serwêrekî dixwezin, yê ku wê hemû pirsên me bide razîkirinê. Yekî usa ku bikaribe şebeqê seheta heyşta bê mala min û tevî min qawê vexwe”.

Ez fikirîm: “Wî çaxî tê xebatkarekî sosîyalî bibînî, kîjanî tê bikaribî kontrol bikî, lê ne ku yekî usa, ku bi Ruhê Pîroz va tê rêberkirinê”. Paşê ez pê hesîyam, wekî li evê civînê nava sal û nîvekê da çar serwêr hatine guhartinê.

Wextê ku ez serwêrê cahila bûm, şeş meha piştî serwêriya min, cahilek hate cem min. “Tê bibî hevalê min?, – ewî pirsî, – serwêrê qulixa cahilaye pêşda hevalê min bû”.

Ewî serwêrî hevaltî tevî cahila kiribû. Bona wan tiştê girîng derbaskirina teşkîldarîya bû. Min zanibû ku ewê cahil çi dixweze. Ewî ew yek dixwest, çi ku endamên şêwirêye wî çaxî ji serwêrê xwe dixwestin.

Min gotinên Metta yên 1O:41–ê çawa mînak anîn, li kîderê Îsa

digot: “Yê ku pêxember bi navê pêxember qebûl dike, ewê xelata pêxemberîyê bistîne, lê kî ku heq bi heqîtî qebûl dike, wî çaxî ewê xelata heqîyê bistîne”.

Min ji wî pirsî:

– Hevalê te gelek in, ne usa ye?

– Belê, – ewî bersiv da.

– Lê serwêrekî cahilayî tek– tenê, yê te heye, ne usa ye?

– Belê.

– Tu xelata serwêrê cahila dixwezî, yan ya hevalekî, çimkî bi kîjanê tu min qebûl bikî, bi wê yekê wê bê qirarkirinê, ku tê ji Xwedê çi bistînî.

Ewî ez fem kirim.

Gelek qulixçî ditirsin, wekî heger ew xwestinên cimetê neqedînin, bi wê yekê ewê wana bidine xyîdandinê û ew jî wê piştgirîya wan unda bikin. Ew ketine tela tirsa xeyîdandina yên mayîn. Merivên nêzîkî wana wana kontrol dikin, lê ne ku Xwedê wana kontrol dike. Çawa encam, li civînên wan, yan jî li olên wan beşeke biçûk, ya qîmetê heta–hetayê tê mîyaserkirinê.

***Yûhenayê Nixumdar ji Îsa xeyîdî.***

Nixumdar jî ji Îsa cêribandina xeyîdê ra derbas bû.

> “Şagirtên Yûhena derheqa vî hemû tiştî da Wî ra gilî kirin. Û Yûhena gazî du şagirtên Xwe kir, şande li cem Îsa û got: “Ew tu yî, yê ku gerekê bê, yan em gerekê hîvîya yekî mayîn bin?”. Ew meriv jî hatine cem Wî û gotin: “Yûhenayê Nixumdar em andine cem Te û dibêje ku Ew tu yî, yê ku gerekê bê, yan em gerekê hîvîya yekî mayîn bin?””.
>
> – LÛQA 7:18–20

Deqekê bisekinin. Bona çi Yûhennayê Nixumdar ji Îsa pirsî, ku gelo Ew e Ewê ku gerekê bê? Yûhenna ew bû, yê ku bona Wî rê çê kir û derheqa hatina Îsa da elam kir: “Awa Berxê Xwedê, yê ku gu-

nehê dinîyayê hiltîne” (Yûhenna 1:29). Yûhenna yê tek–tenê bû, yê ku got: “Ew e Yê ku bi Ruhê Pîroz dinixume” (Yehenna 1:33). Ewî usa jî got: “Ew gerekê mezin be, lê ez biçûk bim” (Yûhenna 3:3O). Yûhennayê Nuxumdar yê tek–tenê bû, wekî bi rastî zanibû, ku wî çaxî Îsa kî bû (Ev yek hela hê Şimhûn–Petrûs ra eyan nîbû).

Bo çi ew dipirse: “Gelo Îsa ye Mesîh, yan hîvîya yekî mayîn bin?”.

Bicêribîne xwe dayne dewsa Yûhenna. Tu ew meriv î, yê ku hacetekî tûj e nava wê yekê da, çi ku Xwedê dike. Hilbet, meriv ji te qulixê qebûl dikin. Qulixdarîya dinîyayê ya here bi nav û deng ya te ye. Tu zewicî nînî bona ku bi cûrê herî baş temamîya qewata xwe bidî xebatê. Tu li qûmistanê mayî, te li wir hingivê beyanî xwerîye û rojî girtîye. Te miqabilî fêrisyan şerkarî kirîye û hatî gunehkarkirinê, ku tu nava xw eda cin î. Temamîya emirê xwe tu bi hazirkirina rêya Mesîh derbas dikî.

Niha jî tu li hebsê yî. Gelek meriv tên seredana te, çimkî niha guhdarîya cimeta ku te hazir kirîye, li alîyê Îsa yê ji Nisretê ye. Şagirtên te jî gihîştine wî merivî. Tenê çend şagirt mane ku qulixî te bikin. Wextê ku ew tên cem te, gilî dikin, ku çawa ev Meriv û şagirtên Wî bi emirekî başqe dijîn. Ew tevî bacgir û gunehkara dixun û vedixun. Ew Şemîyê diteribînin û rojîyê jî nagrin.

Tê bi xwe bêjî: “Min dît ku çawa Ruh bi cûrê kevotkê peyayî li ser Wî bû, lê gelo ev e kirina Mesîh?”.

Cêribandina xeyîdê diha zêde dibe, çimkî tu hebsê da nî. “Ev Meriv, bona kîjanî min emirê xwe bona hazirkirina rêya Wî derbas kir, qet nehatîye ku min bibîne. Heger Ew Mesîh e, wî çaxî bona çi min ji vê hebsê dernaxe? Min tu tiştekî şaş nekiriye”.

Bi vî cûreyî tu du şagirtên xwe dişînî, ku ji Îsa bipirsî: “Ew tu yî, yê ku gerekê bê, yan em gerekê hîvîya yekî mayîn bin?”.

Were em bersiva Îsa binihêrin:

> “Û wî çaxî, ewî gelek meriv ji nexweşîya û derba û ruhên xirab xilas kirin... û ronahiya çava da kora. Û Îsa bersiv

> da û got: “Herin Yûhena ra gilî bikin, çi ku we dît û bihîst, wekî kor dibînin, seqet digerin, yên kotî paqij dibin, ker dibhên, mirî radibin, Mizgînî bona feqîra tê xwendinê. Û xwezî li wî, yê ku ji Min wê nexeyîde’”.
>
> – LÛQA 7:21– 23

Bersivaa Îsa ya pêxemberîyê bû. Ewî gotinên ji kitêba Îşaya ya pêxemberîyê anîne ber çava, kîjan bona Yûhenna nas bûn. Gotinên ji Îşaya yên 29:18, 35:4–6 û 61:1–ê didine kifşê, wekî nenihêrî wê yekê, ku şagirtên Yûhenna êdî hemû tişt dabûne zelalkirinê, lê dîsa ew hîvîyê bûn ku ji Îsa bipirsin. Ew xeber şedetîya wê yekê didan, wekî ew bû Mesîh. Îsa bi wê yekê xilas nekir. Ewî ser da zêde kir: “Û xwezî li wî, yê ku ji Min wê nexeyîde”.

Îsa dixwest bigota: “Yûhenna, Ez zanim, wekî tu wî hemû tiştî fem nakî, çi ku li te diqewime û gelek rêyên Min fem nakî, lê ji Min nexeyîde bona wê yekê, wekî Ez wî cûreyî nakim, çawa ku tu hîvîyê bûyî”. Îsa gote Yûhenna, wekî ew Xwedê nava emirê xwe da û qulixa xweda bi femdarîya yên mayîn gotûbêj neke. Yûhenna hemû tişt derheqa bernama Xwedê da bi temamî nizanibû, çawa ku em roja îroyîn derheqa temamîya bernama Xwedê da nizanin. Îsa piştgirîya wî dikir û got: “Te ew yek kirîye, çi ku te ra hatibû gotinê. Xelata te wê gelekî mezin be. Awqasî ji Min nexeyîde”.

## Xeyîda bêyî hîvîya guhdarkirina baxşandinê

Heger tu mînanî Yûhenayê Nixumdar nava gelek rêyên Xwedê da hînbûyî bûyayî, wê menî hebûya ku tu jî ji Îsa bixeyîdîyayî. Heger tu bi rastî Wî hiz dikî û bawar dikî, tê şerkarîyê bikî, kö ji xeyîdê aza bimînî, fem bikî, wekî rêyên Wî diha gelekî bilindin, ne ku yên te. Usa jî, heger tu hazir dibî teslîmî Ruhê Xwedê bî, merivê ji te bixeyîdin. Îsa di nava Yûhenna: 3:8–da got: “Ba li kî alî dixweze, wî alî jî diçe û tu dengê wî dibihêyî, lê nizanî ew ji kîderê tê û kuda diçe. Her kesê ku ji Ruh dibe jî usa ye’”**.**

Hinek wê fem nekin, wextê ku tu tevî Ruh bilivî. Îzinê nede,

wekî bersiva wane xirab te ji wê yekê paşda bigire, bona kîjanê tu dilê xwe da zanî ku rast e. Bona xwestinên meriva Ruh nede sekinandinê. Petrûs derheqa vê yekê da dibêje:

> "Niha Mesîh bi bedena Xwe bona me zêrîya, hûn jî bi fikira wî cûreyî pêşda herin, wekî yê ku bi bedenê zêrîya, ji guna aza bû. Vir hada, ne ku mînanî xwestinên meriva, lê mînanî xwestina Xwedê bedena xwe da bijîn".
>
> – 1 PETRÛS 4:1,2

Wextê ku tu himberî xwestina Xwedê dijîyî, tê xwestinên meriva mîyaser nekî û çawa encam tê bedenê da bizêrî. Îsa ji alîyê rêberên ruhanî da hate zêrandinê. Merivên ruhanî bawar in, wekî Xwedê tenê nava sînorên normên wan da kar dike. Ew bawar dikin, wekî ew in ew merivên tek–tenê, "kîjana da" Xwedê heye. Heger Xudan 2OOO sal pêşda bi Ruhê Pîroz hate rêberkirinê, merivên ruhanî da xeyîdandinê, wî çaxî peyîhatîyên Wî jî wê wana bidine xeyîdandinê.

Zêrandina Pawlos mînakeke baş e. Li Galatîyayê hinek meriva bihîstibû, wekî Pawlos bona Mizgînîya xaç li ber meriva daxustiye û derbasî alîyê rêberên ruhanî bûye, kîjana digotin, wekî sunetkirin tenê bona xilasbûnê pêwîst e (lazim e). Feqet, Pawlos ew rast kirin. Ewî digot: "Min binhêrin. Ez ji hemû alîya da ji alîyê rêberên ruhanî da diêm zêrandinê. Gelo ewê vî cûreyî nêzîkî min bûna, heger min sunetkirin pêşda bikişanda. Heger xaç rêya xilazbûnêye tek–tenê ye, meriva dide xeyîdandinê, lê ew e rast û rêyeke başqe tune, bi kîjanê ez hazir bim tiştekî başqe xeber bidim (Galatî 5:11).

Heger yek miqabilî rastîya Încîlê derdikeve, wî çaxî wede ye, bixeyîdin, bêyî gumana guhdarkirina baxşandinê. Em gerekê dilê xwe da qirar bikin, ku emê gura Ruhê Xwedê da bin û ew yek girîng nîne ku ewê çi biha be. Emê paşê mecbûr nîbin ku bin hukum da bijartinê bikin, çimkî ew êdî hatîye kirinê.

**ÎSA HİNEK MERİV XEYÎDANDİN, BO KU GURA BVÊ XWE DA BİMA, LÊ EWÎ TU CARA MERİV NEDİXEYÎDANDİN, KU Bİ WÊ YEKÊ MAFÊ XWE ÎZBAT BİKİRA.**

“Van axirîya min kitêba We, “Tela Şeytan”, xwend û ez dixwezim bêjim, wekî kitêbê bi temamî nava govekeke emirê min da ez aza kirim, bona kîjanê ez difikirîm, wekî ezê tu cara aza nebim. Ez awqasî dixwezim razîbûnê elamî We bikim, bona nivîsara vê kitêbê, çimkî ewê emirê min guhartîye”.

– K. R., TÊNNÊSÎ

# 10

# NİŞKÊVA NEDİNE XEYÎDANDİNÊ

***"Vir hada, hev sûcdar nekin, lê diha baş e vê yekê daynine nava fikira xwe, wekî glorbûn, yan jî xeyîda bira nava fikira we da tunebe".***

**– ROMAYÎ 14:13**

Me hêja gotûbêjkirina derheqa wê yekê da ser hevda anî, ku çawa gelek meriv ji Îsa dixeyîdîn, wextê ku Ewî rêwîtî dikir û qulix dikir. Dihate texmînkirinê ku Ew kuda diçû, meriv dixeyîdîn. Vê beşê da ez dixwezim wekî mayîn gotûbêj bikim.

Îsa û şagirtê Wî, teze ji Kefernahûmê paşda vegerîyabûn. Wana zivireke qulixkirinê ser hev da anîbû û bi wedekî kurt hêsa bibûn, hewcetîya kîjanê gelek bû.

Heger cîhekî usa hebû, li kîderê Îsa dikaribû bona qulixê bisekinîya, ew cîh bajarê Kefernahûmê bû.

Wextê ku Ew li wir bû, nevsekî fermî nêzîkî Şimhûn–Petrûs bû. Teslîmî wî merivî kiribûn ku wî merivî bac berev bikira. “Dersdarê we bac nade?” (Metta 17:23). Petrûs bersiv da û got, belê, çû cem Îsa bo ku gotûbêj bike.

Îsa fikira pirsa berevkirinên bac fem kir û destpê kir pirsa bide Şimhûn–Petrûs: “Teva çawa tê kifşê Şimhûn, padişên dinîyayê ji kê bac hildidin, ji ewledên xwe, yan ji bîyanîya (merivên xerîb)?”. “Ji bîyanîya”, – Petrûs got. “Wî çaxî ewled aza ne”, – Îsa got” (Metta 17:24, 26).

Îsa got, wekî “ewled aza ne”. Ewana ne ew meriv in, kîjan bac didin, lê ew meriv in, yên ku kara bacê distînin. Ewled li sera dijîn, kîjan bi bac têne xweyîkirinê. Ewled ji sivira padişê dixun û kincên padişa li xwe dikin, yên ku pirsên bac didine çareserkirinê. Ew belaş dijîn û belaş tên çareserkirinê.

Nevsê resmî baca paristgehê qebûl dikir, feqet kî bû padişê paristgehê, yan jî xweyê wê? Bona qedirê kê ew dihate çêkirinê? Bersiv tenê yek bû, bona Bav Xwedê. Petrûs hema teze ji Xwedê îzbatîk stendibû, wekî “Îsa Mesîh bû, Kurê Xwedê Yê sax”.

Hema li ser wî hîmî jî Îsa Petrûs ra dibêje: “Eger Ez Kurê Wî me, Kî ye Xudanê p’aristgehê, gelo Ez nava dayîna bacê paristgehê da aza nînim?”.

Bêguman, Ew ji bac azabûyî bû. Nava pirsa nedayîna bac da Ew heq bû. Niha binhêre, ku Ew Şimhûn–Petrûs ra çi dibêje:

> “Feqet, bona ku wana nedine xeyîdandinê, here behrê, tora xwe biavêje û masîyê pêşin ku te girt, devê wî veke û tê devê wî da zîvekî bibînî: hilde û dewsa Min û dewsa xwe bide wan”.
>
> – METTA 17:26

Îsa teze azaya Xwe dabû kifşê, lê bona ku Petrûs nede xeyîdandinê, gote wî: “Were em bac bidin”. Eva jî îzbatîke azaya Îsa ye mayîn bû, wextê ku Petrûs şande masîgirtinê û wextê ku ew masîyê ewlin bigirta, ewê devê wî da pare bidîta. Xwedê heta pirsa parê bac jî da çareserkirinê.

Îsa Xudanê dinîyayê ye. Ew Kurê Xwedê ye. Dinîya û ew hemû tişt çi ku tê da heye, ji alîyê Wî da hatîye çêkirinê û teslîmî Wî dibin. Lema jî Ewî zanibû, wekî devê wî measîyî da wê pare hebûya. Ew mecbûrbûyî bona wan pareya nexebitîbû: Ew Kurê Xwedê bû.

Gelo eva ew Îsa ye, Yê ku beşa pêşya vê da meriv dixeyîdandin û baxşandin nedixwest. Ewî da kifşê, wekî Ew ji baca paristgehê azabûyî ye, lê got: "Em wana nedine xeyîdandinê, here û bac bide". Tê bêjî hinek tişt anegorî hev nînin, usa nîne? Bersiv nava gotinên bi sirêda ne.

> "Wî çaxî şagirt hatine cem Îsa û gotin: "Nava padişatîya ezmîne mezin da kî ye?". Û Îsa gazî zarokekî kir, ew di navbera wana da da sekinandinê û got: "Ez rast dibêjime we, heger hûn paşda neyên û nebine mînanî zaroka, hûnê nekevine nava padişatîya ezmîn. Niha kî şexsê xwe bike mînanî zaroka, ew nava padişatîya ezmîn da mezin e"".
>
> – METTA 18:1–4

Li vir xebera kilît ev e: "Kî ku şexsê xwe teslîm bike". Paşê Îsa bi hûrgilî dibêje:

> "Ji we kî ku bixweze mezin be, bila xulamê we be... Çawa ku Kurê Mêriv nehat ku qulixî Wî bikin, lê Ew qulix bike û dewsa geleka şexsê Xwe bide"
>
> – METTA 2O:26–28.

Ay te ra gilî! Elametîke çi cûreyî! Îsa nehat ku qulixî Wî bikin, lê bona ku Ew qulix bike. Ew teslîmî tu merivekî nebû. Feqet Ewî ew rê bijart ku bi xebitandina azaya Xwe qulix bike.

## Azabûna bona qulixkirinê

Peymana Nû da, çawa lawên Xwedê, bangî me tê kirinê ku em mînanî Brayê xwe bin, nêzîkbûna me mînanî ya Wî be, çi ku em nava Îsa da dibînin.

> "Çimkî hûn bona azayê hatine gazîkirinê, birano: tenê azaya we menîyê nede bedenê, lê bi hizkirinê qulixî hev bikin".
>
> – GALATÎ 5:13

Cûrekî xebera "azayî" ya mayîn dikare bibe xebera "mecal". Çawa kurên Xwedê yên sax, em gerekê azayî û mecalên xwe bona qulixkirina bo şexsê xwe nedine xebatê. Azayî bona qulixa bo yên mayîn tê xebitandinê. Nava qulixê da azayî heye, lê nava koletîyê da destê te girêdayî ne. Kole ew e yê ku mecbû re qulix bike, lê xulam ew e yê ku bona qulixkirinê dijî. Were em bibînin ku çawa çend firqî di navbera tabîyên kole û xulam da hene:

- *Kole (bindest) bi mecbûrî dike, lê xulam na.*
- *Kole tiştê herî kêm ji tiştên dewkirî dike, lê xulam tiştê herî zêde.*
- *Kole gavekê diavêje, lê xulam diha gelekî.*
- *Kole xwe talankirî texmîn dike, lê xulam destvekirî ye.*
- *Kole girêdayî ye, lê xulam aza ye.*
- *Kole bona mafên xwe şerkarîyê dike, lê xulam na.*

Min dîtîye ku çawa gelek mesîhî bi tabîya teng qulix dikin. Ew bi nerazîbûn bacên xwe didin, çawa kole bin qanûnê da dijîn, ji kîjanê ew aza bûne. Ew dilê xwe da çawa kole dimînin.

Tiştê herî ku mêriv xemgîn dike ew e, wekî "qanûn" ji nivîsarên Peymana Nû hatîye çêkirinê. Nava wan da ew "ruh" tune, nava kîjanî da Îsa temîyên Xwe dan. Ew texmîn nakin, wekî bona qulixê azabûyî ne. Bona wê yekê jî ew bo kara xwe şerkarîyê dikin, lê ne ku bona merivên mayîn.

Pawlos bona şerkarîyê nama Romaya û Korîntîyan ra dişîne, kîjana da meseleke kifş tîne ber çava. Ew bona bawermendên vî cûreyî azayê himberî xurek dike. Pawlos bang dike: "Ewên ku nava bawerîyê da zeyîf in, bêyî devjenîya li ser fikira, qebûl bikin. Yek bawar dike ku hemû tiştî dikare bixwe, lê yê zeyîf pincar'ê dixwe" (Romayî 14:1, 2).

Îsa dabû zelalkirinê, wekî ew çi ku dikeve dêv ew nîne, wekî heram dike, lê ew çi ku ji dêv dertê. Wextê ku Ewî ev elametî kir, bi wê yekê Ewî hemû xurek bona bawermenda da helalkirinê (Marqos 7:18,19).

Pawlos dibêje, wekî bawermendên usa hebûn, yên ku nava bawerîya xwe da zeyîf bûn û ew hela hê ditirsîyan goşt bixun. Rast e Îsa derheqa wê têmayê da xeber dabû, lê wan meriva rûyê menîyên tirsa femdarî da nikaribûn goşt bixwerina.

> "Niha, li ser xwarina gorîyên ku ji pûtan ra tên dayînê, em zanin ku "pût li dinîyayê ne tiştek e... Lê bona me tenê Xwedêk heye, ew jî Bav e. Her tişt ji Wî ye û em jî bo Wî hene. Û tenê Xudanek heye, ew jî Îsa Mesîh e. Her tişt bi destê Wî hat efirandin û em bi Wî hene. Lê belê, her kes ne xwedîyê vê zanînê ye. Hinek jî, ji ber hînbûna pûtan, ya heta niha, li ser goştê ku ji pûtanra hatîye qurbankirin, hê jî dixun û hetanî niha giva usa ye û bi îsafa wane sist heram dibe".
>
> – 1 KORİNTÎ 8:4,6,7

Li wan civîna mesîhîyên bi bawerîya diha qewat, goştê nenas li ber mesîhîyên bi bawerîya xwe sist dixwerin. Ev yek wana li ber problêmekê da sekinandinê, nenihêrî wê yekê, wekî Îsa ev xwerin dabûne helalkirinê. Yên diha zeyîf nikaribûn ew şikilê mejûyê xwe da, yê qurbana pûtan, ji xwe dawşandana. Mesîhîyên bi bawerîya xwe diha qewat zanibûn, wekî pût tiştek nîne û li cem wan tiştê usa tune bû, wextê ku wana dixwar.

Feqet, çawa bawermendên Peymana Nû, ew diha gelekî bona xweyîkirina mafên xwe xemgîn bûn, wana kevirê xeyîdê danîbûne li ser rêya birayên xwe yên zeyîf. Tabîya vî cûreyî dilê xulam da tune. Binhêre ku Pawlos çawa berbirî wan dibe:

> "Vir hada êdî hev sûcdar nekin, lê hê zêdetir, biryarê bidin ku hûn astengîkê daneynin pêşiya birayekî ku gulor be yan ji rê derkeve... Çimkî Padişatîya Xwedê ne xwarin û

> vexwarin e, lê belê heqîtî, aşîtî û şahiya bi Ruhê Pîroz e”.
>
> – ROMAYÎ 14:13,17

Pawlos dixwest bigota: “Werin em bîr bînin ku bi rastî padişatî çî ye. Padişatî heqîtî ye, aşîtî û şahîya Ruhê Pîroz da ye”. Ev hemû tişt nava wan bawermendên nû da nehatibû hîmdanînê. Bawermendên bi bawerîya xwe diha qewat azaya xwe bona qulixê nedidane xebitandinê, lê bona parastina “mafên” xwe didane xebatê. Ulmê wane azaya Peymana Nû hebû, lê ulmê bêyî hizkirin dide tunekirinê. Îsa mafên xweye derheqa qatê paristgehê da li ber Pertûs û şagirtên mayîn da kifşê û derheqa girîngiya danîna emirên xweye bona qulixê şirove kir. Ewî tu cara azaya Xwe çawa mecal heasb nekir, bona ku dewa mafên me bike, bona ku nebe menîa ji rêderketin û xeyîdandina yên mayîn.

Pawlos vê eşaretîyê dide wana, ulmê kîjanaye mafê wan nava Îsa da hebû, lê dilê wanî bona qulixê ne mînanî yê Îsa bû.

> “Û ew birayê zeyîf wê rûyê ulmê te da unda be, bona kîjanî Mesîh mir. Û bi vî cûreyî, bi sûcdarkirina bira û lêxistina wijdanê yên zeyîf tu miqabilî Îsa guneh dikî”.
>
> – 1 KORİNTÎ 8:11,12

Em dikarin azaya xwe bona gunehkirinê bidine xebatê. Çawa? Bi gîhandina birîna yên hindava wan meriva, yên ku bi wijdanê xwe gelekî zeyîf in û em wî çaxî dibine menî ku biçûkekî Mesîh bixeyîde û ji rêya xwe derkeve.

## Dest ji mafên xwe berdan

Peyî wê yekê ra, wextê ku Îsa azaya Xwe ya derheqa bacê paristgehê da îzbat kir, Ewî piştgirîya şagirtên Xwe dikir û bersiva derheqa girîngiya gurêdabûnê da:

> “Yê ku ji van biçûka yekî bide xeyîdandinê, kîjan bawarîya xwe li Min tînin, diha baş e ku kevirekî aş stûyê wî

> va bê dardakirinê û ew niquyî nava behrê be. Wey li serê dinîyayê bona ji rêderxistinê, çimkî ew gerekê bên, feqet wey li wî merivî, bi destê kîjanî ew gerekê bê. Heger destê te, yan lingê te ji rê dide derxistinê, wî jêke û ji xwe dûr biavêje. Diha baş e tu seqet bî li vê dinîyayê, ne ku bi du desta û bi du linga bikevî nava agirê heta–hetayê. Heger çavê te te ji rê derdixe, çavê xwe der bixe û ji xwe dûr biavêje. Diha başe bi çavekî bikevî nava emir, ne ku bi du çava bikevî nava agir. Fesal bin, wekî ji van biçûka tu yekî bêhurmet nekin, çimkî ez we ra dibêjim, wekî milyaketên wan li ezmîn sifetê Bavê Min dibînin, Yê ku li ezmana ye”.
>
> – METTA 18:6–10

Ev beşa Încîla Metta da bi temamî derheqa xeyîdê da ne. Îsa zelal dibêje, wekî ji hemû tiştî aza bin, çi ku dibe menî ku gunehkarîyê bikin, heger ew yek ji mecaleke te ya ji Peymana Nû ye. Heger ew dibe menî, wekî birayê te guneha bike, li ber wî wê yekê “jêke”.

Diqewime tu bipirsî, lê bona çi Îsa gelek didane xeyîdandinê, çawa ku me beşa kitêbêye pêşîyê da dît. bersiva pirsê zelal e. Îsa hinek rûyê wê yekê da didane xeyîdandinê, wekî ewî gotinên Bavê xwe dikirin û bona yên mayîn qulix dikir. Xeyîdandina wî bona parastina mafê Wî nîbû.

Fêrisî dixeyîdîn, wextê ku Ewî roja şemîyê qenc dikir. Şagirtên Wî dixeyîdîn, çimkî Îsa ew rastî dianî ber çava, kîjan ya Bavê Wî bû. Meyrem û Marta xeyîdîn, wextê ku Ew carekêra nehat ku Lazar qenc bike. Feqet tê tiştê usa nebînî, wekî Îsa bona qulixkirina li ber Xwedê, yê mayîn bida xeyîdandinê.

Pawlos nava nama xwe da, ya bona Korintyan eşaretî da:

> “Tenê fesal bin, wekî azaya we bona yên zeyîf nebe xeyîdandin”.
>
> –1 KORİNTÎ 8:9

Azaya me hatîye dayînê, bo ku em qulix bikin û emirê xwe daynin. Em gerekê çê bikin, lê ne ku tune bikin. Ew azayî usa jî bona wê

yekê nehatîye dayînê, ku em hemû tiştî li ser xwe berev bikin. Roja îroyîn gelek cara em azayê bona xwe didine xebatê û ew yek dibe menî, wekî meriv ji jîyana mesîhîtiyê derdikevin.

Careke mayîn ewê eşaretîyê guhdar bike, kîjan hinekî pêşda me anî ber çava: “Tenê fesal bin, wekî ew azaya we nebe kevirê xeyîdandinê bona yên zeyîf”.

Ez meselekê bînim. Wextê ku ez cara duda bi rêwîtîya qulixê çûme Îndonêzîyayê, Lîza û zarokên min jî tevî min bûn. Em hatine ada Balîyêye Dênpasarê, kîjan tê hesabê çawa zona hêsabûnê.

Endamekî civîna cîh li merkeza bajêr da xweyê mêvanxaneke mezin bû. Em rêya dirêj çûbûn û em hindik razabûn. Bo wê yekê jî em westîyayî bûn. Wê şevê em çend cara ji denga û ewtînîya kûçika hişyar bûn. Em tenê şevekê li wê adê man û çawa ku lazim bû hêsa nebûn.

Rojtira mayîn em çûne ada Çavayê û her du hevtîyên mayîn me li wir qulix kir. Nava wî wedeyî da tenê rojeke meye aza hebû û ew jî bona rêwîtîyê bû. Nava 24 seheta da me li civînekê pênc cara qulix kir, hejmara endamên kîjanê dighîşte 3O–î hezarî.

Anegorî progiramê, gerekê piştî wê rêwîtîyê em dîsa ada Balîyê ra paşda vegeriyana. Serwêrê civînê me ra got ku em gerekê dîsa li wê mêvanxanê bimînin. Piştî her du hevtîyên wî cûreyî derbasbûyî, me êdî nedixwest ku em nava qewilên wî cûreyî da li wir bimana.

Şebeqê, wextê taştê, wextê ku em gerekê ji Çavayê biçûna Balîyê, jinekê pêşnîyar kir ku ewê parê mayîna me yên li cîhê hêsabûnêye li Balîyêye here baş bide. Ez şa bûm, çimkî mecala hêsabûnê û çûyîna li cîhekî bedew hebû.

Wextê em ji rêstoranê derketin, me eşîyayên xwe berev kirin, Lîzayê got ku ew hinekî ber xwe dikeve bona qebûlkirina pêşniyara wê jinê. Tevî tercimeçî me fikir pevguhartin û me got, wekî hemû tiştê baş be. Teyarê da Lîzayê got, wekî bi fikira wê me rast qirar nekirîye.

Min guhdarîya Lîzayê nekir. Wextê ku em gihîştine Balîyê û

wextê ku me eşîyayên xwe distendin, Lîzayê carekê jî got û dîsa fikira xwe îzbat kir, lê min ew yek hesab hilneda.

Wextê ku em rastî serwêr hatin, min wî ra got, wekî pêşniyareke baş bona me kirine û em naxwezin li wê mêvanxanê bimînin. Min texmîn kir, wekî gotina min li serwêr xweş nehat û me derheqa wê têmayê da xeberda.

Wî çaxî ewî zelal got: "Con, bi wê yekê tê endamê civînê, yê ku xweyê mêvanxanê ye û usa jî malbata wî bidî xeyîdandinê. Wana êdî pêşda oda we başqe kirîye û bona êvarîyê hazirîya xwe dîtine".

Min usa jî serwêr dabû xeyîdandinê, çimkî min ew yek qîmet nekiribû ku wana bona me çi hazir kiribû. Min gote wî, wekî em li wê mêvanxanê bimînin û emê ji pêşnîyara wê jinikê paşda bisekinin.

Xudan bona tabîya min tevî min xebitî. Min zanibû, wekî serwêr xeyîdî bû. Min dît, wekî bi p'arastina mafên xwe min ev bira dabû xeyîdandinê û ew yek êdî guneh bû. Min ji wî baxşandin xwest û ewî baxşande min. Gumana min heye, wekî ezê careke mayîn tiştê usa nekim.

## Têsta çêkirinê

> "Usa ye gerekê em peyî aşîtîyê û çêkirina himberî hev herin".
>
> – ROMAYÎ 14:19

Meremê me gerekê nebe menî, wekî rûyê azaya meye şexsî da yekî mayîn bişimite û bikeve. Ew çi ku em dikin, dikare tenê anegorî Kitêba Pîroz bê îzindayînê. Feqet tu bi xwe ji xwe bipirse: "Gelo ew yek bona çêkirina min, yan yekî mayîn e?".

> "Bona min her tişt bi qanûnî ye, feqet hemû tişt kardar nîne. Hemû tişt bona min qanûnî ye, lê hemû tişt çêkirinê nade. Bila tu kes tenê bona kara şexsê xwe negere, lê her kes ya hevalê xwe jî... Usa ye yan bixun, yan vexun, yan

> jî çi karî bikin, hemû tiştî bona rûmeta Xwedê bikin. Bêyî xeyîdandinê nêzîkî cuhîya, yûnana û civîna Xwedê bibin. Çawa ku ez bi hemû tiştî hemûya xweş dikim, kara şexsê xwe nagerim, lê ya geleka ku ew xilaz bin".
>
> – 1 KORİNTÎ 10:23,24,31–33

Ez piştgirîya te dikim, ku tu îzinê bidî Ruhê Pîroz, bona ku bi saya wan gotinên Kitêba Pîroz her govekeke emirê te paqij bike. Îzinê bide Wî, wekî ew hemû menîyên veşartî nîşanî te bikin, kîjan bona kara te ne, lê ne ku bona kara yên mayîn.

Ew yek girîng nîne, ku tê kîjan goveka emirê xwe qebûl bikî. Banga Wî, ya bona qulixkirina bo hemûya qebûl bike.

Azaya te ya nava Mesîh da bona azakirina yên mayîn bide xebatê, lê ne ku bona mafê xwe. Eva emirkirineke qulixa Pawlos bû: "Bi tu tiştî tu xeyîdekê em nadin, wekî qulix neyê şermezarkirinê" (2 Korintî 6:3).

## EW MERİVÊ KU NİKARE BİBAXŞÎNE BÎR KİRİYE, KU XWEDÊ DEYNEKÎ ÇAWA Lİ WÎ BAXŞANDÎYE.

“Eva êdî serê salekê ye, wekî nava kitêbên min da kitêba “Tela Şeytan” heye. Û min bi kutasî destpê kir wê kitêbê bixwînim. Min ra carekê ra li hev hat ku wî ruhî cuda bikim, kîjanî nava emirê min da cîhê xwe kiribû. Ez ketibûme nava şikberîyê û bona wê yekê jî ez bi xwendina vê kitêba bi Ruhê Pîroz va hatime rêberkirinê. Min çiqas gelek dixwend, ez awqas gelekî teslîm dibûm. Serwêrê civînê tewaqe kir, ku ew meriv pêşda bên, yên ku hewcê baxşandina yekî ne. Ez carekê ra pêþda çûm, bo ku wana bibaxşînim, himberî kîjana min texmîn dikir ku wana ez xeyîdandime, xwezima bavê min. Paşê min tewaqe ji bavê xwe kir ku bibaxşîne min. Ez razî me, wekî ewî baxşand û niha ez aza me. Spas bona vê kitêbê.

– R. P., VÊRCÎNÎA

# 11

# HEGER TU NEBAXŞÎNÎ, TÊ NEYÊYÎ BAXŞANDİNÊ

***"Bona vê yekê ez dibêjime we, heger hûn hemû tiştî bi duakirin tewaqe bikin, bawar bin ku hûnê bistînin. Û wextê ku hûn bisekinin dua bikin, bibaxşînin, heger miqabilî yekî tiştek heye, bona ku Bavê we jî, Yê ku li ezmana ye, sûcê we bibaxşîne. Feqet heger hûn nebaxşînin, Bavê we jî, Yê ku li ezmana ye, wê sûcê we nebaxşîne".***

**– MARQOS 11:24–26**

Ez dixwezim guhdarîyê bidime li ser wan encama, kîjan wî çaxî pêşda tên, wextê ku em înkar dikin ku xeyîdê ji xwe dûr bixin û çawa ji wê yekê xilas bibin. Îsa zanibû çi digot: "Heger hûn nebaxşînin Bavê we jî, Yê ku li ezmana ye wê sûcên we nebaxşîne". Em nava kûltûrake usa da dijîn, li kîderê hertim nîne, wekî em fem dikin

ku çi dibêjin. Em merivên mayîn bawar nakin ku fikira wan çi ye, wextê ku ew me ra tiştekî dibêjin. Gotina şexsekî bi temamî nayê qebûlkirinê.

Ev yek ji zarotîyê destpê dibe. Dê yan jî bav dibêje zarokê: "Heger tu wê yekê carekê jî bikî, ezê te bixim".

Zarok ne tenê wê yekê dîsa dike, lê hela hê zêde dike. Zarok careke mayîn eşaretîyê ji dê û bava distîne. Bi tomerî hildayî tiştekî usa nayê kirinê, wekî ew kirin bê rastkirinê. Heger tê kirinê jî ji tiştê sozdayî hinekî nermtir, yan jî diha berk dibe, çimkî hêrsa dê û bava radibe.

Ji vê yekê bona zarokê zelal dibe ku tu xweyê sozê xwe nînî, yan jî çi dibêjî ew rast nîne. Zarok şaş dibe û qedirê dê, yanê jî bav girîng hesab nake. Bi vî cûreyî usa jî nava govekên emire mayîn da berdewam dibe. Zarok bi van norma usa jî dersdara, hevala, mezina dinihêre. Wextê ku ew dighîje, ew gotinên xwe girîng hesab nake, soza dide, elametîya belav dike û dîna xwe nade wan.

Ez mînakekê bînim. Cîm û Tom rastî hevdu tên. Ew Tom nas dike, lê menî tune bûye ku bi hev ra nêzîkayê bikin. Cîm ji wê rasthatina nişkêva dilteng dibe, çimkî ew lez e, lê niha jî gerekê bi mecbûrî qise bike.

Ew hevdu dinhêrin. Cîm dibêje: "Şikir ji Xudan, bira. Baş e ku ez te dibînim".

Ew hinekî qise dikin. Çawa ku Cîm lez diket, ew qisê ser hevda tîne û dibêje: "Em gerekê rojekê dora sivira xwerinê rastî hevdu bên".

Berê ewlin Cîm şa nîbû, wekî ewî Tom dît, çimkî ew lez bû. Ya duda ew e, wekî ew derheqa Xudan da nedifikirî, lê ewî vî cûreyî silav da Tom: "Şikir ji Xudan". Ya sisîya ew e, wekî meremê Cîme teglîfkirina bona xwerinê tune bû. Ew yek mecal bû ku xeberdanê ser hevda bîne û wijdanê wî rihet be. Dêmek, ew çi ku Cîm got, gotinên vala bûn.

Halên vî cûreyî her roj jî pêşda tên. Roja îroyîn gelek meriv wê yekê nakin, çi ku dibêjin. Em wedekî usa da dijîn, wextê ku em nizanin, ku gelo meriv xweyê sozê xwe ye, yan na?.

Feqet, wextê ku Îsa xeber dide, Ew dixweze ku gotina Wî bi temamî bê qebûlkirinê. Em nikarin gotinên Wî wî cûreyî binihêrin, çawa ku em şexsên qedirbilind dinihêrin, yên ku nava emirê me da nin. Wextê ku Îsa tiştekî dibêje, ew hema wê yekê jî hesab hiltîne. Ew wî çaxî jî pişta me ye, wextê ku em himberî wî usa nînin. Îsa nava dereca rastîyê û paqijîyêye usa da digere, kîjan ji sînorên kûltûra û civaka me jortir e. Bona wê yekê jî, wextê ku Îsa dibêje ku heger hûn nebaxşînin, Bavê we jî, Yê ku li ezmana ye, wê sûcên nebaxşîne we. Meremê gotina wî hema ev e.

Ew derheqa vê yekê da carek nîne ku dibêje. Îsa girîngîya vê eşaretîyê dide kifşê. Werin em çend elametîyên vî cûreyî binihêrin, wextê ku Ewî nava halên cûre–cûre da kirin.

> "Çimkî heger hûn xirabîyên meriva wan ra bihêlin, Bavê weyî jorin jî wê we ra bihêle. Lê heger hûn xirabîyên wan meriva wan ra nehêlin, Bavê we jî wê xirabîyên we nehêle".
>
> – METTA 6:14,15

Û dîsa:

> "Bibaxşînin û hûnê bêne baxşandinê".
>
> – LÛQA 6:37

Careke mayîn em nava duada dixwînin:

> "Û deyînên me me ra bihêle, çawa ku em deyîndarên xwe ra dihêlin".
>
> – METTA 6:12

Hewaskar e ku wextê me bizanibûya ku çiqas mesîhî wê bixwestana, wekî Xwedê usa bibaxşanda wana, çawa ku ew hev dibaxşînin, yên ku ew dane xeyîdandinê. Hema ev e rê, bi kîjanê ewê baxşandinê bistînin, çimkî nebaxşandin li civînê awqas belavbûyî ye, bo wê yekê jî em naxwezin van gotinên Îsa bi dil qebûl bikin. Belavbûyî ye yan na, rastî nayê guhartinê. Çawa ku em dibaxşînin

û şexsekî mayîn didine dasekinandinê, wî cûreyî jî wê me ra usa be.

Min şedetîya qulixçîkî li Fîlîpîna bihîst. Hevalên min, yên ku ew nas dikirin, miqalek nîşanî min kirin, kîjanê da derheqa cêribandinên wî qulixçîyî da dihate gilîkirinê.

Ew çend sala ser hev miqabilî gazîya Xwedê ya bona emirê wî derketibû, çimkî bîznêsa wî ya baş hebû. Ewî hebûneke mezin berev kiribû. Teslîmnebûna wî merivî bi kutasî zyan da wî rûyê nexweşîya dil da û wî cîguhartî nexweşxanê dikin.

Wextê emelyetkirinê ew dimire û ew xwe ji dergehên ezmîn der dibîne. Li wir ew rastî Îsa tê, Yê ku derheqa teslîmnebûna wî da xeber dide. Ew tewaqe ji Xudan dike, wekî heger Ewê emirê wî dirêj bike, ewê qulixî Îsa bike. Xudan qayîl dibe. Pêşîya şandina wî ya nava bedena wî, Xudan şikilê cehnemê nîşanî wî dide. Ew meriv li wir xasîya xwe dibîne, ya ku nava agirê cehnemê da dişewitî. Ew zendegirtî dimîne, çimkî ewê jinê "dua tobekirinê" kiribû û çûbû li civînê. Ew ji Xudan dipirse: "Bona çi ew li cehnemê ye?". Xudan bersivê dide, wekî ewê jinê nebaxşandîye xêrxwezekî xwe, bo wê yekê ew jî nehatîye baxşandinê.

## Baxşandin û mezinbûna ruhanî

Ez û Lîza rastî gelek mînaklên tela nebaxşandinê hatine. Wextê ku ez cara ewlin bi meremê qulixkirinê li Îndonêzîayê bûm, ez maleke bîznêsmênê dewletî da dimam. Ew xilasbûyî nîbû. Feqet, malxwê malê û endamên malbetê diçûne li wê civînê, li kîderê min qulix dikir.

Nava hevtêkê da, wextê ku ez mala wan da bûm, jin û mêr û her sê zarokên wan xilas bûn. Azayî pêşda hat û atmosifêra temamîya malê hate guhartinê. Mala wan bi şabûnêva tijî bû. Wextê ku ew pê hesîya, wekî ez gerekê tevî jina xwe careke mayîn bême Îndonêzîayê, ewî em teglîf kirin ku mala wan da bimînin û gotin ewê parên bilêtên teyarêye bona me, usa jî zaroka, bikirin.

Em hatin û me deh cara li wê civînê qulix kir. Min derheqa to-

bekirinê û hazirîya Xwedê da xeber dida. Me nava qulixkirinê da hazirîya Xudan texmîn dikir û li dor–berên me hêsir û gazîyên bona azayê hebûn. Me careke mayîn jî bona temamîya malbata wan qulix kir. Dayîka wî bîznêsmênî, ya ku li wî bajarî dima, wextê qulixê li wir hazir bû. Ewê jinê jî êpêce pare danîbûn, ku bona em bilêtên teyarêye bona zaroka bikirin.

Wextê ku hevtê êdî nêzîkî dawîyê bû, ewê jinê raste–rast li çavên min nihêrî û pirsî: "Con min bona çi tu cara hazirîya Xwedê texmîn nekirîye?".

Me teze taştîya xwe ser hevda anîbû û her kes ji dora sivirê çûbû.

Ewê xeberdana xwe dom kir. "Ez wextê her qulixkirineke te hazir bûme û min guhdarîya te kirîye, çi ku te gotîye. Ez bona tobekirinê hatime, lê min tu cara hazirîya Xwedê texmîn nekirîye. Û bi tomerî hildayî min tu cara hazirîa Xwedê texmîn nekiriye".

Min tevî jinikê qise kir û paşê min gote wê: "Were em bona te dua bikin, bona ku tu bi Ruhê Xwedê va tijî bibî". Min destê xwe danî li ser wê û dua kir, ku ew Ruhê Pîroz bistîne, lê texmînkirina hazirîya Xwedê tune bû. Paşê Xwedê min ra got: "Ew nabaxşîne mêrê xwe".

Min destê xwe paşda kişand. Min zanibû, wekî mêrê wê jinê wefat bibû. Min gote wê: "Xudan nîşanî min dide, wekî tu nabaxşînî mêrê xwe". "Belê, rast e, lê min hemû tişt kirîye bona baxşandina wî".

Paşê ewê derheqa kirinên mêrê xwe da gilî kir.

Min fem kir, ku ew bona çi bona baxşandina mêrê xwe şerkarîyê dike. Feqet min gote wê: "Bona ku tu ji Xwedê bistînî tu gerekê bibaxşînî". Paşê min şirove kir, ku Îsa derheqa baxşandinê da çi hîn dikir.

> "Tu nikarî mêrê xwe bi qewata xwe bibaxşînî. Tu gerekê wê yekê bînî ber Xwedê û tewaqe bikî, ku ew te bibaxşîne. Paşê jî tu dikarî mêrê xwe bibaxşînî. Tu dixwezî mêrê xwe aza berdî?", – min jê pirsî. "Belê", – ewê got.

Min rêberî li wê kir, bona duakî zelal: "Bavê Ezmana, bi navê Îsa, ez baxşandina Te tewaqe dikim bo nebaxşandina mêrê xwe. Xu-

dan, ez zanim, wekî ez nikarim êdî bi qewata xwe bibaxşînim. Ez êdî şaş bûme, lê niha li ber Te ez ji bi dilê xwe mêrê xwe aza berdidim. Ez wî dibaxşînim”.

Wextê ku duakirin ser hevda hat, hêsirên wê ketine li ser sûretê wê.

“Destên xwe bilind bike û bi zimana xeberde”, – min gotê.

Cara ewlin ewê bi zimanê dinîyaêye bedew dua dikir. Dora sivira taştê me hazirîya Xudan texmîn kir. Em bi hazirîya Xwedê va tijî bibûn.

Nêzîkî pênc deqa ew jin digirîya. Me hinekî jî qise kir, paşê min gote wê, ku ew gerekê ji hazirîya Xudan razîbûnê bistîne. Ewê pesindayîna Xudan berdewam kir. Min ew tenê hişt.

Wextê ku ew behs gihîşte kurê wê û bûka wê, ew zendegirtî mabûn. Kurê wê digot, wekî ewî tu cara nedîtîye, ku çawa dayîka wî digrî. Ewê jinê bi xwe jî bîr nedianî ku cara dawîyê kengê girîya bû. “Hema wî çaxî jî, wextê ku mêrê min mir, ez negirîyam”, – ewê digot.

Hema wê êvarê, wextê qulixê ew bi avê hate nixumandinê. Nava hersê rojên peyî ra, her dem ken ber devê wê bû.

Ewê jinê nebaxşandibû û nebaxşandinê ew kiribû dîl. Feqet, hema wî çaxî, wextê ku ewê mêrê xwe aza berda û baxşande wî, nava emirê xweda ewê qewata Xudan stend û hazirîya Wî nas kir.

## Xulamê ku nebaxşand

Nava beşa 18 a da, ya Încîla Metta da Îsa diha gelekî zelal derheqa nebaxşandina û xeyîdê da xeber dide. Ewî şagirt hîn dikirin ku çawa wî birayî ra li hev bên, kîjanî ew daye xeyîdandinê. (Têma lihevhatinê da emê diha dereng, beşeke mayîn da gotûbêj bikin).

Petrûs pirsî: “Xudan, gava ku birayê min li hemberî min guneh bike, divê ez çend cara wî bibaxşînim, hetanî hevt cara? (Metta 18:21).

Petrûs difikirî, wekî ew gelekî berbihêr e. Ew hiz dikir berbirî pirsên êkstrêmal bibe. Ew yekî usa bû, kî ku gotibû: “Heger bixwezî li vir em sê holika çê bikin, yekê ji te ra, yekê ji Mûsa ra û yekê jî ji Êlyas

ra" (Metta 17:4). Niha jî ew difikirî ku ew yekî berbihêr e: "Ezê usa bikim, li ber Serwêr bêjim, wekî ez hazir im hevt cara bibaxşînim".

Feqet, Petrûs bersiveke ecêb stend. Îsa ew hemû tişt avîte alîkî, çi ku Petrûs çawa berbihêrî hesab dikir: "Ez nabêjime te hetanî hevt cara, lê hetanî 77 cara" (Metta 18:21, 22). Dêmek, bibaxşîne, çawa ku Xwedê bêyî sînor dibaxşîne.

Paşê Îsa metelokek gilî kir:

> "Bona vê yekê padişatîya ezmîn bû mînanî merivekî padişa, kîjanî xwest tevî xulamên xwe hesab rûnî. Wextê ku destpê kir hesab rûnê, yek anîne cem wî, yê ku deh hezar telantî deyîndarî wî bû".
>
> – ETTA 18:23, 24

Bona ku em girîngya gotina Îsa fem bikin, gerekê bizanibin ku telantî çi bû. Telantî mengiranyê pîvanê bû. Ew bona çapkirina zêr (2 Padişatî 12:30), zîv (3 Padişatî 20:39) û hesinên mayîn didane xebatê. Telantî 75 fûnt e. Eva ew giranî bû, kîjan dikaribû ya meriva bûya (4 Padişatî 5:23). Deh telantî nêzîkî 75O î hezar fûnt e, yan jî 375 tona ye. Usa dertê, wekî xulam 375 tonna zêr deyîndarî padişê bû.

Niha qîmetê zêr nêzîkî 375 dolara ye. Nava sûka îroyîn da telantîk zêr wê bighîşta 45O î hezar dolara. Bona wê yekê jî deh hezar telantî wê bike çar mîlîyard 5OO mîlîyon dolar. Dêmek, xulam çar mîlîyard 5OO mîlîyon dolara deyîndarî padişê bû.

Îsa li vir tiştek da dîyarkirinê, wekî deyînekî xulam hebû, kîjan ewê tu cara nikaribûya bida. Em dixwînin:

> "Lê çimkî ewî nikaribû deyînê xwe bida, xweyê wî emir kir, ku ew, jina wî, zarên wî û hemû hebûna wî bêne frotanê, ku deyînê wî bê dayînê. Wî çaxî xulam deverûya çû nigê wî, lava jê kir û got: "Li min sebir bike, ezê hemû tiştî li te vegerînim". Gunê xweyê wî li wî hat, ew berda û deyînê wî jî baxşandê"
>
> – METTA 18:25–27

Niha werin em fikira metelokê û xeyîdê himberî hev bikin. Wextê ku xeyîd heye, usa ye deyn jî heye. Te bihîstîye, wextê ku tê gotinê: "Ewê bona vê yekê bide". Dêmek, baxşandin mînanî tunebûna deyîn e.

Padişa Xwedêyê Bav raber dike û Ewî jî deyîn baxşande xulam, yê ku ewî nikaribû bida. Di Kolosî 2:13, 14–da dibînin: "Û hûn wextekê bi ruhanî nava neheqîya û binyata xweye gunehkare nesinetkirî da mirî bûn, lê Xwedê hûn tevî Mesîh sax kirin. Ewî hemû neheqîyên me baxşandine me û ew kaxeza deyînên meye ku bi qeyde–qanûnî miqabilî me hatibû nivîsarê, ji navê hilda û darmixê xist".

Ew deynê ku li me hate baxşandinê, nikaribûn bidana. Meyê tu cara nikaribûya ew deynê Xwedê bida. Xeyîda me nedihate altkirinê. Bona wê yekê jî Xwedê xilasbûn çawa pêşkêş da. Îsa dewsa wê nasnama deyîn da, kîjan miqabilî me bû. Em dikarin heleqetîya xulame tevî padişê û usa jî ya me ya tevî Xwedê himberî hev bikin.

"Lê çaxê xulam derket, rastî xulam–hevalekî xwe hat, yê ku sed zîvî deyîndarê wî bû, dest kire xeneqê û gotê: "Tu çiqasî deyîndarê min î, bide"" (Metta 18:28).

Anegorî Kitêba Pîroz, ya "Logos" êye hînkirinê, zîvek wî çaxî nêzîkî aylixa xebatkarekî rojê bû. Bi vî cûreyî, roja îroyîn sed zîv wê bibûya nêzîkî çar hezar dollara. Niha xwendinê bidomîne:

> "Wî çaxî hevalê xulam xwe avîtie nigê wî, jê lava kir û gotê: "Li min sebir ke. Ezê li te vegerînim". Lê ewî guh neda wî, çû ew avîte kelê, heta ku ew deyînê xwe bide".
>
> – METTA 18:29, 30

Xebatkarekî wî hinek pare, yek sêanîya aylixa salê, deyîndarê wî bû. Teyê çi bikira, heger te yek sêanîya aylixa xwe unda bikira? Feqet bîr bîne, wekî deyînê çar mîlîyard û 5OO mîlîyonî li wî merivî hatibû baxşandinê. Ew pare awqasî gelek bûn, wekî ewî merivî wê nikaribûya nava emirekî da awqas pare qazanc bikira.

Xeyîda, kîjana em himberî hev distînin, himberî xeyîdên himberî Xwedê tên kirinê, usa çawa ku çar hezar dolar himberî çar mîlîyard 5OO mîlîon dolara hate kirinê. Diqewime merivek xirab nêzîkî me

bûye, lê wê yekê himberî wan xirabkarîyên me nakin, kîjan himberî Xwedê hatine kirinê.

Diqewime tu texmîn dikî, wekî tu kes mînanî te nava halekî awqas xirab da nîne. Feqet tu texmîn nakî ku çiqas xirab nêzîkî Îsa bûn. Ew sûcdar nîbû, Berxekî bêsûc, Yê ku hate kuştinê.

Ew merivê ku nikare bibaxşîne, derheqa wî deyînê mezin da bîr kirîye, kîjan baxşandine wî. Wextê ku tu fem bikî, wekî Îsa te ji mirina heta–hetayê û zêrandinê aza kirîye, tê yên mayîn bêyî tu qewila aza bikî. Ji wê yekê xirabtir tişt tune, wextê ku tu nava gola agire heta–hetayê da nî. Li wir rihetî tune, kurm namire, lê agir jî vênase. Ev bû axirîya me, hetanî ku Xwedê bi destî Kurê Xwe Îsa Mesîh baxşande me. Alêlûya! Heger bona te baxşandin dijwar e, wî çaxî derheqa rastîya cehnimê da û hizkirina Xwedê da bifikire, ku te ji wê yekê xilas kir.

## Dersên bona bawarmenda

Werin em metelokê berdewam bikin:

> "Xulamê xirab, min hemû deyînê te baxşande te, bona wê yekê ku te lava ji min kir, lê ji te nediket ku tu jî li xulam hevalê xwe bihatayî rehmê, çawa ku ez te hatime rehmê?".
>
> – METTA 18:31–33

Îsa nava vê metelokê da derheqa bêbawara da nedigot. Ewî derheqa xulamên padişê da digot. Li vî merivî deyînekî mezin hatibû baxşandinê (xilasbûn) û ew çawa "xulam" dihate navkirinê. Ewê ku wî nebaxşandê "xulam–hevalê" wî bû. Em tên li ser wê fikirê, wekî eva derheqa wî bawarmendî da bû, yê ku baxşandin înkar kir.

> "Û axayê wî hêrs ket, ew da destê zulmdarên kelê, heta ku ew hemû deyînên xwe vegerîne. Usa jî Bavê Min Yê Ezmana wê li serê we her yekî bike, heger hûn bi dil nebaxşînine birê xwe".
>
> – METTA 18:34, 35

Nava van xebera da sê xalên sereke hene:

1. Xulamê ku nabaxşîne tê zêrandinê.
2. Ew borcdar e deyînê xweyî pêşda, 375 tonna zêr, paşda vegerîne.
3. Xwedêyê Bav wê wî cûreyî himberî her bawarmendekî bike, kî ku xeyîda birê nabaxşînê.

***1. Xulamê ku nabaxşîne, tê zêrandinê.***

Ferhenga Vêbstêr xebera "zêrandin" vî cûreyî şirove dike: "Zêrandina bedenê, yan fikir", yan jî bi êşandina xedar ceza bikin, bi mecbûrî, yan jî bi xwestina xwe "xweşhatina" sadîstîyê nîşan bidin".

Ewên ku berbi zêrandina vî cûreyî meriva def didin, ew ruhên cina ne. Xwedê îzinê dide "ewên ku dizêrînin" bedenê û fikir bêşînin û bizêrînin, heger ew bawarmend bin jî. Wextê qulixê min gelek cara bona wan meriva dua kirîye, yên ku nikaribûne qencbûnê, yan jî azabûnê bistînin, çimkî wana dilê xwe da yên mayîn nebaxşandine.

Doxtir û ulmdar nebaxşandinê û talayê nexweşîyên usa va didine girêdanê, yên mînanî artrîtê û penceşêrê. Nexweşîya ruhanî gelek cara hema talaya nebaxşandinê va didine girêdanê.

Hîmlî baxşandin bîrkirina şaşîyên merivên başqe ye. Lê carna ew li cem te tê bîrkirinê. Îsa got: "Heger tiştekî te miqabilî yekî mayîn heye, bibaxşînê... " (Metta 5:23,24). Bi gotina "yekî mayîn", dixweze bêje, wekî tu bi xwe jî nav da yî. Heger Xwedê baxşandîye te, wî çaxî tu kî yî, wekî nabaxşînî yekî mayîn, yê ku ji alîyê Xwedê da hatîye baxşandinê, heger ew yek tu yî jî.

***2. Xulamê ku nebaxşand mecbûr bû deyînê pêşda nedayî bide.***

Pêşnîyarî wî kirin tiştekî usa, çi ku ne nêzîkî aqila bû. Ew yek mînanî tiştekî usa bû, wekî heger pêşnîarî me bikirana ku dewsa wî deynî bidin, yê ku Îsa li Golgotayê paşda da.

Emê xilasbûna xwe unda bikin.

Diqewime tu bêjî: "Deqekê sebir bike. Ez difikirim, wekî heger merivekî carekê duakirina tobekirinê kirîye û emirê xwe teslîmî Îsa kirîye, wî çaxî ew meriv tu cara nikare unda be".

Heger tu bawarîya xwe li wê yekê tînî, wî çaxî şirove bike, ku bona çi Petrûs vî cûreyî nivîsî:

> "Heger ewên ku bi zanebûna hindava Xudan û Xilazkirê me Îsa Mesîh carekê ra destê xwe ji heramîyên dinê kirin, paşê dîsa bikevine nava wan heramya, bidine der, axirîya wanê ji ya pêşin xirabtir be. Wan ra hê qenc bû ku qet ev rêya rastîyê nas nekirana, ne ku piştî naskirinê, ji wê temîya Pîroz dageryane, ya ku wan ra hate dayînê"
>
> – PETRÛS 2:20,21

Petrûs derheqa wan meriva da xeber dida, yên ku bi saya xilasbûna Îsa Mesîh ji gunehên dinîyayê revîbûn. Feqet, paşê ew careke mayîn ketibûn nava wan gyneha û ji wana bin ketibûn.

Bi gotina serkeftinê, Petrûs dixwest bigota, wekî ew paşda venegerîyan û tobe nekirin. Petrûs ew yek îzbat kir, wekî vegerandina berê xwe ji heqîtîyê diha xirab bû, ne ku wî çaxî, wextê ku tu hela hê ewê nas nakî. Bi gilîkî mayîn gotî, Xwedê dibêje, wekî diha baş e tu cara xilas nebî, lê ne ku pêşkêşa emirê heta–hetayê bistînî û paşê berê xwe ji wê vegerînin.

Cihûda jî derheqa merivên civînê da digot, yên ku "du cara miribûn" (Cihûda 12,13). Fikira mirina du cara dide kifşê, wekî tu carekê bêyî Mesîh miribûyî, lê paşê, bi qebûlkirina Wî, tu sax bûyî, lê paşê tu careke mayîn mirî, wextê ku tu ji rêyên Xwedê paşda sekinîyî.

Em dibînin, wekî gelekê bên cem Îsa, wê xwe afû bikin û bêjin: "Xudan, Xudan, ne me bi navê Te pêxemberî stend, bi navê Te cin derxistin û bi navê Te gelek tiştên mezin kirin? Û Ezê wî çaxî zelal bêjime wana, ku min Hûn tu cara nas nekirine, ji Min dûrkevin, kî ku xirabkarîyê dike" (Metta 7:22,23).

Wana Îsa nas kiribû, wana Îsa çawa Xudan nav kiribû û bi navê Wî ecêb kiribûn, lê Îsa ew nas nekirin.

Îsa kê nas bike? Pawlos dinivîsî: "Heger yek Xwedê hiz bike, ewê ji alîyê Wî da bê naskirinê (1 Korîntyan 8:3). Xwedê wan meriva nas dike, yê ku Wî nas dikin.

Tu dikarî bêjî: “Ez Xwedê hiz dikim, Ez awqasî vî birayî hiz nakim, yê ku ez xeyîdandime”. Wî çaxî tu xapîyayî û tu Xwedê hiz nakî, çimkî nivîsar e: “Heger yek bêje ku Xwedê hiz dike û birayê xwe hiz nake, ew derewîn e, çimkî ew birayê ku dibîne hiz nake, lê heger Xwedê nedîtîye, çawa dikare Wî hiz bike?” (1 Yûhena 4:20). Tiştekî gelekî xirab e, wextê ku meriv tê xapandinê, çimkî merivê xapîyayî bi dilê xwe bawar dike ku ew bi xwe rast e. Ew bawar dike, wekî ew li ser rêyekê ye, lê bi rastî li ser rêyeke başqe ye. Ew merivê ku naxweze gura Gotinê bike, ew dilê xwe dixapîne.

Ew yek hewaskar nîne, wekî “gelek” hîvîyê ne, herine Ezmîn, lê wê bêne înkarkirinê û Îsa jî got, wekî gelekê rojên dawîyê xeyîdî bin? (Metta 24:1O). Gelo ev her du kom dikarin hema wan meriva jî bikine nava xwe?.

Hinek bawarmend rûyê nebaxşandinê da awqas zêrandî ne, wekî gumana wan heye ku mirinê rihetîyê bona wan bîne. Feqet eva rast nîne. Emê niha pirsên nebaxşandinê hel bikin, heger na, wî çaxî em gerekê bona dayîna deyînê nedayî bêne gazîkirinê.

***3. Xwedê wê himberî her bawarmendekî wî cûreyî bike, yê ku înkar dike ku bi dil bibaxşîne û ew yek girîng nîne, ku birîn yan jî xeyîd bi çiqasîva mezin e.***

Îsa mexsûs usa kir, wekî em bi rastî vê metelokê fem bikin. Bawarkî hemû meteloka da Îsa şirovekirin nedida, hetanî ku şagirtên Wî tewaqe nedikirin. Vê carê ewî dixwest, wekî pirsên bêyî bersiv, yên derheqa berkbûna dadê da nemînin, ya wê dadê, kîjanê bona wan meriva bê kirinê, yên ku nexwestine bibaxşînin.

Carên mayîn jî Îsa wê yekê dide femkirinê, wekî heger em nebaxşînin, emê neyêne baxşandinê. Bîr bîne, wekî Îsa mînanî me nîne. Ew çi ku dibêje hema bona wê yekê ye. Gelek cara em vê yekê li civînê nabînin. Dewsa wê gelek cara ew yek tê afûkirinê. Nebaxşandin himberî zinêkarîyê, dizîyê, îçikevexwerinê, gunehekî diha biçûk tê hesabê. Feqet, ewên ku nabaxşînin, ewê padişatîya Xwedê tevî wana nestînin, yên ku gunehên mayîn dikin.

Hinek meriv dikarin bifikirin, wekî eva temîke gelekî berk e, lê

bona min ev yek çawa temîya eşaretîdayînê ye, lê ne ku çawa ya dada berk tê bihîstinê. Gelo tê niha wê yekê hesab bikî çawa tiştekî hê bilind, ku Ruhê Pîroz miqabilî te derkeve û careke mayîn tobekirinê û baxşandinê ra derbas bibî, yan tê wê yekê rast hesab bikî, ku baxşandinê înkar bikî û ji Xudan van xebera bibhêyî: “Dûr here”? Wî çaxî mecala te ya tobekirinê wê tune be.

# EM GEREKÊ Jİ HEYFHİLDANÊ USA DÛR BİMÎNİN, WEKÎ PAŞÊ MECALA ME HEBE KU EM ÎZİNÊ BİSTÎNİN.

“Bona nivîsara kitêba “Tela Şeyt’an”, bona gura We ez ji Xwedê razî me. Ev kitêb awqas pîrozkirî ye, wekî Ruhê Xudan her dem tevî min bû, wextê ku min dixwend, kîjanê du roja kişand. Evê kitêbê bi temamî emirê min guhart. Ez ji xeleqên xeyîda azad bûme û ezê berdewam bikim dil û fikirên xwe bona azamayînê hîn bikim”.

– L. M., KAROLÎNA BAŞÛR

# 12

# HEYFHİLDAN TELE YE

***"Ji ber xirabîyêva xirabîyê li tu kesî nekin.***
***Çi li ber çavê hemû meriva qenc e, wê yekê bikin".***
**– ROMAYÎ 12:17**

Çawa ku me beşa derbasbûyî da dît, nebaxşandina xeyîdê mînanî tiştekî usa ye çawa ku tu deyîndarê yekî bî. Wextê ku merivek ji yekî mayîn zyanê dibîne, ew bawar e, wekî ewê din deyîndarê wî ye. Ew hîvîya dayîn e, yan bi para yan jî bi tiştekî mayîn.

Sîstêma meye mhekemê bona wê yekê ye ku mafên wan meriva biparêze, hindava kîjana şaşî hatîye kirinê, yan jî zyan dane wan. Îşên mehkemê dicêriîbînin dewakarîyên wan bidne razîkirinê. Wextê ku merivek ji yekî mayîn zyanê ketîye, heqîtîya merivatîyê dibêje:

"Ewê bona wê yekê li ber cabdarîyê bisekinin, çi ku wana kirîye û heger gunehkarkirin bê îzbatkirinê, ewê dewsê bidin". Xulamê ku nebaxşand dixwest ku xulam–hevalê wî deyn paşda vegeranda û paşdavegerandina wî deynî ew nava dadgeha qanûnê da digerîya. Eva rêya heqîtîyê nîne.

> "Delalno, heyfê hilnedin, lê cîh bidne hêrsa Xwedê, çimkî nivîsar e: "Heyfhildan destê Min e, Ezê heyfê hilînim", – Xudan dibêje".
>
> – ROMAYÎ 12:19

Bona me, zarokên Xwedê, ew yek rast nîne, wekî em bi xwe heyfê hildin. Eva hema ew yek e, çi ku em digerin, wextê ku em baxşandinê înkar dikin. Em dixwezin, digerin, program dikin û heyfhildanê mîyaser dikin û hetanî wî çaxî nabaxşînin, hetanî ku deyn bi temamî nayê paşdavegerandinê. Û tenê em qebûlkirina dayîna deyîn qirar dikin. Wextê ku em dicêriibînin ewê şaşîyê, ya hindava meda mîyaserkirî, rast bikin, em xwe dewsa dadkir diatînin. Lê em zanin, wekî

> *"Tenê Qanûndarek û Hakimek heye,* Yê *ku dikare hin xilas bike û hin jî unda bike. Lê tu* kî *yî ku loma li hevalê xwe dikî? B*êh*na xwe ji hevdu teng nekin xwîşk* û *birano, ku* dîwana we nebe. Va *ye hakim li pi*ş *dêrî sekinî ye".*
>
> – AQÛB 4:12, 5:9

Xwedê ye Hakimê bi heq. Ewê dîwana bi heq derbas bike, lê Ewê anegorî heqîtîyê dewsê bide. Heger yekî şaşî kirîye û bi bêqelpî tobe dike, wî çaxî karê Îsayî li Golgotayê kirî deyn dide hêçkirinê.

Diqewime tu bêjî: "Lê şaşî hindava min da hatîye kirinê, lê ne ku himberî Îsa". Belê usa ye, lê tu mezinaya wê şaşîyê texmîn nakî, kîjan te hindava Wî kir. Îsa Qurbana bêsûc bû, Yê ku bêguneh hate dinîyayê, nenihêrî wê yekê wekî her merivek guneh kiribû û ew gerekê bimira. Ji me her yek jî qanûnên Xwedê teribandine, kîjan ji qanûnên dinîyayê jortir in. Heger heqîtîyê kar bikira emê li ber dîwana ezmîne here bilind bisekinîyana.

Diqewime ku te menî çê nekirîye ku himberî te şaş bin. Lê heger tu bicêribînî ewê himberî wê yekê bikî, çi ku hindava te da hatîye kirinê û ew hatîye baxşandinê, te çi kirîye û tu hatî baxşandinê, tê bibînî, wekî tiştê himberîhevkirinê nîne. Te qet deynê xwe jî neda-ye. Heger tu xwe xapîyayî texmîn dikî, wî çaxî te femdarîya, yan jî fikira dilovanîya hindava xwe da unda kirîye.

## Tu qulçekî tarî

Anegorî Peymana Kevin, heger te miqabilî yekî xirabkarî kiribû, îzina wî hebû ew wî cûreyî miqabilî te bikira. Îzin didan ku deyna paşda hildî, dewsa xirabîyê bi xirabîyê cabê bidî (Lêwî 24:19, Derketin 21:23–25).

Wî çaxî qanûn tiştê herî grîng bû. Îsa hela hê nemiribû bona azakirina wan.

Niha binihêre ku çawa Ew berbirî bawarmendên heca Nû dibe:

> *"We bihîstîye ku hatîye gotinê:* "Çav dewsa çav, diran dewsa diran". Lê ez we ra dibêjim, miqabilî xiraba nesekinin. Heger yek şelmaqê li rûyê teyî rastê bixe, yê din jî bide ber. Û heger yek te kaşî ber dîwanê bike, bixweze kirasê te ji te bistîne, potê xwe jî jê ra bihêle. Û heger yekî qulixê da zorê li te bike, wekî kîlomêtrekê te bibe, tevî wî duda here". Bide wî, kî ji te dixweze û berê xwe ji wî neguhêre, yê ku dixweze ji te deyîn bike".
>
> – METTA 5:38–42

Îsa her qulçekî tarî dida hildanê. Bi gilîkî, Ew dibêje, wekî tabîya me gerekê ji heyfhildanê dûr be, ku em bi rezedilîya xwe vekirî bin, mecalê bidin, wekî ji me "karê hildin".

Wextê ku em dicêribînin wê şaşîyê rast bikin, kîjan dijî me hatîye kirinê, me bi wê yekê xwe dewsa dadkir diatînin. Beşa 18–a, ya Metta da xulamê ku nebaxşand got, wekî hevalkarê wî biavêjine hebsê.

Gelo çi hate pêşîya wî? Xulamê ku nebaxşand teslîmî celata kirin, lê malbeta wî hate frotanê, hetanî ku ewê deyînê xwe bida.

Em gerekê teslîm bin û cîh bidine Hakimê heq. Ew bi heqîtî deyîn paşda dide, tenê Ew bi heqîtî heyfê hildide.

Bi têma xeyîdê min li civîna bajarê Florîdaêyî Tampayê qulix dikir. Dawîya qulixê jinek nêzîkî min bû. Ewê got, wekî ewê baxşandiye mêrê xweyî berê, bona huemû kirinên wî, lê wextê ku gotina derheqa azaberdana xeydada hate bihîstinê, fem kir, wekî hetanî niha nava wê da edilayî tune bûye û nava halekî giran da ne.

–Te hetanî niha nebaxşandîye wî, – min gote jinikê.

–Feqet min hêsirên baxşandinê rêtine, – ewê got.

– Tu dikarî bigrîyî, lê tu hela hê wî aza bernadî.

Jinikê gote min ku ez şaş im û ewê baxşandiye mêrê xweyî berê.

–Ez ji wî tu tiştî naxwezim. Min ew aza berdaye, – jinikê got.

– Bêje min, ewî çi te kirîye?

– Ez û mêrê xweva tevayî li civînekê da çawa serwêr bûn. Ewî ez, tevî sê kurên me, hişt, tevî jineke li civînê revî. Ewî got, wekî wextê ku ez stendime, Xwedê hesab hilnedaye, çimkî bona wî xwestina Xwedê ew bûye ku wê jinikê bistîne, tevî kîjanê jî ew revî. Mêrê min digot, wekî ew jin nava qulixa xwe da gelekî qîmetlû bû, çimkî ew diha gelekî piştgirî dida wî, lê ez bona wî dijwarî bûm. Mêrê min ez gunehkar dikirim ku ez lomekar im. Gunehê xirabbûna malbetê ewî danî ser min. Ew tu cara paşda nehatîye û qebûl nekirîye, wekî ew hemû tişt gunehkarîya wî bû.

Ev meriv eşkere hatibû xapandinê û hindava jin û malbeta xwe ew şaş bû. Jina wî ji kirinên wî gelekî zêrîya bû, hîvîyê bû, wekî ewê deynê xwe bide. Deyn ew nîbû ku ewî bi para piştgirîya malbetê bikira, çimkî mêrê jinikêyî teze bi hemû tiştî va malbet dida razîkirinê. Deynê ku jinikê ji mêrê xweyî berê dixwest, ew bû ku ewî şaşîya xwe qebûl bikira. “Tê nebaxşînî wî hetanî ku ew neyê cem te û nebêje, wekî ew şaş e û paşê tê bibaxşînî wî. Menî nadyîna deyn e, wekî hetanî niha te ew girêdayî xweyî kirîye”, – min gotê.

Heger Îsa hîvîyê bisekinîya ku em herin cem Wî û me baxşandin bixwesta û bigota: “Em şaş bûne, Tu rast bûyî, me bibaxşîne”, – Ewê me li ser xaç nebaxşanda. Wextê ku Îsa li ser xaç bû kire gazî: “Bavo, berde wana, çimkî ew nizanin çi dikin” (Lûqa 23:34).

Îsa pêşîya çûyîna meye li cem Wî û xwemikurhatina me, wekî me Ew xeyîdandîye êdî baxşande me. Gotinên Pawlos me şîret dikin: “Çawa Mesîh baxşande we, usa jî hûn gerekê bikin” (Kolosî 3:13). “Bi hev ra şîrin û dilşewat bin, li hev bibaxşînin, çawa Xwedê bi Mesîh baxşande we” (Efesî 4:32).

Wextê ku min jinikê ra got, wekî ewê nebaxşîne mêrê xwe hetanî ku ew neyê û nebêje: “Ez şaş bûm, tu rast î”, hêsir ji çavên wê barîn. Çi ku ewê jinê dixwest himberî êşên ku mêrê wê gîhandibû wê û zarokên wê, eva çawa tiştekî biçûk dihate texmînkirinê. Ewê bi xwe, xwe dewsa dadgira danîbû û dewa paşdavegerandina deyn dikir û hîvîya dayn bû. Vê xeyîdê îzin nedida wê ku heleqetîyên wêye tevî mêrê wêyî teze baş bûna. Wê yekê usa jî hukumî li ser heleqetîyên mêr kiribû, çimkî mêrê wê jinêyî berê usa jî serwêrê wî bûye.

Gelek cara Îsa halê dilên me himberî axê dike. Şîret tê dayînê, ku koka xwe dirêj bikin û nava hizkirina Xwedê da îzbat bin. Toximê Gotina Xwedê paşê koka xwe diavêje dilên me, şîn dibe û xilasîyê rezê xwe dide. Ev rez hema hizkirin e, şabûn, edilayî, şîrnayî, rembûn e (binihêre Galatî 5:22, 23).

Feqet, ewê tenê ji axê şîn be, çi ku çandî ye. Heger em toximê deyn, nebaxşandinê û xeyîdê diçînin, dewsa hizkirina Xwedê tiştekî mayîn wê derkeve. Ew kok dibe ya talayê.

Frênsîs Frangîşanê kitêbeke xwe da bi cûrekî baş derheqa talayê da dibêje: “Talayî heyfhildana nemîaserkirî ye”. Ew wî çaxî pêşda tê, wextê ku heyfhildan têra wê derecê nabe, çawa ku em dixwezin. Xudanê kitêba Îbranya derheqa wê têmayê da dibêje:

> “Bikin, ku tevî hemûya edil bin, jîyana pîroz derbas kin. Bêyî pîrozîyê tu kes wê Xudan nebîne. Ha ji xwe hebin, nebe ku ji we yek destê xwe ji kerema Xwedê bike û nebe

> ku yek nava we da bibe rawekî tal, tengavîyê bide û gele-ka jerdadayî bike”.
>
> – ÎBRANÎ 12:14, 15

Guhdarîyê bide li ser van xebera – “gelekê heram bin”. Diqewime ku evana ew in, derheqa kîjana da Îsa got, wekî rojên xilasîyê ewê bixeyîdin (binihêre Metta 24:10).

Talayî kok e. Heger wan koka xweyî dikî, av didî, qewatê didêyî û guhdarîya te li ser e, ewana kûr û qewîn dibin. Heger pirsên kokê lez neyêne safîkirinê, wî çaxî dijwar dibe wana ji kokêva rakin. Qewata xeyîdê wê hema usa zêde bibe. Bona wê yekê jî Gotin li ber dilê me da tê, dibêje ku îzinê nedin, wekî ro li ser hêrsa me here ava (binhêre Efesî 4:26). Wî çaxî dewsa rezê heqîtîyê emê rezê hêrsê, hevsûdîyê, hiznekirinê, şera û hevraqayîlnebûnê bibînin.

Îsa ev rez çawa yên xirab nav kirin (binihêre Metta 7:19, 2O)

Încîl dibêje, wekî qeger merivek li peyî edilayê naçe û cîh dide xeyîda, ewê bi

kutasî heram bin. Çi ku nava te da qîmetlû ye, wê rûyê nebaxşandinê da heram be.

## Padişê qewat heram dibe

Destpêbûna kitêbê da me dît ku çawa Dawid hetanî wî çaxî jî himberî Şaûlê padişa bêqelp ma, wextê ku Şaûl himberî wî qelp bû. Dawid bi xwe heyfhildan nedigerîya, hela wî çaxî jî, wextê ku du cara mecala wî hebû ku heyfê hilda. Dawid merivekî himberî dilê Xwedê bû. Ewî îzin da ku Xwedê dada di navbera wî û Şaûl da bike. Wextê ku dîwana Xwedê peyayî li ser Şaûl bû, Dawid şa nedibû, ew li ser wî girîya, çimkî li cem wî hindava Şaûl da talayî tune bû. Piştî mirina Şaûl Dawid li ser text rûnişt. Ewî miletê xwe qewat kir, gihîşte açixîyên eskerîyê û fînansîyêye mezin û textê xwe qewîn xweyî kir. Ewî gelek jin stendin, kîjana bona wî gelek zarok anîne rûbarê dinîyayê, ji kîjanane Amnon–kurê wî yê mezin û Abîşalom–kurê wî yê sêyem.

Kurê Dawid, Amnon, zirxwîşka xwe, Tamar, da xeyîdandinê, ya ku xwîşka Abîşalom bû. Amnon xwe nexweş diavêje û teweqe ji bavê xwe dike, ku Tamarê bişîne bona ku xwerinê bide wî. Wextê ku Tamar hat, ewî emir kir wekî xulam derkevin û bi destî zorê ew şuhurand. Paşê ewî Tamar bendî tiştekî hesab nekir û ji ber çavê xwe da dûrxistinê. Amnon qedirê qîzeke nemêrkirî êxistibû û emirê wê tune kiribû (binihêre 2 Padişatî 13).

Zirbirayê Amnon, Abîşalom tu tişt negot, wî xwîşka xwe bire malê û ew xweyî dikir, lê bona heramkirina Tamarê ewî Amnon hiz nedikir.

Abîşalom hîvîyê bû, wekî bavê wî wê zirbirayê wî ceza bikira. Dawidê padişa gelekî hêrs ket, wextê ku derheqa xirabîya Amnon da bihîst lê ewî tu gaveke başqe neavît. Abîşalom ji kêmasîya heqîtîya bavê xwe zendegirtî ma.

Tamarê wextekê kincê padişatîyê li xwe dikirin, kîjan pêşda bona qîzên padişêye nemêrkirî didrûtin. Lê niha ew bi şermêva pêçayî bû. Ew keçikeke bedew bû û ew ji alîyê cimetê da dihate qedirgirtinê, lê niha ewê xwe ji meriva vedişart û nikaribû mêr bikira, çimkî ew êdî qîz nîbû.

Ev yek nerast bû. Tamar bi emirkirina padişê çûbû cem Amnon û hatibû şuhurandinê. Emirê wê unda bû, nenihêrî wê yekê, wekî ew merivê ku gaveke wî cûreyîye heram avîtibû, usa derbas dikir, tê bêjî tu tişt neqewimîbû. Tamarê giranîya wî hemû tiştî hildida ser xwe, emirê wê werguhêzî kaosê bibû.

Her roj Abîşalom hêsirên xwîşka xwe didîtin. Emirê qîza padişê werghêzî tarîstanê bibû. Abîşalom salekê hîvîyê sekinî, bi wê gumanê, wekî bavê wî wê tiştek bikira, lê Dawid tu tişt nekir. Abîşalom ji bavê xwe xeyîdî bû û Amnonê bênamûs hiz nedikir.

H'iznekirina wî cûreyîye du sala li cem Abîşalom xwestina kuştina Amnon pêşda anî. *"Ezê bona xwîşka xwe heyfê hildim, çimkî serkarîya rast tu tiştî nake"*, – Abîşalom difikirî.

Ewî bona hemû ewledên padişê kêf teşkîl kir. Wextê ku Amnon hindava Abîşalom şikber nîbû, Abîşalom ew kuşt û revî Geşûrê.

Heyfhildana wîye miqabilî Amnon mîyaser bû. Feqet, ew xeyîda Abîşalome hindava bavê diha gelekî dişuxulî û ew çiqasî dûr bû, agirê xeyîdê diha gur dibû.

Fikirên Abîşalom bi talayê va jehrdadayî bû. Ew bû lomekarê sistbûna Dawid, lê gumana wî hebû, wekî bavê gazî wî bikira. Dawid dîsa tu tişt nekir. Eva yeka diha gelekî hêrsa Abîşalom rakir.

Dibek Abîşalom vî cûreyî difikirî: *“Cimet bavê min silav dike, lê ew himberî xeysetê wî yî rast kor in, ew tenê xwe pêş dixe, yê ku bi Xwedê xwe vedişêre. Ew Şaûlê padişa xirabtir e. Şaûl padiŞatîya xwe unda kir, çimkî ewî padişê Awîmelekya nekuşt û çend pezên wane baş, usa jî çend gayên wan xweyî kir. Bavê min tevî jineke merivekî nêzîkî wî heramtî kir û paşê bona veşartina gunehê xwe ew meriv kuşt, yê ku gelekî nêzîkî wî bû. Ew merivkuj e û heram e, bona wê yekê jî ewî Amnon ceza nekir. Vî hemû tiştî ew bi parastina xweye qelp, ya hindava Xwedê, vedişêre”.*

Abîşalom Geşûrê sê sala ma. Dawid êdî li ser wê fikirê bû ku ew unda bûye. Yoab Padişê ra dibêje, wekî ew Abîşalom bîne malê, lê Dawid nedixwest li ber Abîşalom rû bi rû bisekine. Ji du sala zêdetir wede derbas bû û Dawid Abîşalom paşda vegerand. Ewî dilê xwe da kerem dît û careke din ew da li ser tabîya wîye berê. Feqet dilê Abîşalom da xeyîd hela hê mabû.

Abîşalom ji derva pêşezan bû. Hetanî kuştina Amnon “Abîşalom Amnon ra ne baş û ne jî xirab xeber dida, çimkî ewî Amnon hiz nedikir” (2 Padişatî 13:22). Gelek meriva ra li hev tê bernamên xwe veşêrin, çawa ku Abîşalom ew yek dikir.

Ev tabîya lomekarîyêye xeyîdî ewî vedişart û ewî destpêkir wan meriva berbi xwe bikîşîne, nerazîbûnên kîjana hebûn. Her dem ewî bona wan meriva wede başqe dikir, guhê xwe dida li ser şikyatên wan. Ew ber xwe diket, çimkî hemû tişt dikaribû cûrekî mayîn bûya, heger ew bi xwe padişa bûya. Abîşalom hakimtîya karê wan dikir, bi wê yekê dida kifşê, wekî wedê padişê bona cimetê tune. Diqewime ewî karên hakimtîyê derbas dikir, çimkî texmîn dikir, wekî bavê wî bi heqî qulixî cimeta xwe nedikir.

Dihate texmînkirinê, wekî Abîşalom bona cimeta xwe xemgîn bû. Încîl dibêje, wekî Abîşalom dilên Îsrayêlê ji Dawidê bavê xwe dizî. Lê gelo ew bi bêqelpî bona cimeta xwe xebitî bû, yan ew rê digerîya, bi kîjanê bikaribûya Dawid wergeranda, yê ku ew dixeyîdandin.

## “Pêşezan” şaş dibin

Abîşalom Îsrayêl kişande alîyê xwe û derkete miqabilî Dawid. Dawidê padişa bona xilaskirina emirê xwe ji Orşelîmê revî. Tê bêjî Abîşalom gerekê padişatîya xwe îzbat bikira, lê... ew hate kuştinê, wextê ku ewî dabû peyî Dawid, nenihêrî wê yekê, wekî Dawid emir kiribû ku destê xwe nedine wî.

Bi gilîkî Abîşalom ji alîyê talayî û xeyîda xwe da hate kuştinê. Merivekî ku qewata wî awqas gelek bû, yê ku peyîhatîyê padişê bû, emirê xweyî cahil da mir. Ewî ew yek înkar kir, ku wî deynî berde, kîjan bi fikira wî yê bavê wî bû. Abîşalom emirê xwe herambûyî ser hevda anî.

Li civînê alîkarên serwêra gelek cara ji wî merivî dixeyîdin, qulixî kîjanî ew dikin. Ew dibine lomekar–pêşezanên nava wî hemû tiştî da, çi ku ew li cem mezinê xwe şaş hesab dikin. Ew bi xeyîdêva tijî dibin, ronahiya çavê wan nav hev dikeve, destpê dikin ji fikira Xwedê dûr bikevin.

Qulixçîyên vî cûreyî bawar in, wekî mîsîya wan ew e, ku ew ji mezinê neheq aza bin. Ew dilên hêrsketîya, yên ku nerazîne, zeft dikin û hetanî ku mezin pê dihesin, pê ra dighînin dutîretîyê bikine nava civînê, yan jî nava qulixê. Abîşalom vî cûreyî kir.

Carna gotinên wan rast in. Diqewime Dawid gerekê miqabilî Amnon tiştek bikira? Diqewime govekên serwêre şaş hene? Kî ye hakim– tu, yan Xudan? Bîr bîne, wekî heger tu pevçûyînê diçînî, tê hema wê jî biçinî.

Çi ku li Abîşalom qewimî û çi jî niha nava qulixdarîyên wedê niha da diqewime, tiştekî usa ye, ya ku dewa wede dike.

Gelek cara em fem nakin, wekî xeyîd ketîye dilê me. Wextê ku koka talayê pêşda diçe, ew nayê kifşê. Lê wextê ku wê yekê xweyî dikin, mezin dikin, ew diha qewîn dibe. Çawa ku xudanê nama Îbranîya şîret dide, em gerekê bi guhdarî dîna xwe bidinê, "wekî kokeke tal şîn nebe, kîjanê tengavîyê bide, û bi wê yekê gelekê heram bin" (binihêre Îbranî 12:15).

Em gerekê dilê xwe binhêrin û bona rastkirina xwe wî vekin, çimkî tenê Gotina Wî dikare fikirên dilê me bibîne. Ruhê Pîroz wî çaxî miqabil derdikeve, wextê ku bi saya wijdanê mêriv xeber dide. Em gerekê miqabilderketina Wî hesab hildin. Heger ji we kesek vî cûreyî kirîye, wî çaxî li ber Xwedê tobe bikin û dilê xwe li ber Wî vekin, bo ku Ew rast bike.

Carekê qulixçîkî tiştek kiribû û ji min pirsî ku ewî mînanî Abîşalom kirîye, yan mînanî Dawid? Li bajarekî ewî çawa alîkarê serwêr qulix kiribû û serwêr ew ji qulixê aza kiribû. Dihate texmînkirinê, wekî wî serwêrî hevsûdî dikir û bona wî cahilî ditirsîya, çimkî destê Xwedê li ser wî bû.

Piştî salekê ev qulixçî, yê ku hatibû azakirinê, li ser wê fikirê bû, wekî Xudan dixwest ku ew li perê bajêrî mayîn civînrê bide hîmdanînê.

Ew derbasî li ser vî karî dibe û hinek merivên ji wê civînê, li ku ewî qulix dikir, ji kîjanê dûr ketibû, tên dighîjine wî. Li cem serwêrê cahil tirs hebû, çimkî ewî nedixwest mînanî Abîşalom bûya, lê ew jî ji serwêrê xweyî berê nexeyîdî bû. Civîna nû destpê kiribû ji alîyê Xudan da bê rêberkirinê. Ew ne bona wê yekê bû, wekî kêmasîyên civîna berê hebûn. Min firqîya di navbera Abîşalom û Dawid da nîşanî wî kir. Abîşalom dilê merivên mayn didizî, çimkî ew ji mezinê xwe xeyîdî bû. Dawid piştgirîya merivên mayîn dikir ku ew hindava Şaûl da bêqelp bûna, nenihêrî wê yekê, wekî Şaûl peyî Dawid ketibû. Abîşalom tevî xwe meriv hildan, lê Dawid tenê dûrket.

Min jê pirsî: "Tu ji civînê tenê dûr ketî? Te bona piştgirîya meriva tiştek kirîye, wekî ew bên cem te û piştgirîya te bikin?".

"Ez tenê dûr ketime û min tu tişt nekirîye ku meriva tevî xwe bibim", – ewî got.

“Ew yek baş e, ku te mîna Dawid kirîye, lê tenê ser wê fikirê be, wekî ew merivên ku hatine cem te, ji serwêrê berê xeyîdî nîbin, lê heger xeyîdî bin, wî çaxî rêberîya wane berbi azayê û qencbûnê bike, – min şêwir da wî.

Niha civîna wî merivî gulvedide. Nava wî da min ew yek qîmet kir, wekî ew neditirsîya ku dilê xwe binhêre û ne tenê ew yek, ewî usa jî xwe teslîmî şîretê Xwedê dikir. Bona vî serwêrî ew yek girîng bû, wekî ew teslîmî xwestina Xwedê bibe, lê ne ku bona wê yekê, ku bide kifşê, wekî ew “rast e”.

Netirse, îzinê bide Ruhê Pîroz, wekî Ew nebaxşandin û talaya dilê te da elam bike. Tu çiqasî dirêj wê yekê veşêrî, ewê awqasî mezin be, koka xwe dirêj bike û çiqas here, dilê teyê diha berk bibe. Dilovan bimîne. Lê çawa?

> “De bila her talayî, hêrs, berzeqî, qare–qar û kifirî–zifirî ji we dûr bin, tevî her cûre kîn, boxîyêva û hev ra şîrin û dilþewat bin. Li hev bibaxşînin û çawa Xwedê bi Mesîh baxşande we”.
>
> – EFESÎ 4:31,32

# Bİ DİJÎDERKETİNA HİNDAVA XEYÎDA DA TÊ DİHA MEZİN BİBÎ.

“Min kitêba “Tela Şeytan” dest xist. Eva duakirina mezin e. Min pêşniyarî geleka kirîye ku ew vê kitêbê bixwînin. Bi rastî, Xwedê ew yek nava emirê min da da xebatê. Ez razîbûnê elam dikim”.

– S. T. CORCÎYA

# 13

# AZABÛNA Jİ TELÊ

***"Bi vê yekê çiqas ji min tê, ez dicedînim hemû wextî bi wijdanê rihet li ber Xwedê û meriva bim".***

**– KARÊN ŞANDÎYA 24:16**

Bona azabûna ji xeyîdê cedandin lazim e. Pawlos wê yekê himberî sportê dike. Wextê ku em bedenên xwe didine qewatkirinê, wî çaxî mecala zyanêketinê kêm dibe. Wextê ku ez li adên Havayê bûm, bona şikilkişandinê ez rabûme li ser dîwarekî. Peyî wê yekê ra damarê nigê min şidyan û çar roja ez nikaribûm bigeriyama.

"Heger tu çawa lazim bû sportê va mijûl bûyayî, ev yek wê neqewimîya, çimkî damarên nigê te sist in û wî çaxî tu dikarî zyanê bikevî", – doxtir min ra got.

Wextê ku ez êdî dikaribûm bigeriyama pêşezanekî mayîn min

ra şirove kir: “Tu gerekê van tişta bikî, bona ku damarên çokê te vebin”.

“Mijûlbûna sportê va”, “Hînbûna wê yekê” xebera yûnanî ye “askeo” ye (askêo). Ferhenga Fayne şirovekirina wê xeberê vî cûreyî şirove dike – “Biêşîne, cedandina bide xebatê, bi rêya sportê û terbetdarîyê hîn bibe”.

Gelek cara merivên başqe me didine xeyîdandinê û bona me baxşandin dijwar nîne. Me dilên xwe dane hînkirinê û zirara xeyîdê bona me qezîya nîne.

Gelek meriv hildikişyane li ser wî dîwarî û zyanê neketine, çimkî ew êdî hîn bibûn. Bi wî cûreyî gelek gura Xwedê da nin, bi rêya hînkirina dilê xwe. Dereca gihîştina me qirar dike ku tê çawa bêyî zyan ji xeyîdê derbikevî.

Hinek xeyîd wê diha dijwar bin, lê ne ku ew xeyîd, bona kîjana em hîn bûne. Halê sert dikare bibe menîya xeyîdê, yanî zyanêketinê, peyî kîjanî ra emê mecbûr bin ruhê xwe va hîn bin, bona ku dîsa aza bin û qenc bin. Bona wê yekê cedandinê lazim bên.

Vê beşê da ezê derheqa wan xeyîda da bêjim, bona safîkirina pirsên kîjana gelek cedandin lazim in.

Nava emirê min da carekê tiştekî usa qewimî, kîjan qulixçîkî va girêdayî bû. Ew xeyîda ku min dît, ya tek– tenê nîbû, lê hema ewê sal û nîvekê ez dizêrandim. Merivên dor û berên min zanibûn çi qewimîye. Wana ji min dipirsî: “Tu naxeyîdî yî? Tê çi bikî? Tu dixwezî xwe bidî alîekî û tu tiştî nekî?”. Min digot: “Nava emirê min da hemû tişt baş e. Ewê yekê hukumî li ser min nekirîye. Ez pêşdaçûyîna xwe didomînim”.

Feqet, ew bersiva ku min dida, kubarî bû. Ez gelekî xeyîdî bûm, lê ez xwe mikur nedihatim. Min gelek wede nava mitala da derbas dikir, dicêriband fem bikira, ku çawa ev hemû tişt qewimî. Ez zenrdegirtî mabûm û min tu tişt texmîn nedikir. Min ew fikir ji xwe dûrxistin, lê bi rastî ez sist bibûm û xeyîdî bûm.

Meh derbazs bûn. Dihate texmînkirinê, ku hemû tişt hişk dibe, qulix “kevinbûyî bû”, “zexîra” n min vala bû û ez nava zêrandinê da

bûm. Min her roj miqabilî cina şerkarî dikir. Ez difikirîm, wekî ev hemû berxudanên min rûyê navê min da bûn, lê bi rastî ew zêrandin ji nebaxşandinê dihat.

Her car, wextê ku ez li rex wî merivî bûm, ji wî direvîm, çimkî min texmîn dikir, wekî min derba ruhanî distend.

Paşê ew şebeq hat, kîjanê ezê tu cara bîr nekim. Ez rûniştî bûm û min dua dikir.

–Xudan, ez xeyîdîme?, – min pirs da.

Ev xeber ji devê min teze derketibûn, wextê ku ji kûraya ruhê xwe min dengek bihîst:

–Belê.

Xwedê xwest guman be, wekî ez xeyîda xwe fem dikim.

–Xudan, ez hîvî dikim, tu min ji evê birînê û xeyîdê xilas bikî. Bona min gelekî dijwar e, – min hîvî dikir.

Eva hema ew yek bû, çi ku Xwedê ji min dixwest. Ewî dixwest, ku min xwehizî daniya alîekî. Gelek cara em dicêribînin, bi qewatên xwe tiştekî bikin, lê ew yek wê alî mezinbûna meye ruhanî neke, çimkî serbara serda em dikarin rihet bikevin.

Bona qencbûnê û azabûnê gava ewlin ew e, wekî tu xeyîda xwe qebûl bikî. Gelek cara kubarî naxweze ku em xeyîd û zirara xwe qebûl bikin. Ji wî çaxî da, wextê ku min halê xweyî rast qebûl kir, ez Xudan digeriyam û ez bona rastkirinê vekirî bûm.

Min texmîn kir, wekî Xudan dixwest ku min çend roja rojî bigirtana. Rojî wê ez danîyama li ser tabîke usa, li kîderê minê dengê Ruhê Pîroz texmîn bikira.

> "Ev e rojî, kîjanê Ez begem dikim. Girêfûtkên nerastîyê bide helkirinê, wan girêfûtka veke û tiştên şikestî aza berde û hemû desthilatî wê bê şikênandinê".
>
> – ÎŞAYA 58:6

Ez hazir bûm ku girêkfûtkên nerastîyê vebûna û ez ji wê tesîrê azad bûma.

Piştî çend roja ez çûme cîhê şînekê. Ew merivê ku ez xeyîdandibûm jî li wir bû. Min ew piş avahîyê civînê dît û ez girîyam.

–Xudan, ez wî dibaxşînim, ez wî aza berdidim, bona wî hemû tiştî çi ku ewî kirîye.

Min carekê ra texmîn kir ku giranî ji ser min çû. Min baxşandibû wî. Ez gelekî sivik bûm.

Feqet, ev hemû tişt destpêka rêya qencbûna min bû. Min dilê xwe da baxşandibû, lê min giranîya birînê fem nekiribû. Ez hela hê bi temamî qenc nebibûm û ez dikaribûm careke mayîn bixeyîdîyama. Eva mînanî tiştekî usa ye, ku çawa tu ji birînên fîzîkî qenc dibî. Bona sekinandina birînên pêşerojê da lazim bû ku min xwe hîn bikira, dilê xwe, fikir û texmînkirinên xwe qewîn bikira.

## Hûnê derheqa paşdahatina berbi xeyîdê da çi bêjin?

Meh derbas bûn, min carna miqabilî fikirên berê şer dikir. Wextê ku li ber min derheqa wî da xeber didan, min nerazîbûna xwe dida kifşê, lê wextê ku ez rastî wî dihatim, min texmîn dikir ku xeyîd hela hê maye. Min carekê ra ew fikir înkar dikirin û ew diavîtine der (2 Korintî 10:5). Bona azamayîna ji xeyîdê eva xwehînkirin û şerkarîya min bû.

Bi kutasî, min ji Xudan pirsî ku ez xwe çawa ji wan fikira biparêzim, bona ku ew careke mayîn min berbi nebaxşandinê nekişînin. Min zanibû, wekî Ewî dereceke azayêye bilind bona min dixwest, lê min nedixwest bi xeyîdê emirê xweyî mayî derbas bikira. Xudan gote min ku ez bona wî merivî dua bikim, kîjanî ez xeyîdandibûm û gotinên Xwe bîr anîn:

> “Lê Ez we ra dibêjim, dijminên xwe hiz bikin û bona wan dua bikin, yên ku we dizêrînin”.
>
> – METTA 5:44

Min usa jî kir, min dua kir. Pêşîyê ew çawa dengekî “hişk”, bêyî tu tiştî hate texmînkirinê. Çawa borcdarî, min serda zêde dikir:

“Xudan, bona wî dua bike. Roja baş bide wî. Nava hemû tiştî da, çi ku ew dike, alî wî bike. Bi navê Îsa, amîn”.

Vê yekê çend hevtîya dom kir. Dihate texmînkirinê, ku rêyeke başqe tune. Rojekê jî Xudan gote min ku ez Zebûr 35 bixwînim. Min nizanibû ku nava Zebûr 35 da çi heye. Min vekir û destbi xwendinê kir. Wextê ku min nîvê wê xwend, min halê xwe dît.

> “Şedên derew radibin û ew tiştên ku ez nizanim, ji min dipirsin, dewsa qencîyê xirabîyê didine min û min bêzuret dihêlin”.
>
> – ZEBÛR 35:11,12

Min dikaribû xwe himberî Dawid bikira. Bi fikira min, wî merivî û çend hevalên wî dewsa qencîyê xirabî min ra kiribûn. Bêyî şik ez xemgîn bûm.

Xwedê bi vî zebûrî usa kir, ku yazîya min, ya nava çend salên dawî da, nîşanî min bike. Gotinekê ez usa def dam, ku ez awqas bilind banzdim ku min serê xwe banê avayî xist. Gilî derheqa van gotina da ne:

> “Wextê ku ew nexweş diketin, min kincên ruhanî li xwe dikirin. Min bi rojîya xwe dizêrand, lê duayê min diketine paşila min. Ez mînanî xêrxwez û birayê xwe nêzîkî wan dibûm û xemgîn dibûm çawa ku yekî şîna dayîka xwe dikir”.
>
> – ZEBÛR 35:13,4

Dawid digot, wekî meriv dicêribandin emirê wî tune bikirana. Ew bi xirabî êrîşî li ser wî dikirin, lê ewî tiştê usa nekiribûn ku layîqî wê yekê bûya.

Paşê bersiva min hat: “Feqet, çawa ku ez... ”

Bersiva Dawid li ser kirinên merivên mayîn nehatibû hîmdanînê. Bi qirarkirina wê yekê çi ku rast bû, ewî bona wan usa dua dikir, tê bêjî ew birayên wî bûn, yan jî usa çawa ku merivek şîna dayîka xwe dikir. Xwedê nîşanî min da ku ez çawa bona wî merivî dua bikim:

"Bona wî usa dua bike, çawa ku tê bixwezî Ez bona te bikim".

Ji wî çaxî da duayên min bi temamî hatine guhartinê. Ew bi jîyanê va tijî bûn û min du dikir: "Xudan, Tu bi cûrê diha qewat Xwe elamî wî bike. Bi hazirîya Xwe, bona wî dua bike. Îzinê bide wî, ku ew Te ji nêzîk va nas bike, bila ew ji Te xweşîyê bistîne û bona navê Te qedir bîne". Min ew dua dikir, çi ku minê bixwesta ku Xwedê bida min.

Min weke mehekê bi dilêşîî bona wî dua kir û bi dengê bilind got: "Ez dua dikim. Ez te hiz dikim, bi navê Îsa". Ew deng ji kûraya ruhê min dihat. Wî çaxî min texmîn kir, wekî qencbûn tam bû.

## Qencbûn nava pevçûyînê da

Gelek hevtê derbas bûn û min ew meriv careke mayîn dît. *Mîn texmîn dikir ku tiştekî başqe dilê min da maye. Min hela hê dijî xwestina lomekarîyê şer dikir.*

– Tu gerekê herî cem wî, Con, – jina min got.

–Na, ezê neçim, – min gote wê, – niha ez qencbûyî me.

Feqet, min texmîn kir, wekî Ruhê Pîroz şedetîya wê yekê neda, çi ku min got. Min ji Xudan pirsî, gelo hewce bû, ku ez biçûma cem wî. Ewî gote min ku hewcetîya wê yekê heye.

Ez wî merivî ra pevketim û ez bi pêşkêşekî çûm. Ez li ber wî ta bûm û xwe mikur hatim, ku t'abîya min şaş bûye û min baxşandina wî hîvî kir. Em li hev hatin, baxşandin û qencbûn ketine dilê min.

Wextê ku ez ji ofîsa wî derketim, ez êdî qencbûyî bûm. Min êdî miqabilî wê êşê şer nedikir, ne jî himberî wî lomekar bûm. Piştî wê yekê heleqetîyên me pêşda çûn û problêmên me tune bûn. Pişt*î rasthatinê min gote Lîzayê: "*Wextê ku ez cara ewlin rastî wî merivî hatim, çavê min da usa hate kifşê, wekî ewî nikaribû tu şaşî bikirana. Min nava wî da tu gunehkarî nedidît. Min ew hiz dikir, çimkî ez difikirîm wekî hemû tişt baş e. Lê wextê ez xeyîdî bûm, hizkirina wî gelekî dijwar bû. Ewê yekê her parçekî bawarîya min dida pêşîya min". Niha, wextê ku ez nava vê yekê ra derbas bûme û qenc bûme,

ez dîsa wî cûreyî wî hiz dikim, çawa ku cara ewlin ez rastî wî hatim. Eva hizkirina gihîştî ye. Û gotina Kitêba Pîroz hate bîra min:

> "Berî her tştî hizkirina we hindava hev da bi dil û can be, çimkî hizkirin gelek guneha dinixême".
>
> –1 PETRÛS 4:8

Merivên ku çavên meriva da usa tên kifşê ku ew nikarin şaşîya bikin, hêsa ye wana hiz bikin. Ew hizkirin tiştekî mayîn e, wextê ku em gunehên wana dibînin, bi taybetî wextê em ji wê yekê zirarê ketine. Bi hizkirina Xwedê ez gihîştim, dilê min hate qewînkirinê.

Piştî wê yekê, tiştên wî cûreyî gelek cara bûne û wî çaxî gelek wede lazim nîbûye ku ez wê xeyîdê bi temamî aza berdim. Menî ew e, wekî dilê min bona azamayîna ji wê xeyîdê êdî hîn bûye.

*Çend meh derbas bûn ji wî çaxî da, wextê ku Xwedê pêşîya çûyîna li ofîsa wî merivî min ra xeberda. Eva wedê hînbûnê bû, wextê kîjanê dilê min hîn bû û qewat bû. Nava wan meha da min texmîn dikir ku ez li tu cîha nalivim, lê ez xemgîn bûm ku halê min çiqas diçû xirab dibû. Feqet, ez li ser rêya qencbûnê bûm. Ruhê Xudan rêberîya min dikir, bo ku min ber xwe bida. Ew yek beşa şuxulkarîya gihîştina min bû. Ezê wê cêribandinê heram nekim û ez bona wê gîhîştinê razî me, wekî ewê ew cêribandin anî nava jîyana min.*

## Gihîştina bi rêya tengavîya

Em nava wedê dijwar da mezin dibin, lê ne ku nava wedê hêsa da.

Nava rêwîtîya meye tevî Xudan emê her deman rastî cîhên dijwar bên. Em nikarin ji wê yekê birevin. Hewcetî heye ku em rû bi rû rastî wan bên, çimkî ew dijwarîî dibin beşa wê şuxulkarîyê, bi kîjanê Ew me diguhêre. Eger tu ji wan dijwariya birevî, tê bi wê yekê dijwariya bona mezinbûna xwe pêşda bînî.

Eger tu himberî wan dijwariya ser bikevî, tê diha qewat bî. Tê diha "bengîyî" li ser Îsa bî. Eger tu ji tengavîya derketî û nava xwe da qewatê û hizkirinê texmîn nakî, wî çaxî tu hela hê ji birîna qenc nebûyî.

Qencbûn bijartina te ye. Gelek meriv dixeyîdin û tu cara qenc nabin. Rast e, ev yek baş nayê guhdarkirinê, lê ew bijartina wane.

*Îsa ji zêrandinên xwe hînî gurêkirinê bû. Petrûs jî ji zêrandinên xwe hînî gurêkirinê bû. Pawlos dîsa wî cûreyî. Lê tê derheqa xwe da çi bêjî? Gelo tu hîn bûyî, yan tu hişkî, sarî, tal û hêrsketî yî? Eger usa ye, wî çaxî tu hînî gurêkirinê nebûyî.*

Rast e, xeyîdên usa hene, kîjan wê hema usa dûr nekevin. Tu borcdarî xebatê bikî, bicedînî ji wana aza bî û nava wê şuxulkarîyê da tê mezin bibî û bighîjî. Gihîştin hêsa nayê. Eger usa bûya, wê her kes jî ew yek dest bianya. Hindik meriv bi saya berxudana xwe dighîjine vê derecê. Berxudan heye, çimkî civaka me ya Xwedê nîne, lê xwehizîyê ye. Dinîya ji alîyê "mîrê mîrtîya hewê da" tê serkarîkirinê (Efesî 2:2). Û çawa fayde em dikevine nava gihîştina Mesîh, tengavî rastî me tên, kîjan wî çaxî tên wextê ku em miqabilî xwehizîyê disekinin.

Pawlos paşda hate li wan her sê bajara, li kîderê civîn hatibûne hîmdanînê. Meremê wî ew bû ku ewî şagirt bida qewatkirinê. Gelo ewî çawa dikir? Pawlos piştgirîya wan dikir:

> "Dilê şagirta dişidandin, dil didane wan, ku bawarîyêda bimînin û digotin: "Gerekê em bi gelek cefakişandinê bikevine Padişatîya Xwedê".
>
> – KARÊN ŞANDÎYA 14:21

Pawlos jîyana hêsa soz neda wan. Ewî şagirta ra açixîya anegorî normên dinîyayê soz neda. Ewî da kifşê, ku eger şagirt hazir dibûn karê xwe bi şabûn ser hevda bianîyana, gerekê li ber dijwarîya ber xwe bidana û ew yek ewî çawa "tengavî" nav dikir.

Eger tu qeyîka xwe miqabilî hatina çem diajoyî, tê mecbûr bibî hema usa bajoyî û cedandinên mezin bidî xebatê, bona ku li ber gurbûna çêm ber xwe bidî û pêşda herî. Eger tu ajotinê bidî sekinandinê û rihet bibî, tê wî çaxî usa herî, çawa ku çem te dibe. Wî cûreyî jî, eger me qirar kirîye, ku em bi rêya Xwedê herin, emê rastî gelek tengavîya bên. Hemû cêribandin jî wê bersiva pirsa sereke bidin:

“Tu hazir dibî jîyana xwe usa derbas bikî, çawa ku dinîya derbas dike, yan tu hazir dibî jîyana xwe bi xwepêşkêşkirinê derbas bikî?”.

Bîra xwe da xweyî bike, wekî wextê ku em jîyana xwe bo Îsa unda dikin, em emirê Wî dibînin. Hîn be, ku tu li ser faydayê xilasîyê bisekinî.

Petrûs gelekî baş şirove dike:

> *“Delalno! Ji wê alava tengav*îyê ecê*bmayî nebin, ya ku bona cêribandina* tê *we ye* û nefikirin, k*u ev çi belav bû li we qewimî. Lê* ş*a bin, ku* hûn tevî cef*ay*ên Mesîh dibin, wekî wextê x*uyabûna rûmeta W*î hûnê ji ş*abûnê ge*ş *bin”.*
>
> –1 PETRÛS 4:12,13

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî ew wedê zêrandinê himberî wedê şabûnê dike. Tu çawa dikarî şa bî, wextê ku... Wextê ku şikirîya Wî bê kifşê, tê tevî Wî bî, dereca şikirbûnê awqas e, çiqas te îzin dayê ku Ew dilê te da xeysetê Xwe çê bike. Bi gilîkî, tu xeyîdê nenihêre, tu ewê şikirîya pêşerojê binhêre. Alêlûya!

# DİHA GRÎNG E KU TU ALÎ BİRAYÊ XWEYÎ XALİFÎ BİKÎ, LÊ NE KU BİDÎ KİFŞÊ KU TU RAST Î.

“Ez 18 salî me. Malbata min malbateke zef baş e: dayîka min û du xwîşkên mînanî hev. Min tu cara bavê xwe nedîtîye û nava temamîya jîyana xwe da himberî wî bi tabîya nebaxşandinêva pêşda hatime. Kalikê min merivekî Xwedêparêz e û ewî kitêba “Tela Şeytan” da min, ku ez bixwînim. Pey xwendina kitêbê ra, ez êdî hazir bûm ku min bibaxşanda bavê xwe”.

– N. M., NYÛ MÊKSÎKO

# 14

# LİHEVHATİN ÇAWA ARMANC

***"We bihîstîye ku pêşîya ra hatîye gotinê: "Nekuje"! Kî ku bikuje, dîwana wî wê bê kirinê. Lê Ez we ra dibêjim, kî ser birê xwe hêrs bikeve, wê bibe deyîndarê dîwanê û kî bêje birê xwe: "Bêaqil", ewê bibe deyîndarê civîna giregira û kî ku bêje: "Axmax", wê bibe deyîndarê dîwana agirê dojê. Awa eger tu hedîya xwe bînî ser gorîgehê û li wir bê bîra te, ku dilê birê te ji te maye, hedîya xwe wê derê, li ber gorîgehê, bihêle û pêşîyê here birê xwe ra li hev were û paşê were hedîya xwe bide".***

**– METTA 5:21–24**

Ev gotinên jêgirtî ji xeberdana Çîyê ye. Îsa destpêkir bêje: "We bihîstîye ku pêşîya şa hatîye gotinê...". Paşê Ewî digot: "Lê Ez we ra dibêjim...".

Îsa li her dera nava temîyên Xwe da evê himberîhevkirinê didomîne. Pêşîyê Ew me ra qanûnê tîne, kîjan anegorî kirinên meye der e, paşê Ew mîyaserkirina wana nîşan dide û wê yekê tîne nava dil.

Li çavên Xwedê da merivkuj tenê ew nîne, yê ku mêriv dikuje, lê ew e yê ku birayê xwe hiz nake. Tu dilê xwe da çawa nî, tu bi rastî jî usa nî.

Nava evê beşa gotina Xwe da Îsa encamên xeyîdê zelal dide kifşê. Ew hildana wê hêrsa berk tîne ber çava. Eger merivek bêyî menî ser birê xwe da hêrs dikeve, yan jî wî ra dibêje “bêaqil”, ew nava qezîya dadgehê da ne.

Anegorî ferhenga Vayn, xebera “bêaqil” çawa “serê vala” tê şirovekirinê. Eva gotina miqabilderketinê ye, kîjan hêna Mesîh da cihûya dida xebatê. Wextê ku hêrs dighîşte wê derecê, wextê ku meriv birê xwe ra digot bêaqil, wî çaxî ew nava qezîya dojê da bû. Bi gotina Îbîd, xebera “bêaqil” çawa “bêxwedê” tê şirovekirinê. Yê bêaqil dilê xwe da dibêje, wekî Xwedê tune (binihêre Zebûr 14:1).

Wan roja yekî ra gotina “bêaqil” gunehkarîke mezin bû. Tu kesî yekî mayîn ra tiştekî wa nedigot, hetanî ku ew hêrs werguhêzî hiznekirinê nedibû. Ewa hema ew yek bû, çawa ku tu îro birê xwe ra bêjî: here cehnemê.

Îsa nîşanî wan dikir, ku eger pirsên hêrsê neyêne zelalkirinê, ew yek dikare berbi hiznekirinê bibe û eger pirsên hiznekirinê jî neyêne zelalkirinê, wî çaxî ewê wana bike nava qezîya cehnemê. Paşê Ewî serda zêde kir, wekî eger wextê dayîna hedîyê Xwedê bîr bînin, wekî birê wan ji wan xeyîdî ye, pirsa wane sereke gerekê ew be, ku gerekê wî bibînin û li hev bên.

Bona çi em gerekê berbi lihevhatinê bicedînin? Bo me, yan bo birê me? Em gerekê herin li cem birê xwe, bona ku bikaribin alî wî bikin, ku ew ji xeyîdê derbikeve. Eger me ew nexeyîdandîye jî hizkirina Xwedê gerekê îzinê nede, wekî ew hêrsketî bimîne, ku ew necêribîne ji xeyîdê derbikeve û bê dasekinandinê. Diqewime me tu tiştekî şaş nekirîye. Ew yek girîng nîne ku em rast in yan şaş in. Bona me ew yek girîng e, ku em alî birê xweyî xalifî (lukumî) bikin, lê ne ku bidne kifşê, wekî em rast in.

Ssênarên xeyîdê yên cûre–cûre hene.

Diqewime ew merivê ku ji me xeyîdî ye, bawar e, ku em nava nêzîkbûna xwe da himberî wî heq nîbûne, wextê ku bi rastî me tu zirar negîhandîye wî. Diqewime înformasîya nerast li cem wî heye, bi kîjanê ew hatîye li ser fikira nerast.

Ji alîkî mayîn va jî diqewime, wekî înformasîya wî rast e, lê ew hatîye li ser fikira nerast. Ew ku çi me gotîye, diqewime bi rêyên cûre–cûre, ji yekî derbasî cem yekî mayîn bûye û xilasîyê navhevketî gihîştîye wî. Nenihêrî wê yekê, ku meremê me tune bûye em zirarê bidne wî, gotin û kirinên me ew dane xeyîdandinê.

Gelek cara, bi hesabhildana meremên me, me gunehkar dikin, lê merivekî mayîn anegorî kirinên wana gunehkar dikin. Diqewime meriv tiştekî bifikire, lê tiştekî mayîn bêje. Carna jî motîvên rast bi aqilî ji me jî xwe veşartine. Em dixwezin bawar bikin ku ew paqij in. Feqet, wextê ku em bi derbaskirina nava Gotina Xwedê ra fikirên xwe paqij dikin, em wî hemû tiştî li ser rasteke başqe dibînin.

Û bi kutasî, diqewime me himberî wî merivî guneh kirîye. Em hêrsketî bûne, yan jî bin hukum da me ew daye xeyîdandinê. Diqewime ew meriv bi zanebûn (qestbende) wî cûreyî nêzîkî me dibe, lê em bi rehmê caba wî didin. Ew yek girîng nîne, ku menî çî ye, wekî femdarîya vî merivî tarî bûye û fikirdarîya wî li ser texmîn-kirinê, gotinên merivên başqe hatîye hîmdanînê. Em çawa dikarin bêyî înformasîya rast bi cûrê rast bifikirin? Himberî wê yekê em gerekê gelekî milahîm bin, wekî ew bi dilê xwe bawar bike, wekî hindava wî da şaş bûne. Nenihêrî wê yekê, wekî ew li ser wê fikirê ye, wekî me ew xeyîdandîye, em gerekê baxşandinê bixwezin.

Îsa me şîret dike, wekî wî çaxî jî, wextê ku xeyîd rûyê me da jî nebûye, dîsa gerekê li hev bên. Gera nava wê yekê da dewa gîhîştinê dike. Gelek cara, gava ewlin bona wî merivî dijwar e, yê ku xeyîdî ye. Bo wê yekê jî Îsa dibêje, wekî tu gerekê bi xwe herî cem wî merivî, yê ku te xeyîdandîye.

## Ji wî merivê xeyîdî baxşandinê bixweze

Pawlos digot:

> "Awa em hindava hev da ser nêta edilayê û bawerî avakirinê bin".
>
> – ROMAYÎ 14:19

Ev yek dide kifşê ku em çawa nêzîkî wî merivî bin, yê ku ji alîyê me da hatîye xeyîdandinê. Eger nava gumanbirîyê da dilivin, emê alî edilayê nekin û emê wê yekê bona wî diha dijwar bikin. Em gerekê edilayê bi rêya teslîmbûnê xweyî bikin, lê ne ku kîsî kubarîya me. Ew e rêya tek–tenê, ya bona dîtina lihevhatinê.

Wextê ku min dicêriband tevî wan meriva, kîjan min xeyîdandine, yan jî ser min da hêrs ketine, rêyên lihevhatinê bidîta, ew meriv ji min direvîn. Min ra digotin ku ez xwehiz, kubar, hişk im.

Min wa bersiva wan dida: "Ez usa nînim. Hûn awqasî min fem nakin". Lê wextê ku min xwe diparast, ewê yekê agirê xeyîdê diha dida gurkirinê. Eva rêyya berbi aşîtîyê nabe. Sekinandina bona xweyîkirina xwe û mafê xwe wê aşîtîyê neyîne.

Ez hîn bûme xwe ker bikim û guhdarîya meriva bikim hetanî wî çaxî, hetanî ew gotinên xwe xilas dikin. Wextê ku ez gotina wana ra qayîl nînim, ez dibêjim, wekî ez qedirê fikira wan digirim, lê dibêjim ku diqewime me hev fem nekiriye. Paşê serda zêde dikim, wekî ez bona xeyîdandina wan dêşim.

Carna usa diqewime, wekî ez li ber wan meriva bi rastî neheq im. Min ra tenê dimîne ku ez şaşîya xwe qebûl bikim û bêjim: "Hûn rast in. Ez baxşandina we tewaqe dikim".

Em careke mayîn bêjin, wekî tabûna li ber wî merivî, dide kifşê, wekî emê alî lihevhatinê bikin. Awa bona çi Îsa nava gotinên xweye mayîn da jî got:

> *"Çaxê neyarê te te kaşî* cem hakim dike, rê *da tevî wî zû li hev were. Eger na, ewê te bide destê hakim, hakimê jî te*

*bide destê berdestîyê xwe û te biavêje kelê. Ez rast te ra dibêjim, tu ji wir dernakevî heta polê paşin nedî".*

– METTA 5:25, 26

Kubarî diparêze. Tabûna li ber wî merivî dide qayîlkirinê û dibêje: "Tu rast î. Min usa kirîye. Ez tewaqe dikim tu min bibaxşînî".

*"Lê serwaxtîya jorin, berê pêşin paqij e, paş*ê edil *e, milûk û berbihêr e, bi rehmê û berên qencîyê va tijî ye, bê tagêr û bê hilekarî ye".*

– AQÛB 3:17

Serwaxtîya Xwedê qayîl e ku gurê da bimîne. Wextê ku gilî derheqa pevçûyînên şexsîda ne, ew yek ne dijîderketin e. Merivê ku teslîmî serwaxtîya Xwedê dibe, ew natirse li ber yê mayîn daxue, yan jî qedirê fikira merivê mayîn bigre, çimkî bi wê yekê rastî nateribe.

## Nêzîkbûna berbi wî merivî, yê ku tu xeyîdandîyî

Niha, wextê ku ev yek me gotûbêj kir, ku em gerekê çawa bikin, eger me birê xwe daye xeyîdandinê, were em niha wê yekê gotûbêj bikin, ku em gerekê çi bikin, eger birê me em xeyîdandine.

*"Eger birê te neheqîyê li te bike, gava tu* û ew tenê *ne, wî* şîret *bike. Eger ewî guhdarîya te kir,* ê*dî te birê xwe qazanc kir".*

– METTA 18:15

Gelek meriv ev gotina Kitêba Pîroz bi rêyên cûre–cûre didine xebatê, ne bi wê fikirê çawa ku Îsa digot. Eger ew xeyîdîne, diçin û bi ruhê heyfhildanê û hêrsê va tijî dibin. Ewana vê gotinê çawa afûkirina xwe didine xebatê, bona ku ewê ku xeyîdandiye gunehkar bikin.

Feqet, ewana temamîya wî hîmî berdidin, bi kîjanî Îsa hîn di-

kir ku çawa berbi lihevhatinê herin. Ew hîm bona gunehkarkirinê nîne, lê bona lihevhatinê ye. Îsa naxweze ku em bêjine birê xwe ku ewî çawa xirabî hindava me da kirîye. Em gerekê ewî dîwarê di navbera meda pêşdahatî dûr bixin, kîjan nahêle ku heleqetîyên me bêne dasekinandinê.

Em dikarin ewê himberî wê yekê bikin, ku çawa Xwedê heleqetîya di navbera me û Xwe da da dasekinandinê. Em himberî Xwedê gunehkar bûn, lê Ewî "hizkirina Xwe ya hindava me da kifşê, wextê ku em gunehar bûn, Mesîh bona me mir" (Romayî 5:8). Gelo em dixwezin xweparastina dayînine alîkî û bona kubarîyê bimirin, bona ku wî merivî bibaxşînin, kîjanî em xeyîdandine. Xwedê pêşîya tewaqekirina baxşandinêye ji alîyê me da gihîşte me. Îsa qirar kir ku pêşîya qebûlkirina xeyîdêye ji alîyê me da me bibaxşîne.

Wî çaxî jî, wextê ku Ew nêzîkî me bû, me nikaribû Bav ra li hev bihatana, hetanî wî çaxî hetanî ku me gotina Wî ya lihevhatinê stend.

> *"Ev her tişt ji Xwedê da ne, ku em bi Mesîh tevî xwe li hev anîn û qulixa lihevanînê da me. Awa gotî Xwedê bi Mesîh dinîya tevî xwe li hev anî, neheqîyên wan wan ra neheqî hesab nekirin û gotna lihevanînê sparte me. Awa em ji alîyê Mesîh da reca ji we dikin, tevî Xwedê li hev werin".*
>
> – 2 KORİNTÎ 5:18–20

Pêwîstîya (lazimatîya) lihevhatinê ji wî hîmê tomerî tê, wekî em hindava Xwedê da gunehkar bûne. Emê berbi lihevhatinê û xilasbûnê necedînin, hetanî ku pê nehesin, wekî cihêbûn heye.

Peymana Nû da şagirta digot, wekî meriva miqabilî Xwedê gunehkarî kirîye. Lê bona çi dibêjin, wekî wana guneh kirîye? Gelo bona gunehkarkirinê? Xwedê gunehkar nake: "Çimkî Xwedê Kurê Xwe neşande dinîyayê ku dinîyayê gunehkar bike, lê bona wê yekê ku dinîya bi Wî xilas bibe" (Yûhenna 3:17). Diha baş nîne wana bînî cîhekî, li kîderê ewê halê xwe fem bikin, wê gunehê xwe tobe bikin û baxşandinê bixwezin?

Gelo çi mêriv berbi tobekirinê dibe? Bersiva vê pirsê nava Romayî 2:4 da tê dîtinê:

*"Yan jî tu ku dewlmendtîya* şîrnayî, berbihêrî û sebira wî bêh*urmet dikî, tu nizanî tu ku* şîrnaya Xwedê te dibe berbi tobekirinê?".

Şîrnaya Xwedê me dibe berbi tobekirinê. Hizkirina Wî nahêle ku em bona dojê bêne gunehkarkirinê. Ewî hizkirina Xwe da kifşê, Îsa şand, Kurê Xweyî tek– tenê, Yê ku li ser xaç mir. Xwedê gihîşte me, nenihêrî wê yekê, wekî me pêşda miqabilî Wî guneh kiribûn. Ew gihîşte me ne ku bona gunehkarkirinê, lê bona xilaskirinê.

Çawa ku em gerekê bibine mîna Xwedê (binihêre Efesî 5:1), gerekê destê lihevhatinê dirêjî wî birayî bikin, yê ku hindava me da guneh kirîye. Îsa vî cûreyî îzbat kir: "Here cem wî û gunehê wî nîşanî wî bike, ne ku wî gunehkar bike, lê her tiştê ku di navbera we herdua da nin, dûr bixe û bi wî cûreyî li hev werin". Hizkirina Xwedê ya nava me da wê birayê me berbi tobekirinê û dasekinandina heleqetîya bibe.

> *"Awa ezî girtîyê bona navê Xudan, hîvî ji we dikim, ku* hûn *usa bêjin, çawa layîqî wê gazîy*ê *ye, kîjanê ra hûn hatine gazîkirinê. Hûn bi temamîya milûktîy*ê û ş*ikestî bi sebirê hiznekirinê da li ber hev daxun. Bicedînin ku yekîtîya Ruh* pê pevgirêdana edilayê xweyî bi*kin"*
>
> – EFESÎ 4:1–3

Em evê tevgirêdana aşîtîyê bi tabûn, gurêkirinê û bi hizkirina hev xweyî dikin. Tevgirêdanên hizkirinê bi saya wan tên qewînkirinê.

Min himberî wan meriva şaşî kirîye, kîjan bi gunehkarkirin miqabilî min derketine. Çawa encamê wê yekê, min xwestina lihevhatina tevî wan unda kirîye. Bi gilîkî, ez difikirîm wekî wana dixwest bidine kifşê ku ez bizanibim, wekî ew hêrs ketîne.

Yên mayîn, himberî kîjana ez şaş bûme, bi lihevhatin hatine cem min. Peyî wê yekê ra ez lez ketime nêzîkbûna xwe biguhêrim û baxşandinê bixwezim, carna jî bi nehiştina wê yekê, ku ew gotinên xwe xilas bikin.

Gelo usa bûye, wekî yek hatîye cem te û gotîye?: “Ez dixwezim tu bizanibî, wekî min baxşandîye te, ne ku bona wê yekê çawa hevalekî diha baş û ne jî bona tiştekî mayîn”.

Lê paşê te ji nihêrandina wî fem kirîye: “Tu bona baxşandinê deyîndarê minî”.

Tu tevlîhev bûyî, çimkî ew nehatibûn bona lihevhatinê, lê hatin te bitirsînin û kontrol bikin.

Em gerekê awqas wede neçine cem birayê ku em xeyîdandine, hetanî ku me dilê xwe da qirar nekirîye wî bibaxşînin, bi hesabhilnedana wê yekê, ku bersiva wî wê çi cûreyî be. Em gerekê pêşîya çûyîna cem wî, ji dijminatîya himberî wî aza bin. Eger em wê yekê nekin, wî çaxî emê ji vê texmînkirina xirab binkevin û emê ne ku qenc bikin, lê zirarê bidin.

Gelo çi diqewime, wextê ku menîya me rast e û em dicêribînin wî ra li hev bên, yê ku himberî me guneh kirîye, lê ew jî guhdar nake.

> *“Lê eger guhdarîya te nekir, yekî yan dudên din jî tevî xwe hilde, wekî: “Bi devê du, yan sê şeda her tişt îzbat bibe”. Lê eger ewî guhdarîya wan jî nekir, civînê ra bêje. Û eger guhdarîya civînê jî nekir, bila ew bona te bibe mîna pûtparast û xercgira”.*
>
> – METTA 18:16,17

Her yek ji vê texmînkirinê dîsa li ser meremê lihevhatinê ye. Îsa digot: “hertim bicêribîne”. Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî yê ku xeyîdandîye, çi cûreyî dikeve nava her gavekê. Çiqas gelek cara em xeyîda meriva hildidin, lê dewsa wê yekê em gerekê herne cem wî, yê ku miqabilî me guneh kirîye û usa nêzîk bin, çawa ku Îsa dibêje. Menî ew e, wekî me dilê xwe da pirsên xeyîdê hel nekirine. Em xwe afûkirî texmîn dikin û bi fikira xwe wê yekê raberî meriva dikin. Menîya me qewîn dibe û me rihet dike, wextê ku ewên mayîn jî me ra qayîl dibin, ku ew bi çiqasîva xirab nêzîkî me bûne. Nava vê yekê da tenê xwehizî heye.

## Tiştê herî grîng

Eger hizkirina Xwedê bibe menîya meye hertimî, emê tu cara rastî teribandina neyên. Wextê ku em merivên mayîn bi wê hizkirinê hiz dikin, bi kîjanê Îsa em hiz kirin, emê aza bibin, eger ew meriv naxweze jî me ra li hev bê. Guhdarîyê bide li ser gotina Kitêba Pîroz. Serwaxtîya Xwedê nava hemû hala da jî nêzîk e.

> "Çiqas ji dest we tê, tevî hemû meriva nava edilayê da bin"
>
> – ROMAYÎ 12:18

Pawlos dibêje eger mecal heye, çimkî wede wê bê, wextê ku merivên mayîn wê nexwezin tevî te nava edilayê da bin. Diqewime usa bibe jî, wekî merivên usa hebin, yên ku bona lihevhatinê heleqetîya me ya tevî Xudan dayînine alîkî. Wî çaxî dasekinandina heleqetîyê, ya tevî wî merivî, tiştê bûyînê nîne.

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî Xwedê dibêje: "... çiqas we va girêdayî ye". Em gerekê hemû tiştî bikin ku bikaribin wî merivî ra li hev bên, bi aqasîva, bi çiqasîva em anegorî rastîyê pêşda diçin. Gelek cara nava heleqetîya da em gelekî zû teslîm dibin.

Ezê tu cara wê yekê bîr nekim, wextê ku hevalek şêwir da min ku ez ji wî halê pêşdahatî paşda neçim. "Con ez zanim tu dikarî hîmên nivîsarên Pîroz bibînî bona ku dûr sekinandina xwe bidî hîmdanînê. Pêşîya kirina wê yekê, tu li ser xwe guman î, wekî te bona wê yekê nava duakirinê da şerkarî kirîye û te hemû tişt kirîye, çi ku te karibûye bikî, bona ku edilaya Xwedê bihata nava wî halî".

Paşê ewî serda zêde kir: "Tê rojekê yazixîyê elam bikî, eger tu li peyî xwe binihêrî û ji xwe bipirsî, ku gelo te hemû tişt kir bona xilaskirina vê heleqetîyê. Wê diha baş bibe ty li ser xwe gyman bî, wekî rêyeke te ya başqe tune û te hemû tişt kir û tu li ser rastîyê mayî".

Bona wê şêwirê ez ji wî hevalî gelekî razî bûm û min ew gotin çawa serwaxtîya Xwedê qebûl kir.

Gotinên Îsa bira bîra te da bin.

> *"Xwezî li wan ku edilay*ê dikin, çimkî ewê zarên Xwedê bêne hesabê"
>
> – METTA 5:9

Ewî negot xwezî li edilayîxweykira. Edilayîxweykir ji dew û dozê xwe paşda dide û bi her cûra edilayê xweyî dike, hema bi çûyîna berbi rîska dûrketina ji rastîyê. Feqet, ew edilayî edilaya rast nîne. Eva edilaya ser ra ye, ya ku namîne, yê ku edilayê dike nava hizkirinê û dozê ra derbas dibe bi anîna rastîyê, bona ku nava encamên wê yekê da aşîtî îzbat bibe û dirêj bikişîne. Ew heleqetîya li ser ra xweyî nake. Xwestina wî bêqelpî, rastî û hizkirin e. Yê ku e'dilayê dike, wê xeyîdê bi ken veneşêre. Ew edilayê bi hizkirina serbest çê dike, ya ku nikare bê teribandinê.

Xwedê bona însan vî cûreyî dike. Ew naxweze ku tu kes unda bibe. Feqet, Xwedê rastîyê nade der bona xweyîkirina heleqetîya. Ew bi rastî aşîtîyê digere, lê ne ku heleqetîyên bi ser ra. Ew tevgirêdaneke hizkirinê pêş dixe, kîjanê tu qewateke xirab nikare bibire. Ewî emirê Xwe bona me danîye. Em jî gerekê wî cûreyî bikin.

Bîr bîne, wekî hizkirina rast tu cara kubar nabe, tiştê xirab nafikire. Ew ya xwe nagere û rihet naxeyîde (1 Korintî 13:5).

Pawlos nivîsî, wekî hizkirinê hemû guneha alt bike.

> *"Û ez vê duayê dikim, ku hizkirina we hê–hê bi zanebûn û serwaxtîya gihîştîva zêde bibe, wekî kîjan here qen ce, hûn wê bibijêrin. Hingê hûnê Roja hatina Mesîh da* şîrhelal û bêleke *bin û bi saya Îsa Mesîh bi berên heqîyê va tijîbûyî bin, bona rûmet û pesinê Xwedê".*
>
> – FÎLÎPÎ 1:9–11

Hizkirina Xwedê kilîta azabûna ji tela xeyîdê ye. Eva gerekê bibe hizkirineke mezin, ya ku hertim zêde dibe û nava dilên me da qewîn dibe.

Nava civaka me da roja îroyîn gelek meriv piştgirên hizkirina ser ra nin, hizkirineke ku xeber dide, lê kar nake. Ew hizkirina ku me xweyî dike û îzinê nade ku em bişimitin (bilukumin), emirê xwe pêşkêş dike usa jî bona dijmin. Wextê ku em nava vê hizkirinê ra pêşda herin, emê ewî tiştî, çi ku cin danîye li ser telê, danequrtînin.

# PAŞGOTİN

# DERBASÎ KİRİNÊ BİBİN

Çawa ku te ev kitêba xwend, diqewime Ruhê Xudan, derheqa heleqetîyên pêşda û niha da bîr anî, nava kîjana da tu tiştekî miqabilî merivên mayîn xweyî dikî. Min emirkirina Xudan texmîn kirîye ku tewaqe ji te bikim, ku tu tevî min duayê azabûnê bikî. Lê pêşîya duakirinê, tewaqe ji Ruhê Pîroz bike, ku ew tevî te nava wedê derbasbûyî ra derbas bibe û wan meriva bîne pêşîya te, miqabilî kîjana te tişt xweyî kirine. Rihet pêşîya Wî bisekine, wextê ku Ew nîşan bide ku kîjan in ew meriv. Hewce nîne ku tu tiştekî li wir bigerî, li kîderê tu tişt tune. Ruhê Pîroz wê zelal te ji wê derê der bixe, derheqa kîjanî da tu şikber jî nînî. Wextê ku Ew eşkere bike, diqewime tu wê êşê bîr bînî, kîjanê ra tu derbas bûyî. Netirse. Ewê hema li wir li rex te be.

Wextê ku tu wan meriva ji gunehkarkirinên xwe aza bikî, wî çaxî ji wana her yekî bi cûrê xwe texmîn bike. Hemûya bibaxşîne. Wî

deynî dade, kîjanî ew deyndarê te ne. Paşê vî duayî bike, lê tenê bi van xebera va neyê sînorkirinê. Vî duayî çawa rênîş bide xebatê û bi Ruhê Xwedê were rêberkrinê.

> *"Bavo, bi navê Îsa ez qebûl dikim, wekî ez himberî Te gunehkar bûme, wextê ku min nebaxşandîye wan meriva, kîjana ez xeyîdandime. Ez tobe dikim û baxşandina Te tewaqe dikim.*
>
> *Ez usa jî ewê karebûna xwe ya bona baxşandina wan qebûl dikim. Bona wê yekê jî ez bi dil baxşandinê dibijêrim. Navên wan bêje û her yekî aza berde. Li ser wî hemû tiştî, çi ku wana himberî min kirîye, ez parastina xwîna Îsa elam dikim. Ew êdî deyîndarên min nînin. Ez gunehên wane himberî min mîyaserkirî dibaxşînim.*
>
> *Bavê Ezmana, çawa ku Xudanê min Îsa ji Te tewaqe kir, ku Tu wana bibaxşînî, yên ku hindava Wî da guneh kiribûn, usa jî ez dua dikim, wekî Tu wana bibaxşînî, kîjana himberî min guneh kirine. Ez tewaqe dikim, wekî Tu bona wan dua bikî û nava heleqetîyên diha nêzîk da Tu rêberîyê bikî. Amîn".*

Nava rojnîşekê da navên wan meriva binivîse, kîjan te aza berdane û wê rojê bide kifşê, kîjan rojê te ew baxşandine.

Tu gerekê bona azamayîna ji xeyîdê xwe hîn bikî (Careke mayîn beşa kitêbêye 13–a bixweîne). Qirar bike ku bona wan usa dua bikî, çawa ku teyê bona xwe dua bikira. Rojnîşê alî te bike bîr bînî. Eger bîranîn wê her dem fikirên te tevlîhev bikin, wana bi gotina Xwedê xirab bike, tune bike û qirara xweye baxşandinê elam bike. Te bona kerema Xwedê tewaqe kirîye, ku tu bibaxşînî û nebaxşandin awqas qewat nîne, çiqas kerema Wî. Ser xwe be û şerê rehmê, yê bona bawarîyê, bike.

Wextê ku tu li ser xwe guman bî, wekî dilê te qewat e û îzbatbûyî ye, here cem wan. Bila bîra te da be, wekî tu bi meremê lihevhatinê diçî ku karê bidî wan, lê ne ku bona xwe (Metta 18:15 binihêre).

Çavên Xwedê da ev e tiştê baş.

> *“Wî ra, yê ku dikare we ji ketinê xweyî bike û li ber rûmeta xwe bêqisûr eşq bide sekinandinê, Xwedê yê bêşirîkî, bêheval, Xilazkirê me ra bi destê Îsa Mesîhê Xudanê me, şikir û mezinayî, qudret û hukumat be, berî her–heyê û niha jî heta– hetayê! Amîn!”.*
>
> – CIHÛDA 24,25




Armanca qulixdarîya **“Mêsîncêr întêrnêyşinil”**–ê ew e ku alî şexsa, malbeta, civîna û mileta bike, ku ew qewata Xebera Xwedê fem bikin û li ser xwe texmîn bikin.

Bi saya vê femdarîyê, him meriv, him cîhên jîyanêye tam wê bêne guhartinê, û civakê bi aktîvî dijî vê neheqîya ku dinîyayê dizêrîne şerkarîyê bike

---

CLOUD
LIBRARY

Sayta **CloudLibrary.org**–ê dikeke zindî ye, ya ku îzinê dide serwêr û rêberên li temamîya cîhanê, ku ew bi zimanên xwe matêrîyalên êlêktronîye belaş bistînin.

Herine sayta **CloudLibrary.org–**ê û cêrge matêrîyalên Con û Lîza Bîvêra bixwînin, yên ku bi ji 100–êyî zêdetir zimana wergerandî hene.

**Kitêbên êlêktronî, dersên aûdîo û vîdêyo, kitêbên aûdîo, Mizgînîya...**

**Hûn diha zêde dixwezin? Şikil pêlkin.**

CloudLibrary.org

# JI TELA DIJMINE MIRINÊ AZA BIBIN

“**Tela şeytan**” teleke here xapînok eşkere dike, kîjanê mîrêcin dide xebatê bo ku bawermenda ji xwestina Xwedê der bihêle. Ew tela xeyîdê ye.Gelek meriv, ên ku ketine vê tela mîrêcin, wê yekê fem nakin. Xapyayî nemîne! Tê rastî xeyîdê bêyî, û te va girêdayî ye ku ewê çawa li ser pêwendîya te ya tevî Xwedê tesîr bike. Bersiva te wê pêşeroja te biryar bike. Eger tu bi cûrê rast ji tela xeyîdê derbikevî, tê zêde qewat bibî û xeyîdî nemînî.

Nava vê kitêbê da usa jî şedetîyên wan meriva hene, yên ku ev kitêb xwendine, kîjanê da pirsên cuda bona gotûbêjkirinê, xeberên ji nivîsarên pîroz û dua, hene
Tê bersivên pirsên usa bibînî, yên mînanî:

- Bo çi min mecbûr dikin ku ez “fikira xwe” ya serpêhatiyê gilî bikim?
- Ez çawa dikarim dijî fikirên şikberiyê û bêaminayê şerkarîyê bikim?
- Ez çawa dîsa li wan meriva amin bim, kîjana ez bi kûrayî xeyîdandime?

Kitêbê alî te bike, ku tê ji “tela xeyîdê” usa aza bibî, ku wê te bona azamayîna ji xeyîdê qewat bike, wê usa bike ku pêwendiya te ya bêyî dijwarî tevî Xwedê hebe.



Con Bîvêr xudanê wan kitêba ye yên ku zêdetir tên firotanê û ew terîfkirê konfêransên mesîhîtîyêye bi nav û deng e.Ew tevî jina xwe, Lîzayê, ya ku dîsa xudana kitêba ye, sala 1990î qulixdarîya Con Bîvêr damezirandine, ya ku mazin bûye û werguhêzî qulixdarîya navnetewî bûye. Dikeve nava wê usa jî programa têlevîzyonê ya “The Messenger”. Ew progam li 214 welata tê weşandinê. Con Bîvêr xudanê gelek kitêba ye: “Tirsê bişkênin”, “Xofa Xudan”, “Bin perdê da” û yên mayîn. Ew û Lîza, tevî çar kurên xwe, li ştata Amêrîkayêye Koloradoyê dijîn.

Van matêryala û yên mayîn hûn dikarin li vê malperê dest bînin: **CloudLibrary.org**

Cloud Library

MESSENGER
INTERNATIONAL
MessengerInternational.org

Ev kitêb ji alîyê xudanê wêda pêşkêş e û ne bona firotanê ye.

Diha zêde dixwezin? Şikil pêlkin.

CLOUD LIBRARY